

# HÊVÎ

KOVARA ÇANDIYA GIŞTİ



\$ 6 (Etranger)

HEJMAR 4/İLON 1985

40 FF

# ESPOIR

HĒVÎ

Revue culturelle kurde

Nº. 4 - Septembre 1985

40 FF

Directeur de la publication : Rojen Barnas

Réalisation : Ali Bucak, Ibrahim Ghazagh, Mohamad Hassan,  
Suleiman Jany, Mahmut Lewendi, Kemal Marûf

Collaborateurs : Ibrahim AHMED (Angleterre), Rojen BARNAS (Suède), Firat CEWERÎ (Suède), Dr. Kemal FUAD (Berlin), Dr. Çemşid HEYDERÎ, (Suède), KENDAL (France), MALMÎSANIJ (France), Ferhad ŞAKELÎ (Suède), Hesen SEYF (Suède),

## SOMMAIRE

### EN KURMANCÎ

- La mort de l'écrivain Hassan Qizilcî - <i>Joyce Blau</i>	7
- En mémoire du R.P. Thomas Bois - <i>Joyce Blau</i>	11
- Souvenirs d'Ihsan Nouri Pacha sur la révolte d'Agrî (III) -	15
- Bûbê le contrebandier (nouvelle) - <i>Firat Cewerî</i>	27
- Une journée chez le savant Kinyaz İbrahîm - <i>Çerkezê Reş</i>	37
- Les plantes alimentaires - <i>Hesenê Metê</i>	41
- La fille du bouvier et le fils du prince (conte) - <i>Mûsa Kaval</i>	44
- Poèmes inédits - <i>Rıza Çolpan, Nezîr Gedo, Toşînê Reşîd</i>	55
- Les publications récentes	62
- A propos du livre de Mentéchachvili - <i>Pêşrew K. Ehmed</i>	

### EN KURDE DUMİLİ

- Poème à la naissance du Prophète - <i>Ehmedê Xasî et 'Usman Efendi</i>	75
- Sheikh Saïd de Pirane - <i>Malmisanij</i>	111
- La mort de Xalit Beg de Cibrî - <i>Demir Özlu</i>	115
- Le Folklore de Dersim - <i>Firat</i>	121
- Bibliographie dumili (2eme partie) - <i>Malmisanij</i>	127

### EN KURDE MERIDIONAL

- Point de vue - <i>Hawar</i>	203
- L'internationalisme dans la poésie de Goran - <i>Kamuran</i>	188
- Dernière lettre (poème) - Y. Werzêr	181
- Dildar, poète révolutionnaire et progressiste - <i>Kemal Marûf</i>	177
- Conte de la montagne - <i>Heme</i>	171
- Fondements de la pensée patriotique kurde dans le Mem û Zîn d'Ahmed Khanî - <i>Ferhad Şakeli</i>	160

La revue Hēvî (Espoir) est une publication bi-annuelle de l'Institut Kurde. Elle est ouverte à tous les courants de la vie culturelle kurde.

Les textes publiés n'engagent que la responsabilité de leur auteur.

Pour toute correspondance, écrire à : **Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS - FRANCE. Tél. : (1) 48 24 64 64**

# HÊVÎ

---

## KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ

---



HEJMAR 4/İLON 1985

**Imprimé en Italie**

**Copyright INSTITUT KURDE DE PARIS – 1985 – ISSN 0761-1242**

Kurmanç di dewleta dinê da  
Aya bi çi wechî mane mehrûm ?  
Bîlcimle ji bo çi bûne mehkûm ?

*Ehmedê Xanî (sedsala XVII)*

# **SERECEM**

## **KURMANCÎ**

- Mirina Hesenê Qizilcî - *Joyce Blau*
- Bîranîna Thomas Bois - *Joyce Blau*

7  
11

## **BELGE**

- Bîranînên Ihsan Nûrî Paşa (III)

15

## **ZIMAN Û EDEBIYAT**

- Qaçaxkeriya Bûbê - *Firat Cewerî*
- Rojekê bî ilimdar Kinyazê İbrahîm re - *Çerkezê Reş*
- Pincar - *Hesenê Metê*
- Keça Gavan û Kurê Mîr - *Mûsa Kaval*

27  
37  
41  
44

## **HELBEST**

- Bîr nabin - *Riza Çolpan*
- Apo - *Nezîr Gedo*
- Strana Pêşmergan - *Tosinê Reşîd*

55  
57  
59

## **PIRTÜKÊN NÛ**

62


- Li ser pirtûka Mentêşavîlî - *Pêşrew K. Ehmed*

## DUMILÎ

- Mewlidê Nebî - <i>Ehmedê Xasî</i>	75
- Biyîşê Pêxemberî (Mewlûda Nebî) - <i>'Usman Efendî</i>	98
- Şêx Seîd Hame Pîran - <i>Malmîsanij</i>	111
- Mergê Xalit Begê Cibrî - <i>Demir Özlu</i>	115
- Folklorê Dersimî ra - <i>Firat</i>	121
- Bîblîyografiya Dimilî (Zaza) II - <i>Malmîsanij</i>	127

## KURMANCIYA XWARÊ

- Nameyek bo rongeyek - <i>Hawar</i>	203
- Internasyonalîzm li şî'rî Goran de - <i>Kamuran</i>	188
- Duwaname - <i>Y. Werzêr</i>	181
- Dildar, şairî şoreşger û pêşkewtinxwaz - <i>Kemal Marûf</i>	177
- Çîrokî Şax - <i>Heme</i>	171
- Binçînekanî bîrî kurdayetî li Mem û Zînî Xanî de - <i>Ferhad Şakelî</i>	160



# MIRINA HESENÊ QIZILCÎ

**Joyce BLAU**

*Nivîskarê navdarê Kurdistana Iranê, Hesenê Qizilcî di temmûza borî de di zîndanên Iranî de li jêr şkencê mir. Stî Joyce Blau, profesora zimanê kurdî li Zanîngeha Parîsê jiyanâ wî bibîr tîne.*

Hesen Mela Elî Qizilcî di 15 îlon 1914 de li gundekî navçeya navbera Bokan û Mahabadê hatîbû dinê. Qizilcî navê gundekî nêzikê Pencwînê, li Kurdistana Iraqê ye. Kalikê wî, Mela Elî, terka vî gundi kiribû û hatîbû navçeya Bokanê li gundê Turucanê bicih bûbû. Bi cîwarbûna vê malbata xwendayan, Turucan bû navbendeke dinî û çandî ya girîng. Di welatê Mukriyan de dibêjin : «Malbata Qizilcîyan wekî werdekan in : têjikênu ku nû ji hêke derdi Kevin bi serbestî melevanî dikan». Rast e ku ev malbat gelek xwenda û zane gîhandiye ji bo neteweyê kurd.

Hesenê piçûk li ber destê mamêni xwe fêrî zanistiyêni islamî, farisî û erebî dibe. Lê ew hê di xortaniya xwe de biryar dide ku ewê melatî neke, bide ser rîyek din.

Di wê demê de, Reza Xan li ser hikum bû û ramyariya (siyasetek) wî mehandina Kurdan bû. Hikûmata Tehranê dest dabû ser mal û milkên Serokêni Kurdan û wan sîrgûn kiri bû, karmendêni ecem şandibû Kurdistanê. Van karmendan bi bertîxurî û hişkahiya xwe gundiyan kurd zehf diêşandin. Di salêni 1926-1930 de Kurd di bin seroktiya Ismaîl Axa Simko de serî hiltînin lê di 1930 de Simko bi bêbextî tê kuştin. Di 1932 de serhilanîna Cafer Axa Sultan jî tê perçiqandin. Şah hemû teşkilatên civakî û edebî yên kurdî û bikaranîna resmî ya zimanê kurdî qedexe dike û, di ber de jî, li çar aliyêni welatê kurda qereqolêni cendirman bicih dike.

Xwendayêni kurd wekî Mela Ehmedê Fewzî, Seyfê Qazî, Qazî Mihemed, Qazî Bokan, Şêx Ehmedê Sirîlaawa û gelek rûspîyêni din dicivin teşkilateke veşarî datînin ji bo parastin û pêşve birina ziman û edebiyata kurdî. Bi hezar

zehmet û dijwaniyan ev teşkîlat ji Iraqê kovar û pirtûkên kurdi tîne anîn û li xortêñ kurd belav dike. Komek ji wan xortêñ navçeya Bokanê spartibûn Mela Ehmedê Fewzî : ewê ev xort bibin çaktırîn hêviyêñ gelê kurd ê Iranê. Di nav wan de Hesen Qizilcî yek ji çêtirîn şagirtêñ Mela Ehmedê Fewzî hebû.

Di şerê cihanî yê duwemîn de, hêzêñ sovyetî bakurê Iranê, yên brîtanî ji nîvroyê wê iŞxal kiri bûn. Di navbera her du navçeyêñ iŞxalkirî de, keriyek ji Kurdistana Iranê «no-man's land» ango ne milkê kesîbû, ji her destelatî biyanî dûr bû. Li wê derê Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê tê damezrandin û Hesen Qizilcî ji dibe endamê partiyê. Di çile 1946, partî li Mahabadê Komara Kurdistanê ïlan dike û pêşewayê partiyê Qazî Mihemed dibe Serek komar. Pêkanînê vê Komarê nîşan didin ku tenê hikûmateke netewî xizmeta gel dike. Di demekî kurt de çendîn tişt hatin pêkanîn ! Tenê di warê weşanê de, kovarêñ Kurdistan, Hawar, Agir, Helale û Niştiman hatin derxistin. Roja ïlana Komarê, Qazî Mihemed li Mahabadê xwendengeheke bilind a keçan vedikir. Hesen Qizilcî bû sernivîskarê kovara Helale, ku bi taybetî ji bo keçan derdiket. Ewî wisa ji di kovara Kurdistan de dînivîsî.

Hêmin (Mihemed Emîn Şêx-ul-Îslam) ku yek ji dostêñ nêziktirîn ên Hesen Qizilcî bû bi dilovanî<sup>(1)</sup> rojeke zivistana 1946 bi bîr tîne ! Dinya gelek sar bû. Roj zû çûbû ava, şevtarî di kuçeyek Mahabadê de bi ser Hêmin de hatibû. Bayek cemidî laşê wî ditevîzand û ewî, bi hemû hewla xwe, xwe dilezand ji bo xwe bîghîne Starekê. Ji nişkêva, çavê wî bi Qazî Mihemed dikeve. Pêşewa li ber deriyê mala xwe diçû û dihat, di destê wî de hejmara rojê ya Kurdistanê û ew bi dengekekî bilind bi yek ji nîvîskarêñ rojnamê re diaxivî. «Ez ji serma diricifîm, dibêje Hêmin, û min di ber xwe de silav li wan kir û xwe lezand. Ewî min dît... û ez ji wan dûr ketibûm gava ku dengê wî hate guhêñ min :

- Te dît, qîriya, tiştê ku vî Qizîlcîyi nîvîsiye ?
- Min kurteçîrok a nefîs a ku wê rojê di rojnamê de derketibû baş dinasî.
- Belê, bêguman, min ew xwend. Bi rastî gelek hêja ye.
- Rast e, got hevalê nîvîskar, ew pir xweş, lê gelek kêm dinivîse !

Pêşewa Qazî serê xwe hêjand, bişîrî û pê re ji Saadî Shirazî du beyt xwend<sup>(2)</sup>. Min bihîst ku li welatêñ Rohelat çîl sal xebat divêt ji bo çekirina şerbikekî ferfûrî

Di bajarê Baxdayê de, rojê ji wan sed çê dikin. Gelo tu niha rûmeta vî şerbikî dizanî ?

Serok Komar difikirî û li min dînihêrt :

- Xwezî di nav me de kesêñ wekî wî zehf bûna ! Û berî ku ew bersiva min bibihîze, ewî wekî ku ji xwe re bipeyive, got :

(1) Pêşgotina Hêmin di Pêkenînî Geda, r. 8.

(2) Gulistan

- Ku em serbixwe bûna ewê çendîn qabiliyet xwe nîşan dana !

Piştî vekişîna leşkerên sovyetî ji Iranê, hikûmata Tehranê hêzên xwe şand ser Komara Kurdi û Serokên wî da girtin. Qazî Mihemed, Seyfi Qazî û Sedrî Qazî di berbanga 31 adar 1947 li Mahabadê daleqandin. Lê gelê kurd tu car van mîrxasan ji bir nekir. Helbestvan û hozan wan distirêن, gora Qazî Mihemed bû zîyaretgaheke pîroz ji bo hemû gelê kurd.

Ji bo Hesen Qizilcî û ji bo dostên wî yên helbestvan Hejar û Hêmin derbederiyeke dirêj û tijî cefa dest pê dikir. Xeynî sirgûnê rîyek nemabû. Ew diçe Iraqê û li wir nihêñî dijî. Di şûna ku dikeve bêhêvîtiyê, Hesen Qizilcî di vê dema tarî û dijwar de, di nav tunebûnê de, dest bi cêribandinê nû dike.

Ew rastî Elaedîn Secadî û Ibrahîm Ehmed dibe û ev rasthatin dibe kaniya nûyitiyan. Ev her du nivîskar guh nadîn usûlêن kevnare yên edebiyatêن farisî û erebî, remz û belaxetê didin alî. Hesen Qizilcî jî bala xwe dide jiyanê, jiyanâ kuçê, ya her rojê, ya Kurdan, dide ser şopa realîzmê. Realîzma wî jî taybetî ye, nêrîna wî gelek nêzikî qewimandinêن rojane ye, ew di hewa germ û mitewazî ya Kurdêن ji rêzê de dilive.

Kurteçirokêن Hesen Qizilcî di kovarêن Bexdayê de, û nemaze di kovara Hîwa (1957-1963)<sup>(3)</sup> a ku Hafez el-Qadî derdixist, de belav dibin. Piraniya wan têن wergerandine erebî.

Di sala 1963, di dema ku Kurdêن Iraqê ji bo rizgariya xwe ya neteweyî, di bin seroktiya Mela Mustafa Barzanî de, şer dikirin, Hesen Qizilcî Iraqê diterikîne diçe Sofyayê cem malbata xwe. Li wê derê, bi saya zanîna zimanêن bulgarî û rûsî, di Radyo Bulgarîstan de dixebite. Di ber de jî ji kovarêن kurdî yên Iraqê re nivîsaran dişîne<sup>(4)</sup>

Hevalêن Hesen Qizilcî, wekî Abdurrahman Qasimlû, Hejar, Hêmin û hinê din, nivîsarêن wî dicivînin û di 1972 de, di nav weşanêن Binkey Pêşewa (Weşanêن Partiya Demokrat a Kurdistanâ Iranê) berhevoka Pêkenînî Gedâ<sup>(5)</sup> derdixin.

Kurteçirokêن Hesen Qizilcî ji titbara xwe tiştek winda nekirine. Li navçê gelek guhirandinêن siyasi çêbûn lê, di bingehê de, civaka kurdî pir neguhiriye. Kul û janêن wê hê dom dîkin : belengaziya gundiyan, kedxurî û stema beg û şêxan, zordestiya dewletê. Qizilcî bi zimanekî gelerî û dewlemend dînivîsîne û mîrxasên wî ji xelkê ne. Buyerêن jiyanâ wan, bibîranîna filan adet an baweriya gelerî nîşan didin ku nivîskar kurahiyêن giyana gelê xwe baş dinase. Gundî ji deyn û bêşan nikare pişa xwe rast bike : wekî cotbendêن gundê Nişûrê, di çîroka Helkêy Hadîxan de, ku mecbûr in ji axayê gund re

(3) Nuştekey Aminexan, Hîwa, no. 30, 1960 - Keşkoli Caduyî, Hîwa, no. 31, 1961 - Şehîdî Zulme kifn û şordînî nawê, Hîwa, no. 33, 1961

(4) Binêre, Le barey hêndê le nihêniyekanî rezimanî kurdî, Govarî Korî Zanyarî Kurd, cild 5, Bexda, 1977, r. 113-134.

(5) Di vê berhevoka 149 rûpel de çarde kurteçirok hene. Çapa duwemîn a vê berhevokê di van nêzan de li Iraqê derket û berhevok li Iranê jî dî çapê de ye.

pîtake, pûşane, rûnane, kawirane, xuriyane, mûwane, firûcane, bêgarane bidin û bi ser de bêşek bi navê tapo, ku nîv an sêye ka hatina zad, meywe an sebze ye, bidin. Û gava ku gundiyê belengaz nikare ji bin van bêşan rabe, axa an şaneyê wî dest datînin ser malên wî. Bi vî awayî, di *Pêkenînî Gêda* de, Hecî Salih dest datîne ser gayê cot ên gundiye kî bextreş ê ku zadê wî kuliyan xwariye. Malbata gundî perîşan dibe : zaro yi xuriya dimire, jinik ji tayê û ji derdan ! Gundî dest bi parsê dike, dikeve ser riyan û wekî gelek gundiye nî belengaz xwe davêje bajêr, bi hêviya peydakirina karekî.

Hesen Qizilcî rexne li dîn digire. Di *Nûştekey Amîne Xan* de jinikek jar, jinê belengazên din re nivîstan çê dike ji bo derman kirina hemû derdên wan !

Tevî realîzmê Hesen Qizilcî cih dide xeyal û efsanê jî. *Keşkoli Caduyî* çîroka xemgîn a gundiye nî perîşan ên bin nîrê axayekê xedar e. Kurê malbata gundî bi saya keşkolekî cadûyî û bi sêr erdê bav û kalêن xwe ji axa distîne.

Piştî ketina rejîma Şah, Hesen Qizilcî di 1979 de vege riya bû Iranê. Ew endamê Partiya Tudeh bû û ji 1979 pê ve berpirsiyarê rojnama *Namêyê Mardom* bû. Ew di Sebata 1984 de hatibû girtin. Ji wê demê de haya hevalê wî jê tune bû.

Bi mirina trajîk a Hesen Qizilcî gelê kurd yek ji kurêن xwe yên sadîq û wefakartir û edebiyata kurdî û cihanî çîrok nivîsekî mezin winda kirin.

# BÎRANÎNA THOMAS BOIS

**Joyce BLAU**

*Bi hinceta deh saliya wefata Kurdiyanê fransiz ê bijare Thomas Bois, Stî Joyce Blau, ku hevkar û şagirta wî bû, jiyan û afirandinên wî bi bîr tîne.*

Xezên sereke yên jiyana mamesteyê min ê rehmetî bi bîr anîn ji bo min şerefike mezin û xebateke dijwar e. Ev zana pareke girîng ê jiyana xwe da çêtir nasandina Kurdan. Ew dostekî wefakar û gelek fedakar ê xelkê kurd bû.

Thomas Bois, di 6 gulan 1900 de, li bajarê Dunkerque'ê, li bakurê Fransayê di malbateke heşt zarokî de hatibû dinê. Ew di xortaniya xwe de biryar dide ku bibe keşe û di 19 saliya xwe de dikeve Dêra Broyen Wa'zdarên Saint Domonique. Li wê derê xwe dide xwendinê, hişê xwe yê rexnegir pêş ve dibe, hînî xebata sebirxwaz a zanistiyê dibe.

Di 1927, dêra wî wî dişîne Mûsilê, ew li wê derê rastî Kurdan tê, fêrî wan dibe û dixwaze bi hemû hêzên xwe bi wan bilî bibe. Ewî hingê zimanên arameyî, erebî, îngilîzî, rûsî, italyanî, yewnanî û latînî dizanibû û dest bi hînbûna kurdî kir. Bi saya qenc fîrbûna zimanê kurdî ewê «giyana Kurdan», edebiyat, dîrok û jiyana civakî ya vî gelê serbilind û mîrxas baştir binase û di demekî kurt de bibe xwediyê gelek hogir û dostên kurd.

Di 1932 de, ew dibe serokê Dêra Mar Yaqûb, rûniştgeha bedew a keşeyên domînîkî ku li serê çiyayên Kurdistanê, di warekî asê û wahşî de hatiye avakirin. Di 1936 de, ew îcar diçe Kurdistana Sûriyê, li mala nû ya Domînîkiyan a Qamişlî û Derbesiyê bicih dibe. Lê hewa Cizîrê li tenduristiya (siheta) nazik a keşe Bois nayê. Mecbûr dimîne ji Kurdistanê û ji dostên xwe yên kurd veqete û diçe, pêşiyê li Trablûsê, dû re li Beyrûtê cîwar dibe. Li wêderê rastî Mîr Celadet Bedirxan û brayê wî Kamûran, xebatkarên westiyannenas ên vejîna çanda kurdî, dibe. Thomas Bois besdarî dide xebatên ronakbîrên kurd û fransiz ên hêja ku kovarên HAWAR (1932-1935 ; 1941-1943), RONAHI (1942-1944) û ROJA NÛ (1943-1946) derdixistin û bi zimanê kurdî lêgerînên

zimannasî, civaknasî, dîrokî û edebî belav dikirin. Dostaniyênu ku di wan salan de dest pê kirin ewê tu car qels nebin. Thomas Bois tevî Mîr Kamûran Bedirxan li ser wergerandina Methelokên Hezretî Silêman (1947-1949), Încîla Yohannes (1951) û bo Lûqa (1953) ji bo civata kitêba Pîroz, bixebite.

Lêgerîna yekemîn a wî di Roja Nû (Beyrût, no. 53, 13 tebax 1945) de derdikeve û ew li ser hozanê mezin Cegerxwîn e. Dîsa di wê kovarê de bendên wî *Le Djebel Sindjar au début du XIXe siècle* (Cebel Sincar di destpêka sedsala XIX de, no. 56, 10 ilon 1945) û *La Citadelle des Khurs* (Kela Xuran, no. 60, 15-10-1945) belav dibin.

*L'Ame des Kurdes à la lumière de leur folklore* (Giyana Kurdan di ber roniya folklora wan de) pêşiyê di hejmarén 5 û 6 ên kovara CAHIERS DE L'EST (Beyrût, 1945) de derketin, dûre, ew di 1946 de, wekî kitêbok çap bû. Dîsa wê salê di kovara CAHIERS DE L'EST de, lêgerîna wî *Les Yézidis et leur culte des morts*, (Êzidî û mirîhebînî) belav dibe.

Di 1947 de, ew bi leqebê Lucien Rambout kitêbeke bingehî li ser pirsa kurdî *Les Kurdes et le Droit*, (Kurd û Hiqûq ; Paris, éditions du Cerf) derdixe û vê pirsê li ber ramana tevane ya awrûpayî radixe.

Di tebaxa 1950 de, Thomas Bois cardin tayînî Misyona Mûsilî dibe, îcar wekî serek. Lê tenduristiya wî di ber xwer nade û ew mecbûr dimîne vegere Beyrûtê. Ew xwe dide lêgerînên xwe yên zanistî û dibe yek ji girîngtirîn kurdîzanên heyama xwe. Di kovara AL-MACHRIQ a Beyrûtê de xebatên wî yên han neşir dibin : *Coup d'œil sur la littérature kurde* (Nêrînek li edebiyata kurdî, no. XLIX, 1955, rûpel 201-239) ; *Les Kurdes : histoire, sociologie, littérature, folklore* (Kurd : dîrok, civaknasî, edebiyat, folklor, no. LIII, 1959, rûpel 266-299) ; *Les Yézidis, essai historique et sociologique sur leur origine religieuse* (Êzidî, cêribandineke dîrokî û civaknasînî li ser rehêwan ên dînî, no. LV, 1961, rûpel 109-128-190-242) ; *La vie sociale des kurdes* (Jiyaña Civakî ya Kurdan, no LVI, 1962 rûpel 599-661) ; *Bulletin raisonné de philologie kurde* (Bultena hişwerî ya filolojiya kurdî, no. LVIII, 1964, rûpel 527-570) ; *Comment écrire le kurde ?* (Çawa kurdî binivîsin ?, no. LIX, 1965, rûpel 369-378+10 wêne) ; *Monastères Chrétiens et Temples Yézidis dans le Kurdistan Irakien* (Monastîrên Mesîhî û mabedên êzidî li Kurdistana Iraqê, no. LXI, 1967, rûpel 67-101).

Di eyînî wextê de li Qudsê, di kovara PROCHE ORIENT CHRETIEN (No. XI, 1961) de lêgerînuka wî ya girîng *La religion des Kurdes* (Dînê Kurdan) derdikeve. Heya dawiya jiyana xwe, ew bi pergal di kovara BIBLIOTHECA ORIENTALIS (Leiden, Hollanda) de qala hemû kitêb û lêgerînên li ser Kurdan nivîsî dike, wan dijmîre û dide nasîn : *Remarques sur la nomenclature grammaticale kurde* (Dîtin li ser navnîşeyîya rîzimana kurdî, XVII, 1960, no. 314, rûpel 152-160) ; *Etudes récentes de philologie kurde* (Lêgerînên teze ên filolojiya kurdî, XIX, 1962, no. 1/2, rûpel 11-171) ; *De la langue à l'âme du*

*peuple kurde* (Ji ziman ta giyana gelê kurd, XX, 1963, no. 1 / 2, rûpel 6-9) ; *La République de Mahabad* (Komara Mahabadê, XXI, 1964, no. 5 / 6, rûpel 298-299) hwd...

Tevî dostên xwe Pierre Rondot û Roger Lescot ew ji 1963 ta 1970 di kovara L'AFRIQUE ET L'ASIE (Paris) de li ser *Chronique de Sociologie Kurde* (Bûyernameya Civaknasîya kurdî) dinivîsîne û wisa jî hevkariya F.M. Pareja dike ji bo xebata wî ya girîng *Islamologie*, Beyrût, 1957-1963, 1148 r. *Mahabad, une éphémère république kurde indépendante* (Mahabad, komareke kurdî ya serbixwe ya jînekurt) ku di kovara ORIENT, Paris, 1964, no. 29, rûpel 173-201 de derketiye, belgeyeke bingehî ye ji bo hemû kesen ku xwe bi ser dîroka kurdan de xwar dikin.

Thomas Bois, di 1965 de senteza lêgerînên xwe yên berê çêdike û dixe kitêbekê : *Connaissance des Kurdes* (Nasîna Kurdan, Beyrût, 1965, 160 r.). Ev kitêb salek bi şûn de bi zimanê ingilîzî di bin navê *The Kurds* de derdikeye. Di vê xebatê de, zanayê mezin li ser gelek aliyêne pirsa kurdî dimîne : berî hemiyan pirsa Kurdistanê, welatê Kurdan ê di nav Tirkîye, Iran, Iraq û Sûriyê de perçekirî ; dûre pirsa rehêne gelê kurd ; dawiyê pirsîyarên civaka kurdî ku Thomas Bois ji nêzîk ve dinasî ji ber ku ew cil salêne jiyana xwe li Rohelata Navîn, heşt salêne wî li Kurdistanê bi xwe borandiye. Tu kurdîzanê fransiz î din qasî wî di nav kurdan de nejîye.

Di 1965 de, ew tê digihê ku wezîfa wî ya li Rohelat qediyaye û ku xebateke din li hêviya wî ye li Ewrûpayê. Ew bi xemgînî biryara ji Rohelata çendin hizkirî dide. Tê Parîsê û li wir li Enstîtuya Neteweyî ya ziman û Medeniyetên Rohelatî de ders dide. Dersên wî bal dikêşin, tên hizkirin.

Tevî nexweşîna xwe, Thomas Bois xebatêne xwe yên zanistî didomîne. Ew di 1974 de di l'ENCYCLOPEDIE UNIVERSALIS (mezintirîn ansîklopediya bi zimanê fransizi) bendên li Ser kurd û Kurdistan dinivîsîne (Paris, 1974, rûpel 718-722). Weşankarêne l'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM (Ansîklopediya Islamê) jê dixwazin ku ew benda navdar a Vladimir Minorsky, bavê kurdnasiya nûjen, li ser Kurd û Kurdistan, ku di 1926 de çap bûye, temam û teze bike. Benda nû ya Thomas Bois, sentezeke dîrokî û civaknasî ya girîng e û ancax piştî mirina wî di çapa nû ya l'ENCYCLOPEDIE DE L'ISLAM de derket (cilt V, Paris, 1981, rûpel 441-489).

Piştî jiyaneke tejî kar û xebat, ev mirovê bawermend û nefspicûk di şeva 4-5 ilon 1975, di nexweşxaneyeke Parîsê de ji sekteya dil wefat kir. Mîsala xebata bi sebat û evîna gelê kurd, Thomas Bois eserekî dewlemend û bikêrhatî hişt.

# alîkari ji bo ferhenga kurdî - fransizi

Enstitu ferhengeke kurdî - fransizî çêdike. Ev xebat karên ku Kamuran A. Bedirxan di sî salên dawînên jiyana xwe de pêk anî bû didomîne û temam dike. Ta niha qasî 55 000 gotin hatine berhev kirin û wergerandina fransizîya gotinên ku bi tîpên A, B, C dest pê dikin qediyaye, tîpa D jî di ber qedandinê de ye.

Ev ferheng ewê mezintirin û firehtirin ferhenga zimanê kurdî be û dixwaze, qet ne be, piraniya mezina dewlemendiyê zimanê me diyar bike. Piştî çapa wê ya fransizî, ewê çapêni bi zimanên din (tirkî, almanî, ingilizî, erekî, farisî) bén amade kirin.

Ziman malê hemû Kurdan e. Weki derya ye, kûr û fireh e. Ci şivan, ci gavan, ci koçer, ci cotkar, ci dengbêj, ci nivîskar, her welatikî me wekî masiyan di nav vê deryayê de mezin bûye û jê parekê stendiye. Enstitu di xebata xwe de hewcê zanîn û alikariya hemû welatiyêne me yên bixîret e. Em dixwazin ku kevirê her Kurdekkî dilsoz di vê avahiya giştî de hebe. Kerem kin, navêni giya û daran, ên hêşînatî û meywan, ên rawir û teyran, ên haleten kar an gotinên ku hun bawer dikin nadir û kêmđitî ne ji me re bişînin. Ku dikaribin her gotinekê piçek izah kin an wergerandina wê bi zimanê ku hun pê çêtir dizanin li kéléka wê deynin baştır dibe. Heçî navê giya û daran, heta dikaribin diyar bikin bejna wan çend bilind e, li ku hêşîn dibin (di erden avî an bejî de, li devê çema an li çolan), berên wan çawan in, ci reng in, çiqas gir in, têñ xwarin an na, tama wan çawa ye ? Ku dikaribin pelek ji darê an jî berê wê, an wêne (resm) yê giya an teyr bişînin hê jî çêtir dibe. Tikaya dawîn : ji bîr me kin di nameya xwe de bêjin hun ji kîjan bajar an navçeya Kurdistanê ne.

Ji niha ve, spasên germîn ji bo alikariya we.

\* \* \* \*

*Nameyan li ser navnîsana jérîn bişînin : Ferhenga Kurdî, Institut Kurde de Paris, 106, rue La Fayette, 75010 PARIS, FRANCE.*

## BELGE

# BÎRANÎNÊN İHSAN NÛRÎ PAŞA (III)

*Piştî bi kurtî qalkirina serxwerabûnên kurdî ji sala 1514 ta Agrî, nivîskarê bîranînan çend gotin li ser dîroka çiyayê Agrî gotibû û paşê herdu serokên serhilanîna Agrî, Bro Heskî Tellî û İhsan Nûrî nasandibû. Dî salên 1926-27 de mîrxas û welatparêzên kurd ên sereke yek li dû yekî xwe digihandin Agrî. Dewleta tirk ji bo pelaştina tevgera kurdî qanûneke «te’cîl» derdixe, bi serokên kurdan re dikeve gotûbêjê, da ku ew ji dewletê re îtaet bikin. Kurd van pêşneyaran qebûl nakin û piştî hin bûyerên cîgehî li gundê Kani Korkê şerekî mezin diqewime di navbera hêzên rizgarîxwaz ên kurdî û leşkerên tirk. Leşkerên tirk dişkêن (binêre Hêvî, hejmarê 2 û 3).*

Komandarê Kurda beyaniyek belav kir, tê de ji bîra rayê têkrayı cihanê xwast ku li vê babetê qezavet kin. Di vê beyaniyê de nivîsibû : Kurd eskerên rûmî ku bi qesda kuştinê hatibûn, pey dîlgirtinê berdidin, azad dikin, lêbelê Türk mindalan (zarokan) ji bi tehrekî facie dikujin. Ji Tirkan re dewleta kevn û medenî, ji Kurdan re ji wehşî dibêjin. Ji herduya kîjanî wehşî kîjanî medenîtir in ?

Zivistan hat, berf melafeyên spî û sarên xwe bi ser Agrî kişand ; çûyin, lêdan û girtin kêm bûn. Agriyîyan duwanzde telefon bi dest xistibûn, lê sîmên (têlên) wan nebû. Şevekî qomandarê kurd desteyek siwar hilda çû ıstgeha Beyazîdê ku ordîgeha eskerên romî bû, ji pêsiya mala reîsê riya hesin, qasî ku pêwist bû sîm anî. Eskerek, çira bi dest, hate derva, dît ku sîm bar dikin, ji tirsa dengê xwe nekir, zû çû hundir. Rojtira din, di nav çend gundên Agrî de peywendiyêñ telefonê pêk hatin. Eskerên li nav Agrî rêkûpêk bû. Uniformên taybetî ji bona efrad û zabit helbijartin. Efrad li ruyê kumê xwe şiklê Agrîya mezin û piçûk ku ji berînî hatibû çê kirin lê didan, zabitan jî di şûna Agrîyê armê Xoybûnê zeliqandibûn û elametên derecên wan jî li rûyê şanê wan bû. Armê Xoybûnê xencerek rast li nav sunbilek genim li aliye û li aliye din qelemeke dûvîn ê desteyîn bûn ; her sê bi hev ve dizeliqîn û hetavek li ser qevza xencerê hemîyan di bin tîrêjîn xwe digit

Wê zivistanê qomandarê tirk ji bona kuştina Ihsan Nûrî bi telaş ket, û vî karî bi Şêx Abdulqadir ku hêjî di itaeta wan de bû, spart. Şêx ji bona vî karî Davo, kurê mezinê Bro Heskî Paşê zavayê xwe helbijart ; bêgûman, ewan dizî ve kar dikirin.

Tirk di babeta bîr û rayên azadixwazî û eşqa serbixoyî ya Kurdan xafil bûn. Bi wan wa bû ku divê yekî bi perekî zehf tima' bikin, ku ew bi netewê xwe re xiyanet bike. Lébelê ew nizanîbûn ku temamî gotübêj\* û nexše\* bi zanîn û destûra Ihsan Nûrî bûn ; her çawa bû ev nexše maweyek\* wan xapand.

Bihar hat. Çiyayê Agrî bi çîmenênen kesk û gulên rengareng xemîlî. Ev çar bihar bûn ku ev çiyayê mejûyî jêr deselata\* Tirkîyê derketibû, bûbû penagaha aşiqêن dilşewat ên azadîyê, neweyên mîrxas ên xwe, singê wê bûbû navenda\* lawanên nebez û canbezar û azadixwaz ên neteweyê kurd, her sê rengên serbixoyî\* kurd li ser qûçen wê daçikandî û bi dil û can dihatin parastin. Ev çiya bûbû kela kurdîtiyê. Ev çiya ji agirparenanê şerkarênen xwe re her wekî kevirêن agir perên xwe li qirnên zor kevn bi her aliyê Kurdistanâ Tirkîyê diperand. Pêlîseyêن bîr û rayên azadiyê van hestêن hakimiyeta bêgane dişewitand, agir pê dixist, dişewitand, dikuşt, wînda dikir. Agirê ku agir ditemirîne. Tirka li pey xwe dikşand newal û çiyan, di dawiyê de di nav axa xwe de dişewitand.

Qomandarê kurd, ji hîc cî û navçeyê hêviya yarmetî û pêşkêş nebû, silah nedidît erdêن dinê bigire, cepheyek freh ê şer veke. Dizanibû ku li pêşîya top û froke û tank ên ordiyêن meşqdîtî yên tirk bi tifing, ew jî gerek e ji destêن neyar fişengên win bigirin, domanîn hêsa nîne. Ew baş dizanibû ku çiyayê Agrî bi dest ve bigire, biparêze, bi hoy têkoşerêن kurd û bi saya xwe bextkirina niştîmanî ya Kurdan hêzên dewleta tirk li navçeyê Kurdistanê berebere biwestîne, ji beyn bibe û bi vê taktîkê nalîna hejaran û hest û îradeya qayîm a neteweyê kurd ji bona bidestxistina azadiya netewayetî û mirovayetî bi guhê alemiya cihanî de, nifûza siyasî û aboriya Tirkan bi lerze xe. Ev bizotina taktîk ji layê navenda Xoybûn pesend kiribûn.

Dewleta Tirkîyê ev car jî weke caranêن din rêça pêş girtibû. Di şerê Balkan ê 1912 de, guh neda doza maf û azadiyêneteweya Arnavût, erdê mezin ê Rûmeliyê ji çengêن wî der çû. Ew bi xişm bi ser Ereban ve çû û muamela bê rehm a Cemal Paşa, wezîrê deryayê, dardakirina mezinênen Ereb di bajarê Şamê de di hoyâ raperîna\* Şerîf Huseyn li Mekkê, temamê Erebistanê ji

---

gotübêj : mizakere

nexše : pîlan

maweyek : demek, midetek

deselat : otorîe

navend : merkez

sebixoyî : serxwebûn, istiqlal

raperîn : serxwerabûn, isyan

destên wan çû. Ewan ders negirtine. Li ber efkar û xeyalatê pantûranîzma xwe, hazır nînin seddekekê Aryarêgez li ser riya armancêن xwe bibînin, ku Kurdistan jî, ku nifûsê wê 2/5 nifûsê temamê Tirkîyê ye, jê biqete !

Min ji bona pêkanîna teşkîlata Xoybûn li nav Kurdistanê û sazkirina helsanên giştî pêwist dît ku desteyêن canbezaran bi nav Kurdistan bişînin, him li Tirkan eziyet bikin him jî teşkîlat çêkin. Hejmara van desteyan kêm bû. Bi cîgahêن dûr diçûn. Li navçeyêن zor dûr ev kar dispartin stuyê hêzêن navçe. Bi vî tehrî, hakimiyeta tirk ne tenê li nêzikayetya Agrî, belkû di tevayıya Kurdistanê de di nav agirê azadiyê de sûta. Navenda ev agirperan Çiyayê Agrî bû û hejmara Agriyîyan zehf nebû. Zeviyêن ku bikarin biçinin zor kêm bûn, ev jî li jêr agirê Tirkan bûn, xincavî kesî nebû vî karî bike. Ën ku destê wan tifeng digirt, li pêşıya neyar bûn. Ewan li pêşıya ordiya mezin a dewleta Komara Tirkîyê singêن xwe kiribûn mertalê derd û belayêن Kurdistanê û erkêن (wezîfêن) giran û dijwar ji bo azadiya Kurdan girtibûn ser stuyêن xwe. Di vê rêuye de zor kend û kosb û têgeriyan li ber wan hebûn. Beşê wan hemîşe bi zehmet û metirsiyêن mezin, lêbelê giyanê wan li bin siya alaya netewayetiya xwe pir bi zewq û xoşî bû. Jîyan li nav Agrî zor asayî û tefrih bû, hesp bezandin û nîşan avêtin bû. Belê ne tenê tefrih, belkû li şer jî zehf kêm mîtralyoz agir dikirin û dixebeitandin. Ji vê bonê, jî kêmasiya fişeng zehf tengîne bûn. Tiştê ku li Agrî nikaribû bi rê keve tirs û yeîs û naumîdî bû.

Paş şerê Kanî Kork, hêzê dil û radeyê bîr û bawerî ya rûniştevanêن Agrî zêdetir bû. Baweriya wan ew qas bû ku digotin qolordiyek tirk jî newêre were ser me. Rastî jî wisa bû. Zabitek tirk bi navê Zühdî Güven, paş gihiştina alaya xwe, di babeta şerên eskerên tirk û kurd de dînivîse : «Li şerek da ku li ba Osmanê Kilim -(Altun diş) li nêzîkî xêlî Şemkan, li navçeya Tuzlice (berê navê wê Qulq bû li navbera Igdir-Qaxizman) qewimî esker paşekêş kir. Roja din ez tevî tabûrek peya li Meydana şer geriyam, laşenê çar esker peyda kirim, bi merasîmê eskeran defn kirim. Rojtira din jî, ji bo geryana çiya û newalan li jorê konêن reş ên xêla Şemkan şeş Kurdan li nav newalan dîtim min ew girtin û zivirîm navenda xwe..»

Ewanan bê şik pez çêran bûn ku belasebeb girtibûn û biribûn. Dewlet qerar dida ku hemleyek eskerî li ser xêla Şekan ku li jêrî serokayetiya Têmir Axa bû bikin. Ji vê bûnê, qomandarê navçê general Subhî çend ferman dida. Paş hêrîşkirin, ew şevê li gundê Kapluçe derbaz dikin. Di vê şevê de karesatek diqewimî ku Zühdî Güven wisa dînivîse : «Em razayî bûn, bi dengê tifing şiyar bûn, me bihîst ku nobedar dibêje : "Ji vê derê revî, ji vê derê derbas bû !" Em hemû bi cil û berg raza bûn, tifinga me li tenişt, tabance li pişt bû. Nişkeva li derva beziyan, me dît "Amo" nav şeqira ku bi xwe re bi şiklê beran xistibû nav gund, ketibû bin loda giya, derxistin. Amo du gule xwaribû, yek ji hestiyêن çenga wî xurd kiribû, ê din bi millê destê wî ku tifing ragirtibû ketibû. Herçiqas ku birîndar bû, nikaribû bi kar bike, ew bi wî destê birîndarê xwe

tifinga xwe li hemêz xwe pêçand, lê esker rê nedida, wî anîn kêleka çadira xwe. Jê pirsîn : Ji bo ci ser û qilafeta wekî beran ketiye û hatiye nav gund ku pir esker lê ye. Birîndar welamê (bersîvê) da, wisa got : «Ji bona girtina tola İbrahîm Feto hatim, Min dixwast di nav çadira we zabita kevim, we bikujim ! Bedbextane beriya ku bikevim çadira we, qereqola we ez dîtim, birîndar kirim..»

Amo ji xêla Şemkan, ji desteya Keremê Qaso bû. Ji ber ku gelek xwîn ji birînên wî rijiyabû, li wê derê mir. Lê di vê babetê de Kurd ewê çawa be tola xwe bigirin ! Diyar e ev birîndar ji rûyê çûyinî xwîna zehf nemiriye, ewî li nav çadira xwe kuştine. Ev ayîneyek e Tirka li gel birîndarê kurd ci revtarî dikan. Wey li halê dîlketiya ! Ku eva jî emê li jêr bibînîn.

Rojek din çend kesek ku ji xêla Şemkan girtibûn, biribûn ser riya Qerekosê. Di vê babetê de jî dîsa zabitê tirk Zuhdî Güven dînivîse : «Li nêzîkî Balıkligöl, em ketine agirê desteyeke kurd. Panzde Kurd, ên ku dîl bûn, me dibir. Destêwan girêdayî bûn. Wekî kitleyek di nav du aliyêne agirê tifingê ma bûn. Di ev pêkî helperane de ev destbestan hatin kuştin..»

Rastî ev e ku ew panzde girtî birin nav çiya, gullebaran kirin, kuştin. Radeya pîsîti ya vî karî baş dizanibûn, loma bi awaye jorîn di rojnama de belav kirine.

Şêx Abdulqadir li gel wan ên ku jê re îtaet dikirin, ber bi çiyayê Ala Dax bi rê ketin. Agriyîyan nedixwastin ku şêxê tabiê Dewletê bê û li quncekî Agrîyê de rûne. Qomandarê kurd pîlanek danî. Beşê mezin ê xêla Hesesorî û Qotan ku li jêr fermana Dewleta Tirkîyê bûn û li gel Agriyîyan jî nava wan çak bû, li nêzîkî Qizil Dize riya Şêx Abdulqadir girtin. Beriya wî, serokên ev du xêlan li gel berpisiyarê hikûmata tirk li Bayzîdê axaftibûn. Dewlet ji vî karî re razî bûbû, ji ber ku ewan gotibûn ku Şêx Abdulqadir li gel Agriyîyan yek e û bi fermana wan û mebesteke taybetî ber bi Çiyayê Ala Dax diçe. Li katek de rastî wisa nebû. Di babeta suîesta Ihsan Nûrî ewî li gel Dewlet bi dil hevkârî dikir. Tenê di babetê Ihsan Nûrî de, li yek hedîseyek xwastine kuştina wî ; ev hedîse awa bû : Şêx Abdulqadir ku xwe bi dewlet spart, Elo Beşo ji nav xêla Şakan teslim Dewlet nebû. Mala wî jî li kêleka mala Şêx bû. Çendî pêş Şêx Abdulqadir tifingciyên xwe şand ser zomayê Elî Beşo û dorê lê girtin. Şer çêbû. Desteyek ji hêzên Agrî li hawara Elo Beşo çûn. Merivên Şêx pare kişiyan. Pey mehek jî, katê Elo Beşo çûbû nav Tirkîyê, malên wan bê mîr mabûn û Şêx dîsa merivên xwe şand, bê şer malên wan talan kir. Wê rojê Taceddin, ji xêla Zirkan, mîvanê wan bû. Ewî jî li gel çend merivên şivan û xulam dîl girtibûn, biribûn. Ji dûr ve Şêx wan dibîne, dibêje : ew kî ye ? Çun kincê Taceddin Beg mîna kincê Ihsan Nûrî bûye, dibêjin Ihsan Nûrî ye. Şêx dixeyide, dibêje : «Ez ci bikim ? Ne dikarim bikujim û ne dikarim, bi Dewlet tehwîl bidim Kurda bixim neyarê xwe !»

Mebesta Tirkîye ev bû ku li nav eşâîrên kurdî neyartî pêk bîne. Ev neyartî dibe duberek li nav pareke xêlanî du aliyênu ku li Agrî di bin ala azadiya kurd de dijijan. Bi vê hêviyê ji xwastina Qotan û Hesesorî re muwafaqiyet kiribû, agahiya wê nebû, nikaribû bizane. Wan ên ku ji bo stendina mafênetewayî giyana xwe bi hîc dudilî û bi şadî fedâ dikirin, hîc hêzek nikare di nav wan de duberî çêke. Bi taybetî mîna hedîsa Şêx Abdulqadir ! Paş şerekî kêm, xêla Şêx riya xwe vekir, xwe gihand Çiyayê Ala Dax. Waliyê Bayzîdê ji tîrsa Kurdan, ciyê xwe li gel qeymeqamê Qere Kosê guherî bû. Li Qere Kosê rûdinişt, ji xwe re dîsa «Bayazit Valisi» digot. Xwast ku Şêx Abdulqadir here cem wî.

Şêx Abdulqadir xwast cem xwe. Şêx ji ber ku êdî bi dewlet baweriya wî nemabû ew dizanibû heke dewlet nedixwast agahdar nebû. Hesesor û Qotan ji dewlet ditirsiyan, nikaribûn riya wî bibirin. Kesênetewexwazân derûdorê wî jî ji wî re digotin : «meçe, dixwazin te bigirin !». Li ser vê yekê, ew bi xwe neçû, brayê xwe, ku zavayê wî jî bû, şêx Hesen şand. Li aliyê din Qotan û Hesesoran bi walî gotin : «Te dît bi xwe nehat, ji niha ve nafermanî kir !» Walî bi xiyaneta Şêx bawer kir ku ta ew ro dostê dewlet bû, ji dewlet qetiya bû. Bi rastî ev hemû nexşeyê\* qomandarê kurd bû. Şêx bi dirustî fermanberdarê dewlet bû, ji bo kuştina min bi dewlet re hevkarî dikir. Mebesta\* Romî ev bû ku neyartî têxe nav êlên kurdî, çun beşekî Hesesorî û beşekî Şakî li nav Agrî bûn, ji bona azadiya Kurdan xebat dikirin. Dewlet dixwast di nav wan de neyartî çêke, hêzên Agrî bibin du ber, dewlet jê kelk bigire. Bi vê hêviyê bû ku dabûn ser vê reyê û dewlet nikaribû bizane ku wan ên ku ji bo girtina mafênetewayetî yên xwe giyana xwe bi şadî fedâ dikirin. hîc hêzek nikare di nav wan de neyartî çêke.

Agriyîyan ber bi serê çiya hilkişiyabûn, çûbûn zozanan. Serokayetiya eskerî ya tirk bolikek hêzê peya û erebeyek top li Burnê Sor (Pozê sor) li pêşîya pira kevirê şêxlû ku li ruyê çesnê sînorê Agrî-Tirkîye bû, cî bi cî kir, bolikek hêzî peya ji li Burnêreş li pêşîya rûniştgeha Ihsan Nûrî û Bro Heskî li gundê Kurdava danî. Hêzên tirk meqerên xwe qayim kirin, ji vê noqtê ta sînorê Iran bi hêztir kirin. Topekê li girê Burnê Sor de danî bûn, dorûbera Çiftlik -li nav Kurdava-Şêxlû -li bin agirê xwe digirt. Ev top her ew topa mezin bû ku Ihsan Nûrî wê çaxa ku di sala 1922 de li navçeya Bayzîdê de qomandarê sînorê Tirk û Iran bû, danîbûn bin emrê wî ku di şer de jê kelk bigire, lê çaxa paşêkeşê kir di cî de hiştibû ji ber ku wesaîtê birina wî nebû.

Qomandarê tirk bi van karan pê wa bû Agriyê dixe gemaro\*, ku îndî nikarin ji Agriyê ber bi derve hate çûn bikin, lê ew nikaribû pêşîya wan bigire ! Di wê dema ku qomandarîtiya tirk bi vî awayî xwe bihêztir dikir, hêzên niştiman perweran jî bi çesnê din zêdetir dibûn. Emerê Besê, Serokê Xêla Kelturî ku li bin tarê bakûra Agrî li navçeya Igdirê rûdiniştin û dîsa li vî aliyê çiya de Eloyê Bekir û Abdullah Xelef, Serokê Qizilbaşoxlî, ku yek ji azadîxwaztirîn û

mêrxastırîn xortên kurd bû û çend sal berê tevî beşeke êla xwe ji Iran hatibûn nav Kurdên Tirkîye û li Rohelata Agrî de rûniştin, Enwerê Mizraq ji nav mala serokayetiya Xêla Zîlan hatin tevî teşkîlata Agrî bûn. Bi ev çeşnê Malbenda bakûra Agrî jî bi hêzên Agrî yek bûn. Hinekî Kurdên aliyê bakûra çiya hê jî tabîyeta Tirkîye bernedabûn. Dîsa taveraja ala serbixoyî kurd tevayî çiyan bi tîrêjên xwe ronak kiribûn. Hîç memûrekî dewlet nikaribû serî li çiya xwe.

## **ARDAŞIR MÛRADYAN**

Ev havîna sala pêncîn -1929- a şoreş bû. Em derketibûn zozanan. Kurdek perîskeyek diyarî hat layê Ardaşir Mûradyan, ku li cem me nuwînerê Fileyên Taşnaq bû. Diyarî tevî reşbelekek da bi Ardaşir û got : «Kurapê te ji bona dîtina te ji Tiflis hatiye Erîvanê, vê diyariyê ji bona te şandiye û ev reşbelekê jî nivîsî da.» Di nav reşbelekê de nivîsibû : «Minbihist ku tu li Çiyayê Agrî de yî, ji bona dîtina te ruxset girtin, hatim Erîvanê ta te bibînim. Rojek were Aralîqê kenarê Arasê, ez jî bêm, em hevûdu bibînin !» Ji Aralîqê re Tirk digotin erdê Tirkîye ye li qerexê Arasê, lê ew li bin çavdêriya Agrîyîyan bû. Çemê Arasê jî sînorê Tirk û Rûs bû !..

Ardaşir israr dikir here wî bibîne ; çendin sal bûn ew hev nedîtibûn. Qomandarê kurd nedixwast ew tenê here, panzde siwar li jêr fermna Emerê Besê Keltûrî pê re şand û bi wan got : «Nabe ji çemê Aras derbas bin, ew berê navçeya Rûsan !» Navçeya Aralîq ku li Bakûra rohelata Agrî ye şenzar e, bê dar û bê hêşînatî ye, zor germeşî niye ku li bin de rahet kin, aliyê rûs bipêçivanewî pir dar û hêşînatî ye. Zabitê reisê postê şûrewî (sovyetî) deng dike dibêje : «Kurmamê te li Erîvan e, telefon dikim tê.» Ardaşir zabit naskir ku ku file ye, bi zimanê ermenî xeber dide. Zabit walamê (bersîvê) dide, dibêje : «Ez bi zimanê file yî nizanîm» Ardeşir dibêje : «Ez te nasdikim.. tu file yî.» Zabit haşa dike û êdî bi zimanê rûsî qise dikan. Zabitê rûs dibêje : «Çira li wê derê li bin tavê, di vê germê de disekeinî ? Were aliyê me, di bin siyê de istirahet bike ta kurmamê te were !» Rastî jî aliyê me havînan zor germ dibe. Ardaşir bi Emerê Besê dibêje : «Rast gotiye ! Were emê çem derbas bin, herin cem wî.» Emerê Besê dibêje : «Qomandar meger nego derbaşî aliyê din mebin.» Ardaşir dibêje : Qomandar nizanibû em ev qas li vir radiwestin. Heke hun neyên, ez bi xwe diçim.» Emerê Besê dibîne ku ew diçe, ji bona ku wî tenê nehêle, ew jî çar siwar hildide, li pey wî diçe, çem derbas dibin diçin postê rûsî. Siwarên din li wêderê dimînin.

Zabitê rûs dibêje : «navenda me zor nêzîk e, kurmamê te tê wê derê, kereme kin biçin wê derê, li wê baştır dikarin ji bo we xizmet bikin.» Diçin, çaxê hindurê xanî dibin Rûsan wanân bi sarî digirin, hesp û tivingên wan jî dest distînin. Emerê Besê bi Ardaşir dibêje : «Ez ji wan ditirsim ; niyeta wan jî bo me pak nîne.» Ardaşir dibêje : «Rast e min jî şek bir.» Saetek disekeinin ji

kurmam xeber nayê. Li ber ev e ku Emerê Besê, ku sar û germa jiyanê dîtibû, peywendiya wa bi jiyan re zehf bû, bi Ardaşîr dibêje : «Ez dixwazim her çawa be xwe xelas kim.» Ardaşîr dibêje : «Ez nikarim, heke tu dikarî here !»

## **REVA EMERÊ BESÊ**

Emerê Besê diçe cem serokê navendê, dibêje : «Siwarêñ min li wî alî li ber tereşka tavê mane, dixwazim herim wanen jî bînim berê Rûsan.» Rûs pê xweş dibin, dibêjin : «Zor çak e !» Hespek tînin ku siwar be, mîze dike hespê wî nîne. Emerê Besê dibêje : «Ez gerek e bi hesp û tifinga xwe biçim. Hesp û tifinga min nebe, siwarêñ din xeyal dîkin hin hesp û tifingêñ me ji destêñ me girtine û êdî nayên.» Ev qise pesend dîkin û tifinga wî tînin didin wî. Siwar dibe, tê cem post. Zabitê postê rûs dibêje : «Gazî ke, bixwaze bila siwar bêñ !» Emerê Besê dibêje : «Ewanan Kurd in, wekî we rîkûpêk eskerî nizanîn. Heke ez bi xwe neçim layê wan, wan serwext nekim, nayên. Pêwîst e ez bi xwe herim, wan bînim.» Zabit razî dibe. Emerê Besê ji çemê Aras derbas dibe, diçe nav siwarêñ xwe, ji wan re dibêje : «Siwar bin !». Carekê bi hevra ber bi Agrî çarnal hespêñ xwe dibeziñ. Bi ev çeşne xwe ji destê Rûsan derdixe. Rûs Ardaşîr û çar siwarêñ kurd dest bi ser dîbin Erivanê, kincêñ wan diguhêrin, paşê dibine Tiflisê davêjin bendîxanê.

Min kaxezek ji Rûsan re nivîsî û bi wasita postê sînorê rûs û ji wan Ardaşîr û çar siwarêñ kurd xwast. Çend rojêñ din her çar siwarêñ kurd tînin Erivanê, hesp û tifing û kincêñ wan didin wan û dişînin Agrî. Qomandarê kurd kaxezekî din nivîsî û car din Ardaşîr xwast, kaxez da Seyîd Resûl, bi çend siwaran ve şand. Siwar çaxê nêzikî çemê Aras dîbin, ber jêrî guleyêñ postê Rûsan dîbin, Seyîd Resûl brîndar dibe, dizvire, êdî nikare kaxez bide. Çend roj paşê, bi toleyê ev karê Rûsan, min desteyek ji Agrî şand bajarek Ermenîstanê' ku li bakûra rojavaya İgdir û li qerexê çemê Aras de ye, bi şev girt bin agirê mîtralyozan. Min paşê bîhist ku Ardaşîr ber bi Sîbîryayê dûr xistibûn.

## **HUSEYN, PAŞA Û HACÎ MÜSA BEG**

Li nîvê havîna wê salê -1929- de, Memo û Nadir, du kurêñ nebez ên Huseyn Paşa, mezinê Xêla Heyderî tevî du bra û braziyek xwe ji Sûriye hatine ketine nav erdê Kurdistana Tirkîyê, paş derbasbûna navçeyêñ Midyat, Bîşêrî û Gerzan têperîne der û pişta Mûşê. Sê kesêñ wan li nav şikeftek bi destê Tirkan dîl ketin û hatin kuştin. Herduyañ mayîn, Memo û Nadir, xwe gihadîn Agrî, hatin cem min.

Kor Huseyn Paşa reîsê mezinê xêla Heyderî, bi nifûztirîn serokê navçeya dor û pişta Wan û Bayzîdê bû. Hevalê wî Hacî Mûsa Beg serokê jîr û bi nifûzê

malbendê Mûşê bû. Ev herdu reîs li ser û bendê pêkanîna Komîta Serbixoya (Istiqqlala) Kurdistan, li bin seroktiya Miralay Xalid Begê Cibranî li gel wan heypeyman bûbûn. Çaxê ez, bi zanîna vê Komîtê, ji bona serbixoyî kurd li navçeya Beytuşşebab rabûm û şkest xwarim, ji hevalên min milazimê ewel Alî Riza Beg, brayê Yûsif Ziya Beg ku li Meclîsa ewel a Komara Tirkîyê nuwînerê Bedlîsê bû û uzvê Komîtê bû, Komîte hate girtin. Brayê wî û zavayê wî Faîq, Beg jî girtin. Serokê Komîtê Xalid Begê Cibranî li nav Erzerom - Qerekose - Patnos - Ercîş - Adilcewazê birin Bedlîsê. (Riya kin a Erzerom - Bedlîs - di aliyê Xinis û Mûşê diçû û ew rê ji nav xêla Cibranî derbas dibû, ji bona wî di wê riyê de nebirin, tırsıyan ku xêla Cibranî wî ji destê wan bigire). Li Bedlîsê wî avêtin bendîxanê. Çaxê digihîjin Ercîşê (ciyê rûniştina Kor Huseyn Paşa) Xalid Beg hêvî hebû ku Huseyn Paşa wî ji destê eskeran ve bigire, çun li navenda xêla Heyderî de bûn. Heta Xalid Beg bi Huseyn Paşa wasite gihad, lê Huseyn Paşa hîç karî nekir ! Hacî Mûsa Beg girtibûn, şandibûn Bedlîsê.

Li ser û benda raperîna Şêx Seîdê Cibranî, Xalid Begê Cibranî û Hecî Mûsa Beg ligel Mulazim Alî Riza û brayê mezin ê wî Yûsif Ziya Beg, ku berê nuwînerê Meclîsa mezin a neteweyî ya Tirkîyê bû, di bendîxaneya Bedlîsê de girtibûn. Li Kor Huseyn Paşa li nav xêlata xwe azad bû. Pelîseyên agirê hilperîna xêlaten Cibranî, Zırkanî, Hesenanî bi sînorê Heyderan jî gihiş, ji Huseyn Paşa jî xwastin bi ehdê xwe wefa ke ligel şoreşê hevbarî bike û nekir ! Navbera ligel evî ku mal û dewleta wî gelek bû, girêdayê eskeranên tîrk dildadeyê li reyanên vanan bûbû bi ev bahanê ku çavrevanê welama Simko ye, îro sibê dikir. Tenanet şêx Seîd şkest. Paş ev şkanê, taqimek li şerkeranî Cibran, Zerkan, Hesenan tevî brayê şêx Seîd, şêx Mehdî û kurê şêx Seîd Alî Riza, ber bi sînorê Iran paşekêş bûn. Di vê demê de ku dixwastin ji malbenda Heyderan têperin, Huseyn Paşa maweyê heft roj rê li ser têkoşeran birî. Axir, şerkarên kurd paş şerekî zor, ji mirovên Huseyn Paşa bi hêzên Tirkan re hevkarî dike !

Iran xwast têkoşerên kurd ji çek bike, lê ew serê riya xwe vekirin, çûn cem Simko. Lêbelê Ferzende Beg û serokê êla Zirikî Kerem Beg hatibûn kuştin. Hinekî mirovên aza û niştimanperwer ên xêla Heyderî tevî pêk hilperan û teqetuq yarideyê têkoşerên kurd dabûn. Tenê evê ku vê xêlê bednav kir kuştina du kesên Hesenî, bi navên Tahir û Beşîr li gundê Kendal Beş û spartina du Heseniyyê din bi navên Hesenê Zubêr û Şemsedînê Lewend bi destê Cendirmêñ tîrk ! Ev du kes riya xwe winda kiribûn hatibûn mala Bedrî Beg. Navbera bi dizî ve bi hêza A. Boğa ragiyandibû. Hikûmat çend nefer cendirme şandibû. Wexta ku ev kes li odayekê Bedrî Beg razabûn, cendirme wan di nav nivînan de digirin, dibin nav riya Bedlîs-Xerzan. Cendirme ev qas li wan dixin ku Hesenê Zubêr dimire, Şemsedîn namire, wî dişînin şarê Izmirê, li wê derê sê sal li bendîxanê dimîne, paşê ji bendîxanê direve, bi

zehmet tê xwe digihînê tîpê Ferzende Beg Hesenî û bi canbezariya xwe li ser riya azadiya neteweyî ya xwe dewam dike. Paşê ku qaremanên Heyderan ku li riya azadiya neteweyê kurd xwîna sorê xwe rijandin, ev du karesatên pîs ji ser navê xêlata xwe şûştin.

Huseyn Paşa xwe hevbeş nekir şoreşa Kurdan ne tenê xêla Heyderan tenanet xêlên mezin ên Zîlan. Sîpkân, Celâlî, û eşîrên din ên kuçik jî tevî şoreşê nebûn. Pêvenda Huseyn Paşa bi regezê kurd û hebûna navê kurd li ser wî pêwist bû cezayê xwe bibîne, xizmetkirina bi dewleta Tirka nikaribû ewî jê dûr xe, ji ciyê xwe xelas ke, ji bona ku ew Kurd bû. Ji ber eve, paş temirandina şoreşa Şêx Seîdê Mezin, di naverasta zivistanê de, dewletê Huseyn Paşa girt tevî jin û zarên wî, di haletên zor xirab de, di berfa zivistanê de ji Kurdistanê di bin muhafeza cendirman de birin Anadola Rojava û wî ji welêt dûr xistin !..

Hacî Mûsa beg bi têgihiştî û bi zîrekî xwe paş mahkeme ji bendîxana Bedlîsê rizgar û mehkûm bi dûr xistibû. Ev du xizm û hevalên kevn di ciyê dûrxistinê, Aydin, de hev dîtin, li ber eve ku herdu jî li pêşî de bi azadî û serokî jiyabûn û sîlehşorê wan hebû, dûrxistina wan ji wan re zor giran hatibû. Di babetê revê de giliyê xwe yek kirin. Diravê zérê zer ê Huseyn Paşa gelek bû, ji bona xwe û mîrên xwe yên ku dikaribûn tifing hildin hesp û tifing bi zér kirin, jin û zarokan li du kuran spart, bi xwe tevî Hacî Mûsa Beg û çend kur û neviyên xwe şevekê ji şar derketin ber bi Sûriyê bi rê'ketin. Li Sûriyê mêvanê Haco Axa, yek ji serokên mezin ên niştimanperestên xêla Hevirkî, bûbûn. Ji navbera deng û basên di babeta Komîta Xoybûnê bi dest anîn. Dilniyazî û wefadariya xwe ya beramberê vê Komîte li ser kaxez dînivîsin û bi çeperê ji bo Komîta Navendî dişînin. Bi min xeber dan, min nivîsi wan bişînin Agrî. Ew bi riya Iraq û Iran bi rê dikevin, li nav şarê Mûsilê ingilîz pêşîya wan digrin, wan car din dizvirînin Sûriyê. Hacî Mûsa Beg nexweş dikeve, radizê, paş çend rojan diçe rehma Xwedê, hevalên riya xwe tengezar dihêle.

Ji bo bicihanîna fermana Xoybûn, çar kur û neviyek Huseyn Paşa ji nav Kurdistanâ Tirkiyê bi xwe, Huseyn Paşa û kurekî wî, Edo, û xwarzek û neviyek wî jî ji nav Kurdistanâ Iraqê ber bi Agirîyê bi rê dikevin. Ji desteya pêşîn sê kesên wan di nav şketek de bi layên hêzên dewletê ve gemaro\* dibin, tên kuştin, Memo û Nadir Beg xwe dighînin bi ciyayê Agrî.

## KUŞTINA KOR HUSEYN PAŞA

Lê Huseyn Paşa ji ber ev peymanşkêni û xiyanet û nepeyayetî ku bi helsanê kurd kiribû tevî hevrîyê xwe di şevez de li jêr gulleyên Kurdekkî ji xwe xaîntir hatin kuştin. Ev hemû mal û pere û xêl ku ji bona parastina wan tûşî\*

gemaro : mihasere

tûşî bûn : rast lê hat

xiyanet bi netewayê xwe bûbû li vê gavê, dewaya mirinê de wefa nekirinbû. Di katek de ku sed hezar zêrên zer ên Osmanî yên wî hebû ligel roleyên\* bê nivîn û bê kefen mirî, ji hezaran malên Heyderî yekî bayê serê wî nebû, wan ên ku li ba wî bûn bi agirê wî şewitîn, kesî laşen wan çal nekir. Bi vî tehrê padaşê\* xulamî û wefayî bi dewleta Tirkiyê û xiyanet bi hevregeyê xwe Kor Huseyn Paşa çû, tola neteweyê kurd hate girtin. Her çend Xoybûn ji bo karêñ xelet ên wî li wî bexşa bû, lê di mahkemeya Xwedayî de qerar pêwîst e îcra bibe ! Heçî qatilê wî, ewê daxa pîsî û xiyanetê li nav çavêñ wî hebe û bimîne.

Kor Huseyn Paşa ji Sûriyê bi rê ketibû, ji nav xêlatêñ kurd ve derbas bûbû hatibû li bakûra Iraçê mala Şêx Ehmed Barzanî, brayê mezin ê qaremanê kurd general Barzanî. Kurê Hacî Mûsa Beg Medenî û apê wî Nuh Beg jî li wê derê bûne. Paş çend roj rahetî bi rê ketine. Wê gavê Nuh Beg dibêje : «Braziyê min Medenî zor dixwaze here Agrî, ewî jî ligel xwe bibe.» Huseyn Paşa jî xweşhal dibe. Ew jî çend siwarêñ xwe hildide, ligel hev bi rê dikevin, bi dizî ve ji sînorê Iraçê derbas dîbin. Şevek li çiyayek dimînin. Medenî û mirovîn xwe bi pîlan û nexşeyek pîsî xwe, nepeyawane Huseyn Paşa û hevalêñ wî, çaxê di xew de bûne, namerdane dikujin, diçin teslîmê Tirkiyê dîbin. Şêx Ehmed Barzanî paş lêkolînan têdigihê ku brayê Hacî Mûsa Beg, Nuh bi dizî ve bi dewleta Tirkiyê qise kiriye, qewl girtiye ku ew Huseyn Paşa bikuje ewê dewleta Tirkiyê jî wî efû bike û destûra kuştina wî dide. Şêx Ehmed, paş muhakeme û pêregihiştina qewl û qerarê Nuh Beg û Tirkiyê, Nuh Beg Idam kir, nehişt ber lêbihurtin û xweşbûnî Tirkîye keve, ji efûya xwe kelk bigire..

Di dawiya havîna 1929 de, li nêzikayetiya Agrî, li nav sînordarêñ Iran û Tirkîye pêk helperanî bû. Sînordarêñ reşîd ên Iran bi yekî postayê sînorê Tirkîye rekib kirin, girek ji wan stendin. Têkoşerêñ kurd bi yarıyê Iraniyan hatin. Zabitê tirk tîrsiya, bi zabitê Irani re gotûbêj kir, li hev hatin. Wê çaxê ez li Agrî nebûm, ji bona serdayinê bi binçeyêñ Komîteya Xoybûn çûbûm navçeya Abaxê li wilayetê Wanê, ji Agrî derketibûm. Di ev ser û bendî de bû ku Şêx Abdulqadir xerîkê geran ji zozanêñ Aladax bû. Li malbenda çiyayê Tendûrek ketibû pelamara\* hêzên dewleta Tirkiyê. Xelkê wî esbab û per û pertalê xwe û hinekî pez û dewarê xwe bi cî hiştibûn, bi halekî perîşan xwe avêtibûn Agrî, jin û zarêñ xwe ji nav derxistibûn. Şêx Salihê braza û Şêx Yasînê kurapê wî û çend kesêñ din, jin û mîr hatibûn kuştin. Bi vî halî Şêx dîsa ketibû rêza têkoşeran.

role : zaro

padaş : xelat, perû

pelamar : êrif, tecawiz

## SERPÊHATIYEKE TIRSNAK

Di zivirandinê de, li mala Yûsif Axa, hevaljina min Yaşar Xanim ku bi pasaport ji Tirkîyê derketibû çûbû Sûriyê, ji wir hatiye Tebrizê. Min meriveke şand ku wê bînin. Di vê meselê derudavekî\* tirsnak hate serê min. Posteciyê min li bajarê Xoy bû. Min xeber şand jê re, adres dayê ku here xanima min bîne. Deh roj kêşa, min cewab negirt. Min Kurdek bi navê Silo, ji nokerên\* Yûsif Ebdal Axa kir cem xwe, cilekî kevn î peritî yê kurdî li xwe kir, tifinga xwe hilda û bi peyatî bi rê ketin çûm bajarê Kela Xoy, li mala feqîrek nasê Silo mam. Bi şev çûm mala posteciyê xwe û min jê pîrsî : «Tu çira neçûyî ?». Got : «Pakêta\* ku te şandibû mora li ser wê mora dewletî bû, nizanibûm li ku bidim, loma neçûm..». Min li pakêtê mora hevîgeya Xoybûn dabû. Min got : «Adresa ji bona anîna eyala min nivîsî ye, pakêtê jî bide vê adresê.» Ew çû, çend roj li hêviya wî mam, nezivirî. Rojekî derketim bigerim. Min kumekî pehlewî jî danî serê xwe. Di kuçeyek xelwet diçûm, min dît li pêşıya deriyek çend cendirme qise dîkin. Li pêşıya wan derbas bûm, min bihîst yek ji wan «Efendî ! Efendî !» gazî kir. Dizanim, gazî min dike, min xwe dame nefehmî. Yek li pey min beziya, hat, ji pare destê xwe danî ser milê min, got : «Min gazî te kir, çira nesekinî ?» Gotim : «Te, «Efendî ! Efendî !» gazî dikir, ez ci dizanim «efendî» kî ye. Ez tu efendî nîn im.» Got : «Were !» Min bir cem zabîtê xwe. Got : «Ev firariyê eskerê Romê ye, min girt anî !» Zabit jî hîçî nepîrsî, kaxezek nivîsî da destê wî, got : «Evî mîrikî bibe tehwîlê dijban (polisê eskerî) bike !». Em çûn, riya me ji nav bazar diçû. Li pêşıya dikane got : «Ezê cixara xwe agir kim.» Em çûn, wê dikanê. Dikancî min nas kir ! Çend sal berê ez û Rasim û Tewfîq ku bi navê bedelî ji Iraq hatibûn Iranê, zivistanê li Xoyê mabûn ; wê çaxê navê min Hacî Mihemed bû, em li ser vê dikanê dikiriyan. Dikancî bi min got : «Hacî, bi xêr hatî ! Hevalên te li ku ne ? Gotim : «Hacî Kî ye, hevalên min kî ne ?» Ewî got : «Ez te rind nas dikim ; hun sê mirov bûn dihatin dikana min.» Min haşa kir. Paşê got : «Bi min ci tu ew bî ya ne bî» Em ji dikanê derketin, cendirme got : Te dît, te derew dikir ! Rast bêje, tu kî yî ?» Di welamê de gotim : «Rastî jî ev e : ez Kurd im, kurê kurd im !» Ew çend sal berê li sînorê Abaxê bûye, serokên Abaxê nas dikir, yek bi yek pîrsî ; min wan nas nedekirin. Min dît ez zehf bi wî re qise dikim, çak nîne, gotim : «Mecbûr nîn im bi te cewab bidim, tu min dibî tehwîlê dijban didî, bila bide..»

Min fikir dikir : min mirov şandiye Yaşar bîne, evanan ez girtime, min nas nakin, heke bêjim jî «Ez Ihsan Nûrî me» bawer nakin û mimkin e bidim Tirkîyê.

rûdave : bûyer, qewimandin

noker : xulam

nuwîner : nemînende, temsîkar

pakêt : zerf

Ew dikancî jî wisa gotiye, karê min bedtir bûye. Halê eyal û dayka wî ci dibe ? Ji hîç alî umîda min nebû, ez mabûm bi serê xwe. Em gihîştin daireya polîsê eskerî. Li Agrî, yek mela hebû, ji aliyê wan hatibû, riyazet kêşa bû, bi min çend dua hîn kiribû, gotibû : «Çaxê diçî cem mezinek psiyader, ev duan li serê wan bixwîne, bikeve hindur, her ci bixwazî ew qebûl dike.» Min ew xwend, çûm hindur. Cendirme kaxiz da yekî, wî ji cendirme re got : «Derkeve !», ew derket, êdî nikaribû qise bike. Ez qederek rehet bûm. Reîs ji min pirsî : «Tu kî yî ?» Gotim : «Xulamê Yûsif Ebdal Axa yim.» Got : «Navê te çi ye ?» Gotim : «Wezo !» Got : «Çira hatiy Xoy ?» Gotim : «Saeta zîvî ya Axa kar nedikir, min anî da saetsaz ku çê ke.» Got : «Here zû saetê bigir û biz vire !». Ez gelek şad bûm. Xwedê îcar jî ez xelas kirim !

Êdî ji karwansera\* dernediketim. Rojek Silo bi bez hat, got : «Yek dostê Yûsif Ebdal Axa min dît, got : «daireya polêş bihîstiye ku mirovek hatiye ji karwanserayê qet dernakeve derva, dixwaze ewî bigire. Zû here wî ji şar derxe !» Êdî ez ne sekinîm, em ji şar derketin, Silo ji bûna kirîna genim yek ga anîbû, li ser riya xwe genim kirî, bar kir ; ji Xoy titûn jî kirîbû, da nav genim. Em di deşta Xoy de pişta xwe dane newaleke kêm av û kêm bilind û di rojê de çûn gihîştin navçeya Kurdan.

Riya me ket péşîya postê cendirman. Memûrê qaçax bi yek cendirme çekdar ve péşî li me girtin. Nîvê şevê bû. Heke li genimê me binêrin, titûn derdiket û bi navê qaçaxa titûnê em digirtin. Min her ci got : «Barê me tenê genim e», cendirme qebûl nekir. Min dît faîde nîne, min tifinga xwe ji mil anî xwarê, quesda wan kir û got : «Em teslîm nabin !». Memûr got : «Ez dizanim tişt nîne ; wezîfa me ye bipîrsin. Kerem kin biçin !»

Ez ji vî jî xelas bûm. Çaxê roja dinê gihîştin mala Yûsif Ebdal Axê, ez ji qam ketibûm, nexweş ketibûm û razam. Çend rojên din min dîsa şand Xoyê. Yaşar Xanim hatibû. Hesp xwastin, min şand, wê anî û li gel xwe bir Agrî. Gihîştina Yaşar bi Agrî bi sualek girîng bi çav nayê, lê tuwane\* û hêza Xoybûn ronak kir. Hê hefteyek hatina wê temam nebûbû ku frokeyên tirk li esmanê Agrî diyar bûn, bi agirê mitralyoz û avêtina bomban bixêrhatinî digotin.

(Dûmahîk heye)

*tuwane* : karîn, qudret.

# ZIMAN Ú EDEBIYAT

## QAÇAXKERIYA BÛBÊ

Firat CEWERİ

Bûbê rabû ser xwe, herdu destên xwe dane paş qûna xwe û ber bi pacê ve meşıya. Qederekî wisan bê deng li ber pacê rawesta. Jina wî dîsan got :

- Bavê min kûçik be, ez hew di vî hundirî de diseke nim. Ez hew kanim bi vê kûçikayiya xwe zariwê te xwedî bikim ! Qe bila dilê te bi me bişewite, ca çi dibe ?

Bûbê bi ser de qîriya :

- Ma ezê çi bikim, keçê ?
- Ma xelk giş çi dikin ?
- Yê xelkê perên wan hene, xelk dewlemend in !

Jinikê berê xwe guhert û dîsan got :

- Yê min ez nizanim, ez hew kanim di vê malê de bisekinim.

Piştî ku Bûbê cigarek pêça û vêxist, got :

- Ezê dîsan herim xwe biavêjimê, qe belkî karekî bi min jî de.

- Kuro, welleh ew tu karî nade te, ew tenê te dixapîne !

Bûbê hêrs bû, destê xwe li dîwêr xist û got :

- Ma ez weki din çi bikim, ez bi ku de herim ? Ez herim xwe biavêjim kê ? Hi ? ... Ka tu bibêje, tu aqilekî bide min !

Jinikê destên xwe li ba kir û got :

- Lê lê ! Ez êqil bidimê, ezê êqil bi mîrê xerab dim !

Bûbê bû weke îsotê. Pehînek du pehîn avêt jê de û bi dengekî gur bi ser de qîriya :

- Ger ku tu aqil nadî min, di karê min de jî xeber mede. Zimanê xwe weke zimanê kûçikan dirêj meke !

Herdu bîskê bêdeng man. Lê tenê dengê îskîna jinikê dihat. Jinikê ji kerban û ji qehran nikanî bû giriye xwe bisekinanda. Ji wê tirê bû, ku mîrê wê ji

questî kar nedikir. Lê kar tune bû. Mêrê wê sibehan zû radibû ser xwe û heyâ bi évarî li bajêr li kar digeriya. Lê wî dîkir nedikir tu kar bi dest nediket. Dawî dawî çû bazine jina xwe firot û serekkarkerek li kargehê bertil kir, da ku kar bidiyê. Lê wî serekkarkerî ew her roj dixapand û tu kar nedidayê. Bûbê her roj wisan polî-poşman û bi stûxwarî vedigeriya malê. Her ku ew wisan bê kar û bê pere vedigeriya malê, ew û jina xwe pevdiçûn û xeber û gotinê nemayî ji hev re dikirin.

Jinikê piştî ku bi dawa xwe hêsisrên xwe û pozê xwe paqij kir, rabû ser xwe û ber bi dergûşa lawê xwe meşîya.

Ji giri çavêن lawik sor bûbûn. Jinikê ew vekir, ji dergûşê derxist, xiste hemêza xwe û pêsiра xwe xiste devê wî. Gava ku devê lêwik kete pêsiրê, lawik aş bû û hew giriya. Jinikê icarê xwe da ser kevnikekî û rûnişt. Dû re lawê xwe xiste nav herdu çîpêن xwe û ew hejand.

Bûbê piştî ku cigara xwe di xwelidankê de vemirand, serê xwe xiste nav çokêن xwe û fikirî. Dikir nedikir tu rê ji hevdu dertnedixist. Gelo çi bikira ?... Çend caran li şelandina bankê fikirî. Li diziyê fikirî. Lê dîsan dev jê berda û ramana xwe guhert. Lê kubihata girtin, hingî kî dê li jin û zarokêن wî binhêrîna ? Ewê di nav xelkê de rezîl bibûya. Xelkê bigota : «Bûbê ji bo diziyê hatiye girtin» Ku navê diziyê bihatser kî, mala wan wêran dibû, tu kesî silav nedidane wan. Ji ber vê yekê, Bûbê ji wan ramanan pir bi dûr ket. Piştî ku qederekî serê wî di nav çokêن wî de û bêdeng ma, dû re cigarek péça. Bi cigarepêçinê re got :

- Keçê, min ji te re got, bajar ji me re nabe, em nikanin li bajaran bijîn. Te bi a min nekir.

- Ma min ê çi bi a te bikira ? Hun her tim li ber hev bûn. Ma qey kuştin ji barkirinê çêtir bû ?

Bûbê wa hebki bi hêrs got :

- Kuştin ?... Dê wî kükîkê birayê te ez bikuştama ? Wî bênamûsê serpîrek ? Keçê, min kanîbû çarika jina wî berepaş bida serê wî. Ma bi a te ew ji mîr e û kane mîran bikuje ?

Jinikê tu bersiv neda, tenê kire îskîn û bi dawa xwe pozê xwe paqij kir.

Bûbê dîsan got :

- Hii... Tu wî kükîkê birayê xwe jî peya dihesibînî ? Ji te re we ye ku ew segê birayê te jî kane mîran bikuje ? Ew jina axê ye, keçê ! Jina Axê ...

Jina wî li ber wî geriya. Bi qûnkişkê ber bi wî çû û serê xwe danî ser milê wî. Lîvîn wê weke yê zarokan dilerizîn û hêsisrên wê bi ser hinarîkên wê de dihatin xwarê. Qederekî welê bêdeng man. Dû re Bûbê destê xwe avêt çenga wê û berê wê bi xwe vekir. Biskê li çavên hevdu nihêrin û rabûn ser xwe û hevdû hembêz kirin. Du-sê caran wisan li ser hev hevdu hembêz kirin û kûr kûr li çavên hevdu nihêrin. Paşê Bûbê ew berda û dîsan çû ber pacê û li derive

nihêri. Jina wî jî da dû wî û ew ji paş de hembêz kir. Li derve sê-çar zarok dileyistin. Piştî ku Bûbê bîskê li wan zarokan nihêri, dû re li jina xwe zivîrî û ew hembêz kir. Jina wî jî heya ku jê hat xwe lê pêça.

Ev hêmbêzkirina wan, tam weke heft sal berê bû. Heft sal berê jî hevdu wisan hembêz kiribûn. Lê bi saw û tirs. Ew herdem ditirsyan. Ew hembêzkirina wan li çiyê û di şikeftê de bû. Hingî gava ku bi hev re reviyabûn, axê du peyayên xwe û birayê jinikê bi dû wan xistibû, da ku wan bigirin û bîninji axê re. Ji ber ku axê dê jinik ji lawê xwe re bixwesta. Lê dilê jinikê ketibû Bûbê û wextî li ser Bûbê dîn bibûya. Ji ber ku mala bavê Bûbê feqîr bûn û tu erd û hatina wan tune bû, bavê jinikê ew nedidayê. Ku dil bikira jî, dîsan Axê nedîhişt. Axê ji bavê jinikê re gotibû «Bila haya te ji qehpa qîza te hebe. Welleh ew bi hinan re baz de, ezê êgir bi mala te bixinim». Axê bi xwe zanî bû, ku dûr nézik, dê keçik bi Bûbê re baz de. Lê welhasil peyayên axê Bûbê bi dest nexistin. Bûbê piştî ku mehra xwe li gundekî din birî, êdî bar kirin bajêr. Ji diya jinikê û mala bavê Bûbê pê ve, tu kesî nizanîbûn ku bê ev beşer bi ku de çûne.

Piştî ku hevdu têr hembêz kirin û xwe li hevdu pêçan, Bûbê jinik berda û ber bi dergûşa lawê xwe ve çû. Lawik ji dergûşê derxist, xiste hembêza xwe û du-sê caran hol kir hewa û girt. Piştî ku bîskê bi lêwik re leyist û henek pê kir, dû re da destê jinikê û got :

- Emo, ma tu zanî ku Ûsê cîranê me çi karî dike ? Ma tu zanî ku ew van peran ji kuderê tine ? Ma tu zanî ku wî ev texsi, sarinc û televizyon bi çi kirîye ?

Emo milên xwe hejand û got :

- No.

- Lê, Üso qaçaxkeriyê dike. Şeva wî ne kêmî du hezar lîran e. Te fêhm kir, du hezar lîran...

Emo li ber wî geriya :

Nebe, nebe, Bûbê ! Ez di bextê te û Xwedê de me, qaçax maçaxê meke ! Tu dibînî, ku her şev teqîn e. Ma te nebihîst, ku wê roja han du kesan xwestibûn ku keriyek pez derbasî binxetê bikin, lê eskeran li wan teqandibûn, dawî dawî herdu jî hatibûn kuştin û eskeran meytêwan avêti bûn dû tirimpêlên xwe. Ew wisan bi mirîti heya bi bajêr bi dû tirimpêlên xwe de kişandibûn. Gava ku xwedîyê wan çûbûn ser wan, ew nas nekiribûn. Tenê néviyê laşen wan ma bûn.

Bûbê bi tiliya xwe ya girdikê simbêlê xwe ji devê xwe derxist, kir niçenîc û got :

- Ih... Na keçê, ma ji te tirê ku ezê herim keriyên pezan derbasî binxetê bikim ! Dîna Xwedê ! Tiştê ku ez dibêjim, barkêsi ye. Xwedîyê mal û esker bazara xwe dikin û du kes bi sîlah li nik eskeran hebe dê esker çawan kani-bin bera barkêşan bidin û wan bikujin ? Ji te we ye, ku hema ez herim û bême kuştin. Ez işe xwe ji tu tişfî naynim. Ezê tenê barêñ xwe bikşinim û

perên xwe bistînim. Ma ev du salêن Ûso ye ku vî karî dike, çîma nehate kuştin ?...

Jina wî dîsan li ber wî geriya, bi nermî û bi stûxwarî jê re got :

- Bûbê, Xwedê carekê mala mirov wêran dike. Welleh tu bi a min bikî, parsê bike û qaçax maçaxê meke.

Bûbê serê xwe kil kir, û got :

- Bi rastî ji aqilê pîrekan tune ye. Keçê qe peyvê fêhm bike ! Ez ji te re dibêjim, ku talûka vî karî tune ye, tu hîna ji pitpitê dikî. Ku talûkak di vî karî de hebe jî, tenê lêrasthatin e.

Di vê navê de lawikê wan giriya. Emo du-sê caran destê xwe li qûna wî xist û pêsiра xwe xiste dev. Dû re ji Bûbê re got :

- Bûbê, ger ku tu li min nafikirî, li vî tifalî û birayêن wî bifikire. Mala me wêran meke !

Bûbê serê xwe kil kir û bi ser de qîriya :

- Keçê, te ez ji niha de xistime gorê. Ma te xêr e, ku tu vê pite-pitê bi ser min de dikî ?

Jinikê hew dengê xwe kir, rabû ser xwe, lawikê xwe xiste dergûşê û ew hejand. Piştî ku lawik bi xwe re çû, rabû çû teşta hevîr ji ser textê firaxan da-xist, du-sê mist ard berda binê testê, rûnişt û hevîrê xwe kir.

Bûbê jî cigarek nû pêça, vêxist û derket derive. Taxa ku ew lê rûdinişt nû ava bûbû. Hema hema hemû xanî yet qatî û bi perekêtan hatibûn lêkirin. Xanî firk bûn. Yek li vir, yê din taa li dera hanê bû. Erdêñ vala, yêñ ku di nava wan xaniyan de mabûn jî, hemû hatibûne firotin. Yêñ ku çend kevir li şûna erdê xwe danî bûn û yêñ ku qorek du qor asasên xaniyêñ xwe avêtibûn. Piştî salek du salêñ din dê bibûya taxeke nû di bajêr de. Mala wan nêzîkî pira Alman bû. Ew çemê ku di bin pira Alman de diherikî û diçû Binxetê, nêzîkî mala wan bû. Havîn bû. Gava ku dibû berdestê êvarê hênkayiyek dikete wê dorê, mirov digot, qey buhar e. Ne ku temama bajêr wisan hênkayî dibû. Ew hênkayî ji ber nêzîkahiya çem bû. Her êvar zarokên wê taxê li meydanê bi topê dileyistin. Carna jê zarok ji çem, ji avjeniyê vedigeriyan, lingê xwe li topê dixistin û ber bi meydana topê ve diçûn. Hemû pîrekên taxê jî, berdestê êvarê nanêñ xwe li tenûrê dixistin. Hingî dengê giriyyêñ zarokan û dengêñ bangêñ çend dikan jî dihat. Bûbê çav li wan çar-pênc peyayêñ ku li ber siya dîwêr rûniştibûn ket. Wî xwe li civatê girt, çû nik wan, silav da û rûnişt. Gişan bi hev re silava wî lê vegerandin. Paşê bi dorê gişan jê re gotin :

- Merheba.

Dû re Ûso jê pirsî :

- Cîran, tu van rojan nexuya bûy, ma tu bi derinan de çû bûy ?

Bûbê piştî ku cigara xwe bi binê sekala xwe vemirand, got :

- Erê Welleh cîran, ez ber bi Kertwêñê ve çûbûm.

- Çima, xêr bû ?
- Xêr bû cîran, ji bo kar bû.

Üso keniya. Li civatê zîvirî û got :

- Karê cîranê min Bûbê nabe. Vî bajarê Nisêbinê, yê mezin dihêle, dihere li gundan li kar digere. (Dû re berê xwe bi Bûbê ve kir û jê pirsî)
- Ma ew ci kar bû, cîran ?
- Karê cenaniyê bû, lo. Cenaniya pembû...
- Eêê...Ma te çima dom nekir ?

Qaso cigara ku pêça bû dirêjî Bûbê kir. Bûbê cigare girt û got :

- Apê Qaso, ma tu ji nexweşiya xwe çawan bûy ? Minbihist ku tu çûbûy ser doktor.

Qaso serê xwe bi aliyekî de xwar kir û got :

- Wele birazî ez weke berê me. Doktor emeliyata min dixwaze, lê buha ye, qeweta min nagihijê.
- Ma doktor nabêje nexweşiya te ci ye ?
- Kevir di gurçikên min de ye...

Memo peyva wî birî û got :

- Aaappê Qqqso, jjibô kkkevir bbbbbbbîra bbaş e. Bbbbbbbîra vvvexwe. Paşê Memo paş guhê xwe xurand û keniya.

Memo hebkî lalikî bû. Gava ku dipeyivî zimanê wî tim li hev digeriya. Emrê Memo di dora bîstan re bû. Qama wî dirêj û zeyif bû. Kincêñ wî tim pînekirî û pertal pertalî bûn. Carna li nav taxê xwas digeriya. Porê wî tim meqeskirî bû. Serê wî piçûk û guhê wî mezin bûn. Di wê taxê de tu kes ji Memo nedixeyidî û dilê xwe jê nedigirtin.

Üso berê xwe bi Memo ve kir û got :

- Memo, van qeşmeriyan meke. Dê apê Qaso çawan vexwe ?

Piştî ku Memo sola xwe xist bin piyêñ xwe û pal da, got :

- Wwwwellleh eeeeezz rrrrast ddddibêbêjjim bbebbbîra jjiji bbbo kekkkevvir bbebbbaş e.

Qaso wa bi şasmayî jê re got :

- Kuro bîra ci ye, Memo ? Ev bênamûs qala araqî maraqiyê dike an... Bûbê peyva wî birî :

- Na apo, na ! Bîra avceh e. Ji ava ceh çêdibe. Wele min jî bîhistiye, ku bîra ji bo kevir baş e, lê ez nizanim rast e an derew e.

Di wê navberê de Evdiko silav da wan û rûnişt. Piştî ku hemûyan silava wî lê vegerandin, Qaso henek pê kir û got :

- Kuro Evdiko, tu hew li me dipirsî, ha ! Qey tu jî dewlemend bûyî ?
- Na wele apê Qaso, ci dewlemendî û ci hal. Bi zorê roj di ser me de derbas dibe.

Icar Bûbê jê pirsî :

- Evdo, min bihîst ku tu li Edenê kar dikî. Ma li wê kar tune ye, lo ? ...
- Evdiko serê xwe kil kir û got :
- Na cîran, karê çii halê ci...

Bûbê disan got :

- Welleh ez rast dibêjim, ger ku li wan deran kar marek hebe ezê jî bêm.
- Na Wele cîran, tu kar tune ye. Avahiya ku em tê de kar dîkin vê sala were ewê bîst karkeran jê derbixînin. Ez ji xwe jî ditirsim. Ez ditirsim ku min jî derbixînin.

Piştî wextekê jina Bûbê bi teşta nêñ di ber civatê re derbas bû û got :

- Ma hun nanê germ naxwin ?

Qaso bi devkenî got :

- Belê Wele keça min. Hela tu bi xêra bavê xwe kefekê bi apê xwe de.

Emo teşta xwe ji ser milê xwe daxist, danî ser çoka xwe, nanek jê derxist û dirêjî Qaso kir. Qaso ew nan kire du perçê, perçê din dirêjî Emo kir û got :

- Rehma Xwedê li dê û bavê te be !

Memo jî ji cihê xwe pekiya, ew perçê din ji destê Emo girt û bi qertan kişiyyayê. Dû re wexta tiştek bigotaya, lê Üso peyva wî birî û nehişt ku bipeyve.

Emo ji Qaso pirsî :

- Min jî bîr kir ku ez bipirsim, apê Qaso, ma gelo nexweşiya te çawan bû ?

Qaso herdu destêñ xwe ber bi hewa vekir û got :

- Ez li ber rehma Xwedê me !
- Xwedê şifa xwe li te bike, apê Qaso. Dû re teşta nanê xwe danî ser milê xwe û ber bi mal ve meşîya.

Edî hêdî hêdî tarî dikete erdê. Zarokên ku bi topê dileyistin, pîrekên ku li ser tenûrê nanêñ xwe lêdixistin hêdî hêdî ew jî winda bûn. Peyayêñ ku li ber diwêr rûniştibûn jî rabûn ser xwe û herkes ber bi malêñ xwe ve çûn.

Piştî şivê Bûbê ji jina xwe pirsî :

- Emo, ma em bîskê nerin mala cîranê xwe Üso ?

Emo bi rakirina firaxan mijûl bû. Piştî ku sifre rakir, got :

- Baş e, wê çaxê ez lêwik şîr bidim, dû re em herin.

Piştî ku zikê lêwik jî têr kir, lawik xiste hembêza xwe, da dû Bûbê û derketin.

Herdu lawikên wan yên din çûbûn mala apê xwe. Bûbê li ber devê derî ji jina xwe pirsî :

- Ma zarok werin ewê zanibin ku em li mala Ûso ne ?
- Ku ew werin emê wan bibînin.

Mala wan nêzîkî hev bûn. Di nav mala wan de tenê du xanî hebûn. Gava ku gihiştin ber hewşê, jina Ûso ew dîtin, çû pêşıya wan, lawik ji destê Emo girt û bi hev re ketin hundir.

Ûso cigara wî di dest de bû, li ser doşekê pal dabû û li televizyonê dinihêri.

Bûbê henek kir û got :

- Ma hun mîvanan vedihewînin ?

Ûso keniya û got :

- Mîvan mîvanen Xwedê ne. Dû re ji cihê xwe rabû û cih da wan.

Bûbê derbasî ser doşekê bû. Emo û jina Ûso jî li jêrî wan rûniştin. Piştî ku Ûso cigare ikramî Bûbê kir, li Emo zîvirî û got :

- Maşale lawikê we mezin bûye, ma navê wî ci ye gelo ?

Ji berdêla Emo Bûbê bersiv da :

- Navê wî Şoreş e. Lawê Qaso ev nav lê kiriye.
- Şoreş navekî pir xweş e, ma tu zanî, bê mana, Şoreş ci ye ?
- Erê we, ez çawan nizanim.

Di wê navberê de nûçeyên televizyonê dest pê kir. Ûso rabû ser xwe û hebkî dengê wê bilind kir. Piştî ku li nûçeyan guhdarî kirin, jina Ûso çayê anî ber wan. Bi çayê vexwarinê re Bûbê ji Ûso pirsî :

- Cîran, riceke min ji te heye.

Ûso qedeха di destê xwe de danî û bi şaşmayî got :

- Estexfurulah cîran, kerem bike !

- Tu zanî ku ez bêkar im û tu kar bi destê min nakeve. Xwediyê xêni her roj kiriya xwe dixwaze

Ûso peyva wî birî û got :

- Eêê, cîran !

- Gelo ma tuê nikanibî li nik xwe karekî ji min re jî peyda bikî ?

Ûso cigarek ikramî wî kir û yek jî vêxist. Piştî ku qurték li çaya xwe xist, got :

- Wele cîran, di vê demê de hebkî dijwar e. Lê çawan...Emê dîsan jî kani-bin ji te re karekî peyda bikin.

Wan wê êvarê heyâ bi dereng şevbuhêrkiya xwe li mala Ûso derbas kirin.

Piştî wê di du-sê rojan, şevekê Ûso li deriyê wan xist û got :

- Ciran, rabe xwe kar bike, emê işev dakevin binxetê !

Gava ku Bûbê dengê Ûso bihîst, hema zû ji nav nivînên xwe pekiya, kin-cen xwe li xwe kir, rahişt werîsê xwe, derket, da dû Ûso û lezand.

Gava ku Emo hişyar bû û li nav nivînê Bûbê nihêrî, Bûbê nedît. Li ser nivînê wî rûnişt û bi heyâ derengê şevê jê re dua kir.

Şev reş û tarî bû. Ji xwe gava ku li Nisêbinê şev wisan reş bûya, xelkê digotin «İşev şeva qaçaxkeran e». Şev wisan reş bû ne ji şewqa lampêñ hin malan bûya, mirov nizanîbû ku tu kes li wê taxê dijîn.

Gava ku ji çein derbas bûn, gîhiştin nik hevkarêñ xwe yên din. Tam cil heb barkêşen qaçaxê di nav erdê nik pira Alinan li hev kom bûbûn. Piştî ku bîskê li hev rûniştin û rêberan (rézanan) şiret li wan kirin, rabûn ser xwe û her neh-deh heb bi derekê de cûn.

Bi her refekî re rêberek an du rêber hebûn. Rêber ew bûn, ku barkêş ji tixûb derbasî binxetê dikirin. Ji ber ku di erdê navbera binxetê û serxetê de inayîn (bombe, qembere) hene. An em kanin bêjin, ku di erdê navbera Nisêbinê û Qainişlo... Salê bê hejmar qaçaxker di nav wan tixûban de têne kuştin. Yên ku bi guleyên eskeran û yên mayîn bi wan diteqin û têne kuştin. Pirêñ wan jî seqet, kulek û bi lingekî dimînin. Gava ku mirov dihere Nisêbinê, mirov pir kesen ku bi lingekî û bi daran diineşin, dibîne. Ew hemû jî di nava tixûban de li wan wisan hatiye. Erê xelk ji wan re dibêjin, qaçaxker. Lî bi rastî ew ne qaçaxker in. Ew ji barkêşan pê ve ne tu tiş in. Qaçaxker ew in, ku şevê bi milyonan mal ji binxetê derdixînin. Ew bi xwe jî li malêñ xwe rûdinêñ û lingêñ xwe diavêjin ser hev. Ew tenê bi perêñ xwe dikin. Yên ku têne kuştin û seqet dimînin, barkêşen belengaz in.

Gurûba Bûbê û Ûso xwe di bin pirê de berdan û ber bi tixûb ve meşyan. Ji xwe tixûb ne dûrî bajêr bû. Gava ku yekî biyanî bihata Nisêbinê, wan nizanîbûn ku Nisêbin û Qamişlo du bajar in. Ji wan tirê bû, herdu bajarek in û tixûb mixûb di navbera wan de tune ye.

Piştî deh-panzdeh deqîqan ew gîhiştin ber tixûb û xwe li wir qederê deqîqekê dane erdê û li rêber guhdarî kirin.

Wê şevê dê xwediyê mal serê barkêş du hezar lîra bidaya wan. Ji ber ku Bûbê hîn nû bû, dê tenê hezar û pênc sed lîra bidaya wî. Piştî ku ew jî çendakî biçûya bihata û jêhatî bûya, dê du hezar bidaya wî jî. Lî hezar û pênc sed jî disan ji Bûbê re ne hindik bû. Gava ku bihîst ku ewê hezar û pênc sedî bistîne, kêfa wî hat û di dilê xwe de got : «Ku ez şevê hezar û pênc sed lîran kar bikim, ne hindik e. Kiriya xaniyê min ya du mehan derdikeve û ezê

ji Emo û ji zarokan re jî hinek kinc minc bikirim û ji xwe re jî kîsek titûn...»

Bûbê pir poşman bûbû, ku heya niha ev karê bi pir pere nekiribû. Wî bîskê ji hin xeyal meyal anîne ber çavêن xwe.

Berî ku li têlan bixin û derbasî binxetê bibin, dîsan rîberê wan ji wan re got :

- Divê ku hun qet gavêن xwe şaş mekin û ji ser şopa min şaş mebin ha !

Pêşî rîber keleşnikova xwe avêt milê xwe, bi meqesa ku mirov pê têlan dibire, têl birî û hemû yek bi yek derbas bûn.

Hemû ketin rîzê û li dû hevdu bi qulûsi meşîyan. Lê dilê hemûyan bi tirs bûn. Üso û Bêbê li herî dawiyê bûn. Piştî ku bi çend gavêن baş di nav tixûbê binxetê de meşîyan, Üso hêdî ji Bûbê re got :

- Ciran, tu lingêن xwe şaş neavêje he ! Ji ser şopa min danegere.

Bûbê bi tirs li dû hemûyan, beyî ku gavêن xwe şaş biavêje dimeşîya. Piştî ku neh-deh deqîqan wisan çûn, ji nişkê ve kozikek leşkeran li pêşîya wan derket û li wan teqandin. Rîberê wan ji hema xwe li ser zik avêt erdê û wî ji li leşkeran reşand. Şansê wan hebû, ku ew ji erdê bi mayîn xelas bûbûn. Üso ji ber ku zû de ev kar dikir, bi rewşê zanîbû. Wî hema xwe avêt destê Bûbê û bi heyecan got :

- Ciran, tu bi dû min de !

Üso, Bûbê û barkêşen din hemû destvala bûn. Ji ber vê yekê ew mecbûr man ku baz bidin û canêن xwe xelas bikin. Hemû barkêşan baz dan, xwe avêtin paş girihekî nêzîkî Qamişlo û xwe xelas kirin. Lê rîber di nava leşkeran de ma. Wî û leşkeran her li hev diteqandin. Piştî demeke kurt, wî ji xwe bi bazdanê gihande nik barkêşan. Wê şevê hemû bi saxî derbasî binxetê bûn.

Bûbê wisan poşman bûbû, ku ew di jiyana xwe de tu caran wisan poşman ne bûbû. Wî bîskê jina xwe û peyvên wê anîne ber çavêن xwe : « Bûbê, Xwedê carekê mala mirov wêran dike. Weleh tu bi a min bikî, parsê bike û qaçaxê meke. Bûbê, ger tu li min nafikirî, li vi tifalî û birayêن wî bifikire. Mala me wêran meke.»

Di wê navberê de Üso tiştek got, lê Bûbê fêhm nekir, veciniqî û pirsî :  
- Ci, ma te tiştek got, ciran ?

Üso zanîbû, ku Bûbê tirsiyaye. Ji ber gava ku şeva pêşî ew derbasî binxetê bûbû, ew ji wisan tirsîya bû.

Wan di eynî şevê de mal derxistin. Ne di cihê berê de, lê di cihekî dûrî bajêr de. Derxistina mal tenê du saet kişand û mal hemû çay bû.

Bûbê saet di çar-pêncê sibehê de vege riya malê. Hêdî, berî ku kesî hişyar bike, derî vekir û kete hundir. Ew hezar û pêncsedê ku kar kiribû xiste bin behlifa xwe û tevlî kincan xwe avêt nivîna. Hema ki xilmaş bû, xewn dît. Lê çi xewn ? Xewnek wisan, ku ew di nav tixûb de û bê heval meval ma bû. Leşkeran her li wî diteqandin û didane ser pişta wî. Lê wî dikir nedikir nikanî bû baz bida, gavên wî li hev digeriyan û dikete xwarê. Dawî dawî leşkeran nêziki lê dikirin û yekî ji leşkeran gule dajot ber tivinga xwe ku berdiyê. Lê Bûbê kire qîrîn û hişyar bû. Bi qîrîna wî re jina wî jî hişyar bû. Gava ku Bûbê dît ku xewn e, hema xwe avêt jina xwe û ew hişk hembêz kir.

Jina wî ecêbmayî ma û jê pîrsî :

- Çi ye, Bûbê ? Ma çi qewimî ? Ma ne tuê îşev biçüya binxetê ?

Bûbê keserek kûr berda û ji kêf û heyecanan hêşir ji çavêن wî hatin. Dû re behlifa xwe bilind kir, ew hezar û pênc sed lîrayêن ku kar kiri bû nîşanî jina xwe da û dîsan ew hembêz kir.

Swêd, 1984

# **ROJEKÊ BI ILIMDAR KINYAZÊ İBRAHÎM RE**

**Çerkezê REŞ\***

Belê, tarîxê di serê serî de tehliyê li nav agirê xwîna civaka me xist. Ev tehlî li serê xaçeriya dinya gewrik heliya, heliya û di çavê me de, deba me de, rêveçûna me de bû melûliya zêndî. Her kurdek îro nîgara melûltiyê ye ku tarîxê usa bi hostatî sêwirandiye. Belê, kula bextê giran di rihê me de ne an jî em in di nav vê kulê de. Û serê me li ser balgivê hîçxemiyê nîne.

*Heylo xweyo, heylo xweyo, heylo xweyo,  
Bavê Wezîr, kekê Nasir  
Vê sibê ji mal derket, gelo çîma  
Hay pirçûyî bê made ye...*

Ango, Wezîr û Nasir bira ne. Li ser axa Kurdistanê nagerin, naleyzin, naçine mekteba Kurdi û aha bavê wan, kekê wan Kinyazê İbrahim vê sibê dîsa pirçûyî bê made ye. Kilama davêje ser xwe, ser bextê civaka xwe. Hizkî rojekê bêserûbin, çîksayıyê, em di nav mij û dûmâna tarîxa xwe ya ewrawira ji Yêrêvanê dertên, berê xwe didine girê fêza Divînê. Divîn wextekê bajarekî mezin û paytexta Ermenîstanê bûye. Îro dewsa kelefe ne. Çend salekên pêş de li Moskvayê kitêbek derketiye, ku tê de resmê gora Selahed-dînî li Dimışqê heye. Ji ber ku ew seresker û sultanê kurdî li Divînê ji diya xwe biye, Kinyaz destê xwe li hev dixe (bê hêrs, bi hesret) :

- Camêr, ewî malxirabî çîma Kurdistan çênekir, çû bû pêsekiniyê gelên mayîn ?... Heta gora wî jî tarîxa xelkê tijî dike, dixemilîne... Ew û Nîzamî Gencewî ji alîkî ve xal û xwarzî ne. Bila Nîzamî Kurdistana ruhaniya edebiyatê saz kira.

---

\* Çerkezê Reş Kandidatê ilmîn filolojiyê şair-edebiyatzan.

Li gundekî ser rê, li ber dîwarekî jineke kurd a sere rûniştiye û teşiyê dirêse. Kî zane, dibe ku ev kinêza Selah-ed-dîn û Nîzamî ye ? Lê kê wê têlê xalîça tarîxa me birêse ? Kinyaz avtomakînê dide seknandinê, peya dibe, ber bi wê diçe. Ew ji ber Kinyaz radibe piya.

- Siba te bi xêr, metê !
- Serçava hatî, lawo !
- Siheta te çawa ne ?
- Eh, wê çawa be, lawo , metê bi qurbana wê bejn û bala te ya sibhanî be. Emê kul û derdan re bûne kan...

Dîsa kul û derd... Canim, kul û derdên dînyayê çîma hema para me ketin ? Dibe ku em bi xwe ji xwe re derd û kulan çêdikin, hesîna bi yekalî tîr û kûr dikin ? Lê çend padîşehêن me, çend paytextêن me hebûne an jî hene ? Birayêن me niha ji bo serbestî û serxwebûna mîletî xwînê dirêjin. Lê gelo ew xwîn deya naçe ? ...Em teypê pê ve dikin.

*Heylo swaro, heylo swaro,  
Lo xweşmêro, lo mîrpenco,  
Lo mêrxaso...*

Ew ci mîrxasî ye ? Ango, em gişk mîrxas bûne, mîrpenc bûne, xweşmîr bûne ? Lê aha ne paytest e, ne dewlet e, ne welat e ! Xelkê ji xwe re dewlet çêdikir, «mîrxasên» me jî kêr û qamê di zikê hev radikirin, ûrt û ocaxê hev ditemirandin, paşê jî helan didane hev, hespên hev.

*Lo xweşmêro, lo mîrpenco,  
Lo mêrxaso...*

De were wê «mîrxasiyê» di serê wan de reşheş meke ! Beg û dewlemen-dêñ xelkê, cahilêñ xwe dişandine merkezêñ dînyayê yên ilmî yên mezin, yên me cahil berî hev didan, qebîl û êl radikirine hev, zariyan hînî «mîrxasiya» qelpemalxirab dikirin. Mîrxas xwedîyê wan qilêriyan nîn bûn. Mîrxas aha Kinyaz e û yên mîna wî... Ezê paşê, li malê fikra edebiyatzanê ermeniyan yê navdar, doktorê filolojiyê profesor Hektor Riştûnî ya derheqa Kinyaz de carake din jî bixweynim : «Kinyazê İbrahim Mirzoëv, kandidatê ilmî filolojiyê, doçent, edebiyatzan-rexnegir, serekê kafêdra zman û edebiyata adirbêcanî (azerbeycanî) ya enstîtuya Yêrêvanê ya pedagojiyê ku li ser navê Xaçatûr Aboyan a dewletê, endamê şêwra wê enstîtuyê ya ilmî, cîgirê dekanê fakulteya filolojiyê, endamê şêwra tiyatroya Yêrêvanê ya adirbêcan ê dewletê ku li ser navê Cebar Cebarlı ya dramatîka bedewîtiyê, endamê koma Komîta Merkezî ya PK Ermenîstanê ya ajîtasyon û propaganda lektoriyê, endamê

Yekîtiya Nivîskarê TRSS. Lê di nav ew çend mijûliyên mexlûqetiyê de, Kinyazê Îbrahîm serê xwe winda nake. Ew xebata ilmî berbiçav dike. Nêzîkê bîst sala ye ku ji problemên tarîx û teoriya peywendiyên edebiyatê ve mijûl dibe. Kitêba wî ya pêşîn bi sernivîsa «Ji terîqa heleqetiyêd kurda-adîrbêcanaye lîtératûriê» di 1978 de derketiye ku ev teza wî ya kandîdatiyê ye. Di van dawîyan de kitêba wî ya diduyan bi sernivîsa «Lîtératûraêd miletîê û pevgirêdanêd lîtératûriê (pêvgirêdanêd lîtératûra kurda tevî lîtératûra cimetêd Pişka-vkazê)» derketiye.

Kinyaz kovarê ilmî de, rojnameyan de, berhevokê matematikê de 30 meqale weşandiye. Ew îro êdî pêşekzanê peywendiyên edebiyatê û baş hatiye naskirinê. Ji bo Kinyazê alim a sereke, diyarkirina serecema îsbatî ya estetîk-tarîx e. Ew bi şarezayî metoda tîpoloji-hemberî hevkirinê dide bikarâ-nîn û bi wê yekê digihîje berhevkirina heta awa û qanûnên edebiyata hundir.

Şivanekî pez berî nava girê Divînê daye, li ser kevirekî rûniştiye û ji dûr ve dîdara (poz) filozofên Yewnana Qedîm tîne bîra merivan.

- Lawikno, we xêr e ? Ew nêzîkî me dibe.
- Şikir xêr e, apo ! Kinyaz dibêje û paşê dibişire, em li hizna bavê Selah-ed-dîn digerin.
- Çi... ? çi... ?

Telpek ewrê reş û tarî li berfa serê Agîrî diale û em difikirin ku dê zûtir baran bê. Şivan rê li ber me digire û dixwaze ku em dagerine gundê nêzîk û bibine mîvanên wî. Diyar dibe ku kurê wî xwendekarê Kinyaz e. Ew ji erdê heta esman ji Kinyaz razî ye, di dilê wî de Kinyaz padışah e, di nav gelê me de serê pêsekiniya ne, pêşewitîyê kultura kurda yê Sovyêtîyê ye û aha ew sond dixwe ku êdî me bernade heta ezet û îkrameke hêja neke. Lê ew derecke herî bingehî de bi derengî ketiye. 2000 salî, 1500 salî, 1000 salî, 800 salî bi derengî ketiye. Divê ew xwe bavêta ser destûpiyê pêşiyê pêşîyan ku ew xizmetê ji gelê xwe re bikirina, neçûna ji xelkê re nav û tarîx qezenc nakirana. Divê ew li van devera biçûna hêsiya Selah-ed-dîn û bavê wî, nigin û golik li erdê xista ku ew li ser xwîna xwe bikeliyana, vegeriyana. Lê îro rastî ew e ku roj êdî dadigere û herke em bixwazin jî nikarin herin herne mîvaniya şivên. Çunkî saetekê-du şun de li Yêrêvanê, li mala nivîskarê Ermenîstanê dê civîna nivîskarê kurda pêk bê ku Kinyazê Îbrahîm divê derheqa rewş û tandansên pêşveçûna edebiyata kurd ya Sovyêtî de teblîxekê bixweyine.

Hê di sedsaleya 11. de, Kela Sêvîliyê li Sûriyê bi navê Kela Kurda dihat naskirinê. Lê wê ci da me ? Belê, Kela hiş û jêhatîbûna mîra ne ku divê kul û derdêne me kêm ke, geşî û şahî li nav melûliya xwîna me ya neteweyî xe. Aha li hindava Kinyazê Îbrahîm wisa difikirin, dinivîsin sedrê tifaqa nivîskarê Adîrbêcanê, akademîk, mîrxasê xebata sosyalistiyê, nivîskarê navdar Mîrza Îbrahîmov, û sedrê tifaqa Ermenîstanê, «'laûrâtê prêmî» (paya dereca pêşîn) a RSS Ermenîstanê ya dewletê, nivîskarê naskirî Vardgês Pêetrosyan, akade-

mîkê kurda yê Sovyetê yê pêşîn Kîmyagerî naskirî Nadirê Kerem Nadirov, profesorê kurd, folklorzan Heciyê Cindî, endamê meqaledarê akademiya Tifaqa Sovyêtê yê ilmê pedagojiyê, dînyazanê naskirî, rektorê Enstituya Yêrêvanê ya pedagoji ya dewletê ku li ser navê X. Abovyan ; Lêmvêl Valêsan, akademîkê akademiya Iraqê yê ilman, zimanزان, serwerê kabînêta Enstituya Lenîngradê a Rojhelatzanî beşê kurdzaniyê ya akademiya TRSS ya ilman Qanatê Kurdo û gelekên mayîn. Lê me badilhewa navê ewladêne gelên cihê cihê, bi bîr neanîn. Kinyazê Îbrahîm ji bilî zimanê dê wisa jî zimanêna azerî, ermenî, ûrisî, tirkî û farisî baş dizane, serederî li erekî û çend zimanêna gelên Asya Navîn jî dike.

- Camêr, hun çîma ha dikin ? hun çîma bê nan û av bi rê dikevin ? Şivan dîsa li ber me zarî dike, lê em careke dinê jî bala xwe didine wan kelefan ku ji wî bajarî kavil mane û ku ji wê deverê rojekê Selah-ed-dîn Eyûbî derket çû...

Paşê em xatirê xwe ji şîvîn dixwazin û berê xwe didine Yêrêvanê. Ji dûr ve êdî roniyêna bajêr dibirisin, dikenîyan... Barana havînê çipeçip davêt...

# PINCAR

**Hesenê METÊ**

Bi roxweşî û tavêن barana sê mehêن buharê re, hinek giyayêن çolê jî bi tenan re derdikevin rûyên zeviyan. Kal û pîrên me Kurdan jî her wekî gelê din (û meriv dikare bibêje bêhtirîn jî) kifş kirine ku, ji van giyan hinekêن wan dête xwarin. Bi tevayî ev giyayêن ku tenê xwarin di nav xelkê de bi navê «PINCAR» ê tête nasîn. Her babetê vê pincarê jî, bi navekî taybetî tête navandin.

Pincar, di nava xelkê de *roleke pêxwariniyê* dilîze. Anglo herwekî qatix bi nan tête xwarin. Hinek babetêن pincarê xavî û hinek babetêن wê jî dête kelandî tê xwarin. Dîsa ji hinek babetêن wê tête hiskkirin û hinek babet jî bi terî tête xwarin. Li ser vê yekê em dikarin bibêjin ku pincar, ne bes pêxwariniya her sê mehêن buharê ye ; dikare di her mehêن salê de jî bête bikaranîn. Bi taybetî xwarin an pêxwariniya gundiyan e, lê bajariyêن me jî jê *îstifade* dikan. Min gelek caran bi çavêن xwe dîtiye ku gundî, di çûyina xwe ya bajêr de tûr û têrêن xwe ji pincarê dagirtine û ketine riya bajêr. Ev, an ji bona firotinê an jî ji bo nas û dostêن xwe yên bajarı, bûye.

Em di vir de baş têdigihêن ku pincar, di her demêن dîrokê de ; di tengasî û fereyî, di hebûn û tunebûn, di serhildan û melûlketin, di şikestin û serketina (ku heta niha serketina xelkê Kurd ne bû be jî) xelkê Kurd de, li çiyan, deşt û berêن newalan ew bi tenê ne hiştine. Her dem bi wan re bûye, ji kêf û qehra wan bê par ne maye... û heta iro jî.

Bi rastî jî, pincar ne ku tenê ji me Kurdan re bûye pêxwariniya ber nanê tîsî. Bi qasî vê ji me re bûye *kultur* jî. Em hemî jî dizanin ku gelek kilam, çîrok û metelokêن me li ser pincarê jî hene. «Pîrê nemire buhar tê ; kalo nemire pincar tê».

Ji hêleke din ve, hatina buharê an berhevkirina pincarê, ji bo keç û bûkêن me dibê sedemêن derketina ji mal û seyrangehê. Buharan keç û bûkêن me (carna xortêن me jî) ji taştıyan hete roava li nav zeviyan, li dor kelem û bendar

û li ber qeraxên newalan pincarê berhev dikan. Ev rewşa, ji keç û xortan re dibe ciyekî *randewûyê jî*. Û pir keç û xortêne me hevûdin li van derna dîtine û revandine. Ev jî bi navê «Çüyina pincarê» bûye. Her wekî ku kilama «Bila nata ev buhara sala îsal» hêsrên gelek dêyan rijandiye. Dîsa, ku keçek bide pey xortekî, mîna tinazekî ji dê û bavê wê re wusa dête gotin :

*Xalê Zilfoyê neçar,  
We qîzek da wek her car,  
Ne hûn bin ne jî pincar.*

Ku em guhêñ xwe bidin keçikek ku li mal maye, (ne zewucî ye) wusa dibêje :

*Kerengo reng bi rengo  
Buhar hat bi heft rengo  
Serê xwe derxe li min derengo*

Dibe ku ji van çarînên tinazî an henekî, li hin navçeyêñ Kurdistanê neyête bikarhanîñ. Ez bi xwe jiyame ku di zaroktiya me de, tev keç û lawan ; em li ser banan û di nava kuçan de bazdidan û me digot :

*Tolikê dixwim tol dibim  
Ser xanîkan hol dibim*

Lê me hemiyan ji guhdariya kilama «Tolikvanê Meyro» kiriye û vê kilamê jî, dengbêja me ya bi nav û deng Meyremxan dibêje :

*Girxopanê bi sîr e  
lê lê Meyro  
Va siwara hîre-hîre  
Tolikvanê Meyro...*

Me goti bû ku kurteçirokên me jî, li ser pincarê hene. Lê nivisandina çirokan ê gelek cî bigirê. Ji bo vê yekê jî, em di ser çirokên ku li ser pincarê hatine gotin re gav dikan. Tenê em dikarin bibêjin ku bi rastî jî pincar, bi her awayî di nava xelkê me de bi cî bûye. Ev gotina jî ji destana Memê Alan:

*Ji berê da heye gotineke mezinan û kalan e.  
Dibêjin : Tu caran bawer nabe bi jinane,  
Dilê wan giş mîna tayê kerengane,  
Ba, kê derê bixwaze, wê da dibe bi rojane.*

Ev gotina, ji bo (jinêñ) sersivik, bêbiryar û durû dête gotin. Bi rastî jî dema ku kereng hişk dibe, bêrûmetiya xwe jî bi xwe re tîne. Bi ba, nanoz û talazê re ji koka xwe dibe û heta newal, gelî û taldan tot û gir dibe, diçê. Di vê warê pincarê de bi kurtebêj, ez dikarim bibêjim ku pîrên me li benda buharê, kalêñ me ji bo xwarina pincarê, keç û xortêne me jî ji bo dîtina ser û çavêñ yarê nûbuharêñ sala dipêñ. Anglo hatina buharêñ nu, dilxweşîya xelkê me hemiyan e.

Min dixwest ku bikaranîna hemû babetê pincarê binivisînim. Lê ê bi serê xwe niviseke dûr û dirêj bûye. Ji ber vê yekê jî, ez du babetê pincarê tenê kat dikim ku xelkê me çawan bikar hanî ne.

**XAZÎG :** Du babetê xazîgê hene. Jê yek ; xazîga morik ku li nava zeviyên cotkirî û şûvan tê. Û jê yek jî ; xazîga spî ye ku ev li beyaran û pirtirîn li çiyan û di nava keleman de tê. Heta meh û nîvekê ber xwe dide. Xazîg bi şikil, mîna tayêñ deziyê solan e. Dema ku dête hûrkirin û şûştin, avek mîna gilêzê jê diherike û kef dide. Xazîg bi tenê jî, di rûn de dête sorkirin û dête xwarin. Meriv dikare hêkan jî bavêjin ber û wusa bixwin. Xazîg di ber girarê de jî dête hûrkirin û wusan bi kar tê. Mîna ku xazîg bi têrî dête bikarhanîn, meriv dikare hişk bike û li zivistanê jî bi kar bînin. Lê xazîg, xagî nayête xwarin.

**KERENG :** Pirtirîn li nava zeviyên hajotî, li çiyan repin, li erdêñ tarî (axa spî û boz) û li çiyan şîn dibe. Meriv dikare bibêje ku ji xêndî mîrg û erdêñ bi av, li her cî û warî pir-hindik tê. Kereng bi navîna meha cotan, hetanî dawiya meha gulanê jî ji bo xwarinê bi kar tê. Kereng him xagî dête xwarin û him jî bi çend babetan dibe şîv. Kereng berê dête xaşandin û dûre di rûn de dête sorkirin. Ku hebe, meriv dikare çend hêkan jî bavêjin ber û bixwin. An jî mast lê kin û bikar bînin. Ev, xwarin an şîvîn ji kerengê bûn. Lê kereng wekî din jî bikar tê. Meriv dikare hur ke û bavêje ber gêrmiya meyir jî. Min bi xwe ne xwariye lê li gor gotaran, dagirtina kerengê jî dibe. Dibe ku kereng, bi çend curêñ din jî were bikarhanîn. Marîfeta kerengê hîna jî dikare bidome. Ji hêlek din ve, ji şîrê kerengê benîş dête çêkirin. Dema ku kereng êdî dibuhure û ji bo xwarinê navête bikarhanîn, şîrê ku di qurmê kerengê de tîrtir dibe. Kerengnas di vê wextê de, dibirin wek miştaxe li ber tava royê hişk dikan. Şîrê ku ji qurmê kerengê diherike, piştî demekî xwe digirê û dibe benîşt.

Me di van herdû babetê pincarê de jî dît ku, hinek babet bi xagî, hinek him xagî û him jî dête serdan, kelandin an sorkirin. Hinek babetê pincarê jî tenê dête kelandin. Wek tolîk, gwîriz, şêlmok...

Niha navêñ pincara ku ez dizanim ev in : Pung, Kereng, Reşatik, Axpandır, Kerbeşik, Tolik, Şeng, Gwîriz, Xazîg, Şêlmok, Pariyê keko, Nanê çûçê, Derziya leglegê, Kahrî, Xerdelik, Şîrim, Mendik, Lêxendûr, Tûsik, Carçarik, Zeynebok, Serspîcik, Lûşik, Tirşo, Kerbeşik, Sîrmastik, Çexşûr...

Pincarvanêñ xelkê me, hinek giyayêñ ku dişibin vê pincarê jî, nasîne. Ji bo ku xelk wan bi kar neyîne, navêñ heywanan lê kirine. Ser qisê :

Tirşo	a - Tirşoyê merivan	b - Tirşoyê ga
Kerbeş	a - Kerbeşika merivan	b - Kerbeşika keran
Xazîg	a - Xazîga merivan	b - Xazîga kûçikan.

# **ÇIROKEK FOLKLORİ**

## **KEÇA GAVAN Û KURÊ MİR**

**Musa KAVAL**

Kurê wî bûye bisparî, hatiye li jinan. Mezinên, rusipiyêñ bajêrî, carcaran ji mîr dipirsin : «Ka kengî, şahiya jinhênan kurê te dikin ?» Giregirêñ bajêrî ewêñ ku keçen wan lişû hene, berguhê bavê wî ve davêjin ku ew dixwazin keçen xwe bidine kurê wî.

Keçen ku bi canitiya xwe ji hemî keçan bi nav û dengtir û malbat mezintir di- guhvecinîne ha evro ha sibê, belkû xwazgîniyêñ wan bêñ, wan bixwazin ji bo kurê mîr Behram. Lê, roj di derbaz bin, meh di derbaz bin, Behram çu caran nikare bersîva pirsên xelkê bide. Ne ew bi xwe, ne jina wî, ne jî mirovêñ wan yên nêzîk nikarin bizanin ka ji ber ci Kamiran naxwaze jinê bîne.. Her carekê ku yek jê dipirse : «Kamiran ka ma heta kengî tu dimînî bê jin ? Bo ci tu naxwazî ku em biçin keça camêrekî ji bo te bixwazin ? Bes tu bêje «e», tiliya xwe dirêj keye Kijan keçê di vê hêlê da, em dê wê ji bo te bixwazin. Kamiran ji bo hemi pirsan, her yek bersîvê, bi tenê, dide. «Min ci kiç navêñ,... vê gavê bela xwe ji min vekin !». Herkes behitî dimîne, hind ditirsin ku ewî nemîr be. Hind ditirsin ku ewî nexweşiyek nefis hebe. Kes nizane derdê Kamiranî ci ye. Lê, Kamiran bi xwe baş derdê xwe dizane. Hem dermanê wî derdî jî dizanet.

Kamiran kurê Mîr e, ji maleke mezin e, nav û dengêñ wan çûne her derekê. Rast e ji kesekê natîrsê. Kes neşê bêbextiyê, yan zoriyê li wî bi ke , lewra bavê wî mîr e, ew bêbextiyê û zoriyê li xelkê dike. Ji vî alî ve Kamiran piştrast e, lê, ji aliye kî ve tirsa wî heye. Tirsa wî ev e : eger ew derdê xwe aşkera bike, hem mirovêñ wî, hem jî xelkê sed lekan (lenetan) sed parandinan (rexnan) dê lê kin. Herkes, bi çavekî kêm dê lê binêrin. Hem ji bo xwe hem ji bo mala xwe, rûreşiyê û şermezariyê dê bîne.

Lê, gelo Kamiran dê bikare ta her û her tiştekî ji xwe mestir, di hundirê xwe de veşêre ! Ma ew kesên, ku berî wî, ketine di vî derdî de, karibûn xwe li ber êş û janêñ wî bigirin ! Kamiran jî nikarî xwe li ber wan bigire. Eger vî derdî

kesek girt, ew roj pey rojê xurt dibe, mirov roj pêy rojê jar dibe . Kamiran çend jê hat xwe li ber êşen wê girt. Lê, domahiya peydomahî, bê zar bû, hew karî xwe li ber bigire.. Hate rayê. Zora wî hate birin, derdê xwe aşkera kir.

Her wekî hozanê mezin Elî Herîrî dibê, di şereka xwe de :

*Her kesê eşiq tê eser ket  
Sed hezar perdan di ber ket  
Hemîyan dê ker bi ker ket  
Tazî û urîyan im ez.*

Kamiranê me tazî û uryan bû derdê wî aşkera bû ; berê, dê û bavê wî bi êşa wî zanîn, mirovên wan yên nêzik, jî, zanîn ka ji ber ci Kamiran naxwazî çu keçan bo xwe bibijêre. Ji ber şerman ruyên wan nagirin ji bo xelkê bêjin, derdê dilê Kamiran. Hem dê û bavê Kamiran hem jî mirovên wî, bi mehan li ber dikevin da ku ew dîtina xwe biguhêre, lê, ci tedbîr li wî nabin. Kamiran dibê : «Ev erd bi wî esmanî bikeve, ez dîtina xwe naguhêrim ; an heta hetayê ez dê bêjin bim an ji hun dê biçin ji bo min keça gavanê me bixwazin. Dilê min ketiye wê, ez evîndarê wê me. Min ne keçen axan, ne yên şêxan, ne yên melan, ne yên rûspiyan û ne jî yên maqûlan divê. Ez bes evîndarê Nêrgiza keça Cindî yên gavan im.»

Kesê nikarî Kamiran lê veke, dilê wî ji Nêrgizê reş ke. Dê û bav ketine navbera nal û bizmaran, pir û rê li wan hatine birîn, nizanîn ka dê ci bikin. Ji aliyevêkî ve dilê wan bi kurê wan ve. Roj pey rojê yê li kêmê dide, ruyê wî yê zerbûy goşt jê çûye maye hestiyê rep û rût. Ji aliyevêkî dinê, dilê wan bi nav û dengê wan ve, dikevine ber rûmeta xwe. Lewra adet û teqlidêwan nahêlin ku yekî wekî kurê wan ji maleke mezin biçe keça gavanî bi mahir ke.

Xelk yê maye şaş, dipirse ; «jî bo çî kurê mîr roj pêy rojê jar dibe ? Ji bo ci ta niha ne zewiciye ? Eve temenê wî yê bûye pirtir ji bîst salan, heval û hogîrên wî, eve sê çar sal in yên zewicîn, hindekan ji wan biçükên wan yên du-sê salî bûyin.»

Mirovên Kamiran hêviya xwe nabirin. Her caran têñ ji bo wî gotinêne ne qenc li ser Nêrgizê dibêjin : ne keçekê pir cuwan e, ne ji maleke mezin, tura wê ne ya maqulan e, em dikarin keçen ji wê cuwantir û ji malêñ mezin, ji bo te bixwazin, ji bo me şerm e ku biçin keça gavanî bixwazin, tu dê bibî serok. Ev keça ne babetî te ye, ne jî heja ye ku ew bibête xatûna welatê me. Naherê, tiştek ji van gotinan bi serê Kamiran nakeve, mîrikî bîryara xwe daye, lê nazivire, yan nikare lê bizivire. Ji bo Kamiran mirovîtiya mirovî ji her tiştekê bi bihatir e, gere ku ew li ser her tiştekê ra bête girtin. Mirov her mirov e ci ji mala maqûlan be ci jî ji maleke feqîr be.

Kamiran dixwast ku bi dê û bavê xwe bi mirovên xwe bide zanîn, bi wan bide qebûl kirin, ku pêwîst mirov hemî ; ci maqûl, ci ne maqûl, pêwîst e

wekhev bin di mafan de, pêwîst e ku siyaneta mirovan bête girtin ji ber mirovîtiyê, lê, ne ji ber tuxmê wan yê civakî.

Mirovên Kamiran bûne du cun. Cunek bi serokatiya dîya wî hatine ser dîtina Kamiran, bûne tagirêن vê jinanînê. Ew jî wekî Kamiran dibêjin : «Rast e mirov her mirov e ci ji mala maqûlan be, ci jî ji mala ne maqûlan be. Ma serên zêde bi maqûlan ve hene ! Ma maqûl ji esmanan hatine û ne maqûl ji axê derketine ! Em hemî mirov in, wekî hev in, wekhevbûna di mirovîtiyê de, ew bi tenê hêja ye ku serî ji hemî newekhevanêن dî bistîne. Kamiran û Nêrgiz hev divên, dixwazin hev mehir kin. Kesê maf nîne li dijî vê birtyara wan rabe, lewra mirovîtiya mirovî, xeştivîtiya (izeta) mirovî, na be ku bibe leyîztika di destêن hinde kesên dî de, tiştên ku parçek in ji kesîtiya mirovî, çê na be ku kesekî dî bê, xwe têkil bike.» Cuna diya Kamiran hemî delîlan tînin, dixwazin dîtina xwe bi xelkê bidine qebûl kirin. Dibejine xortan yên ku hêj jin ne anîne : ma jin hênan ji bo şevez û rojekê ye ! Jinhênan, an ku bijartina hogireke ji bo jîna xwe, da mirov pê şabin dil geş bin bi hevra xweşderbaz kin, ji bo xwe binyatê deynin, biçûkan çêkin. Çewa mirov dê bikare bi kesekê re bijî eger ew ne bi daxwaza mirovî hatibe bijartin ! Ev gotine baş diketine serê xortan, lê, qet nakevine serê mirovên sere (navsalî) ji ber vê yekê piştgirêن diya Kamiran, ji xortan pir dibin.

Cuna dî , bi serokatiya bavê Kamiran li dijî vê dîtinê dirabin : «Nexêr, ev tişt di bînî de nabe, maqûl maqûl e û nemaqûl nemaqûl e ; heryek ji tuxekê ye, çenabe ku yêkî wekî Kamiran kurê mîr, keça feqîrekî wekî gavanê me bixwaze ! Ev tişt hem bo me şerm e hem jî ji bo nifşê me kemasî yê. Eger ev mehirkirine çêbibe, em hew dikarin serê xwe li ber maqûlan û xelkê bilind bi kin.»

Ev girifdariya ha roj pêy rojê mezin dibe. Ji nav mirovên malê derbazbû, kete nav xelkê jî û belav bû. Vêca xelk jî bû du cun, cunek çû ser tayê diya Kamiran ya dî jî çû ser tayê bavê Kamiran. Heçîke gavanê belengaz, ew bi xwe ve maye heyirî, nizane ka dê ci bike, navê wî ye ketiye devê herkesê. Hindek ji bo xwe pê dikinin, çaxê dibînin gotinêن tehl dibêjin wî, kirêtiyan pê dikin. Hindekên dî, guneha wan pê tê. Nemaqûl yên ku hişen wan piçek dixebeitin, pir keyfxweş in ku keça gavanî bibîte bûka mîr. Ewêن ha piştgiriya diya Kamiran dikin, umîda wan ew e ku barêن wan piçek siviktir bibe. Belkî ev jinanîne bibe pêngarek ji bo anîna hindek azadî yê ji bo nemaqûlan û ji bo peydekirina hindek ji wekheviyê di navbera maqûl û nemaqûlan da. Lê ne maqûlên mêtîreş, ew pir jî gavanî û ji keça wî dienirîn. Ew jî ber piyêن xwe wêvetir nabînin. Kula di dilê wan de çav pê nera bûne, çewan keça gavanî dê bibîte bûka mîrê me ! Paşê ew dê ji me biqedirtir û siyanetir keve.

Heçîke Nêrgizê, derdên wê ji yên herkesê pirtir in. Ji aliyekê ve dilê wê dişewite ji bo evîndarê wê (Kamiran), ji alîyekê din ve dilê wê bi bavê wê ve, ku bûye beniştê devê herkesê, ji alîyekê dîtir ve, ew ji jîna xwe ditirse ; gefen mirinê lê têne kirin, dibe ku ha ewro ha sibe bête kuştin da ev girifdariye ji navbera xelkê rabe. Lê kuştin, kuştina Nêrgizê ne çareke durist e, lewra kuştina wê dê vê girifdariyê mezintir ke ; dibe ku her du cun bi hev bikevin gelek kesen dî bêne kuştin. Eger Nêrgiz bête kuştin, dibe ku Kamiran bi xwe, xwe bikuje, yan hindekan ji mirovên xwe bikuje.

Roj her derbazbûn, girifdarî her mezin bû. Hindek ji rûsipyian gotin gere em li çarekê bigerin, vê girifdariyê bitemirînin. Baş e em çi bikin ? Ci ne kin ? Ci çare em dê karî bibînin ? Piştî civîneke dirêj, du dîtin hatine qebûl kirin :

– Mirovên xwe şandine nik şêxan û melan, ji rex wan fetwe anîn, li gora wan fetwan, şerî'et hevmahirkirina Kamiran û Nêrgizê dirust nake ; lewra ew ne hemkufêñ hev in.

– Her wisa, mirovên xwe şandine nik hindek şêxên û melayên dî, ji rex wan nivîstî dane çêkirin da dilê Kamiran ji Nêrgizê bidine reş kirin. Lê eger, ew çara ku mirov dixwaze, bi wê, girifdarî yekî pûç ke, ne çareka dirist û rast be, ew çare wê girifdariyê pûç nake, belkî hindî dî dê wê mezin ke û aloz ke. Ji ber vê yekê, ne nivîstiyêñ melan û şêxan, ne ji fetwayêñ wan karîn çarekê bibînin. Ne ku bes çare nedîtin, belkî girifdarî alaztir kir û pirtir mezin kir.

Vêcarê melan û şêxan ew ji di nav xwe de bûne du ber, berekê hevmahirkirina Kamiran û Nêrgizê baş dît, pişgirtiya wê kir. Bezîne kitêb û hedîsên xwe, fetwa derxistin, li gorî wan ev hevmahirkirin durist e kes nikare li dij raweste. Bera dî, piştgirtina Bavê Kamiran kirin, ew ji çûn kitêb û hedîsên xwe anîn ; wan ji fetwan derêxistin, li gorî wan ev hevmahirkirine ne durist e ; ji ber ku hemkuñ nîne di navbera Kamiran û Nêrgizê de, welî-el-emir, dikare li dijî vê hevmahirkirinê raweste û wê qedexe bike.

Ev hevrikiye, ne hevrikiyek biçûk bû. Lewra, eve cengek bû di navbera dad û bêdadiyê de, di navbera wekheviyê û ne wekheviyê de, û di navbera kevneparastin û nûparastiyê de. Ji bo girifdariyên wekî vê, çare dîtin ne bi sanahî ye. Ci hevrikiya ku çêbibe di navbera dad û bêdadiyê de, çare li wê nabe, eger berevaniya bêdadiyê bête kirin. Ci gava dad bi ser ket û bêdadî baş bi bin ket, wê gavê girifdarî namîne û hevrikî radibe. Vê hevrikiya ha kêşa, dirêj bû û belav bû di nav hemî xelkê de. Lê xurtîtiya her du cunan nema her wekî berê, guhêrînek, hûrik-hûrik, di keve nav xelkê, xes nayête dîtin, lê berdewam e.

Tiştik, çend hêdî-hêdî ji, ku ji biçûkîtiyê bi ber mezinbûnê ve biçêt, eger vêçonê dirêj kir, mirov dê hindê bibîne ku ev tişte mezin bû, berî mirov tê bînîte derê. Her wisa tiştik çendî mezin ji be, ku bi ber biçûkbûnê ve biçe-bila ev cone pir hêdî-hêdî ji be, eger wê dirêj kir, tu dê ha dibînî ku ew biçûk bû, yan mir bê ku mirov tê bînîte derê.

Di girifdariya me de, ji ber ku, başdîtinê xelkê li ser hevmahirkirina Kamiran û Nêrgizê, hêdî hêdî pir dibûn, û bi vî awayî kêşa. Piştî demekê, cuna diya Kamiran, hew xwe dît ku behra pirtir ji xelkê piştiyan in û tagir in ji bo wan. Ji aliyekê dî ve bavê Kamiran hew xwe dît ku kesekî wecgir li pişt wî ne maye. Hem dîtinê xelkê, hem jî yêne gelekan ji mirovên wî hatibûn guhêrîn : hindek bûbûne hevalên cuna diya Kamiran, hindek jî bêrex bûbûn.

Mîr berê xwe dayê ku roj pey rojê hevalên wî kêmtiler dibin, tırsa ku piştî demeke nedûr, ew bi tenê bimîne, yan li dijê wî gihurîn bêne çêkirin. Ji ber vê yekê, biryarek derêxist, di wê de, bi xelkê da zanîn ku ew ji niha û paş ve li dijê hevmahirkirina Kamiran û Nêrgizê naraweste û got kurê min bi dilê xwe ye çi gava bixwaze bila daweta wî bête kirin.

Bi vî awayî çarek hate dîtin ji bo vê girifdariyê, bêdadî bî bin ket, dad bi ser ket. Xelk keyfxweş bûn, Kamiran keyfxweş bû, Nêrgiz dilشا bû. Herkesê bawer kir ku, ji çu aliyan ve, çu asteng neman ji bo hevmahirkirina van her du evîndaran.

Ji ber vê hêngamê, ji ber van serketinan û binketinan, hindek hizir hatibûne guhurîn, hindek pûç bûbûn, hindek jî nû çêbûbûn. Hindek girêyên psîkolojî hatibûne vekirin hindek jî nû çêbûbûn. Çaxê ku hevrikî di navbera du bevlan de çêdibe, ger çi yek ji wan bi serkeve, zora yê dî bibêtin jî, lê, dîsan ewê ku zora wî hatiye bin, ew jî, çi kêm, çi pir, şûna xwe dihêle.

Piştî biryara mîr, du bendî nema : ne di navbera mirovên wî de, ne jî di navbera xelkê de. Ji vî alî ve çu asteng neman. Birekî mirovan ji giregirên bajêrî, çûne mala gavanî, ji bo xwastina Nêrgizê ji kurê mîr re. Piştî rûniştin, -heke tiştek xwarin, vexwarin yan ne- her wekî adetên Kurdan yêne kevin dixwastin, xwazgîniyanbihneke sohbet kirin, paşê gotin : «Em yê hatine mala te, digel teqdîra Xwedê keça te Nêrgizê dixwazin ji bo Kamiranî kurê mîr.» Her kesê hizir dikir ku bersiva Cindîyê gavan dê ev be : «Keça xwe Nêrgizê, qurbana pêlava mîr dikim. Ma heke Cenabê Mîr, min ji rengê xizmîtiya xwe bibîne, vê rûmetê bidete min, ez li ser serê xwe û çavê xwe, daxwaza mîrê xwe bi cih dikim. Ma ez dîn bûme !»

Lê, Cindîyê gavan, bersiva xwazgîniyê keça xwe nevegêra herwekî herkes li hêviyê bû. Ji ber vê duberiya mezîn, kû çêbûbû, li ser mesela zewaca keça wî, gavan pir bi nav û deng bûbû, hem di hundirê hêla mîr de, hem jî ji derveyî wê, navê Cindîyê gavan ketibû ser hemî ziman. Cindî, pir mezîn bûbû di hundirê xwe de, girêya mezînatîyê jê re çêbûbû. Ji xwe nefsa mirovî nazik e ne xwe li ber sermayê digire ne jî li ber germê. Heke hînî yekê ji wan bû, xwe li ber ya dî, xweş-xweş, nagire. Çawan, Kamiran evîndarê bo Nêrgizê, gavan jî wisân yê bûye evîndarê dengvedana xwe. Rast e ji heqê herkesê ye ku siyaneta wî di civatê de hebe û ji heqê herkesê yê ku ji bo xwe li navûdengan bigere ; lê pewîst e ku mirov tixûban nas biket ! Ew dixwaze ku navê wî her di devê xelkê de be, eger ev girifdarî nemîne, an ku eger ev

zewace çêbû, paşê, navê min hew, di nav xelkê da belav dibe, kes ji niha û paş ve bahsa min nake. Belkû gavanî wisa ji bo xwe dihizirî, ewî ji bo xwê digot : «Berî niha bavê Kamiran mahirkirina kurê xwe û keça min nedixwast ; vêcarê dor ya min e, ez naxwazim ku ev hevmahirkirine çêbibe.» Gavanê me, di hindirê xanîkê xwe yê yek tebeq de, di oda xwe de, cara yekemîn e ku rûspî û giregirên bajêr dibîne, yên hatine keça wî ji kurê mîr re dixwazin. Çavê hemiyan li devê wî, li hêviya bersîva wî. Gavanî devê xwe hêdîka vekir, gotineke kurt lê pir xurt ji devê xwe avêt, vê gotinê herwekî jehrê, bîhna vê civata hazir girt. Bavê Nêrgizê gote xwazgîniyên keça xwe : «no, ez keça xwe nadime Kamiran.»

Ev civate şaş ma. Hindekan ji kerban berdane keniyê ; bû tîq-tîqa wan, hindan, bû ping-pinga wan, serên xwe hejandin, hindan bu çîre-çîra diranên wan, ji bihntengiyan, dixwazin gavanê xwe bidanan bi xeniqîn. Kesê bawer nedikir ku Cindî, ji rastî dibêje «no», lê, eger, eve yarı jî be, dîsan ev yarıyên wekî vê û di gavêni wisan de, nabe bêne kirin. Nexusime yekî wekî gavan, vê yarıyê biket digel giregirên welati. Gavanî baweriya wan anî ku ji dil dibê «no», bi dubarekirina bersîva xwe, xwazgîniyên Nêrgizê bi wan ser û dilan ve zivirîne kocika mîr. Ev kirina gavanî bû ciriset kete guhê herkesê, xelkê vêca dest pê kir bi xirabî û bi neqencî behsê gavanî kir. Kes nema ku dilê wî bi Cindî ve bişewite yan ji wî berevaniyekê bike. Berî niha hem mala mîr, hem ji xelk bûbûne du bendî, hindan dixwast ev hevmahirkirine çêbibe, hinan nedixwast. Piştî biryara mîr, ev du bendî nema, lê, piştî biryara gavanî, careke dî dubendî çêbû, lê, ev dubendiya nû ne li ser bingehê berê ye, ne jî, nifşê wê wekî ya berê ye. Vê gavê hemî kes bi tevayî vê hevmahirkirinê baş dibînin, lê, dê çawan Nêrgizê ji bo Kamiran bînin, piştî ku bavê wê nerazîbûna xwe diyar kiriye ? Ev dubendiyên nû ji ber vê yekê hatiye meydanê, hindek dibên : gere ku çend kesek biçin Nêrgizê ji mala bavê wê bîne mala rûspiyeke û dest bi hazirkirina daweta wê û Kamiran bête kirin, eger gavanî her xwe nerazî kir, bila ew baş bête kutan û paşê dest û piyên wî bêne girêdan, bête avêtin di binê zîndanê de. Hindek, dibên ev tişte ji bo me şermeke mezin e, eger em wehe bikin, ji bo me çu siyanet namîne, xelkê biyanî dê lomên me bikin, dê bêjin : «Behram çend mîrekî stemkar e, çû keça gavanê xwe bi zorê ji bo kurê xwe anî, paşê em hew dişen serên xwe li ber xelkê rakin.

Piştî heyamek derbazbû careke dî Behram hindek ji giregirên bajarê şandine mala Cindî ji bo xwazgîniya keça wî, lê vêcarê jî Cindî «no» ya xwe, herwekî berê, wekî bimbekê peqenad, dîsan ew bêhêvî ji mala xwe şandin. Kamiran, çaxê, ev xeberê zanî, ji ber kerban, nan û av xweş bi qirikê da ne diçûn. Nizane ka ci bike. Heçîke Nêrgizê, ew, wext e ji qehran û ji xeman bimire.

Gelo, ma tiştek heye ku tedbîr lê neyête kirin ! Kevnegotineka kurdî dibê : «Tedbîr li her tiştekê dibe, bes li mirinê nabe.» Belkî herkesê ev kevnegotine pir caran bihîstibû lê, kesekê wekî Bedel baş bawerî pê nehatibû. Ev mirovekî imûdvan bû, zû hêviya xwe ji karina pêkanîna tiştên kirinzor ne dibirî. Wî bawer dikir ku mirov bizanîna xwe û bi karîna xwe, ji hemî tiştan xurtir e. Eger mirov zanîn û karînê li ber hev bîne û wan herdukan bi rastî û diristî bi hev re bidete xebintandin, dê şolêni kes nedîtî peyda ke û çêket. Bedel ji xwe bi aneh bû, baweriya wî bi xwe dihat, wer dikir ku ew dikare şolêni ji hemiyan zortir biket, girifdariyêni ji hemiyan aloztir, caran ji bo wan bibîne. Ewî bi vî awayî bawerî bi xwe dihat, ne ji ber malê xwe bû ne jî ji ber mirovên xwe bû. Lewra ew mirovekî xizan bû û ne ji maqûlan bû. Ewî bawerî bi xwe dihat ji ber pirjîriya xwe, ji ber hiş û bîrên xwe ên dijwar, ji ber tecribêni xwe di jînê de. Bedel ji xwe î bi aneh bû, ji bo xwe got : «Ma bo çi ez naçim xwe biceribînim, keça Cindîyê gavan ji bo kurê xwe bixwazim ?» Bedel dizanî ku, eger, ew bi vî tiştî rabe xelk hemî dê bi wî bikenin, dê yarıyêni xwe pê kin, dê bibêjin : «Ev mirov dîn bûye ; ew gavanê ku xatirê mîr û xatirê hemî mirovên mezîn negirtî, gotiye wan hemiyan «ez keça xwe nadime Kamiran, dê çawan xatirê Bedel bigirit ? Û dê çawan bi xwastina wî keça xwe bide kurê mîr.» Bedel di pêsiyê de dizanî ku xelk dê evan gotinan bêje. Lê, ji ber ku ew ji xwe bawer bû ku dişêt vî şolê bike, xwe jê ne da paş. Bedel, li delivekê geriya ku pê wê biçite nik mîr da ji wî destûra xwastina keça gavanî ji bo kurê wî wergire. Çarekê wekî deliva xwe dî li nik mîr. Bedel gote mîr : «Eger mîr destûra beniyê xwe bide, ez bawer dikim ku ez dê karim gavanî bînim ser rê.» Çaxê Bedel ev gotine got hem mîr, hem jî kesen li rex wî mana şaş û ecêbgirtî. Mîr ma hizra xwe kir, piçekê girnjî, berî ku biaxive çavêni xwe li civatê gera.

Herwekî dixwast ku hindek ji haziran bersîva Bedel bidin, çend kesan ji mezinêni kockê dest bi axaftinê kirin ; bi awakî kêmdîtin û pêkenîn, dî gel Bedel axiftin : «Bedel beg ! Ez benî ! Ma tu kengî hind mezin bûyi, ku tu biçî ji bo kurê mîr jînê bixwazî !» Bû tîq-tîqa civatê, hemiyan berdane keniyê, herkesê ji bo xwe gotinek avête Bedelê belengaz : Bedel ne tu bi xwe jî dizanî ku giregirê bajêr hemî çûne mala gavanî ji bo xwastina keça wî, dîsan, wî, ew hemî şikandin û xatirê wan negirt, vêga tu bi çi rûyî têy dibêjî mîr : «Ez dikarim keça gavanî ji bo kurê te bixwazim !...» Bedel qet rengê xwe xirab nekir, qet li ser hiş û hemdêni xwe neçû. Careke dî, berê axaftina xwe da mîr : «Mîrê min, bes ez dixwazim ku mîr, ji dewla serê xwe min ji rengê xulametiya xwe bibîne, destûra min bide ku ez digel gavanî biaxivim li ser vê meselê, bila ev axaiftina min bi awayekî kesitî be, ne bi aşkera be, bi navê mîr be.» Mîr ma, her hizra xwe kir, ji bo xwe got «Ma ji bo çi na ! Bila ew jî biçe xwe bicerbîne.» Mîr gote Bedel : «Baş e, here digel gavanî biaxive, lê, ne bi navê min, heke te karî wî bînî li ser rê, aqilê wî bîniye serê wî aferîn ji bo te. Ez dê,

paşê bi çavekî dî li te binêrim. Bedel pir keyfxweş bû, çû destê mîr û piştûpişt zivirî heta ber derê kockê.

Bedel, wekî xwazgîniyên ku berê çûbûn xwastina Nêrgizê nekir. Ew soresore neçû bêjite gavanî ezê hatim keça te ji bo kurê mîr dixwazim. Bedel dizanî ku eger ew bi vî rengî biçe xwazgîniyan, bê goman, gavan, bersîveke pir tehil dê dête wî. Ji bo ku ew digel gavanî, bi awakî nerm û hostayî biaxive, gerya li delîvekê. Bedel gerya, da cihekê û gavekê bibijêre û di wan de, digel gavanî biaxive. Bedel dizanî ku bijartina cih û gav mercek girîng e, ji bo kirina her tiştekê û ji bo karina pêkanîna wî bi awayekî baş. Ji ber vê yekê çû zerevanî li gavanî kir. Her wekî gavan li çolê, li ber dewaran dima, Bedel jî çû çolê li nik gavanî, ji bo xwe sohbet kirin, li ser çêrandina dewaran, li ser karên rojê. Bedel dixwast ku digel wî biaxive, bi awayekî kesdarî, bê ku gavan çu şikan ji wî bibe. Carekê gavan, ji bo destava xwe bike, çû pişta berekê, dest bi mîztiñê kir, Bedel çû ji wî wêvetir, ew jî li pişta berekê runişt, dest bi mîztiñê kir. Bedel ev gave baş dî ji bo axiftinê li ser mesela keça wî û kurê mîr :

**Bedel :** Cindî, minbihîstiye ku mîr dixwaze keça te ji bo kurê xwe bixwaze, eve rast e ?

**Cindî :** Erê, berî çend heyaman giregirêن bajarî du caran hatin xwe avêtine nav mala min, hîndî hêvî lavahî ji min kirin, ku ez keça xwe bidime kurê mîr, lê, min keça xwe ne da Kamiran û ez nadim.

**Bedel :** Ji ber ci tu naxwazî keça xwe bidî Kamiran ? Ma keça te bi wî ne qebûl e ?

**Cindî :** Belê wela keça min pir ew divê, eger ez wê bidime Kamiran dê ji keyfan bifire, lê, ez nadim, ma ne keça min e, ez bixwazim didim ne-xwazim nadim, ma kesê çu heq li ser min heye ?

**Bedel :** Erê, kesek e heq li ser te heyî, keça te heqê li ser te heyî, wê heqê heyî ku şû biket bi kesekî baş û bi dilê xwe, herwekî Kamiran bi dilê wê ye û kes ji wî baştir nîne, ji mafêñ wê ye û ji mafêñ Kamiran ku ew hev mahir kin û te heq li ser wan nîne ku şahî û dilxweşıya wan bimîrînê, ma te serê keça xwe divê, yan ne ? Ma te çu neyarî ji bo wê heye, yan ne ?

Gavan ma, pir hizira xwe kir, di dilê xwe de ev pirsan dubare kirin, paşê got : Eve ci pirs in tu ji min dikî ? Çawan ez dê neyariya keça xwe bikim !

**Bedel :** Eger rast e te keça xwe divê, ji ber ci tu nahêlî ku ew bibîte xatûna vî cihî ? Ji bo ci tu li dijê evîndariya wê dirabî ? Ma tu nizanî ku ew evîndara Kamiran e û Kamiran jî evîndarê wê ye ? Ma tu nizanî ku eger keça te şû bi Kamiran bike, ew dê bibîte kevaniya kurê mîr. Piş-tî bavê xwe Kamiran dê cihê wî bigire.

**Bedel :** Cindî, ka ji bo min bêje ji ber ci tu neyarê serê xwe yî ?

**Gavan :** Çawan mirov dibîte neyarê serê xwe, eve ci gotin in tu dibêjî ?

**Bedel :** Belê ! Mirov dikare, bi tênegihîsttin bibîte neyarê serê xwe. Herwekî mezinan gotiye : «Tênegihîsttin ji bela Xwedê mezтир e.» Belkî, di hemî jînan mirovî de, carekê bela Xwedê bête serê mirovî, lê, bitêne gihjîsttinê, mirov hema her yê di belayê de ye. Ma tu nizanî ku, eger tu keça xwe nedî Kamiran, dê nexweşiyêne mezin ji bo te çêbin, ne tu dikarî ji xwe berevaniyê bikî ne jî kes dikare ji te berevaniyê biķe, eger cu nexweşî jî ji bo te neçêbin, lê, tu dê her gavan bimînî, li çolan, li ber dewaran bijî. Hizirêñ xwe bike, eger tu bibî xezûrê Kamiran, wê gavê cihê te ev çole nabe. Cihê te dê li kocka mîr be, tu dê bibî mirovê malê.

**Bedel :** Tu çendî mejîreş î ? Tu ji bo ci van tiştan fêhim nakî ? Baş e ka ji bo min bêje ji ber ci tu naxwazî ku keça te şû bi Kamiran bike, ew bibîte xatûna vî cihî û tu bibî xezûrê kurê mîr ?

Gavan ma, hizirêñ xwe kirin cu bersîvîn cihgir nedîtin, mirûzê wî nexweş bû bû ping-pinga wî, ji bo xwe got : «Rast e ji ber ci ez na-xwazim !... Xelk hemî dixwaze, keça min dixwaze, mala mîr dixwazin, kurê mîr evîndar e, bes ez naxwazim !» Ev gotinêñ ha, di bin lê vîn xwe re gotin. Wekî kesekî ku tiştik ji bîr kiribe û piştî demek dur bête bîra wî, wisan gavan bi ser hişen xwe ve hat, paşê rabû ser piyên xwe, doxîna xwe girêda, Bedel hej yê li pişta berî nerabûye, got : «Bedel ! Ma şireta te ji bo min ci ye ? Tu çawan dibînî ku ez bikim ?» Paşê ev gotinêñ jêrî gotin : «Eger carekê dî mîr kesek şand ji bo xwazgîniyîn keça min, ez nabêm na, ez careke dî xwe şaş nakim, eger tu bikarî qencyiekê li min bikî, pîlanekê çêke ku careke dî xwazgînî bêñ keça min ji bo Kamiran bixwazin.»

Bedel baş bawer kir ku hişen gavanî hatine serî. Bedel êvarê zivirî çû mala mîr, çaxê ku mîr ew ji dûr ve dît, hê baş nêzîk nebû, gotê «Ha Bedel, ka bêje tu bûyî şêr yan bûyî ruvî ?<sup>(1)</sup>

**Bedel :** Mîrêm, serê mîrî sax be, bi eniya mîr kim ez bûme şêrekî mezin !

**Mîr :** Kuro ! Tu rast dibêjî ? Te ew anî ser rê ? Mîr xweş-xweş bawer nekir ku Bedel karibiye, gavan qanî bike.

**Bedel :** Bi eniya mîr kim min anî ser rê, vê gavê hişen wî yên hatine serî, eger mîr xulamekî xwe jî rêkete xwazgîniyê ew nabêje na.

**Mîr :** Baş e ! Te çawan kir vê şolê çêkî, çawan ev giregirêñ vî cihî hemiya nikarî wî bînîne ser rê û te bi tena xwe karî vî tiştî bikî ?

**Bedel :** Mîrê min her serek aqilek heye.

(1) Li nav Kurdan de vê gotinê dibêjîn, bi awayekî henekî, ji bo pirskirina tiştikê, ku mirov dixwaze bizani be, ka kirina wî pêk hat an na.

**Mîr :** Gotina mezinan rast e : «Aqil taca zêrîn e, li serê her kesê nîne.» Bedel tu mirovekî zîrek î, pêceba yî, lê, mixabin ta niha min tu nedînasî, mirovekî wekî te ji bo min çêtir e ji hezar kesên dî. Ji niha û pêş ve, tu dê li serê kockê rûnî û tu dê bibî jî şîretvanê min.

Piştî çend rojan, mîr, Bedel û çend mirovêن mezin şandine mala Cindiyê gavan ji bo xwastina keça wî ji bo kurê xwe Kamiran. Daweta herdu evîndaran hate kirin û herkes keyifxweş bû ji ber serketina dadiyê û binketina bêdadiyê.

## kitêbxana enstituyê

Kitêbxana Enstituyê dixwaze bibe hîmê Kitêbxana Neteweyîya Kurdistanê. Tê de niha bi 25 zimanan bêtirî 2600 cild kitêb hene. Hin ji van kitêban gelek kevn in, di sedsalên XVIII û XIX de çap bûne. Hin destnivîs jî hene.

Ji kovarên kevn, civanbendên (kolleksiyonên) Hawar, Ronahî, Roja Nû, Stêr û Kurdistan (Iran) temam bûne, ên kovarên din tê berhev kirin.

Di vê navê de Enstitu, belgeyên arşîvên diplomatik, film, wêne û diapozîtif, kaset û sêlikên kurdi jî dicivîne. Ta iro dora 2000 diapozîtif, 26 film û qasî 130 saet mûsîqiya kurdi hatine civandin.

Bê guman, ev hé destpêk e ; karê salekî ye. Divê ku em afirandinên li ser ziman, dirok û çanda xwe diyar kin, binasin û bi dinyayê bidin nasîn. Civandina arşîvên me yên neteweyî, dewlemendkirina kitêbxana me ya neteweyî karê her welatparêzî kurd, her Kurdeki bixiret e.

Li kitêb, kovar, film, wêne, kaset û belgeyên li ser Kurdan bigerin ; we bi ci zimanî ci peyda kir ji kitêbxana Enstituyê re bişinin. Çavên xwe li dengbêj û çirokbéjan, xasme li yên pîr, bigerînin. Stran û çiro-ên wan bigrin kasetan û ji me re verêkin. Bila, bi mirina wan, keriyek ji folklora gelê me winda me be, ji bîran neçe.

PARASTINA ÇANDA KURDİ, KARÊ ME HEMÛYAN E.

## **BİR NABIN**

**Riza ÇOLPAN**

*Bîr nabî Yilmaz  
Bîr nabî Seyda  
Ew di dilan de dijîn  
Di dilên me da.*

*Bi hezaran sal  
Derbaz bin dîsa  
Bîr nabin ew herdu,  
Têñ bîranîn wisa*

*Ew ronahî ne  
Mîna roja zer,  
Gelê Kurd re şewq in  
Tarî davêñ der.*

*Şiyarêñ gel in ew  
Rêşanêñ me ne  
Çiyayê bilind in  
Ew ala me ne.*

*Nazim Hikmet'ê Kurd  
Seydayê Cegerxwîn.  
Mirina te em kirin  
Ser reş dil birîn.*

---

\* Ji bo bîranîna yeksalî ya mirina Seydayê Cegerxwîn û Yilmaz Güney.

*Tu Nerudayê me yî  
Mîna Pûşkîn î  
Te şer dom dikir  
Ser rêça çînî.*

*Tu hozan û şâîr  
Yilmaz rejîsor.  
Mêrxasên kurd in  
Hûn her du pispor.*

*Tu û Yilmaz Güney  
Tucar bîr nabin  
Îro roja mirina we ye  
Kurd çawa şabin ?*

*Em hemû xemgîn in  
Bo we dilbişîn in  
Rizê Gur im dibêm  
Hûn di nav nûr bimînin.*

*Sydney - Australia*

# **APO\***

**Nezîr GEDO**

*Apo xebera te ez kuştım  
Dil û canê min bîrîştin*

*Xema apê xwe pir dixum  
Apo bar kir dil dijwar kir*

*Zû bû Apo ji nav me çû  
Birîn û kul li me derbû*

*Jîr û serok û zana bû  
Jîna wî tev kul û derd bû*

*Rêça apêm her kes zanî  
Bo serbestiya Kurdistanî*

*Felek çîma bi kul û derd e  
Parîs ji me re qebr û kund e*

*Kula Apêm pir giran e  
Kula wî li ser tev kulan e*

*Dijmin dîsa li me şabû  
Ji ber ko Apê me winda bû*

---

\* Têkoşer û welatparêzê kurd ê hêja Mistefa Remzi Bûcak di seva 12.7.1985 de li Parîsê wefat kir. Kurdên Fransayê hemû bi dilovani jê re Apo digotin. Yek ji wan, xortekî kurd ji Kurdistanâ Sûriyê vê helbestê li ser wî nîvîsiye.

*Gorek mezin ji Apo re çê kin  
Ji her çar aliyan gulan lê kin*

*Gulek ji Hemrîn û yek ji Wahê  
Û ji Qesrî Şîrîn û li Amed Canê*

*Gulek ji Ferhad û gulek ji Şîrîn  
Û yek ji Memê Alan û Zîna birîn*

# **STRANA PÊŞMERGA**

**Tosinê REŞİT**

*Dîlberê, yarê !  
Dijminê devxûn  
Dikin bi bîna barûdê  
Çiyayênen me bifetisînin,  
Bi dû-dûxanê,  
Dikin esmanê hêşîn reşreng kin,  
Stêrkên geş ên rûyê esmên kor kin,  
Dikin nîşana kewêner bigrin,  
Bi xûnê avê çêma havêن kin.  
Dîlberê, yarê !  
Destê min û te ji hev qetandine,  
Qidûmê çokê evîndarya me  
Şikandine,  
Ü reşa mîna  
Ewrê bi berf û baran ve avis,  
Dikin li serê te û çiya girêdin.  
Qederê, yarê !  
Rondikê reş ên çava paqîj ke,  
Serbilindî û kawî-kubariyê  
Li dora xwe raxe,  
De bira lûlê  
Tivinga rastî sîngê te kirî,  
Ber te bitewin,  
Ü ser tetikê top û reşaşa  
Bira dest, pêçiyêن dijmin neyara  
Tev bilerzin.  
Qederê, yarê !*

*Dayikê dilkeder  
Bi stranê şêr, pesnê méranyê  
Em razandine,  
Bi axîn, nalîn, hêsir û girî  
Em mijandine,  
Û guhê me da  
Tevî gotinê çîrokê çûktiyê,  
Gotinê kuştin, lêdan û zîndan  
Tim xudan bûne.  
Dotmamê yarê !  
Bîranînên tal, nav çavê me da  
Bi cûrê xûnê xwe diyar dîkin,  
Ji hêrs, eynata,  
Dema destê me gere dar bigre,  
Tivingê digre,  
Mal û avayî nîvîşkan hiştî,  
Kozik, qelaçya em hildijenin.  
Dotmamê, yarê !  
Em paşîroja Kurdistanê ne.  
Nav xûna me da  
Wê evsenetya bav û kalê me  
Dîsa fûr dide,  
Xûn ji êgnaya  
Bi hezar salî me berev kirye,  
Hundir va kel tê û diherike.  
Nav me da dîsa Kardûx û Madî  
Bi doza Kawa wê hişyar dîbin,  
Tole hildana  
Nav û méranya xwe ye bîrkirî  
Ji me dixwazin.  
Loma eger em carna çok didin  
Li ber dijmîna,  
Dêmek bona baş nîşan girtinê,  
Eger têñ kuştin,  
Dêmek tek tenê ji birîna sîng,  
Lê ne ya piştê.  
Bindestê, yarê !  
Seva zarê me bi gilyê «Kurdistan»  
Pasaporta xwe tim bixemilînin,  
Seva welatê me yî qincilî  
Perê xwe veke wek bazê sîmir,*

*Herçar perçê xwe bi rengê xûnê  
Rengekî reng ke,  
Seva tu herdem  
Serê xwe şara gevêj girêdî,  
Dengê kenê te  
Radyoyên dinê temam belav kin  
Emê xûna xwe, mînanî xûna peza 'qurbanê  
Çiyayê serbilind-netka welat xin.*

*Erivan (Yekîtiya Sovyetî)*

# PIRTÜKÊN NÛ

## LÊGERÎN

**BRUINESSEN Martin van, Popular Islam, Kurdish nationalism and rural revolt : The rebellion of Shaikh Said in Turkey (1925)**, (İslama gelerî, neteweparêziya kurdî û serhilanîna gundiyan : Serxwerabûna Şêx Saïd li Tirkîyê), di pirtûka «Religion and rural revolt», Janon M.Bak and Gerhard Benecke editors, Manchester University Press, 1982, Manchester, rûpelên 281-295.

Di destpêka 1925 de li Kurdistana Tirkîyê serxwerabûneke gundiyan qewimî. Dû re, hin hawir xwastin wê wekî tevgereke paşverû ya «Serekeşîr û şêxan» an ya «çeteyên gundiyan iptidaî» nîşandin. Ji bo perçiqandina vê serxwerabûnê hikûmatê tirk mecbûr ma qasî du mehan 35.000 leşker, balafir û bombavêjên xwe seferber bike, li navçeyê xwîn û agir birêje. Meclîsa Netewî karînên temamî dida hikûmatê û dadigehêن taybetî serokên serxwerabûnê û di vê navê de dijekarêن (mixalifêن) siyasi yêñ din jî mehkûmê mirine dikirin. Martin van Bruinessen li Tirkîyê bi şahidan re peyiyyîye, li belgeyên tirk û Ingîlîzî yêñ wê dewrê nihêrtiye û risteya bûyeran gelek baş gihandiye hev. Serxwerabûn bi destê partiya Azadî hatîbû tenzîm kirin ; parti ji alîkarî û piştîvaniya hin şêxan, bi taybetî şêxên neqşebendî ku di vê navçeya Kurdistanê de gelek nifûzdar in, kelk (istifade) girt. Nivîskar agahdariyên nû tîne û nîşan dide kîjan bûyer çawa hatine çewtandin. Ev xebateke zanistî gelek girîng e ji bo nasîna bûyera ku ji hingê ve wekî «Serxwerabûna Şêx Seîdê Pîran» tê zanîn.

**BRUINESSEN Martin van, Kurdish tribes and the State of Iran : The case of Simko's revolt** (Eşîrên kurdî û dewleta Îranê : Serxwerabûna Simko) di pirtûka *Conflict of Tribe an State in Iran and Afghanistan* Croam Helm, London, 1983, rûpelên 364-400.

Eşîrên kurdî pir caran di dîroka Ecemistan û Îranê de rolên girîng leyistine. Nivîskarê pirtûka héja Agha, Shaikh and State (Utrecht, 1978, 467 r.), Martin van Bruinessen di vê xebatê de li ser serxwerabûna İsmâîl Axa Simko, di destpêka salên 1920 de, dimîne. Simko, serokê mezin ê eşîra xurt a Şîkakan bû. Şîkak, piştî Kelhoran (li rojavayê Kermanşahê) mestirîn eşîra Kurdistana Iranê ne. Ew di navçeya navbera Soma û Bradost, li rojavayê Salmas û Ormiyê dijin. Di heyama bûyeran de ev eşîr ji du hezar malan pêkhatî bû, xeyn ji rûniştevanên neeşîri (gundi) yêñ navçê, ku, bi hejmar, sê car li wan bûn. Nivîskar, di vê xebatê de, li ser veguherîniyên civakî û siyasi yêñ Kurdistan ku heya destpêka vê sedsalê di navbera împaratoriye osmanî û Îranî de perçekirî bû, dimîne. Gava ku hebûna dewletên awrûpayî xwe li van deran dide hisin, mîraniyên kurdî, ku hin ji wan pir kevn û biquidret bûn, demêñ xwe yêñ dawîn dijin. Di vê heyamê de neteweparêziya kurdî jî hildikişîya. Nivîskar li ser pêşveçûna peywendiyên nav-eşîri di vê dema livdar û guhêrok de, agahdariyên zehf balkêş tîne. Ev agahdarî roniyeke nû tîne ji bo têgihiştîniya dînamîka tevgera netewî ya kurdi ya iroyî li Iranê.

## KOVARI KORİ ZANIYARİ IRAQ, *Destey Kurdî*, cild X, Bexda, 1983, 492 rûpel.

Di hejmara 10 a bultena salane ya desteya kurdî ya Akademiya Zanistî ya Iraqî de bendên jêrîn hene :

### ***Bi kurdî***

Kamil Beşîr, *Rexnesazê ku bîr û dozî honrawa*.

Emîn Neqşebendî, *Şarezûr û şarezûruyekan*.

Ewîrehmanî Haci Marîf, *Rênuşî kurdî li rojnameyî têgihîştînî rastî de*.

Bedirxan Sindî, *Ez û Min* di zimanê kurdî de (rûpel 133-153).

Şukir Mistefa (werger), *Kurd û Kurdistan*.

Ebdulsettâr Tahir Şerîf, *Perwerde û mindal*.

Kemal Mezher, *Kurd, layî Gardelevski-Beşî 1*, (rûpel 218-253).

Wurya Omer Emîn, *Layenekî cewazi* (rûpel 254-276).

Komîtey Zimanê Kurdi,

### ***Bi erebî***

Franz Heinrich Weissbach, wergerandin û nîşeyênen Cemal Reşîd Ehmed, *Kardûx* (rûpel 341-368).

Mihemed Cemîl el-Mula Ehmed el-Rojbeyanî, *Deqûq an Deqûqa'* di dîrokê de (rûpel 369-461).

Muhsin Mihemed Huseyn, *Ibn al-Esîr dîroka heyama xwe ne siyaseta wê dinivîse* (rûpel 462-491).

Ebdulletif Ebdulmecîd Gullî, *rastnîvîsîna kurdî ya yekbûyî* (rûpel 492).

**ŞAKELÎ Ferhad, Kurdish nationalism in Mem û Zîn of Ehmedê Xanî**, (neteweparêziya kurdî di Mem û Zîn a Ehmedê Xanî de), xebata lîsansê ji bo Zanîngeha Uppsalayê (Swêd), Gulân 1983, 63 rûpel.

Ev xebata zanîngehî, ku bi zimanê îngilîzî hatiye nîvîsîn, lêgerîna yekemîn e ku ta niha li Rojava li ser afirandina sereke ya şairê netewî yê kurd Ehmedê Xanî (1650-1707) derketiye.

Di pêşgotina xwe de nîvîskar qala çap û wergerandinê vê destana ku bi gelempêri yekemîn afirandina neteweparêz a kurdî tê hesibandin dike. Metna pêşîn di salên 1917-1919 de li Stenbolê derdikeye. Divê ku ta 1947 li bendê bimînin ta ku çapeke nû li Helebê bi saya Şêx Hesenê Haşimî derbiçe. Di 1962 de, kurdîzana sovyeti Margaret B. Rudenko li ber destnîvîsên kitêbxanên Moskova û Lenîngradê çapeke nû pêktîne û tevî wergerandina rûsî neşîr dike. Di 1968, Mehmet Emin Bozaslan Mem û Zînê bi alfaba latînî û tevî wergerandineke tîrkî li Stenbolê derdixe (Gün Yayınları). Çapeke diwemîn a vê pirtûkê de 1975 de, dîsa li Stenbolê rojê dibîne. Helbestvanê navdar Hejar, Mem û Zînê diqelêbê kurdiya navendî û di 1960 de li Bexdayê çap dike. Di 1979 de, dîsa li Bexdayê, Ezedîn Mistefa Resûl teza xwe ya doktorayê «Ehmedê Xanî, şair, ronakbîr, feylesof û sofî» bi zimanê erebî derdixe (511 rûpel).

F. Şakeli afirandina Xanî, ku di 1694 de hatiye temam kirin, di hoyêni siyasi û civakî yên heyama wê de bicîh dike. Ew, wisa ji, qala jînenigariya vî şâîrê ku bi hemû zimanêna navçeyê dipeyiîv û dinivîsî û kelam û fiqhî xwendibû, dike. Nîvîskar di xebata xwe de ji du afirandinê din ên Xanî, *Nûbar*, ferhengoka erebî-kurdî, dora 1000 peyivan, û Aqîda /imanê kelk digire.

Ev xebat, ku baş hatiye pêkanîn, roniyeke nû tîne ji bo têgihîştîniya afirandina nemir a Ehmedê Xanî.

**SIM Richard, Kurdistan, The search for recognition**, (Kurdistan, gera ji bo nasînê), Conflict Studies, The Institute for the Study of conflict, no. 124, London, 1980, 24 r.

Ev kitêbok bi destê lîgerekî Enstituya ji bo lêgerînê li ser şeran, ku li ser hoy û nîşaneyîn bêistiqrariya siyasi, şoreş, serxwerabûn û şeran di cihana îroyî de dixebite hatiye nîvîsîn.

Piştî teswîra Kurdistanê û «17 milyon Kurd» ên di nav pênc dewletan de perçekirî, Richard Sim qala rewşa Kurdan di van dewletên ku axa Kurdistanê li hev parî kirine dike. Ew bi kurtî li ser ol, ziman, jiyanâ civakî ya Kurdan û pêşveçûna tevgera netewî ya kurdi ji sedsala XX vê de, li ser serxwerabûnê kurdi yên sedsala XX û tevgera her pênc dewletan li hemberî wan dimîne. Ew bi Îranê dest pê dike : serxwerabûna Şikakan di salêن 1920 de, di bin seroktiya Simko de, tevgera rejîma Şah û ya Komara İslâmî li hemberê hindikahiya kurdi ; tevgera neteweyiya kurdi li Iraqê û bi taybetî dema têkoşîna çekdarî di bin seroktiya Mistefa Barzanî (1961-1975) de ; tevgera kurdi li Tirkiyê. Dawiyê ew qala Kurdêن Sûriyê û Kurden li dervayî welêt û tevgera dewletan biyanî (bi taybetî ya Yekîtiya Sovyetî) li hemberê xwestekêneteweyî yên Kurdan dike.

**XİŞBE SAMÎ, Kêşekanî şanoy hewçerx**, ji erebî wergerandiye Mahmûd Zamdar, Wezareta Çand û Rênişaniyê, Beşê çand û weşanên kurdi, rîz no.94, Bexda, 1983, 113 r.

Wergerandina bi zimanê kurdi, alfaba erebî, a lêgerîneke giştî li ser şano (tiyatro) û sînemaya hemdem li Rojava û li welatên rohelat (bi taybetî li Yekîtiya Sovyetî).

**ZERÛ, Ehmed Evdile, Peyiv**, Bexda, çapxana el-Hawadis, 1980, 78 r.

E.E. Zerû helbest, çîrok û lêgerînê helbestvan û lêgerên behdînanî berhev kiriye û çap kiriye. Wekî hemû weşanên kurdi yên ku li Iraqê derdi Kevin, ev pirtûka kurmancî bi alfabeaya erebî hatiye nivîsîn. Em bala xwendevanan bikşînin ser lêgerîneke hêja li ser sêzde haletên müstiqiyê ku di sedsala XVII de di Imparatoriya Osmanî de bi kar tanîn, ên ku navê wan di Mem û Zînê de derbas dibin : *ney, qanûn, sentûr, tenbûr, ûd, sîhîr, kûs, nakur, tepîl, zurne, nefîr, rebab* û def.

## MÜSÎQÎ

**BOTANÎ Beşîr, Bistire ! Mûzîk û stranên folklorî**, Weşanên Kurdiska Förlaget, Swêd, 1981, 67 r.

Mûsîqî beşike girîng a çanda kurdi ye. Lîbelê, lêgerînê li ser wê zehf kêm in û nasîna wê hé di tariyê de dimîne. Folklora kurdi pir dewlemend e, stran perçeyek mezin ê jiyanâ Kurdan e, Kurd li her ciyî, bi her hincetê distirêن.

Beşîr Botanî berhevoka xwe ya duwemîn a stranên kurdi yên bi nota nivîsî derdixe. Berhevoka pêşîn, Aşîtî û Evîn, di 1980 de, dîsa li Swêdê, çap bûbû.

Nivîskar vê xebatê ji mûsîqînasên kurdi yên sovyetî Cemîla Celîl û Nûra Cewarî re îthaf dike.

## OL

**EBDULKERÎM EL-MUDERRIS Mela Muhemmed, U'lama una fî xidmet el-i'lm wel dîn** (Zanayên me di xizmeta zanistî û dîn de), Bexda, 1983, 668 r.

Ev kitêba stûr ferhengek e li ser jiyanâ 506 zanayên kurd ên ku xizmeta İslâmî kiriye. Her bendekekê, ku li gora dora alfabeaya erebî hatiye rîz kîrin, qala jiyan û afirandinê alimekî kurd ê ku bi zañîn û dîndariya xwe hatiye naskîrin dike.

Nivîskar ji agahdariyêne gelek pirtûk û destnivîsên dîroknasên mezin kelk girtîye : Ibn Xalikan, Ibn el-Esîr, Ibn Xaldûn, hwd.. û wisa jî ji destnivîsên ku di pirtûkxaneyê arizî yên mizgeftêن Iraqî de hatine parastin. Ewî bi vî awayî li destnivîsên Ismaîl Paşa Baban, Omar Riza Kehâla, İbrahîm Fesîh el-Heyderî û gelek dîroknivîsên din meyeze kiriye.

Afirandinê Mela Mihemed Evdulerîm el-Muderris pir girîng in. Ev imamê ku mizgefta navdar el-Xewt el-A'zam a Bexdayê idare dike kitêbîne hêja li ser jiyan û afirandinê şairên kurd ên klasîk nivîsiye : Mewlewî (Bexda, 1961, 544 r.), Nâî (Bexda, 1976, 750 r.), Mehwî (Bexda, 1977, 597 r.), Feqê Qadirî Hemewend (Bexda, 1980, 789 r.) hwd... hwd...

**EVDULKERİM EL-MUDERRIS** Mela Muhammed, Yadi Merdan, cild II, weşana Akademiya Zanistiya Iraqî, destey kurdî, 1983, 668 r.

Mamoste El-Muderris cildê yekemîn ê Yadi Merdan li ser Mewlana Xalid Neqşebendî, nûkerê dawîn û hîmdarê vê tarîqetê li Kurdistanê nivîsibû. Di cildê duwemîn de jînenîgari û afirandinê çil û pênc şêxên neqşebendî yên navçeya Hawroman heye. Ev pirtûk kaniyeke hêja ya agahdariyê ye li ser ekola Hawroman a perwerdiya dînî û manewî.

**HEKİM Helkewt, La confrérie des Naqshbandis au Kurdistan au XIXe s.** (Tarîqeta Neqşebendiyan li Kurdistanê, di sedsala XIX an de), teza doktorayê, Zanîngeha Paris-Sorbonne, 1983, 322 r.

H. Hekîm xwe daye lêkolîna destpêkên tarîqeta xurt a Neqşebendiyan li Kurdistanê. Xebata wî ji sê pişkan hevedudanî ye. Piştî pêşgotineke dirêj, ku tê de nivîskar qala kaniyên xwe (erebî, farisî, kurdî) dike, ew bi kurtî li ser dîroka tarîqatê ji dema hîmdarê wî Evdilxâliq Xucduwanî, ku di 1180 an 1220 de miriye, ta îro dimîne. Paşê, qala qaîdên tarîqetê dike. Pişkê duwemîn li ser dîroka Kurdistanê, di destpêka sedsala XIX an de ye, bi taybetî li ser dîroka Xanedana Babanan ku li mîlkîn li ser sînorêni imparatoriyê osmanî û farisî hikim dikirin. Gava ku Ziya ul-dîn Xalid Huseyn (di 1776 an 1779 de hatiye dinê), ku bêtir bi navê Mewlana Xalid tê nasîn, ji eşîra xurt a Jafêñ navçeya Şahrezorê radibe, hîkmê Xanedana Babanan ber bi kîmbûnê diçû.

Nivîskar hewl dide ku di jiyanâ Mewlana de efsanê ji pêkaniyê veqetîne û ew gelek li ser rola civakî û ramyarî (siyasi) ya vê tarîqetê ku di destpêka sedsala XIX de bi temamî li Kurdistanâ Iraqê bi cih dibe dimîne. Xebat bi têbîrîya serxwerabûnên neteweyî yên kurdî yên mezîn ku ji salêñ 1880 vê de di bin serokatiya şêxên neqşebendî yên navdar qewimîne diqede : serxwerabûnên Şêx Ubeydullahê Nehrî (1880-1882), Şêx Saîdê Piranê (1925), Şêx Ehmed û Mela Mustefa Barzanî, di salêñ 1930 an de.

**SAFİZADE Sediq, Bozorganê Yarsan,** weşanên E'tâi, Tehran, 1982, 211 r., bi zimanê farisî.

Nivîskar pisporê mezhebê Ehlî Heq e û di vê xebatê de jînenîgariya bîst û neh giregirên girîng ên mezhebê Ehlî Heq pêşkêş dike. Ew li pey her jînenîgariyê kerîyek ji helbestenâ wan ji datîne. Helbest bi zaravayê goranî ne û ji bo qenc nivîsandina dengen taybetî yên vî zaravayê, Safizade hemû metnan bi tipen latînî dînîvisîne. Dû her metnî ji wergerandina wî ya farisî dide. Dervayî yê dawîn, ev giregir hemû kurd in. Navên wan ev in : Behlûl Mahî (di sala 219 ê hicrî / 834 ê mîlîadî de miriye) ; Şah Fezî Welî (sedsala 3 a Hicretê) ; Baba Serheng Dodanî (di 324 H / 935 M de li navçeya Sine de hatiye dinê) ; Şah Xoşîn Lorestanî (406-467 H / 1015-1047 M) ; Baba Tahir Hemedanî (390-450 H / 999-1051 M) ; Pîr Şehriyar Awramî (sedsala V a Hicretê) ; Baba Nâ'us Caf (di 477 H / 1084 M de li Hawromân-Luhon hatiye dinê) ; Sultan Ishaq (sedsala VIII a Hicretê, ji Şahrezorê) ; Şah İbrahîm Ayût (di 725 H / 1324 M li Hawromân hatiye dinê) ; Baba Yadgar (di 761 H / 1359 M li Hawromân hatiye dinê) ; Abidîn Caf (di 720 H / 1320 M de li Şahrezorê hatiye dinê) ; Nêrgiz Xanimê Şahrezorî (di 713 H / 1313 M de li Şahrezorê hatiye dinê) ; Elî Qelender (di 838 H / 1434 M de li navçeya Kermanşahê hatiye dinê) ; Şah Veysqûlî (di 810 H / 1407 M de li navçeya Sine de hatiye dinê) ; Seyid Ekâbir Xamûş (di 844 H / 1440 M de li Hawromân hatiye dinê) ; Baba Celîl Dodanî (di 883 H / 1478 M de li Sine hatiye dinê) ; İlbaşî Caf (898-961 H / 1492-1553 M) ; Xan Atêşê Lorestanî (sedsala XI a Hicretê) ; Xan Almasê Lorestanî (1072-1138 H / 1661-1725 M) ; Şah Heyas Besakanî (di 1125 H / 1713 M de hatiye dinê) ; Seyid Farzî (di navbera sedsalân XI û XII ên Hicretê de jiyyaye) ; Şêx Emîr Zoleî (ji navçeya Kermanşahê, di 1125 H / 1713 M de miriye) ; Seyid Brake (1210-1290 H / 1795-1873 M, ji navçeya Kermanşahê) ; Şah Teymûr Banyaranî (di 1246 H / 1830 M de li navçeya Kermanşahê hatiye dinê) ; Dervîş Newrûzê Soranî (di 1260 H / 1844 M de li Sencab-Kermanşahê hatiye dinê) ; Dervîsqûlî Kerendî (di 1236-1316 H / 1820-1898 M de li Mahîdeş-Kermanşahê hatiye dinê) ; Şêx Nezer Elî Cenab (1251-1334 H / 1835-1915 M, ji Sehne-Kermanşahê) ; Hâcî Nîmetullah Ceyhûn Abadî Mokrî (1288-1338 H / 1871-1919 M, ji

Dînovar-Kermanşahî) ; Edîb al-Memalik Ferahanî (1277-1316 H / 1860-1898 M, ji Soltan Abad / Irak). Peyivnameyek gotinêن sofi û ferhengo keke goranî (bi tîpêن latînî-farisî di dawiya vê xebata girîng de hatine danîn. Ji me re hineke ecêb dixuye ku Baba Tahir Hemedanî û Edîb al-Memalik Ferahanî wekî mirîdêن Mezheba Ehlê Heq hatine hesibandin. Pir heyf e ku nivîskar navê kaniyêن xwe hilnade.

## PIRTÜKNASÎ

**NERîMAN Mustefa, Mâ esdahû el-ekrad ila el-Mektebe el-e'rebiye** (beşdariya Kurdan ji kitêbxaneyê erebî re), Bexda, 1983, 112 r. bi zimanê erebî.

Pirtüknasiya 605 pirtûkên ku nivîskarêن kurdî di navbera salêن 1900 û 1981, di warêن cihê de, bi zimanê erebî nivîsîne.

Nivîskar xebata xwe li şeş pişkan par vekiriye :

- Nasînêن giştî û felsefe (sofîzm, mantiq...)
- Ol (Islam, tefsîr, Quran, pirsêن olê...)
- Zanistiyêن mirovî (civak û jiyana civakî)
- Ziman û zanistî
- Edebiyat
- Coxrafya, dîrok û jînenîgariya mirovêن mezin.

Pirtük bi navnameya nivîskaran xelas dibe.

## PIRTÜKÊN ZAROKAN

**BEHRENGî Samed, Masiyê reşê piçûk**, Uppsala, 1981, 28 r. 28 x 20 cm.

D. Xebatkar vê çirokê ji farisi wergerandiye kurmancî. Çiroka masiyê reş ê piçûk li Iranê pir naskirî ye û hatiye wergerandinê gelek zimanên biyanî. Bi serpêhatiyêن masiyê piçûk ê ku itaet nake, nivîskar, ku di 1939 de li Tebrîzê hatiye dinê û di 1964 hatiye kuştin, zorkariya şahîtiya Iranê gilî dike. Mats Abelson wêneyêن vê kitêboka xweşik çêkiriye.

**BERGSTRÖM Gunilla, Alfonsê şit**, ji zimanê swêdî hatiye wergerandin, Kurdiska Kultur Förlaget, Stockholm, 1983.

Wergerandina kurmancî ya çirokeke swêdî ji bo zarokan. Bi alfabeşa «Hawarê» hatiye nivîsîn û bi wêneyêن bedew xemilandin.

**CEWERî Firat, Dê şêrîn e**, Uppsala, 1983, 74 r.

Berhevoka hijde helbestêن ji bo zarokan. Bi kurmancî, tîpêن latînî, tevî wêneyêن Meyro Zilan. Helbest welatparêz û hînker in.

**FRICK L. û CARLBRAND J., Ma gakûvî kûçikan dixwin ?** Kurdiska Kultur Förlaget, ji zimanê swêdî hatiye wergerandin, Stockholm, 1983.

Kitêbokek bi kurmancî, tîpêن latînî ji bo zarokan, tevî wêneyêن bedew.

**LINDREN A. û WIKLAND I., Belê Lotta dikare bajo**, ji zimanê swêdî hatiye wergerandin, Kurdiska Kultur Förlaget, Spånga, Swêd, 1982, 30 r.

Kitêbokek ji bo zarokan bi kurmancî, tîpêن latînî, tevî wêneyêن rengîn ên xweşik.

**NURî Cemal, Zêrin û Kalê**, Wezerata çand û Rênişanî, Idara çand û weşanêن kurdî, Bexda, 1983, 90 r.

Pirtükeke çirokan ji bo zarokan. Her şeş çirokêni bi kurdiya navendî, alfabeşa erebî hatiye nivîsîn û nivîskar bi frehî ji folklora kurdî îlham stendîye. Ev çirok hemû cara pêşîn dikevin çapê, xeynî «fîlbaziya rûvî» ku berê di kovara *Perwerde û Zanistî*, (Bexda, no. 13, 1977) de bi navê Soran derketkîbû.

**SANDBERG I. Ú L., Kino digot, alîkarî bikim**, ji zimanê swêdî hatiye wergerandin, Kurdiska Kultur Förlaget, Stockholm, 1983, 32 r., 20 x 18 cm.

Kitêbokek ji bo zarokan, bi kurmancî, tîpêñ latînî, tevî wêneyên rengîn.

**SANDBERG I. Ú L., Kino digot, li wê derê binêre**, ji zimanê swêdî hatiye wergerandin, Kurdiska Kultur Förlaget, Stockholm, 1983, 32 r., 20 x 18 cm.

Kitêbokek ji bo zarokan, bi kurmancî, tîpêñ latînî, tevî wêneyên bedew.

**XWENDINÎ KURDÎ, polî duwemî seretayî**, Korî berêweberî perwerde û fêrkirdinî seraserî Kurdistanî Iran, 1983, 137 r.

Kitêba xwendinê ku Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê di çarçeva bernameya xwe ya perwerdeyiyê de neşir kiriye. Ev kitêba bi wêneyên rengîn ên bedew xemilandî, bi alfabeaya erekî ya kurdêñ Iraqê hatiye nivîsin. Di dawiya her rûpela xwendinê de ferhengokeke kurdî-kurdî û çend pirs hene.

Metin bi awayekî baş û hînker hatine helbijartin. Kitêb baş û bikêrhatî ye.

**ZANISTÎ EZMÛNÎ, ji bo polî duwemî seretayî**, ji zimanê farisi wergerandiye, Korî berêweberî perwerde û fêrkirdinî seraserî Kurdistanî Iran, 1983, 144 r.

Ev kitêba xwendegahî bi destê Partiya Demokrat a Kurdistana Iranê di çarçeva bernameya wê ya perwerdeyiya Kurdêñ Iranê hatiye çap kîrin.

Alfabeya erekî ya Kurdêñ Iraqê hatiye bi kar anîn. Tê de, bi kurtî, qala nasîna heywan, giya, meywe, zebze, kulîlk, xwarin, tenduristî, avakirina xaniyan, coxrafya, ol, hwd... tê kîrin. Di dawiya pirtûkê de ferhengokeke kurdî-farisi heye.

## ZIMAN

**AKRAWÎ F.R., Standard Kurdish Grammar**, London, 1982, 200 r.

Rêzimanene gelempêri ya zimanê kurdî, bi destê kurdekî navçeya Akrayê, li Kurdistana Iraqê. Ji bo pêkanîna vê «rêzimana klasîk a kurdiya edebî», nivîskar ji metnêni bi zaravayêن bakur û navend kelk girtiye. Ew mikur tê ku «hin Kurd dikarin tiştek jê tê negihêñ» û dibêje ku «divêt hemû kurdêñ ku dixwazin zimanê xwe û zanava xwe ya neteweyî biparêzin vê rêzimanê bixwînin û hîn bikin».

Ev cêribandineke din e ji bo çê kirina zimanene edebî yê kurdî bi tevîhevkirina zaravayan. Berî Akrawî, ceribandinêni din, ên cidditir, çê bûn ji bo yekandina kurdiya edebî. Ya dawîn a Cemal Nebez (ku demeke dirêj fêrên zimanê kurdî daye li Zanîngeha Serbest a Berlîna Rojava) bû : *Zimanî yekgirtûy kurdî*, Bamberg (Almanya Federal), 1976, 126 r.

**BABAN, Şukrullah, Ferhengê farisi-kurdî**, 1982, 872 r.

Nivîskar, ku ji Sineyê ye, li Zanîngeha Tehranê ilmân îslamî xwendîye. Ew li radyo-televizyona Iranî xebitiye û ıstgehîn Ormiye û Sine (Senendec) ïdare kiriye. Ew di sala 1960 an de pirtûkê jî li ser jiyana Selahedînê Eyûbî nivîsiye. Mîrza Baban ne zimannas û ne jî pissorê zimanê kurdî ye. Ev kêmâsi xwe di ferhenga wî ya farisi-kurdî de xwe nîşan dide. Mesela ew lêkera farisi *raftan* «çûyin» bi gotinê *royıştin* û wîsa jî *koc kirdin*, tê per *kirdin*, *burdin*... werdigerîne.

**BALÎ, Awê, Alfabeaya kurdî**, weşanên Komkar, no. 15, Almanya Federal, 71 r.

Ev pirtûka hînkirinê ji pirtûkên awrûpayî bandûr (îlham) digre. Alfabe ya Hawarê ye, xeynî dengdêra i ku ew bê xal i dînivîse û dengdêra i jî dike i. Li rex her tîpeke alfabê wêne hatin danîn. Hingî fêrbûna alfabê pêş ve diçe. Nivîskar helbestêñ kurt ji nivîskarêñ naskiri weki Cigerxwin, Karlenê Çaćanî, Şikoyê Hesen dide xwendevanan. Di pirtûkê de bingehêñ hesabê dêstpêkî jî hatiye dayin (hejmar, pirsêñ piçûk, tevî wêneyan).

**KARA, M.S., Ferhengê farisi-kurdî, wûşebijêr**, Senendec, 1982, 348 r.

Ew ferhenga farisi-kurdî ya berîkê dora 7500 gotin dicivîne û eserê hiqûqnasekî ye. Nivîskar di kovara KORDESTAN ku di salên 1964-1965 de li Tehranê derdiket çend helbestêx we belav kiribû. Ew qenc bi kurdî dizane û wergerandina wî, bi awayekî giştî mukammel e. Ferheng, bê gûman, ji bo kesênu ku dixwazin hînî zimanê kurdî bibin alîkarekî hêja ye.

**XORŞİD, Fuad Hama, El-luxat el-kurdiye, el-tewzî' el-cuxrafi li-lehcetiha** (Zimanê kurdî, belavbûyîniya coxrafi ya zaravayê wî), Bexda, 1983, 52 r., bi zimanê erebî.

F.H.Xorşîd coxrafînasekî xort e. Xebata wî ya bi zimanê erebî li ser belavbûyîniya zaravayê kurdî ji alî Kazim Sadedîn ve hatiye wergerandinê ingilîzî : *Kurdish language and the geographical distribution of its dialects*, Bexda, 1983.

Piştî ketîniyeke kurt li ser eslê kurdî û xasiyeta wî, nivîskar zimanê kurdî vediqetîne çar şaxan : 1) kurdiya bakur (beyazîdî, hekkarî, şemdiñanî, botanî, devokên rojavayî, badînanî) ; 2) kurdiya navendî (mukrî, soranî, ardelanî, sulêmanî, germîyanî) ; 3) kurdiya nîvro (lorî-feylî, bextiyarî, mamaşanî, kuh-giluyî, kelhorî, lakkî) ; 4) goranî (goranî, hawramî, bacalanî, zaza). Nivîskar paşiyê xerîteyek zimannasiya kurdî çê dike.

Ev xebat dikaribû balkêş û bikêrhatî bibûna lê mixabin ji ciddiyeta zanistî dûr e û tê de gelek xeletî hene.

**KURDOEV, K.K. û YUSUPOVA Z.A., Kurdsko-Russkij Slovar** (Ferhenga kurdî-rûsî, <oranî>), dora 25.000 gotin, Moskova, 1983, 752 r.

Ew ferhenga girîng a yekemîn e ku li Yekîtiya Sovyetî li ser kurdiya navendî (devokên Sulêmaniye, Erbil, Rewandûz, Koy Sancak, Kerkük, Mehabad, Oşnoviye, Bane, Senendec) derdikeve. Peyivîn kurdî bi alfabeyle erebo-farisi ya kurdênen Iraq û Iranê li gora rêza vê alfabê hatine nivîsin.

Sê lêger vê xebatê pêk anîne. Berî hemiyan Zarê Yusuf, pispora sovyetî ya kurdiya navendî, ku ta niha gelek xebatan belav kiriye li ser rûçikên morfolojîk ên cihêن yên zaravayê kurdî yên navendî, herfêن han daye ser xwe : û, u, o, î, i, e, ç, x, r, z, j, s, ş, f, v, k, g, l ; Qanatê Kurdo tipêن a, ê, b, p, t, h, d, c, m, n, h girtiye ser xwe û Marûf Xeznedar, pisporê edebiyata kurdî, ji navçeya Hewlêrê li Kurdistanâ Iraqê, tipêن q, y û c. Ev her sê lêger jizanîna pisporê kurd ên ji Kurdistanâ Iraqê û Iranê ku li Yekîtiye Sovyetî xwendine kelk girtine. Ev pisporê aîkar Cemşîd Heyderî (ji Hewlêrê), Qawus Qeftan, Kemal Mezher Ehmed, Ewerêhman Hacî Marif (ji Sulêmaniye) û Kerîm Eyyûbî (ji Mehabadê) ne.

Li rex her peyvê, xwendina wê bi tipêن latîn yên alfaba Hawarê hatiye danîn. Çapa ferhengê gelek bedew e û ferheng haletekî hêja yê xebatê ye.

## PIRTÜKÊN DIN

**MARÛF Ebdulxaliq, Teknîkar**, Wezareta Çand û Rênişniyê, beşa çand û weşanên kurdî, rêza zanistî no. 1, Bexda, 1980, 379 r.

Ew pirtûka ku Mihendis Emced Ebdulwahid çav lêgerandiye û rast kiriye, dixwaze teknîkên elektronikê (radyo, transistor, teyp, hwd...) hînî her kesî bike.

Nivîskar ji pirtûkêni bi erebî û bi îngilîzî nivîsi bandûr girtiye. Di dawiya pirtûkê de ferhengo keke teknîk a îngilîzî-kurdî heye...

**SEMEDÎ Seyid Muhemed, Rojjimêri Mehabad**, Mehabad, 1342/1983, 108 r.,

Teqwîmeke li Mehabadê çapbûyî. Li ser rûpela pêşîn wêneyek şairê kurd ê sofi Melayê Cezîrî (1570-1640). Tê de jînenigariyê kurt ên şair û nivîskarê kurdênen din, teví wêneyen wan hene : Haci Mela Ebdulla Celî yê Koy Sancaqê, Muftî el-Ezîz Efendi yê Sulêmaniye, Mihemed Emîn Zekî Beg, Pîremêrd, Herîq, hwd...

# LI SER PIRTÜKA MENTÊŞAŞVİLİ

**Pêşrew Kerîm AHMED**

Pirtûka kurdî ya A.M. Mêntêşاشvili ku bi zimanê rûsî li Mosko derketiye, di çapxana «Nauke» sala 1984 de hatiye çapkîrin, ji 240 rûpelan pêk hatiye.

Ev pirtûk bi toneke fereh li ser rewşa aborî ya Kurdistanê ya sedsala XIX ta roja îroyîn kolaye. Ev bi zimanê rûsî yekemîn kar e ku bi şeweke fereh li ser rewşa komelayetî (civakî) - aborî ya Kurdistanê dikole ji belgeyên hêja wek li ser gişî aliyên jiyanâ Kurdan, rewşa jînê, a koçeran, a xêlan (eşîretan), a cotkaran, a axa û karkêran tijî ye.

Li ser rewşa jiyanâ koçeran bi toneke pir baş û fereh axaftiye. Lê belê ew hinek li hejmarê koçeran di nav Kurdan de zêde dike û dibêje ku ta kutayıya sedsala XIX piraniya Kurdan koçer bûne. Li perawêza (1) de dînîvisîne ku pirtûka «Kurdistan and the Kurds», A.R. Ghassemloou (Praga 1965) de hejmara kurdên koçer dike 1/3. Mêntêşashvili dibêje ku Qasimlo vê hejmarê dide, lê hîc belgeyek di destê wî de nîne. Eger em vejerin ser pirtûka mamosta Emîn Zekî û hejmarê koçeran kom bikin, dibe 131.929 xêzan, û cotkarên rûniştî 233.158 xêzan derdikeyin, û 239.900 xizanê nîvrûniştî dîbin. Eger nîvrûniştî û rûniştîyan kom bikin, dibe 473.058 xêzan ku ev dibe bêtirî 1/3. Herwisa mamosta Emîn Zekî hejmarê 30 xel (eşîret) ên rûniştî, 6 eşîretên koçer û 3 yên nîvrûniştî nedaye. Li vir em dikarin bêjin ku gotina mamosta Qasimlo rast e û ji bo vî tiştî belge jî hene.

Di vê pirtûkê de, bi awakî pir xweş û diyar li ser kiştûkalê (ziraet) ji nîvisandiye. Li Kurdistanê ci têñ çandin, çawa zeviyan dikolin, sîistema yekzevî û duzevî ci ne, hatine nîvisandin.

Nîvîskar dibêje ku 100 kg dane 500-700 kg dane didan. Bi wê tonê rewşa aborî ya gundê Kurdistanê li gor belgeyên ta niha hene, pir baş vekiriye û herweha çawaniya çewsandinên cotkaran ji aliye hikûmetê ve, aşkere kiriye : Çawa keda wan bi erzanî ji aliye hikûmetê ve têñ kirîn û paş de bi bihayekê giran careke din difroşin wan. Wek titûn, silqê şekir û h.d. Ji bo îsbatkîrinê, ji

rewşa jinê çend malêñ cotkar nimûne daye, bi wî rengê zilm û zoriya ser cotkaran ji bo xwendevanêñ Ewrûpa aşkere kiriye.

Nivîskar bi wîrdî li rewşa bajaran kolaye. Nîşan dide ku sermayedarî bi çitonê dikeve nav Kurdistanâ Turkiyê. Lê belê çaxa tê ser vekirina riya hesin, dibêje ku şoreşa Kemal Ataturk bi wî karî pêşveçûna aborî anîye meydanê. Kemal riya hesin, ne ji bo aborî çêkir, ji tirsa ku Kurdistan ji destê wî neçe çêkir û ta leşkerê xwe zû bikişîne Kurdistanê, heke serhildanek çêbibe. Li aliyeke ñ din Almanya û Îngîlîstan her yek ev rî ji bo xwe dixwastin. Û dixwastin ku zûtir kutayî li vî karî bînin ji ber ku xwe amadeyê şerê cîhanî ya duhem dikirin.

Ev tişt wisa dide xweyanî kirin ku nivîskar baş «Kemal û Kemalîzm»ê fêm nekiriye. Mentêşavîlî di pirtûka xwe de bi belge û rîkûpêk, peywendiya nav xêzanêñ kurda vekiriye. Dibêje ku peywendiya derebegayetî li Kurdistanê pir jar büye, ev jarî peywendiya xêlekî jî bi xwe re dikuje, lê peywendiya malbatî li Kurdistanê hîn pir xurt e.

Nivîskar ayin (ol) û hemî terîqetên li Kurdistanê ji jiyana Kurdan ve girêdaye.

Herweha li ser rewşenbîrî, ziman û nivisandina kurda axaftiye. Di ziman de, li ser şêweyêñ zimanê kurdî û navçeyêñ belavbûna zaravayan destnîşan kiriye û hoyêñ bûna van zaravayan bi toneke zanistî vekiriye.

Li aliyeke ñ din pir li kurdî ; li wêjê (edeb) ya kurdî kolaye. Her li folklor ta wêjeya nivisandî, navê hin hestyarêñ (şair) kurda daye. Wek Elî Teremaxî (sedsala X-XI,) Elî Herîrî (1009-1079), Ehmed Melayê Cizêrî (XII), Feqiyê Teyran (1307-1375), Melayê Batê (1417-1495), Ehmedê Xanî (1650-1708), Mustefa Bêşaranî (1641-1721), Mîrza Şeref (XVIII).

Lê nivîskarê birêz dibêje ku «Mishefa Reş» û «Celwe» bi zaravayê kurmanciya bakur hatiye nivisandin. Bi baweriya min ev ne wilo ye. Eger li vê têkstê binêrîn, ji bo me hinek aşkere dibe.

#### Feslî nuxustîn

1. Min bûm û îsteş hem demênim ta axirî, beser hemû afrîdeyek heye min îşî ewane pêk bînim.
2. Min hazırlım xêram bo ewanî pêm birwa deken û demê iş deparênewe.

Ev ji bo me dide xweyanî kirin ku ev bi kurmanciya başûr (soranî) hatiye nivîsandin.

Herweha navê Baba Tahir Uryanî (XI) û Hacî Nûr Alî İlahî daye.

Nivîskar herweha hinek li ser wêjeya sedsala XIX jî nivisandiye û navê Nalî (1800-1856), Ebdulrehman Beg (1805-1869) û Mustefa Begî Kurdi (1812-1850) daye û bi toneke fereh li ser hestyarê niştîmanperwer Hacî Qadirê Koî (1816-1894) nivisandiye.

Wextê li ser Şêx Rizayê Talebanî (1842-1910) diaxive, dibêje ku Hacî Qadir gotiye ku Şêx Riza «Şehsiwarê rewânbehî kurdan e.» Ev bi baweriya min çewt e, ji ber ku Hacî Qadir dibêje :

*Şehsiwarî belaxetî Kurdan  
Yeke tazî fesahetî Baban*

*Mustefa ye texellusî kurdi  
Xezelî kirde ber tenî kurdi*

Li vir xweyan e ku Hacî ev honrawe li ser Mustefa Begî Kurdî gotiye, ne li ser Şêx Riza. Bi şeweke pir hêja, li ser Herîq (1866-1909), Adebî (1859-1916), Temûr Beg nivisandiye. Dibêje ku wêjeya kurdî piştî şerê cîhanî yê pêşî, bi gavên mezin pêşve diçe.

Li ser rabûna bizûtneweya kurdan, di salên 20-30 de, endêşeyên (fikir) niştimanî di nav wêjeya kurdî de bi awakî diyar tête xweyanî kirin, wek di nav honraweyên (şîir) Ehmed Muxtar, Ehmed Hamîd, Elî Kemal Bekir de. Di tojîneweya (tehqîq) xwe de destnîşanê pir tiştên hêja dike û dibêje ku di nav wêjeya nû de, zimanê hestyarar ne wekî zimanê hestyarên klasîk in : Herwekî Goran, Bêkes, Dildar, Nûri Şêx Salih.

Li ser rojnamevaniya kurdî dibêje ku di sedsaleyên XIX-XX li çaxê «Vejia Asya» de, Kurd yek ji zorlêkirawtîrin û paşketitîrin miletên bindest yê Dewleta Osmanî bûn. Pir hoyen girîng yên çêbûna rojname û kovaran vekirî ye. Bi toneke kin û rêkûpêk naveroka wan weşandina daye û bi ci awayî tesîr li ser rewşenbîrên wê demê hiştiye : wek rojnama «Kurdistan» 1898, «Hetawî Kurd». Herweha li ser hinek desteyên (grup) kurda yên ku peywendiya wan bi van weşandina hebûye, nivisandiye wek desteya «Hîway Kurd» 1910, a ku kovareke her mehê bi navê «Roja Kurd» derdixist.

Li ser Komara Mahabadê nivisandiye ku bi navê «Helale» kovara dengê xortên Kurdistanê derdiket. Navê rojname û kovareke din jî daye, wekî «Şoreş», «Rizgarî», «Azadî», «Xebatî Kurd» û kovarên «Hawar» û «Gelawêj».

Di beşê duhemê pirtûkê de, li ser eşîret û hevgirnên (konfederasyon) eşîretan nivisandiye. Ji bo vê yekê, berî her tiştî rewşa civakî-aborî ya eşîretan vekiriye. Dibêje her koçerek endamê eşîreke koçer e. Lê hinek ji gundiyan bê eşîr in. Ev Kurdên ku bi eşîrekê ve negirêdayî ye, bi navê «kurmanc» li Kurdistana bakur têن binavkirin, li Kurdistana başûr ji wan re dibêjin «miskîn». Li Sulêymaniyyê ev bi navê «goran» têن naskirin. Ev hersê nav ji bo cotkaran dihatin gotin.

Kurdên rûniştî ji giştî daniştvanên navçeyî bêtir dihatin çewsandin, ku ev çewsandin ji aliyê şêx, axa, mîr, mîrêmîran, beg, eşîretên koçer, Tîrkiye û Îranê ve bû.

Hinek tiştên xweş bi hejmar daye ku wek ji bo suneta zarokan, şêx ji 2-10 pez, ji bo derkirina cinan jî 1-2 pez ji cotkaran distendin.

Li Kurdistanê sê desteyên komelayetî hebûne ; êl, eşîret, cotkar. Êl koçer in û ji çend berebaban têr pêkhatin. Serekê mezintirînê berebabê dibe serekê êlê. Eşîret berê koçerên cengawer bûne û paşiyê li navçekê cînişin bûne.

Peywendiya aborî di navbera eşîretan û Kurdên bê eşîret de bi vê tonê çêdibûn : ji bo birêvebirina karûbarê bê eşîretan (gundiyan), ji gundiyan yek dihat hilbijartin ku jê re «keya», «muxtar» an jî «ketxuda» dihat gotin. Ev karê gundiyan bi hukûmetê re, bi mîr û axayan re dimeşandin.

Nivîskar li ser sîstema hevgirtina ramyarî (siyasi) ya eşîretên Kurdan û hevgirtinê konfederalî ya eşîretan û peywendiyyê wan ên bi dewletên Osmanî û Îranê re rava kiriye.

Li besê sê yê pirtûkê, li ser peywendiya kiştûkalî û pêşveçûna aborî ya Kurdistanê diaxive. Berî her tiştî dest bi rava kırina qonaxên dîrokî û pêşveçûnê peywendiya kiştûkalî (çandînî) kiriye. Û bi qonaxên sedeyên nawendî dest bi tojînewe (tehqîq) ya xwe kiriye.

Di destpêka sedsaleya VII de ; dema erek Kurdistanê dagîr kîrin, di gundên Kurdistanê de giştbeşî (kooperatîv) ya cotkarî li ser bingehêن berebakvî-xélékî çêbû bûn.

Çaxê xelîfeyê îslamê dest danî ser zeviyên şahê Sasanî ku şerê ereban dikir, xelîfe bû derebegê mezintirîn di nav îslamê de. Bi vê tonê derebegî li Kurdistanê gîhîşt payeke bilind, piraniya zeviyan ketin destê dagîrkerên erek û hinek jî di destê kurdên dewlemend de man. Şêweke ji şêweyên derebegîtiyê, li ser zeviyên «weqif» û «îqta» nivisandiye. Dibêje ku hinek caran xelîfe û beg ji % 80 keda cotkaran ji xwe re dibirin. Lê di dema Kerîm Xanê Zend (1752-1779) de, rewşa cotkaran li seranserê Îranê ji berê pir çêtir bû bû.

Di pirtûka xwe de, bi awakî dûrûdirêjî li ser zevîdariya dema nû ya her çar parçeyên Kurdistanê nivisandiye.

Li ser lakêl (zevî ku axa bi kirê dide cotkaran) û bikaranîna lakêlan, di nûtirîn qonaxê de rava kiriye. Li ser şêweyên zibareyên ji bo axê, çend ji kedê, çiqas ji pere û pezên cotkaran ku axa ji bo xwe dibe, li ser rawestaye.

Di van dehsaleyên paşîn de, şêweyên lakêlên sermiyandarî ketine Kurdistanê ku pirê caran sermiyandar û axa yek kes e. Sermiyandarî di van herêman de xurt dibe. Li ku derê kiştûkaliyên pîşesazî (senatê) têr çandin, xwedanê axê hêdî hêdî traktor û patozan dikirin û cotkaran ji ser axa xwe radikin, cihê wan teng dikin an jî wan dikin rêsê karkerên cotkar. Lê peywendiya sermiyandariyê, li Kurdistanê pir paşveketî ye.


Derbareya reforma 1958 li Iraqê, pir bi dûrûdirêjî axavtiye. Giştî aliyên wê reformê diya kiriye. Lê belê dema tê ser reforma No 116 a sala 1970, bi çaveke zanistî lê nanihêre.

Rast e, aliyên baş ên her reformekê hene. Ji bo karêن zanistî, nabe ku aliyên baş, aliyên xerab winda bikin. Ev reform li Kurdistanê bi awakî regezperestî bi kar anîne. Wek parvekirina axa Kerkükê û deşta Hevlîrê li Ereban û derxistina bi hezaran gundiyêñ kurd ji gundê xwe. Herweha pir tiştêñ dinê hene ku nivîskar baş venekiriye.

Bi hejmar û serjmêr (statistik), li kêşeya (problem) mezinbûna bajarêñ Kurdistanê kolaye û bi awakî zanistane ji bo vê kêşeya mezin çûye û bi rastî destnîşanê hoyêñ mezin bona bajaran kiriye. Herweha di pirtûka xwe de, li ser kêşeya pîsesazî ya Kurdistanê pir bi başî nivisandiye.

Bi şeweke giştî ev pirtûk yek ji wan pirtûkêñ herî fereh û baş e ku hemû aliyên jiyan Kurdan girtiye.

190 pelên vê pirtûkê lêkolîn e û li rûpelên 191-211, 346 perawêz rava kiriye. 261 serçawe bi kar anîye û li rûpelên 221-231 ferhengoka navêñ cografi daye.



# NIMÜNEY EDEBIYATÊ DIMILKÎYÊ KLASİK Û DİNÎ

## MEWLIDÊ NEBÎ

Ehmedê XASİ\*

Diyarbekir Vilayet-i celilesine tabi Lice Kazası'na mülhak Hezan Karye'li mekrûmetlû Ehmedî - Xasî Efendi'nin zaza lisaniyla te'lif eylediği işbu mewlid-i şerif, Nezaret-Celilesi'nin 25 Mart 1315 tarihli tahrirat-ı alîyesiyle verilen ruhsat üzerine defa-i ülada dört yüz nüshadan ibaret Vilayet-i mezkûre Litografya Matbaası'nda tab ve neşr edildi. Bundan başka tab ettirilirse mes'ul tutulacaktır.

### MEWLİDÎ NEBİYYÎ'L-QUREYŞİYYÎ (SELEWATULLAHÎ 'ELEYHÎ Fî'L-BUKRETÎ WE'L-'EŞİYY)

Bismillahîrrehmanîrrehîm

Ez bi bismîllahî îbtîda kena  
Raziqê 'aman û xasan piya kena.

Rebbî, hermd û şukrî ancax to rî bê.  
Kîbr û medh û fexrî pêro to rî bê.

\* EHMEDÊ XASİ (1863-?) : 1863 di hezan di marda xo ra biyo. Hezan : Ewro yew nahiye Lici wo (Savat) ki tede zarava Dimilkî qâli beno. Kalikê Ehmedî Xasî, dormarê Bingölî ra amey bî Hezan. Namey yê bixo Ehmed o. Semedo ki namey bab ('esîr) a yê Xas biyo, tia vajiyawo Ehmedî Xasî. Piy yê Mela Hesen o.

Ehmedî Xasî, medresan di wand. 'Erebki, Farîskî û Tirkî zî zanaynî. İcazey xo, muftiyê Diyarbekir Hacı İbrahim Efendi'ra girewt. Xasî, peynîya Mewlid'i di yew ca di qalê Hacı İbrahim'î keno :

«Lede'l-Haci İbrahîm ustazî'l-alî» (Westawo bêr Haci İbrahimî heti.)

Derheqê nî Haci İbrahim Efendi di ma çido zaf nézanîme. Labrê Salname-î Vilayet (Diyarbekir, 1901-1902) di, qismê Vilayetimiz Ahâlisinden olan Ashâb-î Meratib (riperr : 160) di namey yew hâci İbrahim Efendi vêreno. Tiya ra fahm beno ki Haci İbrahim Efendi Diyarbekir di marda xo ra biyo ú ay wextan muderrisê Medresa Mesudiye (Mesudiye Medresesi muderris) biyo. Beno ki Haci İbrahimîo ki Melayé Xasî tira İcazey xo girewto no Haci İbrahim Efendi bo.

Namey Muftiyê Diyarbekir Elhac İbrahim Efendi 5 Mayıs 1920 di rojname (gazete)y Hakimiyet-i Millîye di zî vêreno. Nî rojnamî di yew fetwa muftiyânî Anadolû û Kurdistânî esta. Biñê fetwa di yew fetwa muftiyânê tesdiq kerdoxan miyan di namey Muftî Diyarbekir Elhac İbrahim'î zi esto. Na fetwa destur dana ki bisilmaney Dewleta Osmâni, vera emperyalîstan lej bikerê (B'ewnî : Yalçın Küçük, Aydin Üzerine Tezler - I, tekîn Yayınevi, İstanbul, 1984, r : 102). Hewna beno ki muftî bo.

Çende rey bê ma sewabê hemdê ma  
 Labelê nêrê hîsaban çendê ma.  
 Hemd û şukrê to eda qet nêbenê  
 Ma sera rebbî, ti zanê vînenê.  
 Halê miskîn û feqîr û naqisan  
 Rûreş û zerre siyahê zey hesan.  
 Her nefes de vacê hemd û şukrê to  
 Wacib o, bêşubhe ancî heqqê to.  
 Maneno îne sero şukrê çiman  
 Dest û ling û pa bi e'zayê bînan.  
 Key yeno ca rebbî, heqqê şukrê to,  
 Ger ezel ra ta ebed ma zikrê to  
 Tim biker, qet xafîlî nêben mudam.  
 Her mehal o ger eda ker ma temam.  
 Labelê ma zanê rehma bêhîsab  
 To hete esta wû ma bî dil-kebab.  
 Wazenê ma lutfê to hergû hewe  
 Tim bi zarîyyû fixan roc û şewe.  
 Ez qesem daîm bi zatê to kena,  
 Hem bi yew yew ez sifatê to kena.  
 Ger ebed yew hemdê to qet nêkero  
 Rehmetey to ancî yû gû her bero.  
 Çunkî rehmey to biqeybê yê biya  
 Ger çiqa şermende wû sîne sîya.

*Na fetwa ki ma cor ra behsê yay kerd, binê yay di namey Muftiyê Siweregi 'Usman'î zî nuştewo. Beno ki no zî 'Usman Efendiyo Babî bo ki 1903 di yew Mewlidî dimiliq nuşt bi.*  
*Heto bîn ra Zinnar Sîlopi nuseno ki Muftî Diyarbekir Hacî İbrâhim Efendi û mîrdinê xo Pîrîç çîzadey destâ da'wa Kurdey nêbi, duşmenê na da'wa bî (b'ewnî : Zinnar Sîlopi, Doza Kurdistan, Stewr Basîmevi, 1969, r : 47)*  
*Ehmedê Xasi gelek zeman Hezan di mend. Ay wextan Şêxe Hezanî Şêx Selîm zî Hezan di bi (Soyadîyê key Şêx Selîmî : Aydin o). Wextê Herbê Şêx Seîd'i (1925) di, Şêx Selîmî destâ Hukmatî Tîrkan girewtâ û vanê ki Mustefa Kemal (Ataturk) i yew se'eto zerrén yê rî hediye kerdo. Banê Ehmedê Xasi û Şêx Selîmî zî pé ra nîzdî bî. Labré semedo ki Ehmedê Xasi milliyetperwer bi, mabênen yê û Şêx Selîmî weş nêbi. Xora ewro miridê Şêx Selîmî hima zî Melay Xasi ra hes nêkenê. Vatişbê Hezaniyan gore Ehmedê Xasi gelek şîr (helbest) û Dimîlkî nuşt bi. Nî şîrañ ra yewi di Xasi qîrfan fineno Şêx'î qalê dewîjânê belengazan keno ki Şêx'î rî çiy-mîy ardînê. Vatişan gore Ehmedê Xasi şîrê Kurmançî û 'Erebîkî zî nuşt. Nî şîrîandê yê ra tayıñi melay û suxtay Kurdishanî fek ra zanê. Mesela, Vatişbê Bahri Kçkaya gore Ehmedê Xasi, yew şîra xona 'Erebîkî di qalê Kemal (Mustefa Kemal) i keno, vano :*

*Qidwetu'l-Etrakî turren el-musemma bi'l-Kemal  
Kane me'nahû zewalen, fî'z-zewalin fî'z-zewal.*

*Hina verî, Sultan Ebdulhemid'î xebata Kurdey ra Xasi surgunê Rodos'î kerdo (Rodos Akdeniz dir a). Ehmedê Xasi, şes aşmî (mengî) Rodos di mendo.*  
*Hewna vatişan gore Melay Xasi mesela Kurdey sero Ziya Gokalp'î di zaf munageşe kerdo.*  
*Heze ki peynîya Mewlidî di haseno Fethullah Hesbiyê 'Umerî, qandê Mewlidî Xasi rî yew teqrîza edebî nuşt. Na Terîza 'erebkî di Fethullah Hesbi westê Mewlidî Ehmedê Xasi dano. Ci heyf ki ma derheqê Fethullah Hesbi Sertiî di çiyeķî nêzanîme.*  
*Heze ki Xasi bixo vano nî Mewlid Kirdî 1898 (bi tarîxê 'erebkî 1316) di nuseno ow Mewlid 1899 di Diyarbekir di metteb'e ro guneno (çap beno).*  
*Ewro çend tornê Ehmedê Xasi estê. Nîyan ra 'Elî û 'Evdula Hezan di roşenê.*

Rebbî, halê ma bixû to ra 'eyan  
Lazimey hendî ci ya vaco ziwan.  
Xalîqê ma tim ti yê Barî Xuda  
Şafi'ê ma zî Muhemmed Mustefa.  
Hendî ma şeytanî ra perway ci yo,  
Yû kû tû ra tim biyo bêhêviyo.  
Ey birayê dînî ! Tim goşdarî bê.  
Hem biqelbê xû bixû hêşyarî bê.  
Key şima dî nameyê Şahê şima  
Ame vatiş, sunnet o vacê şima :  
«Esselatû wesselamû ya hebîb !  
Daîma to ro bivarê ya tebîb !»  
Wazenê ger ma xelasiyya temam  
Vatişê ma esselatû wesselam.

### ENÛ MEBHESÊ TERTÎBÊ MEWLÜDÎ Û FEZELEY WENDİŞİ

Lazim o tertîbê mewlûdî temam  
Ma sero vacêñ bizanê xas û 'am.  
Ger ti yew mewlûd xû rê wendîş bidê  
Lazim o tertîb bizanê pê bidê.  
Ewwela tezyînê xû-w'eylanê xû  
Lazim o to rê biqasê halê xû.  
Ca biyarê be'dê cu'ûd û buxûr  
Şerbet û mûman zî ronê bêqusûr.  
Henkî nan û sole zî rone bîra,  
Vende çende merdiman qasê xû ra.  
Ger bipersê «wendîşê roc û şewe»  
Wendîşê şew baştır o hergû hewe.  
Çunkî şew bî ame şahê enbîyan  
Na dunya hem Mekke de ey 'aşiqan.  
'İletê şew çunkî 'îsyanî kemî  
Tim bena waqî' bi ïnê ademî.  
Xasseten yew rey di dunya ay şewî  
Qet gunehkarî ke nêbî yew hewî.  
Ger biyo vatiş «Dilîlê ma ci yo ?»  
Neksê Lat û yût û narê fursî yo.  
'İlleto yew zî dunya bîynê zelam  
Kufr û şîrkî ra hema bîbî temam.  
Yû bişew amew kû loma ma bizan  
Kufrê dunya kerde bî, şew bêguman.

Hasilî qet nînê vatis wesfê yê  
Ma bifek te'rîf biker hem medhê yê.  
    Yû kû xellaqê cîhanî medhê yê  
    Kerdo ma hendî ci vacin wesfê yê.  
Wazenê ger ma xelasiyya temam,  
Vatisê ma esselatû wesselam.  
    Nef'ê mewlûdî şima persê bizan  
    Qet ebed nînê hîsabê defteran.  
Belkî yew yew lazimê vacin şima  
Pê bizanê pîlîyey ay şahê ma  
    Yew tera wendiş biyo ger çî sero  
    Kamo boro gû hezar 'illet bero.  
Hem bedel de rehmete w keyf û surûr  
Nazilê qelbî bido hem feyz û nûr.  
    Meclisa melûd biyo wendiş tede  
    Gû bibo xerq ay di Nurê Ehmede.  
Hasilî kamo kû goşdari buko,  
Yan biwano, yan sebeb bo, bêşik o  
    Cennetê Fîrdewsî ê rî hem verî  
    Boro yû tasike awey kewserî.  
Her cuwabê qebre zî ê rî sehal  
Gû bibo tavil bido 'emma yusal.  
    Hezretê Siddîqî vato yew kelam :  
    Baş bizanê, pê bigîrê xas û 'am :  
«Xerc kero yew dîrheme kamo temam,  
Yû hevalê min di cennet de mudam.»  
    Hezretê Farûqî zî tê'zîmê yê  
    Vato ma ra : «Pê bizanîn qedrê yê  
Qedrê yê kamo bigîyro bêriya  
Zey Muhammed Ehmedî biyaro dinya.»  
    Hezretê 'Usmanî yû Kerrarê sef  
    Her dînan vato 'Ecêb çîke'w şeref :  
«Yew bido yew dirheme biqelbo şedîd  
Zey di Bedr û hem Huneyn de bo şehîd.»  
    Hem bigîro qedrê ê zî ey biran  
    Yû dunya ra nêvecîno bêîman.  
Şeyxê Besrî vato : «Zey Kûhê Uhûd  
Zerdê ma bi gû di yew mewlud de bid.»  
    Fexrê Razî vato : «Weqta ronenî  
    Nan, eger yew boro luqmeyke tenî,

Pîze de gû nan biko cûş û tereb  
 Gû biwazo tim 'efû vaco edeb.  
 Ay kû ez werda, gunehkar o 'efû  
 Wazena ê rê bi namey to 'efû.»  
 Sîrrê Seqtî vato : «Ca w' mewlud tede  
 Wanenê, yû cennet o, yê ha y tede.  
 Çunkî qey hubbê hebîbê basefa  
 È yenê pêser, kenê zewq û sefa.»  
 È zî vato yew hedîsêkew nefîs :  
 «Men ehebbenî huwe 'îndî celîs»  
 Cennetê Fîrdewsî de hetta heta  
 Bes niyo hendî ci vacî ey feta !  
 Şeyx Cuneydî yû Celaluddînê ma  
 Vato hem Me'rûfê Kerxî zî tuba (?)  
 Hinkî nef'ê wendişê mewludê yê  
 Ger biyê vatiş şinê vîst per belê.  
 Qedrê yê ger ma bizanîn ende bes  
 Kafî yo ma rê heta axir nefes.  
 Hasîlî ma kor ê bêhedd û qiyas  
 Ma ci zanê qedrê mewludî binas.  
 Belkî zano qedrê yê rebbê kerîm  
 Medhê yê loma di Qur'ano 'ezîm  
 Kerdo, vato : «Ya Muhammed, ya Emîn !  
 Ente minnî rehmetun li'l-alemîn.»  
 Wazenê ger ma xelasîyya temam  
 Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ ÇINÎ BIYÂYIŞÊ EŞYAN Û SIRRÊ HOMAY O

'Ewwulî xellaqê kullê masîwa  
 Tim tenê bî, baş bizane binewa  
 Nê eno 'erd û enî 'ezmanî bî,  
 Nê perî yû cinnî, nê însanî bî.  
 Nê enî rûcî'w şewî nê nizd û dûr  
 Nê zemanî nê mekanî bêfutûr  
 Yanê nê haca'w tiya enka w verî  
 Qet çinê bî hem çinî kî zey verî.  
 Labelê fîkr û teemmul qet meke  
 'Eqlê heywanî edeb ver pê meke.  
 Yew (yû) 'eqil ku 'eslî yê awe w herî  
 Yû ci zano hukmê şahê Ekberî.

Ger bipersê hîkmetê Homay tera  
 Gû bibo zey meşke perçe, ey bira !  
     Axirî, qet yew bi 'eql û mahirî  
     Nêr'seno me'rîfetê yê Qadirî.  
 Belkî ancax ehlê qelbê muhreqî  
 Yû bizano cuz'îke sirrê Heqî  
     Nişkeno yû zî biko te'rîf hema  
     Cewherê me'rîfetê xellaqê ma.  
 Çunkî heddê herf û sewtan qet niyo  
 Sirrê xellaqê cîhan yê vacîyo  
     Hem meniyyê di qelbê 'aşiqan  
     Bêrê vatiş yê binutqê natıqan.  
 Çunkî herf û sewtî tim cîhatî yê  
 Sirr û me'na cîhetan ra xalî yê.  
     Hasîlî qet eşkenê roşnê çira  
     Hukmê rocî sist kero hukmê xû ra.  
 'Eqî û herf û sewtê ma zî yû qeder  
 Eşkenê sirran bifek biyarê teber.  
     Wazenê ger ma xelasiyya temam  
     Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ XELQÊ PEYXEMBERÊ MA Û XELQÊ ESYAN O.

'Ewwulî darey yeqînî rebbê ma  
 Kerde xelq û pa bî çar şaxî hema  
     Be'dî cû yî padîşahê sermedî  
     Henkî nûrê xû girwet qey Ehmed'î  
 Va : «Bibe Ehmed !». Hema şahê wedûd  
 Şeklê teyra tawuse ame wucûd.  
     Be'dê cû na dawe ser Rebbu'l-umem  
     Zikrê yê kerd bêhîsab, nîno qelem.  
 Be'dê yî zikran hema Rebbê wera  
 Arde yew 'eyney heya na yê vera.  
     Weqto nûrê Ehmed'î anya tera.  
     Bêhîsab yê kerd heya rebbê xû ra.  
 Areqîk da hema şes çîlkê yê  
 Kewtê war çar bî tera çar yarê yê.  
     Yew tera zî bî gulî boy tim yenê.  
     Yîne ra yew zî birinc o ma wenê.

Be'dê cû nûrê hebîbê Ehmedî  
Secde berd panc ray bi qeybê sermedî.  
Yû sebeb ra ma rê panc ferzê temam  
Wacib ê tim ma nimac ker her mudam.  
Be'dê cû duyyes hîcabê nadirî  
Ardî nay ro Xudayê Qadirî  
Nameyê perdan bi xû yew : merhemet,  
Yew keramet, yew zî minnet, menzîlet.  
Yew nubuwvet, yew zî ta'et name bî,  
Yew se'adet, yew zî rif'et ya ebî !  
Yew hîdayet, yew zî te'zîm des temam ;  
Yew şefa'et, yew zî qudret wesselam.  
Be'dê cû nûrê hebîbê serwerî  
Mendo hergû perde de yû çend serî.  
Hergû yew de kerdo zikrêkew temîz  
Heddê yê zano tenê rebbo 'ezîz.  
Be'dê zikrê xalîqê 'erd û sema  
Eşto yû nûr behrê 'îrfanî hema.  
Be'dê yê zî eşto behrê nedretî  
Be'dê nedrî eşto behrê qudretî  
Be'dê cû eşt merhemet behro 'uman  
Weqto bî razî tebr ame heman  
Baskî şay tê, henkî çilkî kewtê war  
Se hezar û vîst hezar û rey de çar  
Weqto yê çilkî kû yê ra bî berî  
Hergû yew bî ruhê yew pêxemberî  
Baskî şay tê, ancî çilkî bêqiyas  
Kewtê war bî ummetê yê 'am û xas.  
Xalîqî yew cewhere yê nûrî ra  
Kerde peyda, be'dê cû anya tera  
Bî di felqey tavilî ay yew hewî  
Yê bi heybet da nezer nîmey yewî  
Tavilî helya bî behrêke'w 'uman  
Heybetan ra dû wû kef da yê (yî) heman  
Kef bî 'erd û 'ewwulî yê Mekke ra  
Yû sebeb ra Mekke bî *Ummu'l-Qura*  
Dû zî ezmanî tera amey wucûd  
La heqîqet ancî zano yû wedûd  
Nisfo bîn ra zî viraştîş da cedîd  
Lewh û kursî yû qelem 'erş û mecid.

Wazenê ger ma xelasîyya temam  
Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ EMRÊ HOMAY O QEY QELEME

Be'dî cû va : «Ey qelem nuştîş bike !»

Va : «'z di emrê to de wa, vatiş bike !»

    Va : Binusne yew çinîko xeyrê min,

    Hem Muhemmed qasid o qey emrê min.»

Weqto ana va, şinawut ay qelem

Tavîlî şî secde û bêhêş bî hem.

    Secde ra weqto wurişte «Rebbena»

    Va : «Ti xellaqê min î ez vînena

Labelê kamo kû namey yê hema

Ame nuştîş nameyê to dir bi ma.»

    Xaliqî va : «'Ewwel û axir ez a

    Yû zî mehhûbê min o 'aşiq ez a.

Ger biqeybê hubbê yê nêbay mi zî

Çîke nêardê wucûd û nê ti zî»

    Va : «Binusne herçî 'isyanê biko

    Yû, gû hîssey yê ci rê agir biko

Herçî nêgeyro bi 'eksê emrê ma

Heqqê yê Fîrdews û dîtiş wechê ma.»

    Ummetê peyxemberanê ba sefa

    Pêro eno nuştî hetta Mustefa

Ummetey yê rê zî dest pê kerd qelem

Kû binusno vaco yê zî ke'l-umem.

    Tavîlî heybet girot vinderte hem.

    Xaliqî va : «Bes teeddeb ya qelem !»

Heybetan ra bî di şîqqî, secde berd

Be'dê secdî va : «Çi vacî rebbo ferd»

    Va : «Binusne, ummetey yê rê surûr

    Ummetun muznîbetun rebbun xefûr»

Yû sebeb ra sunnet o şeqqê qelem

Weqtê qetî ma biker ey za'l-hîmem.

    Be'dê cû nuştî heme teqdîrî tam

    Çi bibo peyda îl yewmi'l-qiyam.

Wazenê ger ma xelasîyya temam

Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ XELQÊ ADEMÎ YÛ NÛRÊ PEYXEMBERÎ YO KEWTÊ PAŞTEY YÊ

Be'dê kullê nuştişê eşyan kû kerd.

Xeliqê cebbarî fermanîke kerd.

Qeybê Cebraîlî va : «Henkî herî

Biyare 'erdan ra bi şeşti tewirî.

Nêbo rengêke tera biyarê kemî

Pê virazên ay herî ra Ademî.

Hîkmetê rengê herî însanî pê

Hergû yew rengêke bî nêbî zey pê

Ha bi şekl û ha şeca'et dilberî

Ha bi cûd û ha bi teb û enwerî

Arde Cebraîlî waro kerde ro

Henkî awey rehmetî kerde pero

Be'dê cû zey mîr 'ecelna yew zeman

Nêdusa pé ra w cê ra bî heman.

Kerde ser aw henkî behrê huznî ra

Yû bînan tavil girot bî hemdî ra

Ma zî loma daîma mehzûn benê

Can yeno pêser muheyyer manenê.

Be'dî va Xalîqo kû zu'l-hîkem :

«'îlmê min de kerdo sebqet huzn û xem.

Qeybê Îbnê ademî ey îns û cin

Kamo ehlê sebrî bo, yû ehlê min.

Kam keso kû nêkero sebr û kerîm

Ez gû ronî yê sero huzn û 'ezîm.

Be'dê cû Adem temam kerd şeklê yê

Hezretê Cibrîlî puf kerd rûhê yê.

Tavîlî Adem wurişt-ronişt verî

Hezretê Cibrîlî secde berd ci rê.

Be'dê cû herçî melek pêro temam

Secde berdî Ademî rê xas û 'am

Tavîlî nurê Muhemmed xatemî

Bî mucella yû di paştey Ademî.

Cenneto Berzex de nay ro va : «Hema

Lazim o na dare ra dûr bî şima !»

Sef bi sef vindertê yê pey de melek

Bî muheyyer, Ademî va : «Ez gerek

Persî Xellaqê cîhan ra no sebeb,  
Yê çi ra vindertê min pey de 'eceb ?»  
Weqto persa xaliqê ra ke'wno hal  
Va : «Eno hîkmet çi yo ya ze'l-celal ?»  
Xaliqî va : «Nûrê şahê cinn û îns  
Ha'w di paştey to de yo, eyro helîs.  
Hîkmet û heybet zî pêro awe wo  
Nî'met û cennet zî pêro awe wo.»  
Ademî va : «Xaliqê 'erş û felek,  
Hes kena bêro muqabil yew melek.»  
Hîkmetê xellaqî ra, dî ame nûr,  
Miyanê wechê yê de tavil bî zuhûr.  
Ademî va : «Rebbî ez hêvî kena  
Yê biya qarşî, xû rê ez vînena. »  
Kerd emrîke'w letîf 'îlmê xû de  
Nûr bî nazil, ame giştâ eşhede.  
Yû sebeb ra giştâ raşte edfel (efzel) a  
Zey çeppe ey ehlê hubb û mubtela.  
Loma weqto nengûyê xo quesnenê  
Desto raşt de 'ewwuli dest pê kenê.  
Desto raşt ra zî kû giştâ nûr tede.  
Be'dê cû hîrê hemey ya kişte de  
Be'dê yîne, pîle zî kû quesnenê.  
Desto çep tertîb tede nêvrazenê  
Çunkî giştê destê raştî edfel ê  
Ma verî vato şima zanê belê.  
Lazim o ma hîkmetê tertîbê vac  
Çunkî hergû derdî rê esto 'îlac  
Weqto yû nûr ame giştê bî sekan  
Nûrê çar yaran zî amey yê bînan  
Nûrê Siddîqî di raştê sidqî de  
Bî sekan Farûqî zî siddîqî de  
Nûrê 'Usmanî zî raştê 'Umerî  
Yê 'Elî kiştâ çeppey peyemberî  
Weqto Adem çim gina giştâ şede  
Ay kû nûrê Mustefayî ha'w tede.  
Bî muferreh va bi îlhamê rebî  
- «Esselamû» hem «'eleykum ya ebi !»  
Da cewab nûrî vera rebbê wera :  
- «We 'eleykumu's-selam» va tera.

Yû sebeb ra ma bid' sunnet o  
Reddê yê zî ferzêke'w kîfayet o.  
Wazenê ger ma xelasîyya temam,  
Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ EŞTİŞÊ ADEMÎ YO CENNET RA Û MARDIŞÊ KALIKANÊ PEYXEMBERÊ MA WO

Hezretê hewwa nezer da Adem'î  
Va : «Çi nûr o ?» Va : «Yê fexrê 'alemî»  
Xaliqî hurdî muzeyyen kerdî bî  
Hem di cennet de muxeyyer kerdî bî.  
Be'dê cû kû Ademî bêemri kerd  
Xaliqî va : « Yê bigîrê b'erzê 'erd !»  
Tavîlî lîbas û tezyîn bî vinî  
Yînê ra wû eştê na dunya genî  
Bî fixan û zariyey yê hergû hew  
Qet ebed nêbî sekan yû roc û şew.  
Bî temam hetta kû hîrê sey sere  
Kerdê zergûn hesrê yê dar û cere.  
Vatişê yê zî eno bî roc û şew  
«Rebbena» vatê «zelemlâ» hergû hew.  
Be'dê cû yew roc wurişt-ronişt hema  
Yew nezer da 'erşê xellaqê Sema.  
Dî kû nuşto : «Yew çinîko, tim ez a,  
Hem Muhemmed mursil o, mursil ez a.»  
Va : «'z di bextê ay Muhemmedî de wa,  
Min 'efû ke rebbî ez bê çare wa !»  
Hezretê Cibrîlî wehye arde ser  
Va : «Ricay to bî qebûl wurze xû ser !»  
Be'dê 'efwey Ademî ra bî'l-yeqîn  
Amey paştey şîsî yû nûro verîn  
Şîsî ra zî ame lacê yê hema  
Nişkena hendî bimara qey şima.  
Çunkî hetta bêro Ednan'î reso  
Gû bibo nizdî se namî pê reso.  
Hem tede esto xîlafêke'w temam  
Yew muheqqeq nişkeno vaco kelam.  
Labelê 'Ednanî ra pey yê hema  
Vîst û yew pî beşek ê vacê şima.

'Ewwulî 'Ednan û Me'd û hem Nîzar  
Yew Muder bî, yew zî Îlyas namedar.  
    Mudrîke yew, yew Xuzeyme, yew Kenan  
    Nedr û Malik, Fehr û Xalib zî heman  
Hem Lu'ey, hem Ke'b û Murre hem Kîlab  
Hem Qusey zî hewtê û des amey hîsab  
    Yew zî yû 'Ebdulmenaf û Murte'îb  
    Yew zî Haşim, yew zî 'Ebdulmuttelîb.  
Şîsî ra hetta tiya nûr bî nîhan  
Fuc'eten pî yê de bî zahir heman.  
    Wazenê ger ma xelasiyya temam.  
    Vatişê ma esselatû wesselam.

ENÛ MEBHESÊ 'EBDULLAHÎ YÛ CUHÛDÊ ŞAMÎYAN  
Û WAŞTİŞÊ AMÎNA CI RÊ

Weqto 'Ebdullahî de nûr bî zuhûr  
Kafiran zana kû amey nizdî nûr.  
    Be'dê cû geyray bi qetlê yê hema  
    Hafizê yê xaliqê 'erd û sema.  
Tim qicî ra pawutê yê kafran.  
Cay ke 'Ebdullahî bikşê bêbiran.  
    Ray ke hewtay heb cuhûd pîya bî heval  
    Sondî wendê, kerdê eqdêkew betal.  
Yû heta ger nêro kiştiş ma hema  
Gû bigeyrin roc û şew tim yê dima.  
    Ma ebed nêfeyrenê eger meram  
    Nêkerin îcra kû vacin ax û Şam.  
Miyanê Şamî ra wuriştê hergû hew  
Şînê rey ra nê biroc daîm bişew  
    Kewtê çol û Kerbelayê kafirî  
    Şî heta dûrê Mekî zey adirî.  
Kerde casusî heta yew rocîke  
Ama 'Ebdullah tenê şî çolîke  
    Weqto dî, kewtê dima zey vergê har  
    Şî bi yê berxê ciwanî hey hewar.  
Pêro piya şî, yew tera nêbî kemî  
Labelê hafiz bî rebbê 'alemî.  
    Weqto şî yê het Cuhudê Şamîyan  
    Tavîf yew 'askere rûhaniyan

Ame 'ezman ra Cuhûdî tar û mar  
Kerdê, pêro eştê, şî yê zey xubar  
Mend 'Ebdullah tenê yû xanedan  
Hifzê yê kerd xaliquê însan û can.  
Yew Weheb bî Zuhriyan ra namedar  
Yû zî yû roc ame bî seyd û şîkar  
Yê zî weqto dî eno hukmo 'ecîb  
Bî muheyyer va : «Eno hîkmet xerîb»  
Weqto yê dî yê ro yew hîkmet gîna,  
Va : «Mi yew keyneyke esta : Amîna.  
Gû bidî yê ger bido yê ra qebûl  
Laîqê yê wa tenê a yew betul.»  
Be'dê cû ame Weheb sahib kemal  
Şî keye va kiyê xû ra : hal û hewal.  
«Hem tesewwur qelbê min de vînena  
Tim, beno kû ez bidî yê Amîna.»  
Hem şî 'Ebdulmuttelîb dî, va tera :  
«Esta yew keyneyke min zaf nadir a  
Laîqê ay nêdiyo min qet tu qewl  
Xeyrê 'Ebdullahî ger yê ra qebûl  
Gû bibo ez gû bidî yê serwerî  
Ay bi emrê yew Xudayê ekberî.»  
Hem şî 'Ebdulmuttelîb va ay xeber  
Kerd 'Ebdullahî di tavil eser.  
Be'dê cû şî yê bi 'urfê ay zeman  
Waşte 'Ebdullahî rê şahê cîhan  
Yew weqeyke zerd û yew sêm hem se pes  
Hem devey zî zey pesan day ende bes.  
Weqto arde hem Yene bî ay şewe  
Hem Receb bî aşme bîbî yew şewa.  
Wazenê ger ma xelasîyya temam  
Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ ÎNTIQALÊ PEYXEMBERÎ YO Û HEWNANÊ AMÎNA WO

Be'dê cû nûro kû ma kerdo sena  
Ame bî meyman bi qeybê Amîna.  
Weqto yû nûr Amîna de bî zuhûr  
Amîna zî dî 'ecîb 'îzz û surûr.

Bêhîsab nîno ebed vatiş temam

Ma biker tefsîl bizano xas û 'am.

Amîna va : «Weqto min zana kû nûr

Amewo meymaniyyey min bêfutûr.

Yew şewike ez di hewnêkew şîrîn

Min dî ame merdumêko enwerîn :

«*Merheba fi ke Muhemed !*» va hema

Namê min persa û va : «Ez Adem a»

Hem Receb bî ay şewa kû Ademî

«Merheba» va qeybê fexrê 'alemî.

Be'dê cû şe'ban de yew şew ame şîs

Va : «*Selamun*» hem «'eleyke ya reis !»

Ame aşma bîne îdrîso refî

Va mi ra : «To rê mubarek bo şeffî».

Ame aşmey çarîne Nuh ba sefa

«*Esselamû*» va «'Eleyke Mustefa !»

Ame aşmey pancîne Hud hewnê min,

Va «*Selamû*» hem «beşaret» qeybê min.

Weqto bî Zu'l-hicce İbrahîm be nam

Ame va hemlê mi ra yê yew selam.

Va di aşmey hewtê İsmâîl zebîh

«*Barekellahû leke hemle'l-melîh.*»

Ame aşmey heştî Mûsa, qey mi, va :

«*Ebşîrî ya Amîne bî'l-Mustefa !*»

Ame new aşman de 'Îsa va mi ra :

«To rê mujdyanî bi sultanê wera..»

Hem dî hewnê bêhîsabê nadirî

Ger bibê vatiş bi emrê qadîrî.

Gû bibo derg no kitabo nazenîn

Belkî mûcîb bo bi 'eczê hazırîn.

Weqto bî şeş aşme hemlê ay ci rê

Kerde 'Ebdullahî quesdê tîcîrî.

Gû Medîne Xalîqî da nêweşî

Qeybê 'Ebdullahî şerbet werd û şî.

Na dunya ra yû hebîb û enwerî

'Umrê yê zî pêro vîst û panc serî

Weqto 'Ebdulmuttalîb bî ba xeber

Amîna berma wû va ah û keser.

Va : «Zerey min bî di nîmey wey limin !

Xalîqî verda yetîm no hemlê min..»

Dar û ber pêro teder bermay bihal  
 Hem çığa heywanî der sehl û cîbal  
     Yew melek nêmend û ruşti va : «Kerîm  
     Nê hebîbê to Muhemmed bî yetîm.»  
 Da cewabêkew letîf ay yew Rebî  
 Baştır a yê rê bipansey may û pî  
     Ey gelê 'aqil temam û 'aliyan !  
     Ma ci zanê qedrê durrê 'aliyan  
 Wazenê ger ma xelasîyya temam  
 Vatisê ma esselatû wesselam.

**ENÛ MEBHESÊ WELEDNAYÎŞÊ PEYXEMBERÊ MA WO**  
*(Sellellahu 'eleyhî we 'ela alîhî wesselem).*

Şî Rebîulewwelî ra des şewî  
 Amîna bî xerqê nûrî yew hewî.  
     Amîna va : «Weqto bî duyus şewî  
     Ez tenê menda di xelwe bêyewî  
 Ay şewî hem bî duşenbe bêfutûr  
 Min dî çar cinî mi rê amey huzûr  
     Meryem a yew, yew zî Sara, Asîya  
     Yew zî ay Hewwa kû bî umme'l-wera.  
 Xidmetê min kerdê yîne bêqusûr  
 Qet mi nedî ezyetîke bî zuhûr.  
     Be'dê cû teyşan bîya ez bêhîsab  
     Min dî ame şerbetîke'w zey gulab.  
 Labelê nê şekker û nê engemîn  
 Çike zey yê şerbetî nêbî şîrîn.  
     Werdişê yê dir rehet bî canê min  
     Min dî yew teyrike ame banê min.  
 Tavîlî min dî hebîbê min emîn  
 Ame dunya qûmû qewme'l-hazirîn  
     Xeyrê insanî çığa eşeya bî va :  
     «Merheba, ya Seyyîde'l-kewneynî !» va  
 «Merheba, ey sîrrê subhan merheba !  
 Merheba, ey rûhê rûhan merheba !  
     Merheba, ey fexrê 'erşî merheba !  
     Merheba, nesley Qureyşî merheba !

*Merheba ! ya sahîbe'd - dînî'l - mubîn !*  
*Merheba, ya sadîqe'l - we'dî'l - emîn !*  
*Merheba, ya men sereyte bî'l - herem !*  
*Merheba, ya men denewte bî'l - qedem !*  
*Merheba ya qurrete 'eynî'l - wera !*  
*Merheba ya men nubî'te fî'l - Hira -*  
*Merheba ya 'alîme'l - 'îlmî'l -ezel !*  
*Merheba ya şaff'an yewme'l - wecel !*  
*Merheba ey rehmeten lî'l - 'alemîn !*  
*Merheba ya men şeff'ul - muznîbîn !*  
 Wazenê ger ma xelasiyya temam  
 Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ HENÎ 'ECAYÎBAN O AMEY WUCÛD ŞEWÊ MEWLÜDÎ

Weqto ame na dunya tavil hema  
 Secde berd qey xaliqê 'erş û sema  
     Secde ra weqto wurişt va : «Rebbena  
     Ummetey min 'aciz a, ez vînena.  
 Qeybê nefse min rica qet nêkena  
 Belkî qey yîne rica to ra kena.»  
     Goş ci şanê hîmmetê şahê şima  
     Tayne ez vacî tera qeybê şima.  
 Yew di kîsra de tera Nûşîrewan  
 Vatê, namey yê di bo weqt û zeman  
     Adirî rê kerdê 'îbadet mudam  
     Qasê yew henzar sere bêşek temam  
 Adirê yîne ciray nêbî çinî  
 La şewey mewlûdî de yû bî çinî  
     Hem biqey Nûşîrewanî banîke  
     Bî di Kîsra de tera eywanîke  
 Vîst û yew qenter bî çares kewtê war  
 Ay şewî de banî hîmmet ra neçar.  
     Behrê Sawa zuwa bî yû zî a şewi.  
     Aw tede nêmende esla yew hewi.  
 Hem şewey mewlûd tede biyo, siba  
 Yew cuhûd bî şarî ra persa û va :  
     «Persê yew mewlûd Qureyşî kamî rê  
     Bî di emşo muzhir o ıslamî rê.»

Ame vatiş va kû : «'Ebdullahî rê  
 Yew weled emşo biyo yê şahî rê..»  
     Yew cuhûd tavil wuruşt şî qeybê yê  
     Va : «Mi rê biyarê teber, ez banê yê..»  
 Weqto dî, yê va : «Bi Tewrato mubîn  
 Gû biko batîl enû dîno verin.  
     Xatemê peyxemberan o *bî'l -yeqîn*  
     Îsmê yê Ehmed, Muhemmed hem Emîn..»  
 Wazenê ger ma xelasiyya temam  
 Vatişê ma esselatû wesselam.

### ENÛ MEBHESÊ HELÎMAY SE'DIYAN O (Rezîyellahû te'ala 'enha)

Amîna va : Hewnê min de bî beyan  
 Gû bido yê şit Helîmay Se'diyan  
     Çende rocî be'dê cû yew kariwan  
     Ame Mekke name vatê Se'diyan  
 Yîne dir bî hem Helîmay Se'diyan  
 Şî xû rê berd Seyyîdê însan û can  
     Ay yew Lacî ke qic bî zumrete  
     Hurdî piya bî şitwerê ay hurmete  
 Yew herîke bî tediş yû zî lexer  
 Labelê nêrsaynê ci esla tu her  
     Çunkî paştey yê sero *nûru'l - en'am*  
     Bî bizanê her zî Ye'für bî binam.  
 Se'diyan weqto kû dî hukmê herî  
 Bî muheyyer va : «Helîma ra verî.  
     Ma xû rê vatê eno her gû di rey  
     De bimano, nêşkeno bêro çirey  
 Ma di enka vînenê zey yew xezal  
 Meş keno rey ra bi emrê la yezal  
     Hem şima hîrê tenî piya niştê ci  
     Ancî yew her nêrseno pey ra bi ci..»  
 Tavîlî Homay zuwanêke'w fesîh  
 Vist yê fek yê bi sewtêke'w melîh  
     Va : «'Ecêb min de memanê Se'diyan  
     Ez bi nî şîklî eger şî asiman

Çunkî nişto min Muhemed zu'l - elem  
 Yû kû qey yê xelq biyê 'erş û qelem  
     Eyro paştey min bi xû efdeltir a  
     Masîwa ra baş bizanê ey wera !»  
 Se'diyan pêro 'ecêb mendê temam  
 Va : «Xiyal o yan bîra o no kelam ?»  
     Şî keye axir Helima serwere  
     Kerd wey hetta kû bî hîrê sere  
 Va Helima : «Qet ebed yew ray ke ver  
 Min necaset nêdî êwa hem eser»  
     Weqto 'ewwul bî xeberdar yû nezîr  
     Va hema : *Ellahû Ekber min kebîr*  
 Be'dê cû ancî Helima nazike  
 Kerd espar û verê yê şâ Mekke  
     Berd û teslîm kerd bi qeybê Amîna  
     Ay zî bî şâ, ma zî şâ ke rebbena !  
 'Emrê yê weqto temam bî şes serî  
 Amîna zî şî dunya ra ay serî  
     Weqto yê rî heşt serî bî munqelîb  
     Qebri rê meyman bî 'Ebdulmuttelîb  
 Mend Ebî Talib tenê pî Heyder'î  
 Bî ci rê hafiz bi emrê ekberî  
     Wazenê ger ma xelasîyya temam  
     Vatişê ma esselatû wesselam.

## ENÛ MEBHESÊ NUZÛLÊ WEHY O Û MÎ'RACÎ YO

Be'dê cû anya kû dunya fanî ya  
 Hem bi qîmet qasê yew dasî niya  
     Va xû rê : «Rebbî, ti zanê, vînenê  
     Çike ra hes nêkena bêtû tenê.»  
 Tim enû fîkr û meram bî hergû hew  
 Xeyrê yê yew çî çinê bî roc û şew  
     Yê heta çewres sere kerde temam  
     Tim di qelbê yê de bî *Rebbu'l - enam*.  
 Hem bi xû zanaynê yû xalî niyo  
 Gû ci rê 'ezmanî ra çîke biyo.  
     Yû bi nê fîkr û xiyalî rocîke  
     Tavîlî anciya şî miyanê kohîke

Nameyê koy zî tera vatê Hira  
Zaf tera hes kerdê ay *xeyru'l -wera*  
    Tavîlî anya kû qelbê yê heman  
    Bî ze roc weqto yeno miyanê çiman  
Bî tebeddul rengê yê mil şî vero  
Hezretê Cibrîl bî nazil yê sero  
    Arde «*lqra bîsmî*» qelbê yê de va  
    Tavîlî şâ bî Muhammed Mustefa  
Hendî zana kû temam bî we'dê yê  
Yew resûl esla çinîko be'dê yê  
    Hendî ewca ra tepya hergû hewe  
    Arde wehyî hem bi roc û hem şewe  
Be'dê wehyî şî temam duyyes serî  
Yew şewîke emrê şahê Ekberî  
    Ame Cebralî ser va sermedî :  
    «Biyare 'ezmanê hebîbê Ehmedî !»  
Pê muşerref bî eno 'erş û felek  
Hem muferreh bî biyê herçî melek  
    Vîst û hewt şew şî Recep ra bî'ttifâq  
    «Cae Cibrîlû îleyhî bî'l - Bûraq»  
Va tera Kû «Xalîqê tû yew selam  
Kerdo, vato bêrê min het hey meram.»  
    Ca de hêz da şî bi Awêy Zemzemî  
    Xeslêke'w sunnet eda kerd ay demî  
Be'dê cû yê kerd nimacêke'w xerîb  
Hezretê Cibrîl tede mendi b' 'ecêb  
    Weqto yû farix nimac ra bî temam  
    Linge eşte zengû ay *xeyru'l -enam*  
Kerdi quesdê Qudsî şî awca verî  
Bîbî hedre hem heme Peyxemberî  
    *Mescîdu'l - Eqsa* de çim rey mendî bî  
    Hem çiqa cinn û melek nêmendê bî  
Pêro amey bî hema sef sef temam  
Yû zî ame yîne rê da yew selam  
    Bî muferreh hem bi tertîb û edeb  
    Şî zîyaret kerdê yû şah û 'Ereb  
Be'dê cû şâ yîne vernî bî imam  
Kerd nimacîke bi qey *Rebbî'l - Enam*  
    Hem niyaz kerd û du'ayî hem rica :  
    «*Rebbî edxilna'd - du'ae we'r -reca*»

Be'dê cû tavil wurişt *tacu'l - enam*  
 Şî siya meşhûre ser *fîhî's - selam.*  
 Sî sera Cibrîlî na baskê xû ser  
 Berd şî 'ezmanî yû xeyre'l - *besser.*  
 Hem ci rî bî a *cemî'izu'n - niqab*  
 Ha çi cennet ha cehennem ha *'iqab*  
 Hem ci sırrî bî di kenzey sermedî  
 Pêro day dîtiş bi qeybê Ehmedî  
 Hasîlî weqta kû şî Sidre heman  
 Hezretê Cibrîl zî ewca bî sekan  
 Va : «De şore, ya Muhemmed, hem Emîn»  
 Va : «Çîra nînê birao nazenîn ?»  
 Va kû «Yew linge tiya ra nêşkena  
 B'erzî, ger berzî, hema ez veşena.  
 Hem ci mexlûqo kû Homay xelqê yê  
 Kerdo, tiya ra wet çinîko heqqê yê.  
 Linge berzo xeyrê to ey nazenîn  
 Belkî heqqê to tenê yo bî'l - *yeqîn.*»  
 Wazenê ger ma xelasîyya temam  
 Vatişê ma esselatû wesselam.

Weqto Cebraîlî ra ver bî Hebîb  
 Ame şerman ra ci rî xewfo xerîb  
 Bî muheyyer, hendî nêzana seyîn  
 Şo huzûrê ay kû *Rebbî'l - alemîn*  
 Tavîlî venda ci *Xellaqê wera :*  
 «*Udnû minnî ya hebîbî*» va tera.  
 «*Hîne nudîye'l - hebîbe bî'l - wedûd*  
*Şase fî behrî't - tecellî we's - şuhûd.*»  
 Xalîqî perde wedarut va : «*Emîn*  
*La texef, unzur bî xeyrî'r - raziqîn !*»  
 Dî cemalê yê di rey bê reyb û şek  
 Labelê nîna ebed vatiş bife.  
 Hasîlî hendî ci vacî ey *besser*  
 Yû kû Homa yê bero 'erşê xû ser.  
 Wesfê yê hendî yenê vatiş temam  
 Ger hema vacî *îla yewmî'l - qiyam.*  
 Hem kelamê xalîqî vatê tedit  
 Qet yenê nuştîş bibê behrê hebûr

Hem henî sîrrî tera estê heman  
Nişkeno vaco ebed yîne zuwan  
    Çunkî meydanê fek û herfan niyo  
    Sîrrê subhanellezî pê vaciyo  
Hasîlî ancî hema Rebbu'l - umem  
Kerd nazil Mekke de sahib - kerem  
    Be'dê cû mend yew serîke lacerem  
    Kerd hîcret şî Medîne zu'l - 'elem.  
Des serî zî mend Medîne de temam  
'Umrê yê hîri yû şestî wesselam.  
    Wazenê ger ma xelasîyya temam  
    Vatişê ma : esselatû wesselam.

*HAZA DU'AÜ MEWLÎDÎN - NEBÎYYÎ*  
(sellelahû 'eleyhî we 'ela alîhî we sehbîhî we selleme)

Ya îlahî kemterîn û qasir ê  
Ma heme Rebbî, ti zanê nazir ê  
    Rehmetey to zaftir a zey qehrê to  
    Ma îman ardo bi no vatiş bi to  
Ger çiqa ma 'asî yû şermende yê  
Labelê ma tim di xewfê to de yê  
    Ger ti banî fî'lê ma ra ey Xuda  
    Ma rê hendî nêbena esla reca  
Ma xû rê zanê kû 'asî yê temam  
Labelê ma rehmetey to a meram  
    Ma sera vazdin ? Çinîko ma mecal  
    Xeyrê yew dergahê to, ya Ze'l - celal !  
Ti biheqqê hurmetê namey xû ke,  
Ma feqîr û bekesan mehrum meke !  
    Ehlê îmanî çiqa estê temam  
    Ademî ra şo, îla yewmî'l - qiyam.  
«Rebbî fexfir malehûm yewme'l - hîsab  
La teweddi'hûm kelîlen bî'l - 'îqab  
    Rebbena lew lem yekûn lütfûn 'emîm  
    Eyne Xasî fî'l - Siratî Mûsteqîm ?  
Werzuqellahumme hesne'l - xatime  
Lî Cemî'il - mûslîmîn el-Fatîhe.



*Temam bi viraştişê Mewlidê Kirdî bi yardımê xaliqî we (û) feyz (?) û bereketê peyxemberê ma (sellelahû 'eleyhî we 'ela alîhî we sellem) bi destê Ehmedê Xasî Hezanî (Hezancî) di hinzar û hîrsey û şiyyes serri de, bi tarîxê 'Erebî.*

*Be'dê enî bizanîn ma ferq kerdo beynatey kafê 'erebî û xeyrê 'erebî bi hîrê nuqtan. Ye'nî ma kafê 'erebî sero nuqtey néronay û xeyrê 'erebî sero ma hîrê nuqtey ronay zey «gişt» û «kişte». Axırı enî çî enayin ferq benê, bi nuqtan nêbo nînê zanayış wesselam.*

☆☆☆

### **HAZA'N - NEZM'Û'T - TARÎXÎ LÎ MÜELLÎFÎ'L - MEWLÎDÎ**

*Leqed temme te'lîfûn bînezmîn mumeccedîn  
Ke 'eqdî's - Sureya summe ne'sîn we Ferqedîn  
Lî Mewlîdî men lewlahû lem yuxleqî'l - wera  
Bî eydî'l - Hezaniyyî'l Xuweysîyyî Ehmedîn  
Lede'l - Hacî İbrahîme ustazî'l - 'alî  
Nesîbûn bîewladî'l - Elîyyî we Ehmedîn  
Fî sittîn we eşrîn we selasîn mîne'l - mîat  
We elfîn hîlalen be'de hecîr Muhemedîn.  
Felemma erade kullû şehîdeynî  
Feeşhedtû hetmen hahûna babe ebcedîn  
790 + 449 + 62 + 5 + 10 (yekûn) 1316*

☆☆☆

### **EYZEN LÎ MUELLÎFÎHÎ**

*Ma medehe'l - Xasî Resûle's - Seqeleynî  
Bel mûdîhe'l - Xasî bîceddî'l - Heseneynî*

### **EYZEN LÎ MUELLÎFÎHÎ**

*Ma neqinay (?) hengî behsê emcedî  
Kerdê Mewlûdê Muhemed Ehmedî*

HAZA'T - TEQRÎZÛ LÎ'L - 'ELLAMETÎ ES - SÎ'RDIYYÎ'L -  
'UMERÎYYÎ FETHULLAH HESBÎ

Înnî reeytû'l - elmeî'ye'l - emcede  
Fî medhî xeyrî'l - enbiya qed ewcede  
Sifren celîle'l - qedrî ïz hurûfûhû  
Fî 'eynî hûrî'l - 'eynî tulqal esmede (etmede ?)  
Bî'z - Zazawîye qed xedet lûxatûhû  
Menzûmeten ke durrî nî'me'l - mewlîde  
Me'nahû yedrî ehlûha mîn xeyrî tefsîrîn  
Yûra te'lifû fiha ewhede  
Muz e'cebe'l - azan Hesbî errexe  
Enqîd bîsifrîn lîl - Xuweysî Ehmede.  
155 + 342 + 766 + 33 (yekûn) 1316.

# NIMÛNEY EDEBIYATÊ DIMILKÎYÊ KLASIK Û DÎNÎ

## BIYÎŞÊ PÊXEMBERÎ (MEWLÛDA NEBÎ)

"Usman EFENDÎ \*

Bismîllahîrrehmanîrrehîm

Binamê Hûma ez do kena îbtida,  
Xaliqê nê 'erd û azmîn yad kena.  
Bibo 'efû gunayê ma vêrdo,  
Gunehkarey ki 'emre xo di kerdo,  
Selewatî biwanîn rind û bolî,  
Biresnên peydê may resûlî.

☆☆☆☆

Jew hîkayet qal keran to rê bira,  
Qedrê Mewlûdî bizan ti ci ra.<sup>1</sup>  
Sûka Bexdadî miyan di bî cenêن,  
Zeydê cey nêdî bî kes erbabê dîn.  
Lajekêndo Salih û ehlê yeqîn  
Ay cenî rê da bî Rebbîl-'alemîn.<sup>2</sup>

\* Usman Efendi (?-1932) : 'Usman Efendi Sîwerekî o. Muftiyê Sîwerekî bi. Mewlidê xwino Dimilkî (Zazakî) 1903 di nuşt. No Mewlid, 1906 di rişt Diyerbekir ki çap bibo. Labrê semedo ki Diyerbekir di nêşinawo biwanê, çap nêbiyo.

Meşrûtiyet (1908) ra pey Qeymegamê Puturge (yew qezay Melatyâ) Faiz Beg Bedirxanî, no Mewlid xo dir berd Estembul ki wica çap kero. Çifayde ki Estembul di zî kesî nêşinawo yê biwano û çap nêbiyo.

'Usman Efendi 1932 di Sîwerekî di şî rehmet. Mewlide Usman Efendi, 1933 di Celadet Alî Bedirxanî Şam di bi herfanê erekî çap kerd. (B'ewnî : Hêvî, Paris, no. 2 (Gulan 1984), r : 77-85).

1 Qedrê Mewlûdî bizanî sufti ra.

2 Ev beytaha di nîviştâ Muhammed 'Elî 'Ewnî Efendî de pêş û paş e. -Celadet Alî Bedirxan.

Ay cenêk merdi w lajek bî warisey,<sup>3</sup>  
Çaxo mayî merdi mend altunê cey.

Labelê vatîn : «Bi ney çiçî» bira<sup>4</sup>  
«Ez bernînan şaş biyan ya rebbena !»

Tim bi no fîkr o şiyîn û aşt û naşt,  
Waneyayn cayêndo mewlûd ame raşt.  
Goş dida mewlûdî o rojay temam,  
Hewn dî, a şew di qilayawo qiyam.

Jew zî vatîn ehlê mewlûdî sela,  
Rew şima bêrîn bi cennet ca bi ca.

«Ez jî kewtan zerre» va ay lajekî  
Hem uja koşkêndo berz û rind min dî.»

Va : «Min zerrî kerd şiran koşkî miyan»  
«Îta cayê to niyo» va bekçîyan.<sup>5</sup>

«Kam ki mewlûda nebî da wendin», ey  
Va : «Bibo na qesra 'alî cayê cey».<sup>6</sup>

Çaxo aya bî, erîna b'ey peran,  
Qandê mewlûda nebî bol goşt û nan.<sup>7</sup>

Hadre kerd zad û veýnda çend peyey,  
Wend aynan melûd, va «No vist berey»<sup>8</sup>

Hurke ser no terzi va ê serwerî,  
Wendî mewlûd, kerdî şâ pêxemberî.

Çaxo ecel ame, dî, ey haziran,  
O bikeyf û bi huwate da bî gan.<sup>10</sup>

Kesî ferq nêkerdi key merd o ciwan,  
Jew rişt do va, hekîmî ard eynan.

Va : «No razî kerdo Rebbi'l-alemîn,  
Aferîn no haldê nê rê aferîn !»

3 Weqta may merd, mend altunêndê cey,  
Lajî altuni girot bî wahirey.

4 Labelê vatîn : «Bi nê çiçî» bira  
«Ez b'erînan, şaş biyan ya sekeran ?»

5 «Utiya cay to niyo» va bekçîyan.

6 Va : «Bibo qesr û malê hemnişîn»

7 Weqta hêşyar bî erîna bi ay peran,

Qandê mewlûd berx û beran.

8 Wend inan mewlûdê weş hemû serre.

9 Emr no terza va, ê serwerî.

10 Peynî ecel ame, dî, ey haziran !  
Di nîvişa Muhemed 'Elî Efendi de ji hêre berjêr deh beyt kêm in. -Celadet 'Alî Bedirxan

Çimî akerd lajekî, va ay dima :  
«Meskenê xo dî mi cennet di nika.  
    Çunke hurke serî min mewlûdê cey  
        Wend, biyan cennet di enbriyanê cey.  
Wendini din (?), «hem biwanên» va «Şima  
Hurke ser mewlûd biyârên rind bi ca»

Ey hina va û terekna na dinî,  
Ganê xo cennet di resna ey nebî.  
    Çunke mewlûdî rê hurmet kerd bi ey,  
        Bîbî cennet mesken û hem cayê cey.  
Ey cema'etên şima zî ser te ser.  
Qedrê mewlûdî bizanîn serr bi serr.  
    Şa kerên (?) sultanê ê hurna dinî,  
        Ta bibî cennet di enbazê nebî.  
Ya Xuda, no yo rica ma rûsiyan,  
'Ef kerî ma û birasnî tu b'inan.  
    A dinî û na dinî û di dî necat,  
        Kam ki wend pêxemberî rê esselat.



Goşê xo ser nêñ cema'et, Rebbê ma  
Kerd xezîne xo miyanî eşkera.  
    Kaf û nûn ard pê het, emrê kerd,  
        Bîbî îcad 'erd û azmîn, germ û serd.  
Nûrdê xo ra kerd bî nûrê Ehmedî,  
Ay nûrî ra xelq kerd ta Muhemmedî.  
    Bado, cey Adem Xeleqna heri ra  
        Ame o nûr çaredê bedrê riwa<sup>11</sup>  
Bado Hewa bîbî peyda, ame rew,  
Çare di vinderdî zeyda menga new.  
    Bado ame peydê ma o nûr resa,  
        Kalikê Ehmed di nûr bî eşkera.  
Kalikê ey va ki 'Ebdulmuttelîb  
«Bimin dê des lajî, ya Reb, ya Hebîb !  
    Raydê to di ez jewî qurban keran,  
        Ta min rê verdî îlahî ê newan.»

---

11 Ame o nûr çaredê ey dî jewa (?)

Ez keremdê xo ra da Ellay bi ey,  
Pey di ma va bî ci rê des lacê cey.

Ke'be do ronişt û veynda çend peyan,<sup>12</sup>

Va ki : «ez do we'dê xo ra ca bidan..»

«Qur'e be'rzî»~va cemati ci rê-

«Ta ki no girwe bi qur'e sax kerî»<sup>13</sup>

Qur'e eşt û kewt -bi 'Ebdullahî ser,

Razî nêbî -va- cema'eto bêxeyr.<sup>14</sup>

Ya senîn razî bî ney rê serwerî

O do bibo pêrê nê pêxemberî.

Va peyanê haziran, destê bi ey

«Cay dê ey di ronîmi (ronemi) ma des devey..»

Des finî (fimî) no terza qur'e erziya

Hurke des di namedê ey vijiya.

Fina jewndes ki eşto qur'e inan<sup>15</sup>

Qur'e no fin (fim) kewt binamê ê devan.

Çun devey bî dûz bi se qurbanî rê,<sup>16</sup>

Kerd bi qurban ê devan vanê ci rê.

Çaxo qurban bî devey Ellay resay,

Pêro lajî ta ki no girwe reyay.<sup>17</sup>

Kam ki adir ra xelasî xo rê waşt,

Wa biwano ê Resûlî rê selat.<sup>18</sup>



Ta ki 'Ebdullah resa û waşte keyn,

Ard ey rê cayêndo rind ra keynekên.

Name Amîna, bixo bol rindî bî

Nêresa nengûdê ca ra kam bîbî<sup>19</sup>

Da bipêr malêndo bol û veyve kerd<sup>20</sup>

Kerd û werd û werd keyandê xo rê berd.

Pê het amey û şewêndo xeyrî bî,<sup>21</sup>

Va mirazê xo girotin jew bibî.

12 Ke'be di ronişt û veynda çend peyan.

13 Ta tu no girwe bîqur'e hewi kerî.

14 Razî nêbî ney rî cema'eto bêxeyr.

15 Fima jewndes ki eşt qur'e inan.

16 Qey devey va, duz bî se qurbanî rê

17 Pêr û laja va, ki no girwe reyay

18 Kam ki adir ra xo rê xelasî waşt,

Wa Resûlî rê buwano esselat.

19 Nêresa nengûdê ay keyney ki bîbî.

20 Da bi pêr malêndo vêş (vis) û veyve kerd

21 Pê het amey ê şewêndê xeyrî di.

Va mirazê xo girewt jewbîni di.

Amîne va : «A şew ame veng mi rê»,  
 Va : «Nika ti mayêk a Ehmed yê»<sup>22</sup>  
     Ney ser ra vêrdî weqtên, ey bira !  
     Dî şêwen, hewnêndo xeyrî 'Ebdulla.  
 Dî ki darêن piştê ey ra vijiya,  
 Gilî zeft kerd bî no dinya, ey bira.<sup>23</sup>  
     Çunke şewra bî, şî 'Ebdullah jewî<sup>24</sup>  
     Va ci rê : «Min emşo hewnêن xeyrî dî.»  
 Hewnê xo qal kerd bi ê merdimî rê,  
 Hewnê cey te'bîr kerd merdim ci rê :  
     «Paştdê to ra» -va- «yeno lajêن teber,  
     O bibo dinya di raşto pêxember (peyamber).  
 O resûl o, ê giî zî şer'ê cey,  
 Perê dari zî heme ummetê ey.»  
     Amîne va, hurke serr di mengî ra,  
     Amê vengêن : To dir esto Mustefa.»  
 «Adem ame» -va- «mi rê menga verêن»  
 Va : «Amîne to nika dî dewletên.»  
     Ame menga didinî di Şit bira,  
     Pîzedê min rê silamên ard bi ca.  
 Ame menga hîrini İdris, deza,  
 Va : «Werrekê min bi to, ya Amîna !»  
     Ame Nuh menga çeharî bêguman,  
     Va ki : «Pîzey to yo wahirê Quran»  
 Menga pancî ame Hud, va : «Amîna  
 Pîzey to yo hebîbê Rebbê ma.»  
     Menga şeşî ame İbrahîm Xelîl,  
     Va ki : «Lajê to bibo ma rê delîl.»  
 Menga hewtî ame İsmâîl bi min,  
 Va ki : «Pîzey to yo Muhammed, lajê min.»  
     Menga heştî ame Mûsa va : «Bizan  
     Lajê to pêxemberê axir zeman»  
 Menga new di ame 'Isa ba edeb,  
 Va ki : «Lajê to bibo mîru'l-'Ereb.»  
     Kam ki wazzenno gunay 'efû bî wa  
     Wa biwano Ehmedî rê essela.



22 Vatê (Va di) ganê yê to Ehmedî rê

23 Gile ey eşt ser bi ser dinya bira.

24 Lékî (lê ki) şewra bî, şî Ebdullah jewî

Va Amîne : «Ta bî new mengî temam,<sup>25</sup>  
Ame xâîb ra melekên, da silam.»

Va : «Werrekê min bi to ya Amîna !

Ha bi to bol dewletên emşo deya.<sup>26</sup>

Emşo yeno to ra menga çaresî<sup>27</sup>

Zeydê cey dinya di nêdî qet kesî.

Name da ci Heq te'ala, Amîna,

Ehmed û Mehmûd, Muhammed Mustefa.»

Va : «Min dî hîrê melek bî eşkera,

Her Jewî destêni di bêraqêni, bira,<sup>28</sup>

Jewî berd mexrib, jewî zî rojhelat,

Jew zî Ke'bî ser di daçikna bî raşt.

Bol melekî zî ïnan dir bî bizan

Key min zey Ke'bî tewaf Kerdêni ïnan<sup>29</sup>

Ez di no hal di biyan amey min dî

Qapi ra kewtî zere hîrê cenî.

Jew ci ra Hewwa cenê Adem nebî,

Jew zî Asiya cenê Fir'ewn bî.

Jew zî may 'Isayê, Meryem namê ay,

Ez senîn vajan bi to rindayê cay (cey) ?

Hurke jew ronişti ê kiştendê min,

Hamberê vinderdî jew xizmet diyên (dîdîn).

Perdey çeşman (çiman) dê min kû werziya,

Bol 'ecübî dî mi, o çax eşkera.<sup>30</sup>

Hûriyê cinnet di tim amê û şîyn

Him temşa tayinan xizmet didîn<sup>31</sup>

Ez biyan teyşan û pîzey min veşa

Min zî ïnan aw waşt, ïnan zî da<sup>32</sup>

Zeydê vewra serd û spe, tam şeker,

Min şimit, kewtan zi xo hem bêxeber.

Bado teyrêne ame dest eşt paşdê min,<sup>33</sup>

-Va- Vilêna paşt û aşt û naştê min

25 Va, Amîna qedîna new meng temam.

26 Ha bi to vêş (víş) dewletên emşo deya.

27 Emşo yenna to ra menga çaresî

28 Hurki jewi dest di bêraqêni bira.

29 Vêş melek zî ïnan dir bî bizan

Heme zî (zey) Ke'bey tewaf kerdiñ ïnan.

30 Vêş 'ecüb mi dî o weqt eşkera.

31 Tayin temşa, tayin xizmet diyên

32 Aw ïnan ra waşt mi, ïnan zî da.

33 Ba'dê teyrêne ame dest eşt paşdê min,

-Va- vilêna paşt û aşt û naştê min.

Ame dinya a sa'at sultanê dîn,  
Nûr di xerq bî vano 'erd û azmîn.

Heme mexlûqî dinê veynda : «Mustafa !  
Merheba, ey melhema pîzey kulan ;  
Merheba, ey serwerê pêxemberan !  
Merheba, kana şefa'et merheba !  
Ti bi xêr (xeyr) amê (amey), to rê bo se merheba.  
Merheba, ti yê ricacî rûsiyan ;  
Merheba, dermanê qelbê nêweşan !  
Merheba, ey mexzenê şer'ê Rebî,  
Merheba, ey serwerê hurna dinî !  
Merheba, ey nûrê çimê ummetan,  
Merheba, pêxemberê axir zeman !  
Merheba, ey ti îmamê enbiyan ;  
Merheba, ey ti delîlê welîyan !»

A şewa ki Ehmed ame na dinî,  
'Erd û azmîn mijde da, va jewbînî<sup>34</sup>  
Va, ïnan keyf kerd û vatêن hurke jew<sup>35</sup>  
«Hemdûllâh k'ame ma rê menga new.»  
«Ke'be» -va- «Keyfan ra a şew reqs kerd,<sup>36</sup>  
Kerdi keyf Ellay rê û secde kerd.  
Ame azmîn ra melekên bêguman,  
Ard ïnan ra jewwî iibrîq, jew legan.<sup>37</sup>  
Jew girot bî dest di desmalên herîr,  
«Barekallah fike ya bedre'l-mûnîr !»  
Ay melekî va bi awda Kewserî,  
Pakî şutdî ganê ê pêxemberî.  
«Ard ïnan» -va- «morê ê pêxemberî  
Na miyandê qolinc ey di vist berey (?)<sup>38</sup>  
Ta ïnan mor kerdo, cayê mor bira,  
«La îlahe îllâlah» va neqşî ra.  
Bi çinay cinnet di pişt qundaxê cey<sup>39</sup>  
Eşti desmalên bi serdê rûdê ey.

Caydo ronay ey bi 'izzet, ey bira,  
Nêdî dor -çoşmeydê (koşmeydê), xo ra kes bira<sup>40</sup>

34 Erz û azmîn roşna da jewbînî

35 Va, ïnan şad bî'w va no hurki jew.

36 Ke'be a şew xo bexo kay kerd,

Kay miyan di Ellay rê secde berd.

37 Va : «ïnan ard jewî iibrîq, jewî zemî legan.»

38 Va : «ïnan ard muhrê ê pêxemberî

Na miyandê qolincî nêvist berey.

39 Bi çinay cenneti pişt pêçekê cey

40 Cayên di ronay ey bi 'izzet, ey bira,

Heyretên bol da bî girwey hina.

Çaxo akerd hurna çiman Amîna<sup>41</sup>  
 Heyretên bol da bî ay girwe hina.  
 Ne melek mend û ne merdim, ne cenî,  
 Nêdî dor -çoşmê hoyna (?) ey nebî.  
 Zirê (zirî ?) ame qe jî (qijî ?) nêdî lajê xo  
 Hersî rijnay va : «No girwe do se bo ?»  
 Naşt û aşt di çimî çarnay dî nebî,  
 Cado tenha kerdo secde ê Rebî.<sup>42</sup>  
     Va : «Ruyê xo hetê Ke'bî kerd bî o,  
     Rebbî ra kerdên rica ummetê xo.»  
 Hey xedaran, ya şima vanê ki «Ma  
 Umetê pêxemberî mi» zûrî ra.  
     Ya senîn zûrî niyo, ey bêheya !  
     Çeresên kerdî rica ma, Rebbî ra.  
 'Emrê ma resna bi çewres zalimîn  
 Nêsimê ma raydê raştî ser femîn (?).  
     Arê bin pêser, binalên, ey bira !  
     Hem biyarêne tewbe, ta 'efû bî şima.  
 Ey dima bol nêşî, -va ki- pêrê cey,  
 Ecel ame merd, peyambero bî sey.  
     Bado ma zî merd, pira -va- ey dima,  
     Biyetîmî gird bî, ta çewres resa.  
 Ta bî çewres serrî Ellay da bi ey  
 Kerd bi en'am va ci rî pêxemberey.  
     Äyet ayet ame Quran bî temam,  
     Kilmkî mazan (?) qisey bes wesselam.  
 Kam ki wend ey serwerî rî esselat,  
 A dinî di adirî ra dî necat.



Çunkî ita bî temam mewlûdê cey,  
 Mu'cîzatê ey biwana çend qisey.  
     Ganê ey -va- çunkî nûr bî, nêdî kes  
     Serseya ey mu'cîzat, no to rî bes.  
 Hurke roj perçêndê hewrî ey sera  
 Kerdi sersey ey rî, geyrayêne dima.  
     Verre o (û) pewte bi aÿû va ci ra :  
     «Aÿû tewrê min biyo, mewwê mi ra.»  
 Çaxo dara xurmî ronay ê nebî,  
 Dest di xurmê da w herkes mêwe dî.<sup>43</sup>

41 Weqta akerd hewnî ra çiman Amîna,  
     Nêdî dor-koşmedê xo kesân bira.

42 Naşt û aşt çimî xo çamay nebî,  
     Cayêndo tenha kerdo secde nebî.

43 Dest di xurmey mêwe da, herkes zî dî.

Va ki, engiştanê ê pêxemberî  
Aw ard û werd ci ra bol 'eskerî.

Hem bi engiştên işaret aşmî ra  
Kerd û aşmî bî di felqey rew bira.

Ger bibo se serrî 'emrê'm xiram,  
Ez biyamoran bi to nêbo temam.<sup>44</sup>

Çunkî ita kerd temam ma mu'cîzat<sup>45</sup>  
Arê bin pêser, biwanin esselat.

Çun temam bî mu'cîzatê ê nebî,  
Qal keran mî'râcê ci to rê sebî.

Va şewado şenbe min dî o Resûl,  
Ame keydê Ummuhanî kerd qebûl.

Va bi Cebraîlî Ellay a se'at,  
Şew bî cennet ti bîy çendêne xelat.

Tî bîba estor û hem tac û kemer,  
Hem bey (biyey ?) vatin çinar û şew bi ser.

Nê hedayan ti berê pêxemberî  
Rew biyarê ti mi rê ê serwerî<sup>46</sup>

Şî bi cinnet Cebraîl dî ki uja,  
Xeylîn estorî çerenî ca bi ca.

Jewî çimî kerdî sipe bermî ra,  
Nêçereno, bol ze'îf kewto bira.

Va ki : «Heywani bi to içiçi resa,  
Ya senî kewtê hena bêdest û pa ?»

Hesrên anto Boraqî va ci ra :

«Se hezar serr bî bi min no hal resa.»

Ame vengên : «Ya Muhammed !» va jewî  
«Ez biyan sersem bi qestê wahirî.<sup>47</sup>

Hem mi rê o wext werden bî heram,

Min rehatê nêdî o çax ra temam.

Çende ki cinnet bibo min rê mekan,  
Labelê adirê 'eşq di ez veşan.»

Va : «Ti zanî kam o Muhemmed, ey bira ?

Bes o no adirê min ganê min veşa.»

Cebraîlî va Boraqî : «Ey Boraq<sup>48</sup>,  
Bi muradê to de ya meki meraq !

44 Ger bibo se serrî 'emrê min temam,  
Ez b'amoran ancîna nêbo temam.

45 Ma tiya kerd temam no mu'cîzat.

46 Rew bibo bêrî (?) mi rê ê serwerî.

47 Ez biya sersem bi 'esqdê wahirî.

48 Cebraîlî va Boraqî rê «Boraq !»

Muhammedo ki vanê ti, pêxember o ;  
Na dinî û a dinî di serwer o.  
Qandê cey Ellay xeleqna na dinî,  
Hem ti yê Sultanê nê hurna dinî.<sup>49</sup>  
Kerdo de'wet Xalîqî emşo bi ey,  
Bê, biresnan to beran ningandê cey.»  
Va gurot estor û rew ame bi ser,  
Da silam û va ki : «Ya xeyru'l-beşer !»  
Va : «Bi to kerdo silam ya Mustefa,  
Xalîqê nê 'erd û azmînî bira.»  
Va ki : «Wa bêro, mi kerdo de'wet ey,  
Çendê weqt o ez biya 'aşiqdê cey.  
Wa bivîno cinnet û hem adirî  
'Erş û kursî wû qelem Lewhê Serî.  
Nê heme wazzenno hurke roz mi ra,  
No zî ningan bancî çiman zey kila.  
Mi zî ardo to rê cinnet ra Boraq  
Emşo Şewa Qadîr yû nîme't-telaq.»  
Cadê xo ra rew weriştö pêxember (peyamber)  
Tacî na ser, do gira do hem kemér.  
Nişto estor Cebrâîl zî kewt bi ver,  
Va ki amey, ta resaynî Qudsî ser.  
Ame rûhê enbîyan hember temam,  
Ê cema'et bîbî, o serwer îmam.  
Mescida Qudsî di du rik'et nemaz,  
Kerd û Înan ard bi Ellay bol niyaz.  
Nişto estor ame ta cao verîn,  
Nerdîwanen dî uja ta azmîn.  
Nerdîwan ra kewt bi rayî şî nebî,  
O resa cayên ki name Sedre bî.  
Çun resa Sedre, bira va Mustefa,  
Cebrâîl nêşî dima, o mend ci ra.  
Va bi Cebrâîlî : «To ïta xerîb  
Qandê çicî ez tereknan ya hebî ?»  
Va ki Cebrâîlî : «Ya xeyrul'-wera !»  
No hina bêran eger ez to dima,

---

49 O yo hem sultanê nê huma dinî.

Ez veşenan ya nebiyu'l-muhterem !  
No hina ra to yo ya sahib-kerem !»  
Na dinî û a dinî di dî necat,  
Kam ki wend pêxemberî rê esselat.<sup>50</sup>




Çaxo Cebraîlî dir kerdên silam,  
Ame refref Ehmedî rê da silam.  
Va uja ra rew gurot ê refref  
Berd bi 'Erşî ser di rona o banî.  
No fim (fin) ame veng û va : «Ya Mustefa,  
Ya hebîbe'l-mucteba, xeyru'l-wera !  
Bê bi to rewna wo ez 'aşiq biyan,  
Kerdo koley to min çendî ins û can. !  
Şî bî nezdî o wû refref ca di mend,  
Ehmedî ra mîm werîş û mend Ehed.  
Bêhes û herf a şew ey neway hezar  
Mustefay dir kerdi qise ey kanî yar.  
«Çi mirazê to yo nê hurna dinî  
Esto vajî ez bi to dan, ya nebî !»  
Va : «Mirazê min îlahî an bi an  
'Efû kerî nê ummetanê rûsiyan.»<sup>51</sup>  
«Da bi to min ummetên -va- «ya Resûl,  
Min ïnan 'efû kerd û ê kerdî qebûl.  
Labelê -va- hurke roj panc wext nimaz  
Wa biyarê bikerê min rê niyaz.  
Ti bi o me'na ïnan ez şa keran,  
Cinnetê xo ez ïnan ra ca keran.»  
Va bi emrê xalîqî ê serwerî  
Ame keydê Ummuhanî zey verî  
Çunke şewra bî, çicî dî bî nebî,  
Kerd sehabî ra hîkayet, zey ki dî  
Va ïnan : «Ey ti şeffî ê rûsiyan !  
Wa mubarek bo bito mî'rac !» ïnan.

50 Kam ki adir ra xo rê xelasî waşt,  
Wa biwano Ehmedî rê esselat.

51 Ev beytâha di nivişta me de kêm bû, ji nivişta Muhammed 'Ellî 'Ewnî Efendi hate girtin.-Celadet 'A. Bedirxan

Va ki : «Mî'racê şima zî bî nîyaz,  
 Da şima wû kerdi bî panc wext nimaz.  
     Kam ki nê pancî biyaro rînd bi ca,  
     Mehşerê Kubra di ancax o bî şâ.<sup>52</sup>  
 Ya eger jewî terekna ey bira,  
 Do bibo şarî miyan di rûsiya.  
     Kam ki wend pey di dima resna selat,  
     Ê nebî ra, adirê ra dî necat.<sup>53</sup>



Ya îlahî hurmetê pêxemberî,  
 Ey cenabê Mustefa tacê serî !<sup>54</sup>  
     Hurmetê hersandê çimê sadiqan,  
     Adirê kilandê pîzey 'aşiqan.  
 Hurmetê Tewrat û Încîl û Zebûr,  
 Nûrê Furqan, cinnet û xîlman û hûr.  
     Hurmetê ey yar, xarê Ehmedî,  
     Hem 'Umer Farûq û Şahê sermedî.  
 Qadrê 'Usman ey xelîlê Muhemmedî,  
 Hem 'Elîyyu'l-Murteza lajê dedî.  
     Padîşhê dînê İslâmî bi ma  
     Verdê ya rebbî bi ma û laj ya.  
 Ey di textê Ehmedî di ya Xuda !  
 Ti bi se serî kerî ya rebbena !  
     Roj bi roj tûj kerî şîmşîrê cey<sup>55</sup>  
     Kor kerî ti dişmenandê dîndê ey.  
 Ey dima ti ummetê pêxemberî  
 Şa kerî ya reb ti roja mehşerî.  
     Pêr û pîrbanê peyanê haziran,  
     Ti bi enbazê Resûlî kî ïnan.  
 Hem peyanê haziran ya rebbena,  
 Ti bi cinnet şa kî ïnan ya Xuda.  
     Wahîrê nê zadî Rebbu'l-'alemîn  
     'Ef kî 'emr û maldê ey berket defîn.

52 Mehşerê Kubra di illa o bî şâ.

53 Kam ki wend û pey di ma resna selat,  
A dinê di adirî ra dî necat.

54 Ey Cenabê Ehmedî tacê serî.

55 Ti vinî kerî dişmenandê dîndê ey.

Hem viraşdoxê kitabê xasekî  
Lajê muftîdê keandê Sewrekî.

Yanî 'Usman Es'ed û ti ey qiji  
Lajê Hac Eyûb Efendî Babijî.

Ey û lajî pêr û pîrbanê verî  
'Ef kerî ti merdeimanê ey berî.

O ki nuşte kerdo no Mewlûdê ma  
Cenneto 'edn û miyandê ci, dî ca.

A dinê û na dinê di dî necat,  
Kam ki wend pêxemberî rê esselat.

*Min Ev Mewlûdaha li ber nivişa  
Mela Mihemed Nezîr, Kurê Hecî Brahîmê Dêrşewî nivisand*

*Celadet 'Alî Bedirxan  
Şam, 2 Tîrmeh 1933.*

# **ŞÊX SEÎD HAME PÎRAN**

**MALMİSANIJ**

1925 di Kurdan Şêx Seîdî reydi vera Hukmatê Tirkan sere hewa na. Kirdî (zazay) nî lejî ra vanê «Herbê Şêx Seîdî.» Mêrdimê ki Herbê Şêx Seîdî di hadre bî ewro hinî heştay-neway serre yi. Verra verra yînî ra çew nêmaneno. Heyf ki vatişanê yînî bixwi ra heyani ewro çiy nênuşiyawo. Nî qalê cêrêni ma «eskeranê Şêx Seîdî ra» yew dewijî ra gûşdaritî û nuştî. No dewij ewro hima weşo û bivatışbê yê gore heştay û şeş serre wo.

«Şêx Seîdî va : «ez inî hukmatî qebul nêkena.» Va : «Ez dewan û sariştananê Tirkîya ra naşta-daşta geyrena. Ayê ki inî hukmatî nêwazenê ez jînî reydi zî qalî kena ki wa qarşî hukmatî wardî.» Ino beyntar di sariştananê Kurdistaney ra zî geyra. Peynîya inî geyrayışî di hewniya ki çewî ra veng nêvejêno, va «Ez Suki (Diyerbekir) di Key Cemîl paşay û Key Eskender Paşay di zî mişewre kena ow ez inî qanunî qebul nêkena.» Inawa qerar da.

Şêx bixwi dormarê Herzurumî di Qerehîsar di roniştinî. Pesê jey û milkê jey zav bî. Zav pêt bi. Vişaney Herzurumî sero qala jey vêretinî. Tanînî Şêxî ra va «Eke ti inawa dewam bikî peynîya tû kû xirab bû.» Ey zî va : «Wa bû.» Peyheseyişan gore Xunus ra werîst bi nimitikî şî bi pîllê Tirkîya zî diy bî, tede qalî kerd bi, vat bi «Ez inî qanûnî qebul nêkena.»

Şêxî ina kerdnî, nimitikî dewan û sariştanan ra geyraynî. Di-hîrê tenê ki weşzanê beytan vajî zî reydi bî. Kura ki şîyî, qarşî hukmatî wa'zî daynî.

Rojî va Şêx Seîd hamewo Liji. De naray miheqeq fesadî zî bîy. Inî fesadan ra tanînî xeberi day bî hukmatî. Haya Şêxî tira çini bî. Hukmatî o taqîb kerd.

Dima Şêx Liji ra hame Hêni. Weyra ra hame Dewa Çewligî, Çewligî ra hame Vêrdan. Vêrdan ra werîst hame Dêrey. Mi bixwi û Dêrey di dî. Şarî vazd kerd bi pêser, 'ecêb vişî insan jey reydi bi. Ay hesab biki, Dêrey ra hetanî Hîra Soran, hetanî Alîndoqi kê herri bivistinî 'ard nêgirotinî. Rojo ki Şêx Dêrey di bi, xeberi giroti ki hukmat jey taqîb keno. Çend tenî erşawitî Pirdê 'Elî Zilfiyan va : «Eke hukmat çewî berşawo, wa pey xebera ma tira bibo.»

Peynî di Pîran resa. Haya hukmatî bere bîy. Pîran di şî Camîyo Cêrên. Tay mehkûmî zî jînî reydi Pîran di bî. Inî mehkumî : Mehemê Îsikî, Îsmelê Îsikî, Hesikê 'Elikî, Şewêşê Mehmedî, Welî Hediki û Hesenê Bêzi bî.

Yewî xeberi day qereqol va inî mahkumî zî ha cemâtê Şêxî di roniştey. Tanî vanî ki Qelbîn ra Îbremê Haj 'Elî xeber daya qereqolî, labrê çew binê jay rind nêzano. Îbremê Haj 'Elî ay wextan zeftiyo bejik bi.

Ay wexta Qumandarê Qereqolê Pîranî Hesen Huznî bi. Mudurê nahîya Pîranî zî Îsmel Efendî bi. Îsmel Efendî Madenij bi.

Biray Şêx Seîdî Evdirehîm zî Pîran di bi. Bêxeyja Şêx Evdirehîmî çend hebî biray jînî bînî zî bîy : Şêx Meydîn, Şêx Badîn û Şêx Hesen. Namey pîy Şêx Seîdî : Şêx Mehmud bi.

Wextano ki Şêx Seîd Pîran di, camîyo cêren di bi, biray jey Şêx Evdirehîmî çend hebê mehkuman di mişewre kerd ow vist qereqolê Pîranî ser. Şarî ki ina xeberi day Şêx Seîdî, ey ca di xeberi erşawiti Şêx Evdirehîmî rî va : «Ina mekî !...» Labrê hima hetana ki xeberi Şêx Evdirehîmî nêresay bî, ey û mahkuman ramit qereqolî ser, tifingî pa nay ow qereqol teslim girot. Qereqol orte ra hewa na. Şêx Seîd ki ino gure pey hesiye weşbê jey nêşi. Û yû disey peyey xwi Pîran ra vejiyay şîy.

Seyîstê Şêx Seîdî ra pey Şêx Evdirehîmî herrinda jey giroti. Ramit Madenî ser, Maden teslim girot. Berê hefsxanî şikit, hefsî verra day. Maden di çew qarşî eskerê Şêxî nêhame. Şêx Şerîfî zî Xalpêt (El'ezîz) girot. Hukmatî heta Adîyemanî ra pansey (500) heb dewij ardiş day bî Maden û vera eskerê Şêxî mewzî bestî bî. Be'dî ino pansey ten, bêpêrodayış teslim bi. Eskerê Şêxî wextano ki dekewt Maden, texmîna gore hinzar û pansey (1500) ten bi. Di rojî Maden di mendî, çik camê sara Madenî bîy şikitî, ardî war ; çiqas ewraq û defterê hukmatî ki weyra bî nê dirnay, nê zî veşnay. Medan ki giyriya herrinda mamuranê hukmatî di Kirdan ra mamûrî tayîn kerdî bî. Deboy Madenî di davîst şeşdarb (dabançe) bi eskerê Şêxî dest ser na. Dima ramit Erqenî ser. Erqenî zî teslim bi. Erqenî di xwira çew qarşî eskerê Şêxî nêhame, Erqeniyîjî zî eskerê Şêxî rey kewtî.

Erqenî di inawa yew qerar da : Herkes qaydê hîri rojî rî şonû keydê xwi, xwi hedirneno, çekanê xwi gêno, rojê çeherinî dormarey Suki (Diyarbekir) di pêser beno. Raşa zî Qelbîney, Mîrey Gêlî, peyey jînî, Axay Pîranî û peyey xwi, Têrkanîjî û Şarê dewanê Kirdasiyanê ay cayan (Bêxeyja Reşît Axay. Reşît Axa bixwi Kirdasî yo. Wextê Osmanîyan di hukmatî ra dey rî Kurki hameyanî), Ma'denîjî, Erqeniyîjî pêro, rojê çeherinî ki vat bi dormarey Suki (Diyarbekir) di pêser bîy. Labrê çekê ma zav zav tanî bî û tifingê Orisi, tirs û kalmey û xencerî, necaxî û çiwey bî. Şaro bîn zî heway ma bi. Wextano ki ma dormarey Suki girot, Wesarî hinî dest bere kerd bi. Varan û çomir-batirxan bi. Elhasil ma a şewi dormare Suki ro girot. Eskeranê hukmatî zî zanaynî ki ma a şewi fînenî Suki ser, yanî hukmatî xebera ma giroti bî, topê xwi bedenî ser nay û bombey ma ra nay. Mi bi xwi çirray bomba nêdîy bî. Tay bomban dîna roşni kerdnî, ay wext ma jînî ra hasaynî ow topan rey di ataşê ma kerderdînî. Biray mi 'Elî mi heti weyra brîdar bi. Verî tersay, be'dî mi destê xwi seredê jey ra çarna ki, tikê serey jey şikiyawo ; yew fişîl serey jey ro guna bi. A şewi ma ra zav insan nêkişîya. Ayê ki mi dî panj şeş tenî kişiyay. Topî ki ma ra nay insan tersa, rema. Verra verra ma remay, ma vila biy. Eskerê hukmatî dî ki ma remenî, be'dî ma dima hamey.

Qumandarê eskerê hukmatîyo ki eskerê Şêxî dima hameynî, Delu Fikrî, bi. Ino Delu Fikrî Alay Qumandarî bi. Be'dî çadira xwi Dêrey di day piro. Qelbîn ra çewres pancakes ten tewşîya bi. Xwira çiki camêrdê Qelbînî bî Camî Qelbînî di pêser kerdî bî, ayê ki tîkê hêşkewte bî vîjnay bî. Inîyan ra dahîris ten verra da, ay bînî kendilan reydi pêra bestî, berdî heta Madenî ra. Va : «Ma jini benê mahkima kenî.» Labrê berdî, yew şewi pey Xaçeki di, nuzdî Arê Xeyrî di yew dere di ganbo ganî sungî kerdî kiştî. Inî Qelbînijan ra Mehemê Misfay, Misfay Mihoy, Mehmedê Mehmedî û çindîna tenan xwi da bi 'erro, eskerê Tirkan vat bi qey merdî. Abi hewa inî çendi tenî tena xelisey. Sungî yew goşê Misfay Mihoy ro gunay bî, goşê jey, derra kerd bi, labrê nêmerd bi (Misfay Mihoy hetanî dades serrî ra ver weş bi). Rojo bîn şar pey hesiya ki mîrdimê jînî kişiyay. Cenîyanê Qelbinijan da piro şiy weyra meytan ser. Elikî, waya Mehemê Misfay vatini : «Ma şî meytî 'ar di diy. Pêro soringi di, çomir di gevizey bî. Keko û Mehmedê Mehmedî yû Misfay Mihoy tede nêbî. Cenîyan ra yewî çantey yew mîrdimê xwi verra akerd tira hewney, çantey jey beyntarê şalan û timananê jey di mîra daye bi. Di letey nano wişk tede bi.»

Vanî wexteno ki qereqolê Pîranî teslim gîyriba bi, kirdan qumandarê Tirkan Hesen Huznî zî hêşîr girot bi. Hesen Huznî ver di çendi Kirdan nobeti pawita. Be'dî wexto ki zorê ma şî ino Hesen Huznî ay Kirdanê ki ver di nobeti pawita, dano tewîştiş, ano Koy Tileyli sero ganbo ganî destan û linganê jînî şîkneno, vano :

– Ez qumandarê yew qereqolê Tirkan ba, ti Kirdo di pereyo mahkum, bêrî mi sero nobeti bigîrî, ez ina kena kê ha !

Vanî ay Kird zî vano :

– Ez merre niya ki ti heway pisîngi pey mi kay kenî. Tifing tû dest do mi ra ni, yew ray di mi bikişi. De sekâ hero, destê mi tifingî bi resaynî ow taqet bibînî ez ka jey pîrda tû 'ebêna !

Senê ki ina vano Hesen Huznî pa nano jey kişeno.

Kıştey nînî hesab... Hima dewanê Henî ra Xiraba di new tenî ebi xapi, destbê eskerê hukmatî kişiyay.

Delu Fikrî Dêrey di camêrdî vistî 'ard, pey bi çiwanbê ternan kutî. Vatînî : «Silihê xwi beerî ! Dêreyijan va : Silihê ma hukmatî ma ra gurotî.» Ay wextan çewî Tirkî nêzanaynî. Delu Fikrî ïnan nêkerd. Dat Mistî Mihikê, Delu Fikrî di Tirkî qalî kerd. Dat Mistî semedo ki Estembul di zav eskerey kerd bî, weş Tirkî zanaynî. Dat Mistî çiqas kí va : «Bîz Vêrmîş», Delu Fikrî va : «Yox, vêrmemîş». Be'dî Dat Mistî va : «Wazeno Pîran ra persî.» Ay sere di bê qaxidê qumandarî, yewerî nişnaynî şero Pîran Delu Fikrî, dat Mistî û çend hebî cendirmey erşawitî Pîran ki şêrî persî. Ay wextan Pîran di réceb Beg qumandar bi. Dat Mistî Mihikî û cendîman, Recep Begî ra yew qaxit girot ard ki tede vano : «Dêreyijan ra silihê jînî gîriyayê.» Delu Fikrî hima ïnan kerd.

Eskerê Delu Fikrî kergî ma ra nêverday, zorî reydi girotînî. Xwira heybanê mayê bînî zî xwi ver şanaynî berdînî. Livîn û firaqê ki dewijan ra girot bî zî xwi reydî berdê.

Bazbindijan û Pîranijan ra hima ayo ki ez zana daçewres ten kişiya. Akragijan ra heştêş (18) tenî kişiyay.

Dêrey ra Bekirê Îmişi (Bekirê Huseynê Îboy) pêrodayîşê Pirdî di kişiya.

Gêl ra zî zaf însan berd dar di kerd : Mîrey Hemî Begî, Zikîfiê 'Ebdulla Begî, Nûrî Nadir Begî û Nadir Begê Nurî Begî berdî Ma'den di dar di kerdî.

Gêl ra Şemê Wusoy : Herbê Geyî Tepe di kişiya.

Beşeyja kişîş û xeneqnayîşî (dar di kerdişî) zaf însan zî surgun kerd. Pîran ra Key Ağay ra zî tanî surgun kerdî. Gêl ra abi asan. Mesela Gêl ra : Şewket Beg (Şevket Karataş) erşawit Isparta. Zikîf Beg (Zülküf Karakoç) û cenîya jey û gedey jeyê şenikî erşawitî Ceyhan-Adana. Weyra çend serrî mendî, be'dî 'ef ki vejiya ageyray.

Be'dî Şêx Seîd û yew qifley imbazanê jey zî tewîştî berdî Suki (Diyarbekir) di leqnay. Çend hebî lajê jey, jey ra pey weş bî : Şêx Elî Riza, Şêx Selaheddîn. Şêx Selaheddîn çend serrî ra ver şî rehmet.

Şêx Evdirehîm û şes hewt imbazê xwi zî çend serrî ra pey nuzdî Bismîlî di yew hêgây xelî miyan di ganbo ganî veşnay.

Ez kamî rî vaja kamî rî nêvaja, hûmaritişî rey di nêqedêni...

# MERGÊ XALIT BEGÊ CIBRÎ \*

Demir ÖZLÜ

Mergê Xalit Begê Cibrî, yew girwe wo ki binê xurîneya serran dir o. Ma şarê rojawanî, namedareya nî girwî qe pey nêhesiyayme. Labrê eke şima yew rojhelatijî ra qalê Xalit Begê Cibrî bikerî, no rojhelatij sewki yew kesdo dorûdormarê xo ra xeberdar o, ca di çimanê xo akeno ow perseno : «Qey ti mergê Xalit Begê Cibrî ci zanî ?» La ne ki tena mîrdimê giregirî, şarê ay cayan bixwi zî mesela mergê Xalit Begê Cibrî zano. Muş di zimistanî wirro, hewt ra heyânî hewtay pîl û şenik qalpaxî xo ser nano. Ez zî Semedo ki eleqedarê nî qalpaxan bîyo, ez na mesela bander bîyo.

Zimistano xidar di, qalpaxê şarî sero bî, lerza Wartoy ra pey Pakîstan ra qaydê ardimî rî amey bî. Qalpaxê ki serê yînî dekupnaye, kiştê yînî heway şewqa tadaye bi, qalpaxê duzî, berzî pa'tî, qîjî, reng-şallênî, sipî, siyay... Mi warto zî dî. Aminan bi. Yew cawo qotin bi. Lerzi yew serri ra ver bîy bî. Banî rîjiyaye bî, xîrbê yînî mendî bî. Çend hebî bîney newe viraziyyat bî. Nîyan ra yew Qereqolê cendirman bi. Bîney bînî bereqey texte ra viraşte bî. Miyanê bereqan ra derey viyartînî. Şar, şaro zimbêl acêr daye, şaro zimbêl xîşin daran ver di, qahwan di roniştînî. Ma piya roniştîme. Aminan bi, yew teymano ki ma (ma, çend embazî Alayîya Muşî di esker bî) yewbînan şinasnaynî û yewna bîrligi ra yew albay ki amey bî derewo pîl di masan bitebîşî zî weyca di bî. Min û teymentî ma silam da pê. Ma, şarî miyan di, şarê siyatalî miyan di bî. È ka hil û gami qal û qîrfan mîrdimanê hukmatî bikî, vîşê yînî 'elewî bî. Dima mi ra hewniyay. Mi fekê xo nêakerd. Ez ana ronişto vinderto. Ez esker biyo, mi casusan ra xo kerdînî, ez hima eskero newe biyo. Eke mi dest bi qalan bikerdnî, ganî mi derg û dila qalî bikerdnî. Labrê be'dînî mi qalî kerd.

Tirê 'Eşîra Xalit Begî dormarê Wartoy dir a ? Ez vano qey yew şaxê 'Eşîra Cibran dormarê Wartoy dir o. Rutbey Xalit Begî, ordû di yarbay bi. Çarşuy

\* Cibranlı Halit Bey'in Ölümü (Öteki Günler Gibi Bir Gün, İstanbul, 1974, Soyut Yayınları, riper : 95-103).

Bedlîsî di dar di kerdo. Enawa, ez ki eleqedarê qalpaxanê weşanê ki semedê lerza Wartoy amey ow şarî xo ser nay bîyo, ez raştê Xalit Begî amewo. Xalito Yarbay nê ; Xalit Begê Cibrî. Qalpaxa Xalit Begî dîna di tek bî. Xişni bî, xemîlnaya bî, purtê yay çiringaynî. Dar di biyayışê yê ra pey mezat di roşiyay. Mîrey Kurdan amey, ebi peranbê ay rojî qalpaxi heştay altun roşiyay. Anka, kam ci zano kam mîre yay nimneno ? Bedlîs yew şaristano zav verên o. Şarê Bedlîsî, endî Muşî û Wartoy nêmaneno. Bedlîs şaristanê verênêranê dinya ra yew o. Mi çendi Bedlîsijî Dağu Trenî di dîy, asnak bî. Mi Muş di, Warto di caran asnak nêdî. Xalit Begê Cibrî çarşuy Bedlîsî di dar di bi. Kalmey Xalit Begî ebi pê zeydnayış mezate di roşiya. Kam ci zano anika kam mîrî dir o. Cilê Xalit Begî kam ci zano kamî dir ê ? Yew mîrdeko ki halî heti yew dikanî ver di ronişte bi, ez nîyan yê ra bander bîyo. Wayirê dikanî zî, mîrdek goşdarit, tesdîq kerd. Mîrdekî Xalit Begî Cibrî rî vatînî «General bi». Yê heti, qayla general bi. Ma'na nî vatîşî mi be'dî fahm kerdi. Ez nîy çîyan çarşuy Muşî di bander bîyo. Çarşuy Muşî di ez hima zaf çîy bander bîyo.

Çarşuy Muşî, yew çarşuy wextê miyanî mendînî. Şaristanê Muşî bixwi tena yew ca'dewo duz û seracêr o, ki İstesuni ra yeno şaristan. Yew rayiro ebi kilometreyan derg o, İstesuni ra ver bi çarşu, qayme, labrê rep û rşt. İstesuni, kişa deşti-Deşta Muşîya berzi- di û wîrdêkek a. Na deşta herrûheray, çîy nêdana, miyan ra roy vêrenî ow serri di şeş mengî binê vewri di manena. Demew ki mi nuzdî İstesuna miyanê na deşti kerd, ez qe nêpejmîriyaynî ki na bînaya panka delali û wîrdêkeka ki kê trîni reydi bider resenî, pey xwi di asar dejanê mîrdimanî binimno ow kê owca dejanê en girananê mîrdimkî veynenî. Rayir ebi yew seracêro nimiz yeno heyânî şaristano ki paştiya xo daya koy. Dormarey yê veng o : İstesuni heti dades bîney ki qandê mamuranê İstesuni rî viraziyay. Dima, di kişî di bereqey ki qandê felaketzedanê Wartoy rî viraziyay. Kê ki nuzdî sariştanî kenî çend hebî atolyey. Rayir ebi eno hewa şaristan reseno, heyânî raştey verê sara hukmatî, weyca di cêser keweno di hetîya şono. Dima zî heze yew nêm daîre şono çarşûy wextê miyanî miyan. Inca dikanî yan 'ardî yan zî di tebeq î. Miyan di bîney verî ra mendeyê kemberinî, panca asinêninî, kerra ra viraştey zî estî. Çit rotoxî, bataniya û kilîm rotoxî nî malî 'Entab ra anî. Labrê eke şîma rind sax kerî, yew tewir kilîm esta tira vajêno xalîya Kurdan ki dewijî anî ow gelek qalin a, keyen nêbena, ser bi serri weş bena, rengê yay ver çimê kê nêabenî, desenê yay cay çinî : lacîwerdî, morî, surî, heme surê kurdanê bereqiyayey pa yî. Dikanî pir çîy-mîye ki Estembul ra yan zî sîndorê İranî û Surîya ra yenî : 'eltîrika destan, kardî padayey, se'etê Çînî yê ki ecêb sade y, se'etê Orisî, bardaxê Frensizî, tebexçey İranî.

Şar tetunê piştî anceno, sew ki yew xerîbî ra hes biko, pêşeno dano yê zî. No tetun çîlzerd o, qaçax o, qaxidê cexra sero nîşanê Şahê İranî esto. Çarşû Corêñ di, qîrnî rayirê çarşî di -Ule Camîyo ki Selçûqîyan viraşto, yê ra pey

dikananê destê raştî di dabançe zî peyda beno, vîtrîn di nênavêno, zerre ra wazêno, eke bişinasnî ow eke hima -partîya peyenî ra- heme nêrotî se danî şima.

Yew giregirê Kurdan welladi di zîyafet da bi, vengda ma zî da bi ; nuzdî se tenî da'wet kerdey bîy. Wextê dest bi îçkî kerdişî di, ay bînan zî heti, mi ro birra, va :

— «To xo 'eskara kerdo. kê ganî inca ra (ma qerraj ra bî, dopolê doli di yewna qerraj bi) heyanî wica şêrî, labrê bindê 'ardî ra, bê xo boyli kerdiş».

Belkî vat bi qey ez tikê xo keno nê zî ez mizmiz keno.

Mi Va : «Ez xo boyli kerdiş ra xo nêkeno. Mi qandê fikrê xo, merg xo çîma kerd.»

Mi nişka na vat bî. Xo vero amey bî. Aya ra pey, Mîrî mi rî hurmet kerd. Şaristan di zî, çiqas ki ma taqîb bîynî zî, hewna kes kişti ser di ma ra nêhewniya.

Werî dima, demew ki mi xo binê dari di derg kerd bi, Mîre ame mi heti. Yew bi yew qalê fikiranê siyasîyanê hemdeman kerd. Her çiqas ki yewna luxatî reydi qalî kerdînî zî, heme 'ecêb weş û roşn zanaynî ; hîre cenîy yê, di mawzerê yê, yew M-1 pîyade tufegî yê bîy. Be'dî wextê miyanê herkesî di qalî kerdişî di mi fam kerd ki cîyayeya fikrê min û yê şertanê tarîxîyan ra yena, ow na cîyayey cîyayeya metodê Kurd û Tirkî ya.

Çarşî di yew zên bi ki koseledo 'entike ra viraşte bi. Se poxnot roşiyaynî. Mi zaf waşt bierîno la çifayde ki mi nişya. Perey mi tay bî. Zên zaf sade bi, kosele w çermê yê zaf weş bî.

Çarşû Corêñ di gelek çîy çerm ra viraştey bî : Kemberî, rextî, êlegê seydbazan...

Yew qahwe zî ïstesuna Muşî di esto. Roj zî, wexto ki trîni nîna zî - hewte di çendi rojî yena- sexlet hesebêno. Zerrey ay qahwî di, nuzdî berê yê yew ca di di rismê şarkî estî. Rismaña yewî di Hezretê 'Elî, ebi estorba xo camî ser ra firreno. Ay bînî di fina Hezretê 'Elî esto. Rengî zî, ca dayışê şeklan zî 'ecêb weş o. Yew risim viraştoxo nêşinasnayewo ki tay zeman hefsxaney Muşî di mendo, ay rismî viraştî.

Bêligi di, ebi Kurdanê bînan yew Xelîl Korkut do Cizîrij bi ; Tirkî nêzanaynî.

Kê ki vatînî «Kekî, bana bir resim yapsana» (Keko, mi rî yew risim viraze hela) fahm kerdnî.

Lîlikê xo vetînî, yew xêza guloveri kaş kerdnî, na xêza guloveri bînî serey keyneka marêni, qismê mendey rismî bê lîlikî viraştînî. Tena rengê risman ciya ciya bînî.

Xelîl Korkut Cizîrij bi. Qaçaxçî bi. Wexto ki kê şîynî atış ow dersê mayincilik di peşmiriyaynî. Atış di, hergû panayış di orte di daynî piro. Vetişê mayinan xora karê yê bixo bi. Serrandê xo ra pîlêr nawitînî. Çîlsiya bi. Demew ki Cizîri di merdişê Şêx Seyday pey hesiya, tewtihîya. Resmê Şêx Seyday ki

Qezetey Akşam (Şewi) di vejiya bi mi dest di diy ; waşt pancas poxnot bido mi ra bierîno. Mi ki tira va no qezete vîst û panc qurişî yo bawer nêkerd. Resmê Şêx Seyday ehendi erjan dest kewo ? Mi resim dirra kerd da bider. Pistandê xo na. Kes nêşikitînî. Vera despotîzmê dor û dormarî hiwaynî. No sebeb ra, rojî, teymentî îddia kerd ki o qeşmereya xo herkesî keno. Xelîl Korkut hezeki bira nî vatî fahm nêkero. Heyana peynîya eskereya xo, xo hin nawit ki, heze ki Tirkî fahm nêkeno ow heze ki îmkanê musayîşî zî çiniko. Yew aştîwaştoxo raştikên bi.

Bêliga Necoy di yewna eskero Kurd bi. Tirkî nêzanaynî. zaf pîr hasaynî. Axay 'ardê yê zî dest ra nîşankerda yê zî dest ra girewt bî. Bêkes bi. Ame bi esker. Dima eskereya yê qediyay. Mi, o bi kincanê sivîley istesuni di dîy. Ez ki dîyo, ame mi het. Bi Tirkîya ki tikê musa bi, va :

« – Ez hinî şono..» Peybi destê xo heze ki işaret bikero.

Şîynî başur, Îraq. Mi zanaynî. Ez Necoy ra bander bîybîyo. İstesuni di, baweriya xo bi min ardişê yê, weşbê mi şî. Kilm bi, pontorê yê heray bî. Unîforma xo veti bî, bibi zey herkesî. Rind nêbi. Halbiko vêşaney Kurdanê ki ameynî istesuni zî, ayê ki ameynî çarşu zî rind bî.

Ma ki qandê manewra rî şîmê Koy Agrî, ma domanê 'ecêb rind û pîrê rindî dîy. Waxtano ki ma ko di qampi day piro, dewijo Kurdo besnderg Huseyîn Elîk'î va ki ma amey nuzdî dewa yê. Qumandarê bêligi yew roj izin da bider, şî dedewa xo, be'dî ageyra.

Alayî di borazan cenaynî. Derg û dila bi, siya bi. Ye hewte ra pey ma ki ageyray qışla, dest pey kerd heze adir veşa. Zaf saxlem bi. Revîri rî qebul nêbi bi. Adirê yê zaf vîşî bi, heze adir û şewat veşaynî. Mi fahm kerd ki semedê hesretî ra wo, hesretê yew gami dewa xo viynayîşî ra. Ma newe ra berd revîri. Başçawusî nêşîna ma bişikno.

Wexto ki yew Kurdî teskere girewtnî çiqas Kurdî bî a şewi pêser bîyînî. Çi kemaney yê bi temam kerdî : paç, pontorî, perey. Aminanan yew asmên bînî ki pank û delal bi ow çiringaynî. Hewa zaf weş bi. La zimistanan teber ra kê nêşiyaynî vinderî, zaf serd bi, ma aşxanewo kerpiçin di kom bîyînî.

Ule Camî yew camîdo bişeklê Selcûqî bi. Weş bi, rengê kerranê yê heze qawerengîyo roşin bi. Dormarey yê di, kelmelê mamuranê ki şaristan ra bar kerdînî roşiyaynî. Xortê Kurdanê ki dewan ra amey bî, wica di kesê ki' emelan geyrenê pawitînî. Hima ci tewir 'emeleyey. Şaristan di yew atolya wîrdêleki zî çinik bî. Ay cayana, bineyna cêr ra mi yew cenîya Kurda zaf rindi dîy, besndergi, keji, por dergi, çindi vajî ehendi rindi bî ; xo nêpiştinî, di hebî camêrdanê Kurdan di qalî kerdînî.

Kuçaya ki ver bi Ule Camî şona, a kuça di, kerre ra di xanê tengî bîy, hina cêr ra çend hebî qunaxê serherrin labrê xişn û kerpiçinî estî. Qırkerdişê Arminiyan ra tikêkîna pey, bi destbê pêtanê cayîyan viraştiş diyayî.

Rayirê çarşî di zî banê kerre ra viraştey estî. Tikêna Ule Camî ra daşt, biney hetê miyanê kuça di, yewna camî esto ki di qırñyanê serberê berê yêyê hewşî di heykelê şerî viraştey : Camî 'Elaeddînî. Hima bineyna daşt di derey, hêta derî, gemî û hezey kotilmanê herri keyey dest pey kenî. Kê ki şono ver bi qotanê ki şaristan sero viraziyawo hinî çîyna çinno. Cor ra axay wayirê mêşnan roşenê, yê bixo qaçaxçîyê mêşnan î, banê yînê herri ra viraştey hîna xişin î.

Şaristano verên destbê Arminiyan qandê warey aminanî rî viraziyawo. Çimka ki eyyamê ewtay cay çinê bi. Qotî zî dik bi diki rezî bî. Kerpan rezî tebîştînî. Şerabviraştoxey zî bî. Qirkerdîşê Arminiyan dima hinî rezî çinikî. Semedo ki kerpey rijiyay, nî qotanê ki şaristan pira vila biyo di hil û gam herri qerteliyêna sermetiyêna, çend tenî mirenî.

Cor ra, dewanê koyan di zî, deşti di zî, kişa corêna şaristanî di zî xirbê kilisanê wextê Arminiyan ra mendey estî. Bîney bi hewabê Arminiyan viraştey û wîrdêk î. Şar tira vano «Camî Gawuran».

Şaristanî Muşî bixo yew Arminî viraşto : Muşel Mamıkonyan'î. Namey şaristanî yê ra yeno. Labrê sewbî efsaney zî estî, vanî : Diza Muşî di henda qama mîrdimî merrey bî, bi zanbê enî cayan merrî ra «muş» vajêno. Demewo ki orduyê Darîyûsî deşti ra viyartînî, dizi ra vejiyay zorê yînî berd. Namey şaristanî, nî «muş» î ra yeno.

Çimka ki na deşti yew vêr o ki ver bi Anadolî abeno. Inca deşti hina rojawan di rind teng bena, Dola Muradî yew dola tengek û zaf derg a. Heyana ki trîni zî zor çıqiyam a doli ra vêrena.

Cêr ra pêro keyey serbari herrinî, vaş serê babnan ro amewo. Deşti wica ra zî acêr şona, deşti di yew royo çanqiliyaye. Zimistanî zî, şaristanê rojhelatî heme, binê vewri di manenî, bêxeyja sipî çîyna nêhaseno.

Şîma nişnî şêxanê ke yenî qahwan û mîrdimanê bînan cê ra vejî. Eke şîma zaf diqqet bikerî, şîma ferq kenî ki ay bînî dormarey şêxî di tikêna hurmetkar roniştî.

Qotanê ki şaristanî paştîya xo daya bider, tîtikê yînî sero Diza Muşî esta. Na dizi zaf rewêna. Çew nêzano key viraziyaya. Diza Xarpêt'î, doli di, bovera yew diz a ki yew keşîşê Arminî daya viraştiş. Diza Sînbad'î, qotan sero, zaf durî ya. Sînbado dengizcî ebi gemiya xo ame wica. Sew şîma dormarey Diza Mercîmek ki nuzdî deşt a ra bihewnî, şîma helqan viyenenî. Wextano ki deşti hima dengiz biya, germî pey bi resenan nî helqan ra bestiyay.

Eke şîma nî koyan ra ver bi acêr timûtim şerî, şîma Motkî resenî. Motkî asar yew ca wo yekta wo ki wica, bindi qanun nêvêreno.

Xalit Begê Cibrî nî cayan pêrunî ra geyra. Nî cayan ra bi. Kurd bi. Rutbey yê ordu di yarbay (mîralayî) bi. (Şarî miyan di vajêno ki general bi). Semedo ki va têkilîya yê serewedardayışanê ay wextî reydi bîya, Çarşuy Bedlîsî di darda bi.

Bedlîs yew şaristano verên o, nî cayan ra zî zaf duri nîyo. Ez mesela Xalit Begê Cibrî weş nêzano. Eke têkiliya yê serewedardayışê Kurdan reydi bibîynî tirê tebîşiyaynî ? Tirê asar yew mîrdim bi ki no dormare di xurt biyayışê yê asan bo Tirê yew mîrdimo xurt bi ? Xususiyetê yê çi bî ? Tirê te'da nêbedeliyayeya şarê nî dormarana ki seserran bider kerda xo di tey vetinî ?

'Eşîra Xalit Begî, 'Eşîra Cibran tirê dormarê Warto'y dir a ? Ez vano qey yew şaxê 'Eşîra Cibran dormarê Warto'y dir o ?

Darda kerdişê Xalit Begî dima, qalpaxa yê erziyay mezate. Bi peranbê ay rojî heştay altun roşiyay (şar na zano, winî bawer keno. Çiyo muhîm *râşti* niya, *bawerî* ya.) Kam ci zano nika key kam mîrî dir a ? Tirê na qalpaxa ki seran ser ra geyrena ? Qalpaxi qalpaxa Xalit Begî ya. Qalpaxa Xalit Begî, yew ca dir a ki çew nêzano, yew keyey Kurdiyo dês bes qalinî di, yew refî sero nîşanê, yay pa, bereqêna bereqêna.

*Tirkî ra tadayox : Malmîsanij*

# FOLKLORÊ DERSIMÎ RA

Arêkerdox : FIRAT

## SEYD UŞE \*

Ax de welat welat welat  
Çiqas honde şîren o  
Hal be halî bira uson vîra nîsono (nusono)  
Begê mi koto Vilê Surpîyan'î \*\*  
Hona welat ci ra oseno.

Seyd Uşe kerdo Vilê Surpîyan'î  
Hona welat ci ra oseno  
Ax de welat welat welat  
Çığa honde şîren o  
Hal be halî bira uson vîra nîsono

## DERÊ LAÇÎ \*\*\*

Ah da halo haloo, halê ma yaman o  
Ordi onto be ma ser, caye de olaxe ma nêdano (nîdono)  
Ordi onto be ma ser, hedele ma nêdano.  
Ala bêrê Derê Laçî serî  
Tede şîn o şîwan o.  
Haq adirê aşîrû wedaro,  
Kes dest ra be ma nêerzeno.

\* Seyd Uşe : Pilê eşîra Qureşan bi. Hukmatê Tirkân, Xalpêt (El'ezîz) di dar da kerd.

\*\* Surpîyan (Sorpyan) : Beyntarê Kalan (Tuncelî) û Perteg di yew dew a.

\*\*\* Lej (Herb)ê Dersimî di Derê Laçî di eşîra Demenan û ordî Tirkân Yewbinan ra zaf mordem kişt. Vanî dere gonî di mend bi.

Nika ke teselîya ho ma ra gurete  
Halê sima jê halê Hermeniyân o  
Peyniya sima jê peyniya Hermeniyân a.  
Ah da halo haloo, halê ma yaman o,  
Ala bêrê Derê Laçî serî tey şîn o şîwan o.  
Zalim ma sero axir makna na be ro,  
Cayê de hedele ma nêdano.  
Haq adirê aşîrû wedaro  
Kes dest ra be ma nêrzeno.  
Ala vaze Ximale Hesê Gewo,  
Hem dano pero, hem tey qeydo vano.  
Vano : «Haq ke dest da be mi,  
Kokê sima birneno.»

## ALÎ

De Alî Alî Alî  
Birayê felekê kalî  
Alî to ra tepa  
Dewê Dersim têde kerdê tolî.  
Alî rewê rawurze ho serî  
Dewê Dersim têde kerdê tolî.

Bira Turusmeg a \*  
Caddey tomoñîlî  
Dîna de birijiyo çê Mustafa Kamil” \*\*  
Veja nivejiya koto qestê mordemê pîlî.  
Alî rewê rawurze ho serî  
Dewê Dersim têde kerdê tolî.

## XIDIR

Xagûl\*\*\* vera Xidirê mi, cîgera mi sona raye  
To dime ra berbena na pepuga kora maye.  
Meso, meso ; gos ro mi ne, bira meso !  
To xapnena, biko Xido na hukmato tereso.  
Biye, biye ; Xidirê mi, cîgera mi biye.

\* *Turusmeg* : Raya Kalan-Xalpêt (El'ezîz)î sero, nuzdî Kalan’î, Munzur’î ver di yew ca wo.

\*\* *Mustafa Kamil* : Mustafa Kemal (Atatürk)

\*\*\* *Xagû* : Yew dewa nahîya Qocaqoç (Kocakoç)’î ya. Qocaqoç : nahîya Kalan (Mamekî, Tunceli)’î ya.

Dayê ma rê ondêra Kore \*  
Wayî wayî, lemin lemin Xidirê mi !..

Mamekî ya, Mamekî ya, dayê lemin Mamekî ya. \*\*  
Zalim ma dayme arê, berdme di sey o poncas mordem piya  
Dayê Kore de puk o, xedeb o onder voreno.  
Vano : «Dota hên ke nano ma ra, dayê mezal ma nîdano.»  
Wayî wayî, lemin lemin, Xidirê mi !..

Vano : «Dayê ma rê kaxita şaye vejiyê,  
Çêvesaya endî tesêla ho mi ra biffîye.»  
Vano : «Payîz o, velg û vaşê ho erzeno  
Verendîya sewqatê hevalanê to ber biye.»  
Wayî wayî, lemin lemin, Xidirê mi !..

Xidirê mi, Xidirê mi, na wusar o  
Ti ke şiya nîşîya ; ne son o, ne sodir o mi sero.  
Wayî wayî, lemin lemin, Xidirê mi !  
Vazo vazo, Mursa vazo, Xidirê mi.

## HEMILKAN

***Yew (ju) Dersimic şîyo Amerîka (Hemilka) di guriyawo û wica di merdo.  
Na lawike (deyiri) yê sero vajiyaya (Dormarê 1950 di).***

De dayê Hemilkan o,  
Onder hardê ho hardo dê giran o  
Derdê dawo (do) be mi bira derdo dê giran o.  
Welat coran çimonê mi vera nêsono (nusono).

Vore vorena tenike,  
Şiya sonî sanena ci bena honike.  
Bira bira, to ke sona memleketî,  
Mi vera selam ro pîl u qijikî.  
Derdonê mi ci re hurdî hurdî qejî ke.  
Cigera mi zerê mi de pote,  
Derjenonê ilaconê na suke.

\* Na lawike (deyiri), Ceng (Herb)ê Kore ra pey vajiyaya.

\*\* Mamekî : Kalari, Tunceli

## RINDEKE

Çêñê mi ke to ra sa va  
Tu va «Ewro ne meste».  
Çêçêñê, cencenî ame şîye  
Kalenî ame reste.

Çêçêñê, cencena tuyâ ke mi diye,  
Se ke asme pencere ra erzena zere,  
Tepê kuna peyê hewrî.  
Safaqê Sodîrî yo, rojî esto.

Rindeka mi vejiya teyer  
Korê mi rê bêro,  
Mi riyê rindeka ho  
Roj sera nas nikero.

Na wo son amo,  
Rindeka mi dest nê pêser.  
Çitor mi rê derdê dînalige nêbo,  
Sewle pencerê ra do tever.

Nere na we kalêñî ame,  
Haq kena ho jêde romesone,  
Çêvesaye posmon beno,  
Çitor ke to da, hen cêno.

## XANE

Xanê wusar na wo ame  
Her çî ho keno newe  
Qewxa min û to kî  
Tepa qewxa kane.

Nere hora hora hora  
Nere to ça herediya mi ra  
Ta mede lesa bariye ra  
Olî bo can dan meraqo ra.

Nere onca hurdî hurdî voreno,  
Zerê mi jêde terseno.  
Onca qalê to yo  
Çê axawo de beno.

Nere çond rojî yo voreno  
Pepugo goyin o. \*  
Esmer sere onca giran a,  
Ma ra ju tersa mi beno.

Çênenê, ma sa nîbîme,  
Jê gula wusarî.  
Çênenê ma vesayme,  
Jê soja adirî.

Çênenê taliyê mawo kor o,  
Eskerê Tirkî onca ma ser o.  
Zerê mi jêde terseno,  
Ma-ra ju fîno be raye.

## NÊTÊ HO VAJÎME

Rozê, Sultan Sileman ebe ciniya ho ra fekê çem ra fetelîno. O be ciniye ra gegane pe destê jumîn cênenê, gegane dest vilê jumîn sera anê, hen fetelînê.

Nadanê ju mose (Yunus) qum sera ramerdayîyo. Sultan Silêman vano :

– Cinîk, nika zerê ma de çike esto ma ke raşt vajîme na mose xil dano, peynîye de çîndano be çem !

– Ya mordimek yê mi dijdiya (dizdeya) mi, saxlîya (nimite) mi to ra çîna, cerîncaye ema ez çaye nîvajîne.

Sultan Silêman vano :

– Reye nade yemi yan ci yêma honde varîyet esto. Na dîna de her ci binê emrê mi der o, tepo jujo polkinke (ju destekke ke bonce ci ra çewres pol gineno waro) dest bero be pistinê ho (xo), qilêr ra ho bikeno. Ez nadano ala çiko pistin ra vezeno dono mi. Çimê mi onca kî feqîr der o.

Yunus (muse) reyê ho sero til bena. Nafa sira yena cinîye. Cinîye her qese cayê ra ana, ama mase hurend ra nîlewuno. Endî peynîye de teselîya ho kuna, vana :

– Reye nade tu Sultan Silêman a, varîyetê to nîno be qesa. Semtena to onca henî. Ez ke ju cenc vîneno von nika bojîyê to de nêbiyene bojîyê ey de biyene. Zere mi ey re tenêna erzeno.

Mose di reye pa xil dano, çîndano çem.

\* Pepug : Yew (ju) bira be yew waye ra sonê kenger. Turuk waye de beno. Bine diraye beno. Waye kengeran erzena ci, bire de ginene waro. Son de nadanê kenger tey çinê. Bira vano : «Wayê to kengerî werdê.» Waye vana : «Mi nîwerdi, iman nîkenî zerê mi rake, tey nade. Bira, zerê waye rakeno, nadano ke kengerî çinê. Lazek beno be mîrcîke, pereno ra sono. Nika waxtê kenger de yeno, waneno, vano : «Peppo, keko kam kist ? Mi kist. Kam şut ? Mi şut. Kam dard be we ? Mi dard be we. Peppo, keko !...»

## **SOBA**

Demenû rozê sonê çê Seyd Rizay\* de benê meyman. Zimistan o, gewrê (kurrikî) ho bîye be hî ; vezenê, lawênê gewrû jumîn ra girê danê. Seyd Rizay kî û sûre soba herîna arda, çeyî pê soba keno be germ. Puçi cênenê erzenê borûnê soba ser. Demenû hata û suru soba nîdîya. Tenê ke beno be germ, layê gewrû veşeno gewrey ginene be war. Demenû ra ju vano :

- Bira bira milaketû gewrey wuza re eşt be war, îne re se bî ?

## **SULTAN SILÊMAN**

Rozê Sultan Silêman nadano cinîya ho hen pozgun a, kêfê ho çîno. Vano :

- Cinik, çayê kêfê to çin o, hen pozgun osena.

Vana :

– Çi mi rê derd nêbo, tu Sultan Silêmon a, zonê teyr-turî zonena, honde varîyatê ma esto, awe ra bile tu xerac céna. Xebere birusne teyr-turî, wa perê ho birisnê. Cilo ci keme. Têy keyfê ho biremîme.

- Cinik ney ra asan çik esto. Ez von ala derdê to çik o.

Sultan Silêman xebere rusneno teyr-turî pêro yenê. Dîk Silêman ci ra tek nîno. Nadano Dîk Silêman n'amo. Elçî rusneno vano : «O sene qese yo, row ci ra vaze, bêro ; nîno o zano.» Elçî peyser yeno, vano :

- Dîk Silêman tenê herey yeno. Tenê hesab dest der o, biqedno yeno.

Tenê maneno, Dîk Silêman vejîno yeno. Sultan Silêman hersîno kowu, puf keno, vano :

- Tu kot menda ?

- Tenê hesab mi deste bî, coka kot be herey Sultanêm.

- O senê hesab o destê to de bo ke xeberê mi ra hona qîmetlî yo ?

- Mi hesab kerd ke na dîna de merdey jêder ê ya çî weş.

- Ema kam jêder o ?

- Weson ra ju jêde bî, o çî mi est be merdo ser, bî be tê virane.

- O kamçî bî ?

- Camerdo ke persê cinîya ho keno. O bi mi est be merdon ser.

Na qesa sero Sultan Silêman gineno ho ro. Teyrî-turî onça peyser rusneno. Nika coka ra na teyr-turî ebe purtê ho ra wo.

\* Seyid Riza : Pile yew eşîra Dersimî bi. 1937 di vera Hukmatê Tirkân sere hewa na. Dima, nuzdî Ezirgan (Hezirgan, Erzincan)'î di Pîrdê Mutî di Tebîşıya. Hukmatê Tirkân, o dar da kerd.

# BİBLİYOGRAFYA DIMİLİ (ZAZA)-II

MALMİSANIJ

- 124 - (Abbas, Hilmi) ; Alt kurdische Kampf - und Liebeslieder bessammelt und übertragen von Hilmi Abbas mit einer Ein führing von Anton Graf Knyphausen, Munchen, Bechtle, 1964.
- 125 - Abovian ; Kavkazî, 1848, no :46, S :164
- 126 - Ağar, Ömer Kemal ; Maden Ili, 1938
- 127 - Ağar, Ömer Kemal ; Tunceli-Dersim Coğrafyası, İstanbul, 1940.
- 128 - Akkan, Erdoğan ; «Elazığ ve Keban Barajı Çevrelerinde Coğrafya Araştırmaları», Coğr. Araşt. Dergisi, 3-3 (1973), S : 175-214
- 129 - Akşam (Gazetesi), İstanbul, 7-5-1925
- 130 - Alîqemer ; «Saniga Pepûg», Dengê Komkar (Kovara Federasyona Komelên Karkerên Kurdistan li Elmanya Federal), no : 40 (12-4-1982), r : 15.
- 131 - Arif, Mehmed (?), Binbir Hadis-i Şerif Şerhi, 2. tab, Kahire, 1325 hicri, s : 406-410
- 132 - Badilli, Kemal ; Türkçe Izahî Kürtçe Grameri, Ankara, 1965, s : 6
- 133 - Barnum, H.N. ; «The Kuzzel Bash Koords», American Missionary Herald, 1890, s : 343-346.
- 134 - Berthelsen, Christina ; Legendariska Dersim en oberoende Provins i Kurdistan, Oslo, 4-5-1985, 32 s.
- 135 - Bira, «Roşa Ma», Dengê Komkar, no :29 (15-4-1981), r : 8.
- 136 - Bumke, Peter j.; «kızılbaş-Kurden in Dersim (Tunceli, Türkei), Marginalität und Häresie», Anthropos 74 (1979), s : 530-548.
- 137 - Cemal, Behçet ; Şeyh Sait Isyani, İstanbul, 1955
- 138 - Cîgerxwîn, Tarixa Kurdistan -1, Stockholm, weşanêñ Roja Nû, 1985, r:14-15,57
- 139 - Çaçanî, Karlînê ; Pizmamîya Cim'eta Ermeniya û Kurda, Erêvan, 1977.
- 140 - Çelebi, Eviya ; Eviya Çelebi Seyahatnamesi, İstanbul, 1976, cilt : 3, s : 869, 873 ; cilt : 4, s : 1152, 1203.
- 141 - Çelebî, Ewlîya ; Kurd le Mêjûy Drawsêkanî da -Seyahetnamey Ewlîya Çelebî, wergêranî : Se'îd Nakam, le çapkirawekanî Korri Zanyarî Kurd, Bexdad, 1977, r : 91, 162, 171, 312.
- 142 - Çermûg, M. ; «Kurdistana Ma», Armanc, Stockholm, no: 59-60 (Çileya Paşîn-Sibat 1985), r : 11
- 143 - Darkot, Besim ; «Tunceli Üzerinde Coğrafi Görüşler», 3. Üniversite Haftası : Elazığ. İstanbul, 1943 (I.Ü. Yayınları, no : 196), s : 114-128.
- 144 - Demeno ; Dengê Komkar, no : 29 (15-4-1981), r : 7
- 145 - «Dersimcede Deyimler ve Sözcüklerin Karşılaştırılması», Kızıl Yol, Bobigny (Fransa), no : 4 (1985), s : 65-70.

- 146 - Dersim, T.C. Dahiliye Vekaleti Jandarma Umum Kumandanlığı (Gizli ve zata mahsustur. Kayıt altında yüz tane basılmıştır). sayı : 55058, Ankara (?), 1935 (?)
- 147 - «Dilin Devrimci Mücadeledeki Etkisi», Ronahî, Zürich, no : 18 (Mart 1976), s : 18-28
- 148 - Dilmen, Mustafa ; «Doğuuda Gördüklerimden», Dicle-Firat (Aylık Fikir Gazetesi), İstanbul, no : 4 (6-1-1963), s : 4
- 149 - Dorn, B. ; An die Historich-philologische classe der Kaiserlichen Academie der Wissenschaften, Mélanges Asiatiques, Petersbourg, 1856, T. II., s : 617-620.
- 150 - Dündar, Tevfik ; Tunceli ve Çevresindeki Üç Vilayetin Ziraâ Durumu ve Gelişme İmkanları, İstanbul, 1943.
- 151 - Elî (Dersimli Ozan Ali), Ala Sare Wedardayêna Karkeran, Dengê Komkar, no : 1 (Adar 1979) r : 7
- 152 - El-'Umerî, Fazlullah ; Mesâlikü'l-Ebsar.
- 153 - «Eskerê Tirkî Dersim de ci Fetelîno», Dengê Komkar, no : 18 (Tebax 1980), r: 8
- 154 - Firat, M.Şerif ; Doğu Illeri ve Varto Tarihi, 2. baskı, Ankara, Millî Eğitim Basımevi, 1961.
- 155 - Gaspardjian, A.O., «Dersim», Istoriko-Filologiceskij Zurnal (Erevan), 1977. 2 (1985), s : 195-210.
- 156 - Gökalp, Ziya ; Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik İncelemeler, Ankara, Komal Yayıncıları, 1975, s : 51.
- 157 - Gökalp, Ziya ; «Kürt Aşiretleri», Barış Dünyası (Dergisi), no : 13 (Nisan 1963), s : 242
- 158 - Gökçe, Enver ; Wa Suwend Bo Wa Şirt Bo, Ca'deyanê Ma Di Zî, Tadayox : Malmisanij, Hêvî, Paris, no :3 (Sebat 1985), r : 105-106.
- 159 - Hakkı (Uluğ), Naşit ; «Batılı Hurafelerin Hükümran Olduğu Dersim», Vakit (Yevmî Gazete), İstanbul, 15-6-1925.
- 160 - Harziya, Alî ; «Kurt Sorunu», Emek-Aylık Sosyalist Dergi, no : 6 (Kasım 1970), s : 47
- 161 - Hasretyan, Prof. M.A. ; Dr. K.M. Ahmad ; M. Ciwan ; 1925 Kurt Ayaklanması (Şeyh Sait Hareketi), Uppsala, Jîna Nû Yayıncıları, 1985.
- 162 - Ibrahimpor, Dr. Muhemmed Teqî ; Vajenameyê Farisî-Kurdî.
- 163 - Iransehr, cildê evvel, 1963, Çapxaney Danişgeh, s : 644.
- 164 - Justi, F. ; Les noms d'animaux en kurde, Paris, 1878.
- 165 - Kop (Sevengil), Kadri Kemal ; Anadolu'nun Doğu ve Güneydoğusu, Türk Kültürünu Araştırmâ Enstitüsü Yayıncıları, 2. baskı, Ankara, 1982, s : 15,28,29,30,48,53.
- 166 - Kemali, Ali ; Erzincan. Tarihi, coğrafî, içtimai, etnografi, idari, ihsai tetkikat tecrübe, İstanbul, Resimli Ay Matbaası, 1932.
- 167 - «Koremore», Roja Welat, Ankara, no : 4 (25-1-1978), r : 12
- 168 - Kurdistan (Gazetesi), İstanbul, no : 2 (1918), s : 14.
- 169 - Kurdo, Qenatê , «Bîr û bawerî niştimanperwerî le folklor û edebî kurdî da», Pêşeng (organî nawendiy Partî Demokratî Gelî Kurdistan), sal : 2, r : no. 4 (Kanûnî Yekem-1983), no : 35.  
- Kurdistan (Dengî Yekîti Xwendekaranî lawanî Kurdistan le Ewrûpa), no : 1-2.
- 170 - Kurdoyêf, Prof. K.K ; Haletakanî cins û bînay, berkar le zaza da, wergêrranî le rûsiyewe : Dr. İbrahimî 'Ezîz İbrahim, Hêvî, Paris, no : 3 (Sebat 1985), r : 118-131.
- 171 - Kurd, Xortê ; Welat Welatê Kurdan o, Hêvî, Paris, no : 3 (Sebat 1985), r : 112.
- 172 - Lacê Heni (Muhammed 'Elî 'Ewnî), Hawar (Kovara Kurdî), Şam, no : 23 (27-7-1933)
- 173 - Lerch, P.I. ; Berich über eine im Auftrage der Historich- Philologischen classe der Kaiserlichen Academie der Wiessench unternommene Reise zu den Krigsgefangenen Kurden in Roslawl, im Gouvernement Smolensk (Petersbourg, 1856), Mélanges Asiatiques, T. II. s : 621-649.
- 174 - Lerch, P.I. ; «Qawxê Nêrib û Siwanî», Hêvî, Paris, no : 3, r : 109-111.
- 175 - «Leza Ma», Ronahî, Zurich, no : 18 (Mart 1976), s : 28-29.
- 176 - «Macerî Silemonî Gince», Hêvî, Parîs no : 3 (Seba 1985), r : 107-108.

- 177 - Malmisanij, Folklorê Ma ra», Hêvi, Paris, no : 3 (Sebat 1985), r : 93-104.
- 178 - Malmisanij, «Heş», Hêvi (Kovara Kurdî ya Zarakan), Stockholm, no : 4 (Gulan 1981), r : 8-9.
- 179 - Malmisanij, «19. Yüzyılda Kird (Zaza) Aşiretleri Arasındaki Çatışmalar», Studia Kurdica, Paris, no : 1 (1985).
- 180 - Malmisanij, «Piran», Berbang, Stockholm, sal : 3, no : 7 (1984), r : 23.
- 181 - Mamed, «Fistanê Dayka Mi», Dengê Komkar, no : 29 (15-4-1981), r : 11.
- 182 - Merdûx Kurdistanî, Hezretê Ayetullah Şêx Muhemmed ; Tarîxê Kurd û Kurdistan we Tewabi' ya Tarîxê Merdûx, cilt : 1, çap : 2, s : 91, 92, 93, 103, 106, 113, 115.
- 183 - Molyneux-Seel, L. : «Journey in Dersim», Geographical Journal, 44-1 (1914), s : 49-68.
- 184 - Nur, Dr. Rıza ; Türk Tarihi, cilt : 1, İstanbul, 1972.
- 185 - Öztürk, S. ; Tunceli' de Alevilik, İ.Ü.E.F. Sosyoloji Bölümü mezuniyet tezi, 1972, no : 7472.
- 186 - Rıza, Em. P. Kd. Albay M. : Benlik ve Dilbirliğimiz, 2. baskı, Türk Kültürünu Araşturma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1982, s : 8,13,18,19.
- 187 - Riggs, Rew. Henry H. ; «The Religion of The Dersim Kurds», Missionary Review of the World, vol. 24 (October 1911), New-york, s : 734-744.
- 188 - San, M. Salih ; Doğu Anadolu ve Muş'un Izahî Kronolojik Tarihi, Türk Kültürünu Araşturma Enstitüsü Yayınları, 1982, s : 16,18,53,63,65.
- 189 - Say, Ahmet ; Bingöl Hikayeleri
- 190 - Say, Ahmet ; «Göriz'li Mehmet Şerif Efendi», Yarına Doğru (Dergisi), Mart-Nisan 1976, s : 11-20.
- 191 - Semt, F. ; «Lazê de Padîşay be çêne da Şuanî», Kurtuluş Yolu, Köln, no : 8 (Haziran 1985), s : 13. no : 10 (Agustos 1985), s : 15
- 192 - Silopî, Zinar ; Doza Kurdistan, 1969, s : 87-96,102.
- 193 - Sumer, Prof. Dr. F. ; Oğuzlar, s : 634, 637.
- 194 - Şerefhan, Şerefname (Kurt Tarihi), çev : M.E. Bozarslan, İstanbul, 1971.
- 195 - Şerefxanî Bedlîsi, Şerefnamey Şerefxanî Bedlîsi, wergêrranî : Hejar, Bexdad, Korri Zanyarı Kurd, çapxaney Nu'man, 1973.
- 196 - Şîhhesenâlı, Doğan Kılıç ; Mc. Carus ; Minorski ; Kürtlerin Menşei ve Kurt Dili İncelemeleri, İstanbul, Dersim Yayınevi, 1963.
- 197 - Şimaran, Lacek ; «Silom mi êst», Dengê Komkar, no : 18 (Tebax 1980), r : 8.
- 198 - Taneri, Prof. Dr. Aydın ; Türkistanlı Bir Türk Boyu : Kürtler, Genişletilmiş 2. baskı, Türk Kültürünu Araşturma Enstitüsü Yayınları, Ankara, 1983, s : 5, 17, 41, 143, 145, 155
- 199 - Taş Mustafa ; «Çemîşgezek İlçesinin İdari Coğrafyası», Türk İdare Dergisi, 41 (324), 1970, s : 127-142
- 200 - Teko, «Sanika Hêş», Dengê Komkar, no : 44 (15-8-1982), r : 11.
- 201 - Tevfik Efendi, Salname-î Vilayet-î Diyarbekir, 1883, defa : 11., Sayfa : 116,138.
- 202 - «The faith of the Dersim Kurds», Gelawêj, The Kurdish journal, june 1964, s : 8-10
- 203 - Toker, Metin ; Şeyh Sait ve Isayni, Ankara, 1968.
- 204 - Uluğ, Naşit Hakkı, Tunceli Medeniyete Açılıyor, 1939.
- 205 - Vakit (yevmî Gazete), İstanbul, Nisan - Mayıs - Haziran - Temmuz - Augustos - Eylül - 1925.
- 206 - «Xelaşayêna Welat», Dengê Komkar, no : 26,27 (15-2-981), r : 7-9 ; No : 28 (15-3-1981), r : 11
- 207 - «Xona Hecî», Hêvi, Paris, no : 3, r : 113
- 208 - Yalçın, Osman ; Elaziğ-Tunceli-Bingöl, İstanbul, 1959.
- 209 - Yamulki, Abdulaziz ; Kurdistan ve Kurt İhtilalleri, cilt : 1, Bağdat, 1947, s : 79.
- 210 - Yavuz, Edip ; Doğ Anadolu'da Dil-Onomastik İlişkileri Üzerine Bir Deneme, Ankara, Türk Kültürünu Araşturma Enstitüsü Yayınları, 1983.
- 211 - Yavuz, Edip ; Tarih Boyunca Türk Kavimleri.
- 212 - «Zazacada Deyimler», Kızıl Yol, Bobigny (Fransa), no : 3 (1984), s : 49-52.

- 213 - «Zaza», Encyclopedia Universalis, Paris, 1980, volume : 9, p : 721.
- 214 - Zekî, Muhemmed Emîn ; Xulasetu Tarixe'l-Kurd we Kurdistan, terceme : Muhemmed 'Elî 'Ewnî, cild : 1, Tab' : 2, Bexdad, 1962, s : 46, 316, 320, 368, 395, 40.
- 215 - Zilfi, «Çuxure», Roja Welat (Rojnameya siyasi û çandî ya 15 rojî), Ankara, no : 5 (5 Adar 1978), r : 11.
- 216 - Doğu Anadolu, s : 142.
- 217 - Arif, Ahmed ; «Dagen Nuheter», (17-2-1985), Översättare : Eshat Ayata-Ruth Sylwan, Stockholm, S : 22
- 218 - 'Ay Adlar.', Tarih ve Toplum, İstanbul, no : 7 (Temmuz 1984)
- 219 - Ayre (mecmu'a ya Ziwanî), Stokholm, Ser : 1985, no : 1,2 ; 16 r.
- 220 - Baykara, barbaros ; Nefret Köprüsü (Şirzi), 5. baskı, İstanbul, Akyar Yayınları, 1982.
- 221 - Baykara, Barbaros ; Dersim 1938, 2. bskı, İstanbul, Akyar Yayınları, 1982.
- 222 - «Bir Türkümüz Üzerine : Lawika Xidê Alê Ismê», Dengê Komkar, Frankfurt, no : 79 (27-9-1985), r : 15.
- 223 - «Karkerê welatonê Dina Pêro ju Bêl !» (Belavoka Têkoşîn), 1-5-1984, (Awrupa).
- 224 - Orankij, Iosif M.; Les Langues Iraniennes, traduction : Joyce Blau, Paris, 1977, p : 163, 196
- 225 - «Zorla Makale Bastırmanın Yolu Bulundu !..», Barış Dünyası (Dergisi), İstanbul, no : 15 (Haziran 1963), s : 357-358

(اکاتی دهلىيin شاعير و نووسهـر لـه گـهـلـهـكـهـيـهـهـ وـهـ نـيـزـيـكـهـ وـهـ بـهـ  
گـهـلـ وـ خـهـلـكـهـ وـهـ پـيـوهـنـدـيـدارـهـ ،ـ دـهـبـيـ يـهـكـسـهـرـ ثـاوـيـ سـيـ شـاعـيـرـ  
بـيـنـينـ :ـ

فـيـرـدـهـ وـسـيـ ئـيـرـانـيـ وـ رـوـسـتـاـقـيلـيـ گـورـجـيـ وـ ئـهـحـمـهـ دـيـ خـانـيـ كـورـدـ (٤٩)

---

٤٩ ئـهـ مـ قـسـهـيـهـيـ بـيـ .ـ ئـوـزـبـيلـىـ ،ـ يـهـكـمـ جـارـ ،ـ لـهـ گـوـتـارـيـكـداـ  
كـهـ بـوـ پـيـشـكـيـشـ كـرـدـنـىـ كـتـيـبـيـكـ لـهـ مـهـرـشـاـغـىـرـىـ گـورـجـىـ رـوـسـتـيـاـقـيلـىـ  
نوـوـسـيـبـوـوـىـ ،ـ بـلـاـوـ كـرـاـ وـهـتـهـ وـهـ .ـ مـنـ لـهـ وـهـ رـگـيـرـانـهـ عـاـرـهـبـىـ يـيـمـمـمـمـمـمـ  
وـهـ رـگـرـتـوـوـهـ كـهـ دـوـكـتـورـ عـيـزـهـ دـيـنـ مـسـتـهـفـاـ رـهـسـوـولـ لـهـ كـتـيـبـهـكـهـىـ  
خـوـيـداـ لـهـ مـهـرـ خـانـىـ بـلـاـوـىـ كـرـدـوـتـهـ وـهـ .ـ  
أـحـمـدـيـ خـانـيـ ،ـ بـغـدـادـ ،ـ ١٩٧٩ـ آـ صـصـ ٨ـ ٩ـ .ـ

گهلى کورد و لانکى به هيز بعون و ته شنه کودن و بلاؤ بعونه و هي بيري  
نه ته وايه تى و رزگار خواز اشهى کورد . مير جه لادهت به درخان، شوره سواري  
هدلکه و توروی مهيداني زمان و كولتورو و روزنا مهگه رى ك سوردي  
و نه و هي ميرانى بوتان، سالى ١٩٤١ ( ٢٣٤ سال له پاش کوچى خانى و ٩٤  
سال پاش تىكشكانى را په رينه که بيدرخان پاشاي با به گهوره و ) له باره  
خانى يه و ئاواي نووسىي :

(مهلاجا مى د هه قى مه ولانا جه لالوددينى روومى و كتيبة وى "مه سنە وى"  
دەگىوتى يه :

من چە گويم وصف آن عاليجنا  
نيست پيغمبر، ولى دارد ككتاب

ئەف پەسنەكى بلند و هي زا يه و بھر ئاوايى ل بەزنا مه ولاناتىت  
دەھ قى ئەحمدەدى خانى و كتيبة اوى "مه وزىن" ده ، ب من به ، مروف  
دكاره زى بىتىرى زى بېيژە . بەلى خانى زى خودان كتىبە ، لى خانى  
پىغە مېھزە زى ..... ) ٤٨

راستى يەكمى ئىستا كە لاي ئەو كەسانەي لەبارى خانى يەسە وە  
دەنووسن و لە بەرهە مەكانى دەكۆلنە وە ، وە كۈونە دېتىكى لى هاتووه ، كە  
بۇ بەلگە جىگە و پايىھى ئەحمدەدى خانى لە ئەدەبى كوردو رۆزھەلاتىدا ،  
قسە يەكى زانا و ئاكادىمى ي سۆقىتى ئائوربىللەي بە نموونە بېھىنە وە .  
رەنگە جىگە خۆي بىت ئەم بەشەي نووسىنە كە مان هەر بەو قسە يە كۆتا يى  
پىّ بېتىن .

ئوربىللەي نووسى بۇوو :

48- Bedorxan, Celadet (Herekol Azizan) : Klasikên me  
Hawar, 9 (1941) 33, : R.9.

خانی ده زانی ئەگەر كەم و كۈورىيەكىش لە كارەكەيدا هەبىت  
 ھۆيەكى ئەوهىدە زمانى كوردى زۆر بە كار نە هيئرا وە و شەبوته زمانى  
 نووسىن و بە تايىھەتى نووسىنى داستانىكى وە كۇم مەم وزىن كەھ مۇو  
 رى و شوين وېتكەكانى ھونەرى داستانى ۋۆزھەلاتى ئى تىدا بە كارھېنرا وە  
 ھەر لە بەر ئەوه بىگومان، زمانى كوردى هيئىنە گوروتىن وپۇتىنسىلى  
 نەبۇو، ھەركەسىش بىيوىستا يە شاكا رىكى ئەدەبى ئى پى بنووسى تووشىنى  
 دەبۇو بە تۈووشى سەختى و گىرە و كىشەوە .

ئەف مىوه ئەگەر نە ئابدارە  
 ئەف تىفلە ئەگەر نەننازەننە  
 ئەف مىوه ئەگەر نە پەلەزىزە ٤٦.  
 كرمانجىيە ئە و قەدەر ل كىارە  
 نووبارە، قەوى ب من شىرىنە  
 ئەف تىفلە ب من قەوى عەزىزە ٤٧.  
 مەم و زىنى خانى شاكا رىكى ئەدەبى بۇو، و خانى خۆى، كەدەيزانى  
 چ كارىكى نووسىو، گەلەكى پى سەربەرز بۇو . بەداھينا نىكى بى  
 وينە دادەنا، كە لەپىنا ويدا رەنجلۇ زۆرى كىشا وە، لەگەل ئەۋەشدا،  
 زۆر بە خۇنزىڭىرنە و داوا دەكەت لە كەم و كۈوري يە كانى چا وبپۇش  
 و دلرەقانە رەفتارى لە گەل ئەكەن .

ئومىد ئەوه ز ئەھلى عىرفان  
 تەشنىع نەكىن وەكى غەيىوران ٤٧٠  
 ئە و دى نەكىن ل منچۇ حەرفان  
 ئىسلام بکن ل من قسۇوران  
 خانى داستانى مەم وزىنى بە و ھىوا يە نووسى، بېيىتەھۆى را پەراندىنى  
 گەلەكەي دەزى چەسا نە و زۆردارى و لە پىننا وى ژيانىكى مەرۇق  
 ئاسايى و ئازاددا. ئەگەرچى خانى بە ئەوهى چا وى بەوهەدى ھاتنى  
 ھىوا كانى بکەوى، كۆچى كرد، بەلام ھىچ سەير نى يە، سەدە ونىيۇي  
 دواي خانى، بۇتان بۇو بە مەيدانى راپەرىنى ئازادىخوازانىسى

پیش سه رده می خانی و ج پاش سه رده می ئهوو تا ئیستاش گەلی نووسه روزانا و هونه رمه ندو خەلکى لىيھا تۇوى كورد بەزمانى، گەلانى سەرەدەستىا نۇوسىوھ و بەۋەش کار و بەرەھەمە كانيان بۇۋەتە بەشىك لە زمان و كولتوور و ھونه رى ئەو گەلانه .

"٤٤"  
بىكىر ژ عەرەبەھەتا قە گورجان  
كرمانجى يە بۇويە ثوبىھى بورجان

لەم بەيتىدا خانى پەنچە بۇ ئەو ناودارە كوردانە درېئە دەكىات كە لە پۇز ھەلاتى ئىسلامىدا نىيوا ن دەركەرددووه ۋە لاڭانە لە ڇىانى كولتوورى گەلانى ئەو ناوجەيدا بە شدارىيا كرددووه .

لىستى ناوى ئەو زانا و ئاعيرە كوردانە لە كولتوورى ئىسلامىدا بەگشتى ھا و بەشىيَا ن كرددووه ، كە لە ئىنسىكۈپىدىيَا ئىسلامىدا بەر چا و دەكەويى سەر دېرى كورد ، كوردىتان ) بەلگە يە كى رۇونى راستىي ئەو سرنجەي ئەحمدەدى خانى يە .

ئەگەر ئەو راستىي يە لە سەرەوە با سمان كرد ، لە بەر چا و بگريين ئەوسا دەزا نىن خانى چەندە بە پەرۇشە و بۇوه بە زمانى گەلەكەمى بنووسى . خانى خۆي زۆر بە شانا زىيە و باسى ئەو دەكەت كە مەمۇزىنى بە كوردى نۇوسىوھ ، ئەگەرچى دەشزا نى لە گۆيىرە زمانى " گەلانى كەورە " بەچا ويڭى سووكە وەھە ما شادە كرى .

يە كرۇو نە وو ساف و بىبەھاتە مەقبۇولى موعا مەلا عەوا من زىر نىنە بىبىن " سېيەھە مانە " ، زىف نىنە بىبىن كو " كەمعە يارە " ۵

ئەف پۇول ئەگەرچى بى بەھانە بى حىلە وو خورده وو تە ما من كرمانجى يە ، سرفە ، بىگومانە ، سوفرى مەيى سورە ، ئاشكارە

لای خانى خۆي داستانى مەم وزىن زۆر خوشە و يىست و لە بەر دلەنە لە گەل ئەوشدا ئاگا دارى ئەۋەيە كەپەنگە بەلای خەلکى دىكەوە وانەبى .

زمانی گله‌کهی ببوژینیته وه .

مهیدانی که مالی دیست خالی  
به لکی ب ته عه سسوب و عه شیری،  
ئهف بیدعه ته کر خیلافی موعتاد "٤٢  
هه لبڑا ردنی زمانی کوردی بو نووسین له روزگاری خانیدا کاریکی ئاسایی  
نه بwoo ، چونکوو زمانی ئا بین و خویندن زمانی عاره بی بwoo ، زمانی  
ئهده بی " چاک و به رز " يش لای عوسما نی یه کان تورکی بwoo ، لای سه فه وی  
یه کانیش فارسی . زمانی گه لیکی وه کوو کورد ، که نه ولاتیکی سه ربه خوی هه بwoo ،  
نه پا شایه کی هه بwoo ، و نه له ئا بین و خویند نیشدا به کار ده هینهرا ،  
به لای خلکه وه زور گرنگ و با یه خدا رنه بwoo ، هه رووه ک نهده بwoo ریگه یه کیش  
بو نان پهیدا کردن و نا و ده رکردن و پلهی به رزو خلات وه رگرن لـه  
کوشکی پا دشا و سولتانه کاندا .

ئه گه ر خانی بیویستایه له پینا وی مه بهست و به رژه وهندی ی تایبه -  
تی خویدا نووسینی بکردا یهته ریگه یهک ، بیگه یهک ، دهیتوانی بنـه  
زمانی تورکی یا فارسی بنووسی و به جوره خوی بگه یه نیته ده رباری سو -  
لتانی عوسما نی یا کوٹکی شاکانی سه فه وی و خلات و پایه بی به رز وه ربگـری  
و به بهختیاری بزی ..... به لام ئه و نه ک هه ر خوی له وانه نیزیک نه کرده وه ،  
به لکوو تهنا نهت له گه ل میری جه زیره شدا ، که میریکی کورد بwoo ، له پینا وی  
به رژه وهندی ی گشتی گه لی کورد و یه کگرتنی ولاتی کوردستانا ، هینه ره ق  
و قسه له رwoo بwoo ، که ره خنه لی ده گرت و به پیچه وا نهی ری و شوینی  
داستانی روز هه لاتی ئه و سه رده مه وه به شیکی تایبه تی بـو په سندانـی  
ته رخان نه کـرد .

قهـلـبـیـ مـهـ نـهـ کـرـ قـهـبـوـلـیـ حـیـلـهـ " ۴۳ "

دلـیـ خـانـیـ قـاـیـلـ نـهـ بـوـ فـیـلـ بـکـاتـ وـ رـیـگـهـیـ لـهـ پـینـاـ وـیـ مـهـ بـهـسـتـیـ خـوـیـدـاـ  
نه گـرـتـهـ بـهـرـ ،ـ چـونـکـوـ دـلـسـوـزـیـ گـهـ لـهـ کـهـیـ بـوـ .ـ دـهـ یـوـیـسـتـ بـوـ گـهـ لـهـ کـهـیـ  
بنـوـوـسـیـ وـ زـمـانـ وـ کـوـلـشـوـورـیـ گـهـ لـهـ کـهـیـ بـبـوـژـینـیـتـهـ وـهـ وـ بـپـارـیـزـیـ .ـ بـهـ لـامـ چـ

کهی خوی . چیروکی مه می ئالان چیروکیکی به تهوا وی کوردی بیه و لای هیچ گهلىکی دیکه نییه ، به پیچه وانهی چیروکی دیکهی وه کو (شیرین و فهرهاد) یا (لهیل و مهجنون) وه که لای فارس و تورکیش ههیه و هه ر بکهش بمه هی خوی ده زانی .

خانی که چیروکی مه می ئالانیشی وه رگرتووه ، زور شتی لی گوپیوه و خستوویه تیه خزمتی بیروبا وه کانی خویه و . چیروکه فولکلوری بکه گهلى لایه نی ئه فسانه بی تیدا بیه وه کوو ئه وهی په ری زینیان بمه شه و لمه (جه زیره) وه گواستوته وه بو (یه مهن) ، به لام خانی هه موو ئه و لایه نانهی لابرد ووه و جیگهی روودانی داستانه کهی کردوته شاری جه زیره پیته ختنی میرنشینی (بوتان) و کاته که شی کردوته چهند سدهه بیک لهوه و پیش ، لمه سردهه می فهرما نره وا بی میریکدا نیوی (زهینه دین) ای لی ناوه .

له چیروکه فولکلوری بکه دا مه کوری پاشای بمهنه ، به لام خانی ئه و ره گه زهی لی سندووه ته وه و کردوویه تی بمه گورد . بیچگه لسنه وه ش و بیستوویه تی له نیو هه موو داستانه کانی فولکلوری کوردیدا بیکیک هه لبیزیری که میرو وه زبرو پایته خت و سوپا و دا وو و ده زگمی ده ولته تی تیدا بیت ، بو وه بیرهینانه وهی سردهه میکی میژووی کورد که میرنشینی بوتان زور به هیزتر بسو ، له لایه کی دیکه شه وه بو ئه وهی سیروبا وه پی سیاسی خوی له مه ر شیوهی ده ولته و چونا بیتی پاشای کی گورد پیشان بسدادات .

له داستانی مه و زین دا ، خانی زور به وردی و وردەکاری گهلى روخسارو لایه نی کومەلی کورده واری وینه کیشا وه : ئا هنگ گیران لمه جه زنی نه ورۆز دا ، را وکردن ، جۆره کانی چەک ، جل و به رگ و خشنل ، ری و شوینی خوان و خواردن و خواردنه وهی جۆرا جۆر ، پاره ، پیشکی و داو و ده رمان ، جادووگه ری ، ژن هینان و نه پیتی خوازبینی و زه ما وهندو ته نانه شه وی بکه می بووک و زاوا ، خانوو و به ره و ئا میری بنیاشنان ، مووزیکی کوردی و مردن و شیوهن و ناشتن ... هستد .

کاریکی زور گرنگ و با یه خدارو هیژای خانی ئه وهی داستانی مه و زینی بمه زمانی کوردی نووسی ، نه ک به عاره بی و فارسی و تورکی که باشی ده زانین و ده بتوانی بدرهه مه کانی خوی به بیکیکیان بنووسی . خانی که به کوردی داستانه کی نووسیوه ، ئا مانجی ئه وه بوبه کولتورو و

خست (خانی سالی ۱۶۹۴ یا ۱۶۹۵ له نووسینی مه موزین بوته وه) . ئەم ساکە هېشتا هەستى نەته وايەتى، بەگۈرەتى، واتاي سیاسى ئى زاراوه كە لای گەلانى رۆزھەلاتى ئىسلامى پەيدا نەبۇو بۇو . لەوسەر دەمەدا خەلکى بە گشتى ، تەنها گوپرايدل و ملکەچى ئايىن بۇون بە ھەمو دەزگا - کانىھە (ئىسلام بە ھەردوو بەشەكانيھە، شىعە و سوننە) و يانىش خىل (خىلايەتى) بە دا وو دەزگا سەرەتا يەككانيھە، خانى بىرۇ با وەرى نەته وايەتى و دەولەتى نەته وايەتى لە كۆتا بى سەدەتى ھەۋەدا ، لە مەم و زىنى خۆيدا باس كردووه ، بەلام مىللەتانى دىكەتى رۆز ھەلاتى نىۋە راست لە نىۋە راست يَا لە كۆتا بى سەدەتى نۆزدە دا بىر و با وەرى ئا وايان لا پەيدا بۇو، ئەۋىش لەوكاتەدا بۇو كە پىاوه نەخۆشەكە (ئىمپراطورىي وە سمانى ) لە سەرەمەرگدا بۇو . لە دەمەدا بىزۇتنە وە ئازادىخوازانەتى نەته وايەتى لەپىئىنا وي دامەزراندى دەولەتى نەته وايەتىدا لە نىۋە گەلانى ئىمپراطورىي وە سمانىدا دەستى پى كرد .

پيا و دەتوانى بىزى ئە و بىر وبا وە رو دىتنا نە ئە حمەدى خانى لە داستانى مەمۇزىنى خۆيدا پېشكەشى كردن، تېكرا ، ئە و با وەرە پېڭ دىنن كە ھەمو نەته وە يەك ما فى ئە وەتى ھە يە دەولەتىكى سەرەخۇۋە دا مەزرىنى و بىریا رى كارو با رو حکومەتى خۆى بىدات . ئەم با وەرە لە دەستپىكى سەدەتى بىستە مەدانىو نرا ما فى دىا رى كردىنى چارەنوس.

خانى بە شىۋەتى جۆر بە جۆر بۇ ھوشيار كردىنە وە گەلە كە ئە تېكرا شاوه ، بۇ ئە وە مىزۇوو خۆيان فىر بىن و نرخى زمانە كوردى يە كە خۆيان بزا ن و لە وە بىگەن كە گەللىكى خا وەن شارستا نىتىن و خۇ بە كورد زانىنیا ن پى شۇورەتى ئە و ھە مووئەما نەتى بەھەنگا وىزا نىۋە بۇ ئە وە كورد بىگەونە بىر كردىنە وە لە وەتى كە ئە وانىش گەللىكى سەرە بەخۇنۇ لە گەلانى دىكە كە متر نىن و ئىدى بۆچى دەبى ژىرددەستەتى گەلانى دىكە بن و بۇچى خۆيان خا وەن ئى خۆيان نە بنو كاروبارى خۆيان نە بن بە رېتۇھۇ .

يە كەم پلەتى ئەم ھەولەدانەتى بە وە دەست پى كردووه كە چىرۇكلىرى (مەمى ئالان ) ئى فۆلكلۇرى ھەلبىز رەدووه و كردوو يەتى بە بنا خەتى داستانە

لەوە دا يە كه كورد ببن به خاوهنى دەولەتى تاييەتى خۇيان، ولاتىكى  
وا كه خۇيان (پاشايىكى كورد) بىبەن بەرپىوه .

۳- بىرى لە بارو دۆخى سەردەمەكمەى خۇى و لە پاشەرۇزىش  
كىردى وە ئەگەرچى خانى پىاوبىكى خواپەرسەت و بەئايبىن بۇو، بەلام ھەرگىز  
بەو بەرسىقانە باوهەرە ئايىنىيەكمەى دەياندا يە دەستەوە، قايىل  
نە دەبۇو، و دلى ئاوى نەدەخواردەوە .

۴- پەنجەمبۇ ئەو راستىيە درېز كرد كە هوى پاشەكتىن گەلى  
كورد ئەدەپە دەرهەتەن پېشىكەوتىنى لى بىراوه و ژىردىستەيە، دەناكورد  
گەلىكى ئازا و قارەما نو چا و تىرە . مىۋوو گەلهەمى ھەميشە تىزى بۇوە  
لە نمۇونەي پالەوانى . ئۆبالي ژىز دەستىش لەگەردىنى دەستەلاتدار  
و فەرمانداراندا يە، نەك ھەزاران، چۈنكۈو مىرو دەستەلاتداران بە<sup>نە</sup>  
دلسوژى خەباتىان بۇ دامەزرا ندىنى دەولەتىكى كوردى نەدەكرد، بەلسکۈو  
بەرژە وەندىنى تايىھەتىي خۇيانىان بەلاوه لەبەر ژەۋەندىنى گەلهەكەپانپى  
گرنگىر بۇو . تەنا نەت ھيندىكىان ئاما دەش بۇون، دەزى يەكدى، دەگەمل  
دا گىر كەران دا دەست تىكەلەو بىكەن .

۵- رېگەى رىزگارى و سەربەخۆيىش ، بەو پىيە ، بەلای خانى يەوه  
ئاشكرا بۇو ھەكىرىتن، بەكار ھىتەنلىكىز ، چاكە .

ئەۋپىنچ خالى ھيلى بىنەرەتى ئەو باوهەرانە پىك دىيىن كە دەتowanىن  
نېيىو بىنېيىن : پۇرگرا مى خانى لەمەر دۆزى نەتەوايەتىي كورد .

لىرە دا شايىانى بايەخ پىدان و باسکەرنە كە بگۇترى خانى لە  
كات و سەردەمەكى زوودا بىرۇ باوهەكانى خۇى لەمەر كوردا يەتى رېك -

یا به کار هینانی هیز، له هلبژا ردنی نوینه‌ری ئەم شوو جۆره بیئر کردنەوەیدا خانی زیره‌کانه تاجدین و عارفی بەکار هیناوه، تاجدین براگه‌وره‌یەو نموونه‌ی نەوەیەک و بیئرکردنەوەیەکی کۆنە کە بەزمانی سیاسی ئەمروده‌شی نیوی (کونسنه رقا تیفای ئى بىرى)، بەلام عارفی برا بچکوله نوینه‌ری نەوەیەکی للاوو خۆرت و دلگەرمەکە بە شیوه پېیکی رادیکال و شۇرۇشگیرانه بیئر دەکاتەوە، خانی خۆی ئەوەنا درکىنی لایەننى کى دەگرى، بەلام ئەگەر ئەوەمان لەبیر بىت کە له کۆمەلی کورده‌وارى دا براى بچووك گوئى رايەلی براگه‌وره‌یەو رېزى دەگرى و براگه‌وره لە کارو بارى گرنگدا بېپار دەدات و قىسى دەيخوا، ئەوجا بۇمان دەردەکە - وئى خانى بەراڭكا وي و بە دل لایەنگرى كىيەو كامە هەلۇيىستى لا پەسەندە . تاجدین خەبەرا برايى گوھ كىر موحىكەم د دلى خوهدا بجىھ كى " ۴۱ "

ئىمە دەتوانىن ھنگا وەکانى خانى بۇ فۇرمۇولە كردنو پېیك هینانى بېرۇ با وەرەکانى خۆى لەمەر كوردا يەتى، لەم چەند خالىمە خوارەوەدا بە كورتى نىشان بىدەين :

- ۱- رەوش وھەل و مەرجى كوردىستا ئى ثى كرده‌وە و ئەوەي پېشان دا كە هوئى ھەرەگە‌ورە كويىرە‌وەریو پاشکە وتنى كوردا ن ئەوەيە ئىمپەرا تۈرىيە - كانى عوسما نى و سەفەوى ولاتەكە بىان داگىير كردووه .
  - ۲- ئەوەي خستە روو كە چارە سەرو شەلتەر ناتىقى ئەو بارە
-

عارف و هه گوته روسته می زال:  
 بی جهنگ وجیدال و بی ته همه وور  
 ئهف مه عره که نابتن ب دیوان  
 یا قهنج ئهوه ئهه سبه سواربین  
 چارنه وو جه وشنان د بهر کین  
 گورزان بههژین، رمان ب بازین  
 یا دی ب کوتک مه می خوه به رد بین

"ئهف ئه مر ب من مه حالمی قال،  
 قهت قی شوغلى مه که تنهشه وور  
 ئهه مانه وو سوبحه سه حتی مهیدان،  
 هه رسی ب سیلاح و کارو با ربین  
 زهندانه وو مه خفه ران ل سرکین  
 ئهف ره نگه مه می ژ میر بخوازین،  
 یا جومله ب مه ردی سه رب ده ردین"<sup>۳۹</sup>

خاشی لیره دا سده رای ئهوهی به مانای راسته خوی وشه وینهه  
 شه پگه یه ک ده کیشی؛ سوارو چهک و چهکدا رو مه سله میه کی ده وا که  
 جهنگا وره کان له پینا وی دا ئاما دهن خویان بهخت بکن، موزیکی وشهش  
 ده خاته خزمتی وینه که وه، وه کوو بلی ئهمه ئهه سووق وکه هنا یه بیت،  
 که جاران له شه ری کلاسیک دا به کار ده برا کاتی که پیا و ئهه بهیته  
 ده خوینیت وه به راستی وا ههست ده کات گورز راده وه شینرین و تیز  
 دهها ویژرین:

گورزان بههژین، رمان ب بازین  
 ئهف ره نگه مه می ژ میر بخوازین  
 له پاش ئهمه وینه یه کی دیکه کی کاریگه رو به هیز دینیت وه:  
 ئاشی ئهجه لی وسا بگیرین ته شبیهی حه بان سه ران بهه رین<sup>۴۰</sup>  
 گوت و بیزی نیوان تا جدین و عارفه بهرا ورد کردنه له نیوان دوو  
 جوئی جیا وا زی بی رکردن وه دوو لوچیکدا: تکا کردن و پارانه وه، یا

خانی هدل ده قوزیتده وه و ئەم با شه دە کاتە ماسکیک بۆ دە رپرینی  
 با وەرە سیاسی يە کانی خۆی لە مەر خەبات کردن لە پیئنا وی ئازا دیدا و بە  
 کار ھیتنا نی هیز . لە نیوان تا جدین و عارفی برا یدا گوت و بیشیزیک  
 روو دە ددا لە بارهی ئە وە وە کامە پیگە بگرنە بە رو بۆ بەردانی مەم  
 چى بکەن با شه . تا جدین لایه نگری ئە وە وە بچنە لای میرو تکای بەردانی  
 مەمی لى بکەن و دا وە لى بکەن لىبى خوش بیت . بەلام عارف لە وبا وە رە—  
 دایه کە کاریکی ئاوا هە رگیز بە بى شەر و بە یە کدا ھاتن ناکریو سەر  
 ناگری . ئە ولەم با رە یە وە دیتتىکی زۆر رۇون و ئاشکراي ھە یە و دەللى  
 ئەم کاره لە دیوانی میر دا . نا، بە لکوو لە مەيدانی شەر دا چاره سەر  
 دە کری و بە لایه کدا دە کە وى . خانی بە زمانی عارفە وە نە خشەی شەر  
 رۆزگار بخوازى دە کېشى ; شەرى لە پیئنا وی مەسەلە و دۆزیکی رە وادا كە  
 پيا و تىدا يا سەر دە کە وى ، يانىش پالەوانانە سەرى داده نى .

دە ردی ستى بى خە يالى زىن بۇو تا جدین ژ خە ما مەمی وە دین بـوو  
 هەر لە حزە دگەل برا ن ب شەربۇو قەسدا د دلى وى ئە فە خە بەر بـوو :  
 رابىت ب غەزە ب بچتە پېش میر داخواز بکەت مەمی ب تەقسىير  
 جاره ك بچتن مەمی رجا كەت سووج و گونەھى مەمی تکا كەت ،  
 دا میر ژ ویرا برا يى سەر دەت يا ئە فە سەر و مالى تى ب دە ردە<sup>٣٨</sup>  
 ئە مە دیتتى تا جدین بۇو كە دە يویست بچىتە لای میرو تکا لە میر  
 بکات بەری بدان . لوچىكى تا جدین لوچىكى هيمنى و گفت و گوچى ، بى ئە وە وە  
 هېزىك ھە بىت سەر كە وتنى بۆ دەستە بەر بکات . بەلام ، بە پىچەوانە ئە وە وە  
 عارف با وە رى بە خورتى و هېز ھە بـوو :

بیچکه له یه کگرتن، خانی مه رجی دیکه ش بو سه رکه وتن و رزگار-  
 بونون دا ده نتی، لم بوواره دا تا قیکردنده وه کانی میژووی کومه لگمه  
 مرؤقا یاهتی ده کاته بنا خدی با وه ره کانی خوی، بو دا مه زراندی ده ولست،  
 خانی وا سیر ده کاته وه، ده بی پیا و ده ست بداته شیرو هیز به کار بینی،  
 بو ئه وهی ما فی خوی ده ست بدر بکات خانی ئه مه به نفیشکی تا قیکردنده وهی  
 دیر وک دا ده نتی . مه رجی سیپه میشی چا که یه (ئیحسان)، که به لای منه وه تا  
 را ده یه کاته ما ویه . خانی (هیز) ده خاته پیش چا که وه ، چونکوو ئه و ده زانی  
 و لهو با وه ره دایه چا که یه کی قدس ولاواز له جیها نیکدا که هیز و خورتی  
 دا گیری کرد ووه و ده بیا به ریوه، نا توانی بژی و خوی بپا ریزی.

### خانی ده بیزی :

زه بت کر ژ خوه را ب میری ده ولست  
 وی حومی د ده ستی شیری رو ووسه  
 لوت و که ره من، عهتا و و به خشین  
 "مه هرا ته چی؟" گوته من کو: "هیممەت"  
 ته سخیر دبت ژ بويی ئىنسان " ۳۷

ھه رجی بره شیری ده ستی هیممەت  
 لهورا کو جیهان و هکی عدر ووسه  
 لی عقدو سیداق و مه هروکا بین  
 پرسی ژ دنی من ئه و ب حیممەت:  
 حاصل کو دنی ب شیر و ئیحسان

ئه گه رچی خانی زور بھی سیر و با وه ره کانی خوی له مه ره کور دایه تی  
 و پرنسيپه کانی و ئاسوی گه شه کردن و پیشکه وتنی ، به شیوه بیکی پاسته و  
 خو ، له دیبا چھی مه م و زین دا ده ربڑیوه ، به لام ئه و هدر سه رتا پیسی  
 داستانه کهی له پیتنا وی ده ربڑینی ئه و با وه رانه دا نووسیوه و مه م وزینی  
 کرد و ته بیانو بو و پنه کیشانی خمی دلی خوی . به شی چل و شه شه مینی  
 داستانی مه موزین یه کیکه له به هیز ترین و گرنگترین به شه کانی داستان  
 که . له و به شه دا خانی با سی ئه وه ده کات که پاش ئه وهی میری حمزه  
 به وهی زانی مه م حمزی له شازاده (زین) ئی خوشکیتی ، مه م ده خاته  
 زین دا نه وه .

تاجدینی دوستی گیانی به گیانی ئی مه م و برا کانی ده که ونه پلان دانان  
 بو رزگار کردن و به ردانی مه م .

ده مینیتەوە . خانى زۆر چاک ھا يدا رى ئەوھ بۇو كە كورد لە كارە ساتىكى زۆر گەورەدا دەزى و لاتەكەي بوته ويئانە و گەلەكەي ژىردىستە وبەزىوو سەرشۇرى بەردەستى تۈرك و فارسە ؛ لە بەر ئەوھ ، لە ھەمبەرئە و ۋەوشە ئەگەر كورد يەكبىرى ، لە وەيە ھەمووشت بە پىچەوانەوە بىت ؛ ئەوەم كورد هيىنە خورت و بە هيىز دەبن ، كە مىللەتلىنى دىكە دەكەونەزىر دەستىانەوە .

قىكرا بکرا مەئىنلىقىادەك  
ھەميان ڏەمەرا دكىر خولامى  
تەحسىل دكىر مە عىلىم و حىكمەت " ٣٥ " گەر دى ھەبوويا مەئىتىيفا قەك  
رووم و عەرەب و عەجم تەما مى  
تەكمىل دكىر مە دىن و دەولەت

مېڭۈسى بزوتنەوەي رېزگارىخوازانەي كورد ، پېرە لە نەمۇنەي گەورە  
گەورە و زىندۇو لە بارەي ئەوھ و كە گبانى خىلايەتى و دوو بەرەكى  
ج زيانىكى كوشىنەدە لە و خەباتە داوه و بوته هوى بە ئامانج نە  
گەيشتن .

خانى لە كۆتا يى سەددەي ھەۋىدا ئە و راستى يەي بە رۇونى دەبىنى .  
نېزىكەي سەددە و نېبۈك پاش ئەوھ ، كۆمەلى راپەرىنى نەتەوايەتى بۇوبى :  
رېزگارىخوازانە دەستى پى كرد ، بى ئەوھ ئاواتەكانيان وەدى بىيىن .

كەندال لەم رۇوهوھ دەنۇوسى : (( واپى دەچى خىلايەتى كۆسپى )  
سەرەكى ي سەر رېگەي پەيدا بۇونى ھەست و ھۆشى نەتەوايەتى بۇوبى :  
تەنا نەت ئايىنىش كە زۆر بە خورتى ملى گەلى كوردى گرتبوو ، تەنلى يەكى  
لەئەنجا مەكانى خۇرسكى بۇو . ئىيمە با وەر دەكەين ھەر ئەم سىما يە بە  
شىۋەيىكى سەرەكى هوى شكانى نېزىكەي ھەموو ئەوھەمۇو سەر ھەللىدان  
و راپەرىنانە بۇو كە لە سەرەتاي سەددەي نۆزدە دا رۇويان دا و دەيانو .  
بىت دەولەتىكى كوردىي سەر بەخۇ و يەكگەرتتوو دامەزرىيىن و لە ئەنجا مىشدا  
بە هوى خيانەت و گۈرىنى لايەنكىرى و دابەشبۇونى نېوان كوردان و بېرۇو .  
باوهوي خىلايەتى يەوھ ھەرەسيان هيىنا . )) " ٦٤ "

هەمەلو مەرجى ئەودەم بەم شىوه يەشى دەكادە وە : ((لە ما وەيىنۋان - سالى ١٥١٤ و نىيۇھى دوووهەمى چەرخى نۇزىدەدا چەند مىرىنىشىنىڭى كوردى دا مەزراڭ كە هەر كامىكىان لە چوار چىوهەي ئىمپەرا تۇرى عوسمانى، يان ئىرمان دا خاوهنى چەشىنسەربەخۆيى يەك بۇون، تەناھت ھىنديكىان ھەم كە گەل شاي ئىرمان و ھەم لەگەل سولتانى عوسمانى پىوهندىيان ھەبۇو .))

دكتور قاسملو پاشان لە سەرى دەزواو دەلى : ((نەك ھەر دەرە بەگە - كان، بەلكۇو بىنەمالە پا داشا سېيەكان و مىرىنىشىنەكانى كوردىش ھەرچەندە چەشىنە سەربەخۆيى يەكىان ھەبۇو، بەلام لە نا و خۆيان دا يەك نەبۇون و ھەمېشە پېكەوە شەپو كىشەيان بۇو، زۆر جار واپى دەكەوت كە بۆشەرى يەكتىر دا وايىيا رەمتى لە شاي ئىرمان يا سولتانى عوسمانى بىكەن .)) "٣٣"

ئەم شەپو شۇرۇ و ناكۆكىيەتىنیوان مىريو سەرەك خىلەكان گەورە - ترىن لەمپەر و رېڭىر بۇو لە بەر دەم يەكگەرتىنى گەلى كوردىدا .

كەندال ، كە نۇوسەرىكى كوردى ئەم دەمە بە ، دەنۇوسى : ((میرەكانى كوردى ، كە گەلى جار ئاسۇي بەر جا ويان لە سنۇورى خۆيان بە ولادەتىپەرى نەدەكەرد، ئەوهەيان سەلمانند كەنا توانى گەلەكەيانلە ژىوتاتەكە دەستەلاتىكىي نىيۇھەندىدا يەك بىخەن . شەپوشۇرلىدر سەر سەرددەستى و خولەپىش گەرتىن، كە پەتاى فيودالىزمە ، كەرىبۈونى بە گۇز يەكدىدا .)) " ٣٤ "

لە كاتى فەقىيەتىداو لە دەمانەشدا كە مەلا بۇو، خانى زۇر ناوجە و دەقەرى كوردىستان گەرا بۇو، و شارەزا بىي يەكى باشى لەمەر دوخ و ھەل و مەرجى كۆمەلايەتى و سیاسى ئى فلاشە كەدى ھەبۇو، دەيزانى بەبىي يەكگەرتىن و بەبىي خەباتىكى يەكگەرتتوو ، گەلى كوردى ھەروا بە ژىر دەستى

33- Ghassemloou, A.R: kurdistan\_and\_the\_kurds,  
Prague 1965 , P. 37.

34- Chaliand, Gerard(ed): People without a country ,  
London, Zed press, 1980, P. 23.

خانی پاساوی ئەم راستییه تاله بەوە دەداتەوە کە کورد ھەمیشە  
ئازا و سەر بەرز بۇون و ھەر لە بەر ئەوەش نايانەوی منه تبا رو چا و  
لە دەستى تەناتەت يەكدىش بن و لە گەل يەكدى رېک ناکەون .

ھندى ژ شەجاھتى غەيىوورن      ئەو چەند ژ مننەتى نەفۇورن  
ئەف غىرەت و ئەف عولۇویھىممەت      بۇو مانىعى حەملىبارى مننەت  
لەو پېكىھ ھەمیشە بى تفاقن      دائىم بەمەررود وشىقا قن" ۳۲

ئەگەرچى پاسادانەکەی خانى راستىيەكى زۇرى تىدا يە وسا يكۈلۈـ  
زىي كۆمەللى كوردهوارى، بەشىوهينىكى زىرەكانەپىشان دەداتە بەلام، ويراي  
ئەوەش ھىزىكى زۇرى قا يىيل كردنى تىددانىيە .

\* \* \* \* \*

خانى لە ئەنجامى ليكدا نەوەو بىر كردنه وەداو لە ئەنجامى  
شىكردنەوەي رەۋىشى ولاتەكەيدا ، بۇ چارەسەر يېك دەگەراو دەيويست پېگەـ  
يەك دەست نىشان بکاتە بۇ گەيشتن بەو پاشە رۆزەي خەونى سېۋە دەبىنىـ

لىھسەدەي شازده و ھەقىدەدا ، لە كوردىستاندا كۆمەللى مىرنشىنىـ  
نيوجەسەر بەخۇـ ھەبۇون، عوسمانىيەكان و سەفەوى يەكان رۆلىكى گەورەـ  
يان ھەبۇولە پەيدا كردن و دامزرا ندى ئەو جورە مىرنشىنا نەدا .

ھەر خىلىك و ھۆزىك، يا ھەر كۆمەلە تىرەيەك مىرنشىنىكى تايىھەقىـ  
بۇون بۇ خۆيان، مىرو دەستەلاتۇرەكان كەھەمو فىيۇدالى گەورە و سەرە روكـ  
خىلى بۇون ، دىزى يەكترى بۇون و بۇ لاواز كردنى مىرەكانى دىكە و بەھىزـ  
كردنى پايدى خۆيان و فراوان كردنى سنۇورى دەستەلاتيان ھەمېشە دىزىـ  
يەكدى لە شەر دابۇون و خۆيان لە سولتان و ( بايى عالى ) نىزىـ  
دەكىدەوە بۇ وەركىتنى پلەو پايدى زۇرتىرو لىيىدانى بەرانبەرە كانىانـ  
دكتور ئەورەخمانى قاسملو لە كىتىبى "كوردىستان و كورد" ئى خۆيىـدا

هەل وەرچ و رەوشى چەوساندنه وە دەمکوت کردن لە كوردىستا ندا ، لە كۆندا و ئىستاش ، رۇلىكى يەكجار مەزن و كارىگەرى لەوەدا هەمە كە كورد پەندا دەبەنە بەر كاردا نەوەي سايکۆلۈزى ئا وەها .

خانىش لەتا وكا رەساتى رەوشى سەرەدەمى خۆيدا هيئىدىچا ر پەنجەبۇ را بىردووپالەوانانەي گەلهەكەي درېزدەكتە

وان گىرت ب شير شەھرى شوهەرت تەسخىر كرن بىلادىھىممەت  
ھەرمىرەكى وان ب بەزلى حاتەم ھەرمىرەكى وان ب رەزمىرسەت ۳۰

من واي سۇ دەچم كەخانى لەو بەيتەدا دەيەھەۋى سەرەدەمېكى مېزۇسى  
كوردو نۇدارىكى كورد وەبىر بىئىتەۋە ، كە لە مېزۇسى ئىسلام و رۆز—  
ھەلاتدا بايەمېكى يەكجار زۆرى ھەمە ، مەبەستىمان رۇلى سەركەدە كوردى  
موسلما ن ( سەلاھىدىنى ئەيیوبى ) يە " ۱۱۹۳/۵۲۲-۵۸۹/۱۱۳۸ " لەشكاندى  
خاچپەرسەتكاندا و دامزرا ندى دەولەتى ئەيیوبى ، كە لە مېسرو سورىا  
و يەمهندىدا فەرمانىرەوا بۇون .

ھەرۋەھا لە مېزۇسى نىزىكى كوردىشدا ، هيئەكانى كورد ، كە لەكۈرانى  
ھوز وتىرەي مېرىنىشىنەكانى كورد پىكەتلىك بىنچىنەبى بۇون كە  
سەركەوتىيان بۇ عوسما نىيەكان لەشەپى دىزى سەفەۋىيىاندا دەستە بەركەد .

مېرىنى و غىرەت و جەلادەت جوا مېرى و ھىممەت و سەخاوهەت  
وان دانە بشىرو ھىممەتى داد " ۳۱ " ئەوچەتمە ۋ بوقەبىلى ئەكرااد

گىيا سى نەتەوەپەرسەتكانى ، ھەرگىز ئەوەي لە بىر ناباتەوە  
كە گەلهەكەي بەدەن ناوابانگى دەركەدووھ كە ھەمېشە جىاوازىان تىدا يە و  
نا كۈك و پا رچەپا رچەن و بەدەگەمن دەتوانلىخ نىيۇ خۆياندا رېك بگەون  
و يەك بگەن . ئەھىيەتى بىت ئەمەش دىار دەيەكى گەنگ و سەرچەرا كېشى  
بىزۇتنەوەي رۇزگا رىخوا زانەي كورد لە را بىردوو و ئىستاشدا يە .

نیزیکی ی بیرو با وه‌ری خانی له جه‌بری‌یه کانه‌وه ، هه‌رگیز وای لی ناکات پاشه رۆژیش ملکه‌چی بیرو با وه‌ره کانی ئه‌وان‌بکات ، به‌لکوو ته‌ماشای کۆمەلی کورده‌وا ری ده‌کات و‌چاوی هیوا ده‌بریتە گەله‌کەی . هه‌رچەندە ره‌وشی گەله‌کەی هه‌رگیز باش‌نی يه‌ونمۇونەی پاشکەوتنه ، به‌لام ده‌زانی ئەم‌دواکەوتنه بیتowanی گەیینی ، به‌لکوو ئەنجامی راسته‌خوّى زیّر ده‌ستی و به‌نمەزانی هیشتەنە‌وه‌یه ، ئەنجامی دا به‌شبوونی و‌لاتەکەیانه . به‌راستی ئەم بیرو بنا خەییکی گرنگ و ستۇونیکی‌ھیژاپیما می‌خانی‌یه ، كە داستانی مەمو زینی بوی تەرخان کردووه . " پرسیدبنا غەنی بینیاتی ، ئید کو ئەحمدەدی خانی د پوئیما خوهدادا گوتنه و نەقشا‌ندنە و رازاندنه ، ئەو پرین ، کو ئەو دبیزەپاشکەتن و پاشدا مايندا مەددەنییە تا کوردان ژ پارکرنو بەشکرنا ئاخا اته ، ژ تونەبۇونا دەولەتا وانه ، ژ بى تفاقیا کوردان و قەبیلیدوانه " . ۲۸

کرمانچ نەپر د بى كەمالىن ئەمما د يەتىم و بى مەجالىن بىلچوملە نە جاھيل و نەزانن بەلکى د سەفيلى و بى خودانن " ۲۹ " ئەگەر زیّر دەستەبى تا وانىش بېت ، ئەوتا وانه ، به‌لائی خانی يه‌وه ، لە ئەستتوی‌نادارو حاكمو ئەمیرەکاندا يه ، بە كورتى ئەوانە‌دەستەلاتیان بە دەستە‌وه‌یه ، نەك شا عىر و هەزاران .

ديارده‌يەكى هەرە ئاشکراى بىزوتتە‌وه‌ئا زا دىخوازىنى گەلى کورد ، لە كۆنه‌وه‌وتائىستاش ، ئەوه‌يە تا را دەيەكى زۆر خۆبە مىزۇوی دىرىپەنە گەلى کورده‌وه گرى دا وەوكىردوویەتى بە كولەكەيەكى بە ھىزبوبەرە و پىشە و چۈون و رېگە خۆش‌کردن بۆ درووستكىرىدىنى پاشە روز ئەم دىا رەدەيىن ، بىگومان ، ھىنندى جار دەبىتەھۆى پەيدا بۇونى خەيال و فەنتازى و تىكەل بۇونى دەگەل (ئىستا) دا ، هەرۋەك دەشپىتەھۆى فەرەزۇيىشتن لە نوخانىن و هەلسەنگاندى ئەو را بىردووهدا . بەداخوه كەم جار خەباتكا رانى رېگە دىسکە و دۆستەکانى كوردو دوزى گەلى کوردىش بە هوى ئەوه‌وه‌كە رەنگە بەتەوا ولە رەوشى پەلە ترا جىدىيا ئىستاى كوردىنا گەن ، تىگە - يىشتن و وينەيىكى چەوت وەردەگرنو دەيىكەنە بنا خەبۇ لىكدا نېتەوە و هەلۇيىتىش .

-۲۸- رو دىننكو، هە سە. ل ، ۹ (سەرەتا لەلائىراستىكتىپەكە را .)

-۲۹- هە سە. پە. ل ۳۲ ،

یەک جور عەبى مەدىجا مى جەمكە  
ھەرچى مە ئىرا دە يەخويا بىت  
كانى دېتن مويەسسى رئيق بال؟  
ئا ياي بوو يە قابىلى زەوالى؟  
ھەتتا وەكۈ دەور مونتەها بىت؟  
تالىع بىتن ژ بۇ مە كەوكەب  
جارەك بىتن ژ خواب ھشىار" ٤٤

ساقى ، تو ژ بۇ خودى كەرەم كە  
دا جام ب مەرىجىيەن نۇما بىت  
دا كەشف بېت لېھەر مە ئەحوال  
ئىدبارى مە وا گىيە كە ماللى  
يا هەر وەھە دى ل ئىستىوا بىت  
قەت مومكىنە ئەۋەز چەرخىلەو لەب  
بەختى مەز بۇ مەمەرا بېت يار

خانى وەكۈ مروقىكى خواپەرسىت و ئايىندار ، بۇ ئەوهى وەرا مىكى  
دەستگىر بېتتە ، زۆر جار دەگەپىتە و بۇ لاي سەرچا وە فەلسەفەي  
و ئايىنى يەكەمى ، بەلام ئە و خواپەرسىكى چا و لىكەر و بىھوشنى  
ھەروا زووش مل بە ھەمووشتىدا تەبەلکۈ دەخاتە بەرددەم پر-  
سيار و لىپرسىنە وەدەيدەوى لوزىك و ياسايدىك بۇ روودا و دىا رەتكانى  
زىيان بەگشتى و زىانى كۆمەلە كەمى خۆيى بدۇزىتە و ھەر وەھاشتى بگات  
بۇچى گەلە كەمى لەو بارە دا دەزىت .

ئەز ما مە د حىكىمەتا خودىدا  
ئا ياي بىچ وەجهى مانە مەحرۇوم؟ ٤٥  
بىلジョملە ژ بۇ چى بۇونە مەحكوم  
بىرۇ با وەرى ئايىنى خانى كەلى جار پالى بىيەدەنى هوى دواكەوتىنى  
گەلە كەمى بخاتەسەر و يىستى خودا .

ئەممە ژ ئەزەل خودى وەساڭر ئەف رووم وەجەملى سەر مەراكىر" ٤٦  
ئەوبەيتە بۇ ئەوهەمان دەبات ، وا بىر بىكەينە وە ، با وەرەكانى خانى، ھەر-  
نەبى لەو سەردەمدا كەپىشگۇشنى مەم وزىنى نوسىيە ، لە با وەرى (جەبىي  
يەكان) ھە ، كەبا وەريان بە (جەبرىيەت) ياخەسلىق بۇوە، سىزىك بۇوە" ٤٧

- ٤٤ - ھ. سه . ب. ل. ل ٣٠-٣١

- ٤٥ - ھ. سه . ب. ل ٣٣

- ٤٦ - ھ. سه . ب. ل ٣٤

- ٤٧ - جەبرىيە ، ياخەسلىق بۇوە، سىزىك بۇوە  
كە گو پىرە وى با وەرى جەبرىن ، كەدەلى ئەوي رەفتار و كردا رەتكەتات  
خودا خۆيەتى نەك مروق (I.2 E)

خانی کاتی بیر لهوه دهکاتهوه کوردیش " خودان "ی خوی هه بیت  
وینهی پاشا یهک له میشکی خویداده کیشی که زانست و هونه رو هه لبه سته  
به کورتی ژیانی کولتوروی و زانستی ، به لایه وه هیژا و گرنگ بیت  
و نرخی پی بد . پاشا یهک بیت ، خوینه وارو روونا کبیریکی گهورهی وه کوو  
خانی و بتوانی له سایهیدا رولی خوی بینی و هونه روی گله کهی پیش بخات  
و کله پور و را بردووی سبووزینیتدهوه . خانی لهم خهیال و وینه کیشا نهی  
پاشا یهکی کوردادا ، به باوهی . د . عیزه دین ره سول ، له لایه ندووفه یله -  
سووفه وه کاری تی کراوه : ئه فلاتوون و فارابی ، که هه ردوه بو فهرما نره -  
وای چاک مدرجی ئه وهیان داناوه فهیله سووف و ژیر بیت . " ۲۲ "

عالی که ره مهک ، له تیفه دانهک ،  
شیعر و غمهzel و کیتاب و دیوان  
ئهف نهقد ببوبویا ل ساوی مه قبوق  
عالی بکرا ل بانی گه ردوون ،  
بی حهی بکرا علی حه زیری ،  
هه تابئه بهد بما یی حه زیران " ۲۳ "

گه ردی هه بوبویا مه زی خودانه ک  
عیلم و هونه رو که مال و ئیزغان  
ئهف جنس ببوبویا ل با اوی مه عمومول  
من دی عله ما که لامی مه وزوون  
بینافه روحه مه لی جه زیری  
که یفهک وه بدا فه قیهی تهیران

له ساتیکی را مان و بیر کردنه وهی سو فی یانه دا خانی بیر له پاشه  
روزی گمل و ولاته کهی دهکاتهوه و دهیه وی تی بگات پاشه روش چون ده بی  
ئه و ره وش و ههل و مرجهی کورد له و روش دا تیدا ده زیا ، زور تالو جه -  
رگبر و بددبهختانه بوبو .

هموو شتیک هه گدشه دهکات تا ده گاته لوو تکه ، تا ده گاته تروپک  
و پلهی ( ته و اوی ) ...  
بدلام پاش ئه وه گورانیکی چونا یهتی دهست پی دهکاته ئه گدر وابیت ، خو  
ده بی بددبهختی و چاره رهشی و کویره وهی کوردیش ببریتدهوه و هه ساروی  
بدهخت و پاشه روشی روونا ک دمکه ویت .

۲۲ - رسول ، المصدر السابق ، ص ۱۵۰

۲۳ - رو دین کو ، هه . سه . ل . ۳۶ - ۳۵

خانی جاریکی دیکهش ده گه ریته و سه زئم بیره و به جوزیکی دیکه ده یلیته وه :

نه قدمی مه مه بیزه " که مبههایه " بیسکهی شاه شاه هره وایه " ۱۸  
ئم تیرا و نینهی خانی گه لی لیکدانه و هه لدگری ، چونکه له وهیه که  
با سی پاره ده کات هدر مه بهستی مانای راسته و خوو راسته قینه و شه که  
بیت و له وه شه مه بهستی و اتا شارا وه که بیت ، که وه کوو نیشانه نسخ  
با یی زمان و کولتووری کوردی (له وانه شه داستانی مه و زینه که خوی)  
به کاری هینا بی . (شه هره وا نیوی پاره یه کی نا وچه جه زیره بیو ، که هدر  
له وی درو وست کراوه و له چوار چیوه و سنوری میرنشینه که دا بۆکریزو  
فروشتن به کار هینرا وه . ۱۹ " له وه یه خانی و شه که وه کوو سیمبولی  
ده سته لات و سنوری ده ست رؤیشتی میری جه زیره به کار بردبی .

ئه وهی لیره دا سه رنج را ده کیشی بیرو رای خانی یه له سه ر میسری  
جه زیره . میری بوتان ده سته لاتدار و فدر ما نپه وایه کی گه وهی کوردستان  
بیو ، به لام له گه ل ئه وه شدا خانی هه ربه ده سته لاتداریکی نا وچه یی  
و بچووکی ده زانی . خانی به ته نی جه زیره نا وی ، به لکوو ده یه وی هه موو  
کوردستان شیکرا بادشا خوی هه بی . هدر به دوای ئه و به یه دا ده چیتموو  
سه ریا سی ئه وهی که پادشا یه کی کورد ده تواني بره و بو پاره (کولتووری)  
کورد پهیدا بکات وئه و نزم و تیروانین و گومان لیکردنی له سه ر لابه ری .  
گه ر دی ببوویا ب زه رب مه نقووش ۲۰ " نه دما وه هه بی ره وا جو مه غشوش  
خانی وه کوو بیه وی ئه م بیرا نهی خوی ، به شیوه ییکی سا یکولوزی ، به هوی  
زور جار دووباره کردن وه وه ، له میشکی خوینه ردا بسچه سپینی ، زور جاران  
باس ده کات وه و هدر جاره ش له گه ل به لگهی تازه و جیا وا زدا ده یانه بیت وه .

پهیدا بیتن مه پادشا هه ک  
قەدری قەلمە مه بیتە زانین  
عیلمى مه ب بیتن عیلاجى ۲۱

رابتىز مەزى جيھانپەنا هەك  
شىرى ھونەرا مه بیتە دانىن  
ده ردى مه ب بیتن عیلاجى

۱۸ - ه . سه . پ . ل ۳۷

۱۹ - رسول ، المصدح السابق ، ص ۷۵

۲۰ - رو دینگو ، ه . سه . ل ، ۳۷

۲۱ - ه . سه . پ . ل ۳۱

کلیلی رزگار بوون لەو ھەموو باره ناھەموارەی کوردستان  
و ریگەی گەیشتنە دوا رۆژیکی باش بەلای خانى یەوە نەجا دووه و نېھینى  
يەکى گەورەشە . ئەوە دەبىنىچىيا وا زىي نېۋان گەلەپەنە خا وەن دەولەت  
و پاشا و تەخت وتاراج و گەلەپەنە داگىركرار و ژىز دەستە و بىچى دەولەت  
و پاشا و تەخت و تاراج چۈنە و چى يە .

تورك وفارس ، يا خانى گۇتمەنی روم و عەجمەنەمەنە جورى يە  
کەمن و كوردىش دووهەم . چارەسەرو ئەلتەرنا تىقى ئەورە و شەش ئەوە يە كە  
كورد و لاتى تايىھەتى خۆي ھەبىتو خۆي بىبا به رېۋە ، واتە دەستەلەت  
بە دەست كورد خۆيەوە يېت . پاشا يەكى كورد كە تەخت وتاراج خۆي ھەبىت  
بە با وەرى خانى ، دەتowanى كورد لە ژىز دەستى داگىر كەران دەر بکات  
و رزگارى بکات .

لاييق بديا خودى كەنەنەك  
زاھير قە دبۇو ژ بومە بە خەتك  
ئەلبەتە دبۇو مەزى رەواجەك  
تىنانە دەرى ژ دەست لە ئىمان" ۱۶

ج لە سەرددەمى دەستەلەتى عارەباندا ، كە بە خۆي بلا كەنەنەك  
ئىسلامى يەوه ، زمان و نەريت و رەشت و خۇوي خۆپەشيان بەلەتا ندا بلا و  
دەكرىدەوه و ج لە سەرددەمى خانى خۆيدا ، كە فارس و تورك دەولەت و  
دەستەلەتى خۆيان ھەبۇو ، ھەميشە بەچا و يېكى نزەمە وەتە ما شايىزما نوكولتو و رو  
دا ب و نەريتى كوردان كراوه . ماكى ئەم سووك تىبرۇوانىنە نەزەنەنە  
بىر و كولتۇورى كوردىش ھە مدیس ، بە با وەرى خانى دەگەرەتەوه بۇ ئەوهى  
كورد و لات و پا شاي خۆي نى يە .

سا حىب كەرەمەك ، سو خەنەوا زەك  
نە دەما وەھە بىچەوا جومەشكۈوك" ۱۷

گەردى ھەبۇويا مە پا دشاھەك  
تەعىين ببۇويا ڈبو وى تەختەك  
حاصل ببۇويا ڈبو وى تا جەك  
خەمخوارى دكىر ل مە يەتىمان

گەردى ھەبۇويا مە سەرفەرازەك  
نەقدى مە دبۇوبىكە مەسكۈوك

کورد له پیتنا وی ته ما حو شه ر خوازی خویاندا به کار بیشنه و بیکهنه مه تالی  
بۆ گیرانه وهی شیرو تیرو دوژمن :

کرمانج هه می ل چار کە نارن  
بو تیرو قهزا کەرنە ئامانج  
ھەر تاییفە سەددە کن سەدیدن "۱۳"

ئەفرۇوم و عەجم بوان حەسارن  
ھەر دوو تەرەفان قەبىلى کرمانج  
گویا کو ل سەر حەددان کلیدن

بەسته (بە عارەبی سە) بۆ راگرتزو گل دانە وهی ئا و دیت  
دامەزرا ندن : روپی کوردا نیش لە ودەمەدا ھەر ئەوه بۇو، خانى لیزىرە  
دا ویئنەیەکى شیعى و زمانەوانى زۆر سەركەوتتوو دروست دەکا، ھەر دوو  
زەریاى بە خروش و شەپۆل دارو ھەلچوھى عوسما نى و سەفە وىرۇوه ویەک، دېن  
شا لاؤ دېن، بەلام کورد لە نیوانیان دا پارچە وشكانى و بەزىكەلەدەیەکىان  
جوی دە کاتەوه . بۆ ویئنە کیشانى ئەورە وشوهەل مەرچە خەنائى وشەی (بە رزەخ)  
ى عارەبی بەکار ھېننا وە کە ھەملە جوغرافیا و ھەم لە قورئا نیش دا با يەخى  
خوی ھە يە .

ھەندى کو دکن خور و ووج و تەحرىك  
وان ژىكە دکن میسالى بە رزەخ" ۱۴"

ئەف قولزو مىدووم و بە حرى تاجىك  
کرمانج دىن بخوين مولەتتەخ

لە ھەل و مەرجى پەيدا بیوون و گەشە كردن و بە ھىزبۇونى ھەمر  
دوو ئىمپىرا تۆرى يەكەدا، خانى دە بىنى ھەبۇونى دە ولەت روپلیکى  
دە بىنى و چۈن دە بىتە ھۆي پېشکە و تبىنە تەوهىيىك . ئەگەرچى سۇلتانى  
عوسما نى و شاي سەفەوى و خۆيان بە نویئنە رو دەمەراتى ئىسلام دەزانى و  
بە نا وى ئىسلامە وە فەرمان دە كەن ، بەلام خانى ھەرگىز بەم رۇا لەتىمە  
ھە لىنـا خەلـەتىـ، بەلـکوـو بـە لـىـك دـانـەـ وـهـىـ خـوـىـ دـەـ گـاتـەـ ئـەـ وـەـنـجاـ مـەـىـكـەـ  
ھەر دوو لايـاـ نـھـەـرـ دـاـگـىـرـ كـەـرـ وـ كـورـدـەـ كـەـ، بـەـ ھـۆـىـ ئـەـوـهـوـ وـهـ كـەـ وـلـاتـىـ  
تاـيـبـەـ تـىـ يـ خـوـىـ نـىـ يـ، گـەـلـىـكـىـ "بـىـپـەـنـاـ"ـ يـ 15

13 - ھە . سە . پ . ل ۳۳

14 - ھە سە . پ

15 ھە . سە . پ . ل ۳۷

تالانه که و تیا چوو . گه رُوکی تورک ئەولیا چەلەبىئە و روودا وەی بەدریزا  
لە (سیاحەتنامە) كەيدا گىردا وەته وە . " ۱۱ "

خانى بىر لە وە دەكادەوە كە كورد بەھۆي ئەوەوە كە ولاتى سەر  
بەخۇو يەكگەرتۇو خۇي نىيە ، ئا واكە وتۆتە بەرددەستى ئە و دوو ھىزە ، چونكەو ،  
خانى دەلىٽى، ئەگەر كورد پاشابىكى خۇي ھەبوا يە :

غاليب نەدبۇو ل سەر مەئەف رووم  
نەدبۇونەخدرا بەيىدەست بىووم  
مەغلۇوب و موتىيعى تورك و تاجىك" ۱۲ "

ئىيمپِرَا تۆرىيەكانى عوسمانى و سەفەوى بەرۋالەت دوو دەولەتى  
ئىسلامى بۇون . جىا وازى ئا يىنزا (مذھب) ھۆيەكى شەرۇ شۇرى نېۋانىان  
بۇو سەفەوى (شىعە) يان كردىبووه ئا يىننى پەسمى دەولەتكە يان و عوسما نىش  
(سوئىنە) بۇون . ھەر دوو ھەر مۇسلمان بۇونو ھەر دووش ھەر خۇيان بەخىيىو  
ئا يىننى راست دادەنا . ھەرىيەكە يان ھەولى دەدا سەنۋورى دەستەلات و فەرمانى  
خۇي فرا و انتر بکات و وولات و خاکى ئەوى دىكە داگىر بکات .

كوردىستان نا و چەيەك بۇو لە نېوان ھەر دوو ئالىدا كە دەبۇو پېش  
تر داگىرى بىھن بۆ ئەوهى بىتوا ن پاشان ھىرچ بېنە سەر پىتەختى  
يەكدى . لەم نېوانە دا كوردىستان بۇوبۇو شەرگە يەك لەشكىرى ھەر  
دوو لا ، سالەھاى سال ، لەسەرى بەيەكدا دەھاتن و لەيەكىان دەدا .

ھەر يەكە يان كۆمەللى میر نىشىنى كوردىان دروست كردىبوو ، بە نيا زەھى  
سەنۋورى ولاتى خۇيانى بىپارىزىن و بىكەن بە گۈ لايەكە دىكەدا .

حەكىم ئىدرىسى بىلىسى (سالى ۹۲۶ ي كۆچى مردووه ) ، مىزۇونووس  
و زانا و سياسە تزانى كورد ، رۆللىكى گرنگى لە يەكخستنى ھۆز و تىرە -  
كانى كورد دا دىيت و كۆمەللى مير نىشىنى بۆ ئالىكارى ئى سولتانى عوسمانى  
لە شەرى دىرى سەفەويان دا پېك هېينا .

خانى زۆر هوشىا رانە لەوه گەيشتبوو كە ئە و دوو ھىزە دەيىانو يىست

۱۱ - رسول ، المصدرا السابق ، ص ۱۰۷ .

۱۲ - رۇدىنەكى ، ھە ، سە . ل ۳۲

ئەنچا مى شەرى چالدىراندا كە عوسمانى يەكا نتىدا سەركە وتبۇون، وەبەر دەولەتى عوسمانى كە وتبۇ لە گەلّە مۇ ئەۋەشدا خانى كوردستان بىنە بەشىك لە دەولەتى عوسمانى يا سەفهوى تازمیرى، بەلكۈوبە ولاٰتىكىدا گىر كراوى دادەنى وئەوانىش بە داگىر كەر .

شەرى نىوان عوسمانى سەفهوى يەكاكانلىسەد سالان پىرتى درىزەكىشا و بۇوبە هوئى وېرلان بۇونى كوردستان سەر راي ئەوهش، بۇ سەر بى شۆر كردنى مىرو فەرمانىدا يەكاكانلىسەد سەفهوى كە دەپەنە زور درىدانى دەكە وتنەھىرىش بىردىن و خويىن رىشتىن. سەفهوى يەكاكانلىسەردەمى فەرماندا يەقى شا هەباىي دووه مدا ( ۱۵۸۵ - ۱۶۲۸ ) هىرىشىان كردى سەر ئەمېرخانى يەكىدەستى مىرى برا دوست، كە ( قەلائىدمەم ) كىربۇوه پىتەختى خۆى.

شەرەكە چەند ما نگىك درىزەكىشا، بەلاملە كۆتا يېدا ( سالى ۱۰۱۷ ئى كۆچى ) كوردان نە تەقدەمنى و نە ئاپانىنە ما بىو، لەبەر ئەوه شكان، بەلام خۆيان نەدا بەدەستەوە، كاتى كەلەشكىرىدا گىركەر چۈونە نىپو قەلائىكە، بىتىانپىاو ان ھەموو كۈزۈرە بۇون و ڇنانىش ياخۇپا بەپەتھەلۋا سىبۇو، يانىش لە دىبوا رەبەرزەكەنلىوە خۆيا نەلدىرى! بۇو، بۇ ئەوهى بەزىنەدۇستى نەكەونە بەرەستى نەيا ر. ئىستاكە گەلئى گۆرگەنلىي و بەيتھەن لەمەر كارەساتى جەرگىرى قەلاؤ ئازايدى و جوا مىرى كوردان گوتراون .

نوو سەرى كۆچكىردووی كوردى سۆفيتى عارەبى شەمۇ رۇمانى دەمدەمى لە سەر بنا خىرى رۇودا وەكەنلىي دەمدەم دا رىشتۇوه . " ۱۵ "

عوسمانى يەكاكانلىان لە تەك سەركەرە كوردى كەندا خۇش نە بۇو. ھەرچەندە لە شەرى دىرىي سەفهوى ياندا بەكارىاندە بىردىن، بەلام، ھەر لەو كاتەشدا لەھەلودە رەفەشىك دەگەرەن بۇ ئەوهى يەكەنلىكە دواي يەكدا يانپىلۇسىن سالى ۱۵۶۱ ئى كۆچى عوسمانى ھەللىان كۆتا يە سەر ئەبدالخانى مىرى بىدىلىس كۆتا يىيان بە ڇيانى ئە و مىرنىشىنە هىينا، كە يەكىك بۇو لە مىرنىشىنە ھەرە گەرنىڭ و ناودارەكەنلىي كوردستان. دۇزمۇن ھەرچىي كەوتەبەرەستت تالانى كەردى. كەتىپخانەدەولە مەندو گەورەكەنلىي ئەبدالخانىش وەبەر ئە و

Semo , Erebê /: Dimdim , Moscow, Sovetskii pisatel 1974

-۱۰

ئەم رۇما نە بەشىوھى كرمانجىي خواروش، بە رىنۇوسى كوردىي كوردستانى عىزراق و ئىرلان، چاپ كراوه، بەغدا ۱۹۷۶

شەرەفخانی بدلیسی ( ١٦٠٤ - ١٥٤٣ ز ) نوسەری شەرەفنا مە ، میژووی ھەرەبە نا و باونگى کورد .

میرنشینەكانى کورد لە نیوخۇياندا ھەرگىز پىك نەبوون. ئەم ھەل و مەرچە بۇ خاوهن بىرىيکى کوردى وەکوو خانى دوولايەنى ھەبوو :

۱- لە لايىكەدە دوخىيکى پىر لە كارەسات و ئازارو خويىن رېزان و پا رچەپارچە بۇون، ولاتىكى داگىركرار، گەلىكى ۋىرددەست .

۲- لە لايىكى دىكەدەدە هىواى ئەوهى سەركىرەكانى کورد بىرىك لە بارى ولاتىكە يانوپاشە پۇزى گەلەكە يان بىكەنەوە و تىكۈشىن يەكىگەن و ولاتىكى بە هيىز و سەر بەخۆى کورد دروست بىكەن .

ئەم دوولايەندە كاراكتەرى ھەرە سەرەكىي کوردا يەتى لەو سەردەمەدا بۇون . ئەحمدەدىخانىش با شەترىن كەسى بۇوە كە بە شىوه يېڭى ئەدەبى ورىاست و رەوانئە و ھەل و مەرچە و ئەو دۆخە كوردىستان و كوردى دەرىيى وە و با شەترىن نوينەرى بىرى كوردا يەتى ئەو سەردەمە سەخت و تىكچىرزا وە میژووی کورد بۇوە . ئەدمونس دەلى :

" ج پېشدا مرکاندە وە میرنشینەكان و ج دواى ئەوساش ھەميشە دېرى ئەم يان ئەو حکومەتى دەسەلەتدار راپەريىن رۇوي داوه . لەم راپەريىنانە دا سەركىرەكان بۇها ندانى خەلکى سەرەبەخۇيان پەنا يان بىردوتە بەرەستىرە گەزى ھەلبەست لە داستانىنىتە وا يەتى مەمۇ زىن(رمىيۇ و جۆلىشى كوردى) ئەحمدەدى خانى بۇتا ( ١٦٥٠ - ١٢٥٦ ) وەکوو سەلگە دەھىنرىتە وە كە كوردا يەتى رەگ و رېشە قۇولى لە رابۇوردۇودا ھەمە . " ٩

خانى كاراكتەر و سىماى سەرەكىي رەشى كوردىستانلە وەدا دەبىنى كە لە نىوان دەولەتكە كانى سەفەۋى و عوسمانىدا دا بەش كراوه و بە ھەر دوشىانە وە كوردىستانىان كردوتە وىرانە و درېخى لە رۇوخاندن و تالان - كىردىن و چەوساندە وەنا كەن بەشى ھەرە گەورە ئىكوردىستان، بەتا يەتى لىنە

سەدەت شا زدە و حەقەدەیزا بىينى سەرەدە مىكى زۆر ئالۇزو دژوا رى مىزۇي  
 كوردىستانە . خانى لە نىوھى دووه مى سەدەت حەقەدە سەرەتاي سەدەتى هەزەدەدا  
 ژيا وە وئەنچا مى ئە دە سەرات و روودا وانەيە سەر كوردىستاندا ھاتبىو،  
 دېتبىو و تىدا ژيا بىو . شەرى چالدىرا نكە روژى بىست وسىيى ئاگوستى  
 سالى " ١٥١٤ ، لە نىوان لەشكري سەفەۋىيە كان و عوسمانى يەكاندا قدوماو  
 بەشكانى لەشكري قىلىباشى سەفەۋىي كۆتا يىھات ، بىو بە هوى دا بەشبوۋى  
 كوردىستان لە نىوان ئە دوو ئيمپرا تورى يەدا . ئەمە سەرەتاي سەرەدەم  
 و كارەسا قىكى تالل و پىر لە ئازارو دەردبىو بۆ گەلى كورد وئەنچا مە -  
 كانى ھەتا وە كەو ئىستاكەش لە ژيانى گەلى كوردىدا كارىگەرە دەرىيڭىز  
 دەكىشى . پەيدا بۈون و گەشە كەردىنى كۆمەللى ميرنىشىنى نىوچە سەر بەخىو  
 كورد و شەرى بەرەدەوا مو نەبرَا وە نىوان دوو ئيمپرا تورى ئوسمانى  
 و سەفەۋى و بە كارەتىنانى كوردىنى يەكدى كاراڭتەرە سرووشتى ھەمل و  
 مەرجى ئە دە سەرەدە مەبۇو . سەرەرای ئەۋەش چەسپا ندىنى سنورى " رەسمى " يى  
 نىوان ھەر دوو ئيمپرا تورى يەكە بە گۈيەرەرىيەكە وتنىمى سالى ١٦٣٩  
 نىوان شا سەفيەددىنى سەفەۋى و سولتان مۇرادى چواردى ھەنەر مى وەسما نى بىو بە  
 هوى دا بەشبوۋى رەسمى و يەكجا رەكىي كوردىستان . عوسمانى يەكان ھەتا  
 توانىيان كوردىيان كرد بە گۈز سەفەۋىيە كاندا ، بەلام بە ھەموجۇرەكىش  
 تىيەكوشان لە نىو خۆشىاندا شەر و ئازا و بىنېنە و بە گۈز يەكىاندا  
 بىكەن ، نەوهەك يەك بىگرن و بىقە دەرەدە سەرە دۆ ئيمپرا تورى كەيەنچى  
 بىكەن .

لە سەرەدە مى ژيانىدا كۆمەللى ميرنىشىنى كورد لە كوردىستاندا  
 ھەبۈون . خانى وەك لە نۇوسييە كانىدا دەرەكەھۆي لە سايىھى ميرنىشىنى  
 بۆتا ندا ، كە بە ھېزىتىرىنى ئە و ميرنىشىانە لە سەرەدە مە دا بۇوه ، ژيا و  
 سالى ١٥٦٤ ئى كۆچى ( ١٥٦٤ ) ، كە خانى هيشتا مندالىكى پېنج سالان بۇو ،  
 يەكى لە ميرنىشىنە ھەرە گەورە كانى كورد ، كە ميرنىشىنى بىدىلىس بىوو ،  
 رووخا و كۆتا يى بە فەرمانىرە وا يى بىنە مالدى بىدىلىسى يەكان ھېنرا .  
 ئەم بىنە مالدىيە روپلىكى مەزنى لە دىرۇكى گەلى كوردىدا دېت و گەلى " شا عىرۇ  
 سىا سەتزا نو مىزۇنۇوسى نا دارىان تىدا ھەلکەوت . كەسانى وە كەو مەلا  
 ( يان حەكىم ) ئىدرىسى بىدىلىسى ( سالى ٩٢٦ ئىكوجى مردووه ) كە كتىبى ( ھەشت  
 بەھەشت ) ، يەكە مىزۇوو ئيمپرا تورى ئوسمانى يانى نۇوسى . ھەرە دە

له لاییکه و . ئەو هەل و مەرجو رپە و شەدژوارو سەختەی کورده وارى دەبىنى و له لاییکى دىكەشە و دەبىنى هیزىكى گەورە و شارا وە پۇتىنسىال له مىللە تەكەيدا ھەيە ، كەچى زیانىكى ئاسايى و سەربەخۆي نىيە ، بەلكوو گەلانى دىكە ، كە هيچيان لەکورده كە زیاترىشنى يە ، ولاتى ئەميان داگىر كردووه و بۇ سوودى خۆيان بە كارىدىتىن و دەيچەوسىنە و . ليئەدا دەكەۋىتە گومان و پەنا دەباتە بەر سەرچا وە بىرۇ با وەرە ئا يىينىيەكە دەمللى لەوەيە خودى ئەمەي لە چارە نووسىبىن ، بەلام ، بىگومان ، بىسم ئەنجامە قاپىل نابى و دلى ئا و ناخواتەوە . . . .

بىر له و دەكتەوە كەدەبى بۇ رىزگار بۇون لەو هەل و مەرجە رېگەيەك ھەبى . ئەودەم بىر له چارە سەردەكەتەوە دەكەۋىتە پلان دانان بۇ دۆزىنە وەي رېگەي پاشە روزىكى بەختىارو رووناڭ بۇ گەلەكەي و ولاتە - كەمى . بىرۇ با وەرە كانى خانى لەم بۇوارەدا كۆمەللى پرا نىسىپى سياسىي و راست و رەوانن كە ، ئەگەرجى ئەو پىش نىزىكەي سى سەد سال نووسىبىنى (خانىسالى ١٩٦٤لە نووسىنى مەم و زىن بۆتەوە ) ، بەلام بەگشتى ، هەتا ئىستاش ، وەكۈ كۆمەللى بنا خەى گشتى بىرخ و گرنگى خۆيان فە دۆر اندۇوە .

رەوش و دۆزى گەلى كورد جىگەيەكى پان و بېرۇ فراوانى لە داستانى مەم و زىن داگىركەر دەرە . بىرۇ با وەرە كانى خانى لەم بۇوارەدا و شېھە و پەيا مەي دەيە و ئەگەلەكەي را بىگە سىنى ، لە داستانە كەدا بەشىوھى جىا واز دەربىراوە . ئىمە دەتowanىن بىانكەين بە دوو بەشەوە :

۱- ئەو بەشەي كە را سەتە و خۇ لە بارو هەل لو مەرجى گەلى كوردو ولاسى كوردىستانلەو سەردەمدا دەدوى و ئاسۇي پاشە رۆزپىشا دەداتە دەكەرى ئەمەيان بە بەشىسيائى نىيۇ بېرى . خانى لەم بەشەدا را سەتە و خۇ لە سیاسەت دەدوى و زمانىك بە كار دىنى كە ، بە پىوانەي سەردەمى خانى دەشى بە زمانىكى سياسى دا بىنرى .

۲- ئەو بەشەي كە را سەتە و خۇ لە تەك سیاسەت خەریك نابى ، بەلام نا وەرە و ئا مانجى دىسان لە خزمەتى بىرۇ با وەرە سیا سیكەندا يە و دەگە لىيانەنەنگە . ئەمەئەو پارچانە دەگرىتە وە كە باسى زمانى كوردى ، كولتۇرلى ، كوردى روالەتكانى كۆمەللى كورده وارى و مىزۇوي كورد . . . هەتەدەكەت

دیوانه ببم، دوران بریژم  
بی قال ژ با تینی خه ردم  
تووتی سیفهت ئەز بکم تەکەللۇم  
مەشھور بین ژ من مەقامات "ع "

بی کەیف نەشیم چو ئەزبېیژم  
بەدحال ببم، سیردان بەدەردم  
تەشیبەی نەبى بكم تەرەننوم،  
داکەش بین ژمن کەرا ماسات،

لە پاش ئەمەر استى مەبەستى خۆی دەبىزى و ئاشکارا دەکات :

سازندهبى عىشقى زىن و مەم بىت  
شەر حا خەمى دل بكم فەسانە زىنی وو مەم بىكىم بەھانە "٨"  
ئە و خەمى دلەي خانى دەيەۋىلىكى باداتەوە و ئەفسانەلى "چىڭات" بىرىتى  
يە لە : ئە و ژىز دەستى يەي گەلەكەي تۈوشى بۇوبۇو، دابەشبوون و پارچە  
پارچە كردنى كوردستان، بە كارھىتانى گەلى كورد لە لايەن دوو هيىزە  
گەورەكەي سەرددە مى خانى يەوه-عوسمانى و سەفەوى-لەشەرى دىزى يەكدىدا،  
كوردستان كردنه شەرگە يەك لەنیوان خۆياندا، نە بۇونى دەولەتىكى  
سەربەخۆى كورد كە كورد خۆى (پاشايىكى كورد) بىبا بهرىيە، دواكەوتىن  
ونرخىي نە دانى كولتۇور وزمانى كورد، نە بۇونى يەكىتى يەكى خورت لەنیيۇ  
رېزەكانى گەلى كورد خۆيدا .

ئەمانە ئەولايەنا نەئى كۆمەللى كورددەوارى ئە و سەرددە مەن كە خانى  
خەمى بۇ دەخوارد، بەلام ئە و هەر لە و كاتەشدا لايەنى دىكە دەبىنلى  
وھەست پى دەکات . خانى شانا زى بەوهە دەکات كە كورددە و كورد بە  
گەلىك دەزانى وەكۈو ھەموو گەلانى دىكەي ھاومال و دراوسىي ، كە هيچى  
لە وان كەمتر نى يە، زمانە كوردى يەكەي خۆيى خوش دەۋى و دەيەۋى پىيى  
بىنۇسى، با لاي خەلکى دىكە نەرخى بۇوسىنە كەش نەبىت كورد بە ئازا و دلىر  
و چا و تىر و دەست بىلاؤ دادەنى، كورد بە خاوهن كولتۇور دەزانى و دەيەۋى  
لەسايى پاشايىكى كورددادا كەپەپۈرۈ گەلەكەي زىندۇو بىكارەوە .

(٦) مە . سە . پ

(٧) زىر و بەم : ژىيەرە سەرروو و ژىيەرە خواروو ئا مىرى عەوود

(٨) روّدىنکو، هە. سە ، ل ٤١

۲- ده یه وی ئه وه بچه سپینی که کور دیش، وه کوو گه لانی دیکه گه لیکی زیندوون و ده توانن پیش بکهون. گه لیکن ده توانن، ئه گه ر بؤیان بلسوی، ژسینیکی ئا سوده و ئاسایی و پر له خوش ویستی وزانین بژین. خانی لیرهدا مده ستیکی سیاسی ده رده بروی و به گرگی له گله که ده کات و (( ئه و تومه تهی دوژمنانی گله که ده بینین به گله که بده، که گوایه له شد و خوین رشتنه و لاده چی دیکه نازانن ده دا ته دواوه )) ۲

هه ئه هلی نه زه رنه بین اکو کرمانج  
تیکدا نه د تالیب، نه مه تلووب  
بیبه هره نه ئه و ز عیش قبا زی ۳

عه شقی نه کرن ژ بو خوه ئامانج  
فیکرا نه موحیبن ئه و، نه مه حبوب  
فاریخ ژ حه قیقی و مه جازی ۴

ئه گه ر خانی لیرهدا دوو مه بهستی لە نووویسینی داستانه که ده سات -  
نیشان کردووه، بـلام هـر لـه بـشهـکـانـی سـرـهـتـای مـم وـیـنـداـ، دـیـانـ  
دـیـتـهـ وـ سـهـ رـهـ وـ باـسـهـ کـهـ بـوـ چـیـ مـمـ وـ زـینـیـ نـوـوـسـیـوـهـ وـیـسـتـوـیـهـ تـیـلـیـ جـیـ، خـانـیـ  
رـوـ دـهـ کـاتـهـ مـهـیـگـیرـ وـ دـاـوـاـیـ بـادـهـ یـیـکـ مـهـیـ گـولـرـهـ نـکـیـ لـیـ دـهـ کـاـ وـ دـهـ یـهـ وـهـ  
له چـاـوـیـ (ـشـیـحـنـهـ وـ مـوـحـتـهـ سـیـبـ)ـ وـهـ دـوـورـ بـیـتـ :

ساـقـیـ ،ـ بـدـهـ منـ شـرـابـیـ گـولـگـوـونـ  
بـیـ دـهـ نـکـیـ دـهـ فـ وـ سـهـ دـاـ بـیـ ۷ـ قـانـوـونـ  
داـ شـیـحـنـهـ وـوـ مـوـحـتـهـ سـیـبـ نـهـ بـیـنـ ۵ـ

خـانـیـ کـهـ دـاـوـاـیـ مـهـیـ دـهـ کـاتـ وـ حـزـ بـهـ سـهـرـ خـوشـ بـوـونـ دـهـ کـاتـ ،ـ مـهـ بـهـ سـتـیـ  
ئـهـ وـهـ نـیـ یـدـ،ـ وـهـ کـوـوـ ئـهـ وـهـ کـهـ سـاـنـهـ دـوـاـیـ هـهـ وـهـ سـهـ زـوـوـ دـهـ کـهـ وـهـ،ـ کـهـ یـلـ  
بـبـیـ وـ خـوـیـ وـ دـهـ وـرـوـبـهـ رـیـشـیـ لـهـ بـیـرـ بـکـاـ .ـ .ـ .ـ

ئـهـ گـهـ رـاـ بـوـواـیـ،ـ دـهـ بـوـایـ دـهـ نـکـیـ دـهـ فـ وـ سـهـ دـاـیـ قـانـوـنـیـشـ بـوـیـسـتـاـیـهـ،ـ  
تاـبـهـ زـمـ وـ رـهـ زـمـ تـهـ واـوـیـ بـگـیرـاـیـهـ.ـ ئـهـ وـهـ سـهـرـ خـوشـیـ یـهـیـ خـانـیـ دـهـ یـهـ وـیـ،ـ سـهـ  
خـوشـیـ سـوـفـیـ بـیـانـ وـ زـانـاـیـانـهـ،ـ کـهـ وـیـگـهـ بـوـ دـهـ رـبـوـیـنـیـ نـهـیـنـیـ یـهـ خـواـیـیـ یـهـ کـانـ  
خـوشـ دـهـ کـاتـ وـ زـمانـیـ نـاـوـهـ وـهـ دـیـنـیـتـهـ گـوـ :

(۲) رسول، الدکتور عزالدین مصطفی، احمدی خانی، بغداد ۱۹۷۹، ص ۴۲

(۳) روڈینکو، هـ. سـهـ. ، لـ ۳۵

(۴) قانون ئامیریکی ژیداری موزیکه (۷۲-۷۳ هـیه).

(۵) روڈینکو، هـ. سـهـ. ، لـ ۴۰

# بنچینه کانی بیری کوردا یه تی له مهم وزینی خانی دا

فهرهاد شاکه‌لی

هۆیه کی هەرە بنچینه بی‌ی ئە وەی کەدا ستانی ( مەم و زین ) لای کورد  
ھیندە به نرخە و ئە حمەدی خانی دانە ریشی ھیندە پا یە بە رز و بە ریزە  
بىگومان، پیوه‌ندى يەکى زۆرى بە نا وە رۆکى داستانه کە وە ھە یە کە،  
تا را دە یەکى زۆر یە وشى گەلی کورد و ولاتى کوردستان پیشان دە دات و  
ئە و ھیواو ئا مانجا نەی گەلی کورد خونى پیوه نېيىن و دە بىنى و لە  
پېشنا وياندا تېکوشما وە و ئېستا کەش ھەر تىدە کوشى، دە رە بىرى .

خانى خويشى ئە مەی نەشا رە دۆتە وە کە لە نۇوبينى داستانه کە يىدا  
ھۆ ئا مانجى خۆی ھە بۇون . لە بە شە کانى سەرەتاي مەم و زيندا خانى  
دۇو مەبەستى گشتى دىارى دە کات، کە دەشى، ھەر لەو کاتە دا، بە  
ھۆ نۇوبينى داستانە کەش بىز مىردىن .

۱- دە یە وى بە زمانى کوردى کارىكى ئە دە بىي و ا بنووسى كە  
بىخا تە ریزى گەلانى دىكە وە و ئە وە پېشان بە دات کە کوردىش دە توانىن  
کارى زانلى و ئە قلى پېشكەش بکەن، کارىكى وا بنووسى كە رە چەلەك و  
رە سەنى کورد پېشان بە دات . ھە لېزىاردى داستانى دېرىن و کوردانى  
( مە مى ئالان ) وە کوو بنا خە یەک بۆ داستانە کە خۆی زېرە کى و ژىرى-  
يەکى زۆرى تىدا يە، چۈنكۈو لە لايىكە وە کە لە پۇورىكى کوردى زېندى دوو  
دە کاتە و دە يخاتە بەر دە مى گەلە کە دە خەلگى دىكەش، لە لايىكى  
دىكە شە وە ھۆشىارى و زانىارى و تىگە يىشتن و بىرۇ با وە رە کانى خۆيى  
دە خاتە سەرى . بە يە كەرنى ئە دوو لايىتە خانى نۇو سراوچىكى و ايداھىنَا و  
کە ئاماتجى يە كە مى نۇوبينى داستانە کە وە دى بىنى :

دا خلق نە بىيىزتن كو (( ئە كراد  
بى مە عريفە تەن، بى ئە سل بىنیاد  
كرمانچ تەن ئى د بى حسېن ))  
ئە نواعى مىللەل خودان كتىّن

۱- رۇدىنکو، م، بە مەم و زین، مۇڭو ۱۹۶۲، ل ۴۵

كورسي هه لدّه گرت .. پياوه کهش ديا ربوو ماندو بُو بُويه که وتبُووه  
دواوه و خيزه‌ي سنگي دههات ..

خوره‌ي به فري تواوه‌ي گوييسوانه‌كان له هه موو لايده‌که وه تيکه‌ل به  
هازه‌ي به فراوي ئدو چمه ده بُو که وتبُووه خوار ئا وا ييه‌وه ..  
پيرئنه‌که له بدرده ماليک دا وه ستا که ده رگا يه‌کي تخته‌ي خوار  
و گيري هه بُو .. كيزيکي ناسکي چا وگه‌شى سوروسپى له با نيزه‌که وه  
وهستا بُو .. به تيله‌ي چاويکي پىر شرم و خنده‌ي هكى ناسکه‌وه لىمه  
لاوه‌که‌ي رووانى و ووتى ..

(( دا يه .. ئدو لاوه ميـوانه (??.) )) .

(( نه .. كچم .. رېسواره و بُو دېـي - وـ ده چـيت .. )) .  
كيزه‌که چاوي رهشى كـال بـووه و خـنـدـهـكـهـى سـرـلـيـوـىـ بـهـ تـىـمـهـ رـىـ  
همـلوـهـرـىـ وـ بـيـدـهـنـگـ بـوـوـ .. لاـوهـكـهـشـكـوـلـهـكـهـىـ زـيـاـتـرـ لـهـ پـشتـتـونـنـدـ  
كرـدـ وـ وـوتـىـ ..

(( مـالـئـاـواـ پـسوـرـىـ .. )) .

ئـهـمـىـ وـوـتـ وـ سـهـرـنـجـيـكـىـ لـهـ كـيـزـهـكـهـ دـاـ وـ خـنـدـهـيـهـكـىـ بـوـ كـرـدـ ..  
پـاشـانـ بـهـ توـولـهـ رـيـگـاـكـهـىـ پـشتـثـاـ وـايـىـ دـاـ هـلـزـنـاـ وـ ئـيـنـجاـ بـهـ لـايـ چـېـيدـاـ  
وـهـرـچـهـرـخـاـ ،ـمـلىـ رـيـگـاـ پـيـچـهـكـهـىـ گـرـتـ کـهـ خـوـىـ لـهـ شـاخـهـ سـهـرـكـهـشـهـكـهـ  
ئـالـانـدـبـوـوـ .. بـىـ ئـهـوـهـىـ ئـاـوـرـ بـداـتـمـوـهـ لـوـوـتـىـ تـيـزـهـنـدـوـ تـاـ دـهـهـيـاتـ  
بـچـوـوـكـ وـ بـچـوـوـگـتـرـ دـهـبـوـوـهـ تـاـ بـوـوـ بـهـ پـنـتـيـكـ پـاشـانـ لـهـ چـاوـ وـوـنـ بـوـ ..

حـمـمـهـ  
ستوكهولـمـ 1985

\* \* \*

پیریژنەکە ووتىي ..

(( رولە . تواناي سى كاژير پى روېشتىتھە يە بە تايىھەتى بەم بەفرە ؟ دەتوانىت لابدەيىتە مالى ئىمە خواردىنىكى گەرم بخویت وپايان هيستريكت بو دەگرم . بە سوارى برو ( )) .

لاوهكە لە سەرۇ سىما شارى بۇو . رانكوجوغەيەكى قاوهىي خاۋىنى لەبدر دا بۇو . قىزە رەشەكەي بە لاي چەپدا دا هينا بۇو .

(( كورم . لەوە دەچىت قوتا بى بىت ؟ ) .

پياوهەكە ئەمەي بەرروو دا تەقاندەوە . لاوهكە سەپەرىكى كردو ووتى .

(( بەلى ما مە قوتا بى زانكۈم ( )) .

لاوهكە بە دەم خەندەيەكەوە كە ليوهەكانى شەق كرۇد ووتى ..

(( پورە رەحەمە . پىيوىست بە و گرانييە ناكات . دەتوانم رى بکەم ) . ئۇتومبىلەكە لە ئا واپى نزىك بۇوە و كەمك بە لاي راستىدا شكاپەوە و لە راستە رىگا كە وەستا . گوندەكە كەوتىپووه نىپوان دوو كىپى بەرزەوە كە لە رىگا كەوە هەروا چەند خولەكىك دوور بىپوو . پىريژنەكە و لاوهكە با روبىنەيان لە كول نا و ثوفىرەكەش بۇ يارمەتى كولەكە لە پېشى پياوهەكە ناو بە دامىنى گىرددەكە دا رۆچۈن گوندەكە هەروا سەد مالىك دەبۇو . دووكەلى دوکەلەكىشى سەربانەكان سەرجەم لە دووكەلى كارگەيەكى گەورە دەچۈو .

پۇورە رەحەمە وەك ئاسكىكى سرک ھەنگا وى دەتا و چەند ھەنگا وى لە پېش لاوهكەوە دەرۇي . خرمە خرمى بەفرەكەي ژىر پىان ئا وزىكى ھىمن بۇو و بىدەنگى دەرۇپېشى دەخروشاند ..

سەربانى مالراو كە وەك پەلهى رەش دەبىنرا ، لە ژىر زەبىزى خورەكە ھەلمىكى خەستىيان لى بەرزا دەبۇوە و تىكەل بە دووكەلى دووكەلەكىشەكان دەبۇو و لە دوورەوە لەوە دەچۈو سەرجەم گوندەكە ئاگرى گرتىبىت ..

پىريژنەكە ئا ورىكى لە لاوهكە دايەوە و ووتى ..

(( كورم . قىرسقەمە مەبە . ماندۇو دەبىت .. بە سوارى بىچىت باشترە ( )) .

لاوهكە بەردهوا م جى پىي پىريژنەكەي ھەلدەگرت ووتى ..

(( نا .. پىيوىست ناكا .. بەردهوا م بروم باشترە ( )) .

ڇنەكە بە توندى كورپەكەي بە سنگەوە نوساند بۇو و ھەنگا وى

(( بدلىٰ . جوا ميررو جهربهزه بورو وده کاکم هه مبشره ده يگيرايده وده ))  
پيريزنه که ما وده يه که بيدنه نگه بورو ئينجا قولبي گريانى هاتى و بىنجه  
ده نگيکى به سۆزه ووه ووتى ..

(( كورمسه ))

وهك سوژنیک بکریت به بمنگى جگه ريا . لاوه که راچهنى به تامه زرووه ووتى .  
(( به راست . تو دايکى شەھيد نەبەزىت ))

پيريزنه که بى ئەوهى وەلام بـدا تەوه کە وـته گـريانـيـكـى نـهـرم ..  
لاوه کـه بـهـدـهـمـ گـيـزـاـوىـ بـهـسـمـرـ هـاـتـيـكـىـ کـهـ زـوـرـ كـونـ نـهـبـوـ بـيـسـتـبـوـوـىـ  
گـيـنـگـلـىـ دـهـخـواـرـدـ ..

(( لـهـ شـهـوـيـكـىـ مـاـنـگـهـ شـهـوـيـ هـاـ وـيـنـ دـاـ بـهـ خـوـىـ وـهـ فـرـهـزـهـ کـهـ يـهـ وـهـ  
شـهـ بـهـ يـخـونـ دـهـ کـهـ نـهـ سـرـ تـيـپـيـكـىـ سـهـ رـبـاـزـىـ لـهـ يـهـ كـيـكـىـ لـهـ گـهـ رـهـ کـهـ کـانـىـ  
شارـ دـاـ .. ئـەـنـجـاـ مـىـ شـەـرـيـكـىـ خـوـيـنـاـ وـىـ دـرـيـزـخـاـ يـهـ نـگـولـلـهـ يـاـنـ لـىـ دـهـ بـرـيـتـ .  
دوـزـمـنـيـشـ تـاـ دـيـتـ زـيـاتـرـ لـهـ هـرـ جـوارـ لـاـوـهـ ئـابـلـوـقـهـ يـاـنـ دـهـ دـهـ دـهـ ..  
ئـهـ مـيـشـ يـهـ كـيـكـىـ لـهـ هـاـ وـرـيـكـانـىـ دـهـ پـيـكـرـيـتـ .. تـوـانـاـيـ دـهـ رـچـونـيـاـ نـاـ مـيـنـيـتـ .  
بـوـيـهـ پـهـلـاـمـارـىـ چـكـىـ هـاـ وـرـيـكـهـ دـهـ دـاـ دـوـاـ فـيـشـهـ كـهـ بـهـ رـوـوـيـ دـوـوـزـمـنـهـ وـهـ  
دـهـ نـيـتـ .. لـهـ گـهـ لـ دـهـ نـگـىـ كـهـ لـهـ شـيـرـىـ كـاـزـيـوـهـ دـاـ خـهـلـكـىـ ئـهـ وـ نــاـ وـهـ دـوـوـ  
لـاشـهـ خـلـتـاـنـىـ خـوـيـنـ دـهـ دـوـزـنـهـ وـهـ کـهـ يـهـ كـيـكـىـانـ دـوـوـ كـلاـشـينـكـوـفـىـ لـهـ  
ئـاـ مـيـزـ دـاـ دـهـ بـيـتـ ..

لاوه کـهـ خـوـيـنـ چـاـ وـهـ کـانـىـ گـرـتـبـوـوـ .. مـوـچـورـكـهـ سـارـدـ سـاتـ لـهـ دـوـاـيـ سـاتـ  
لـهـ نـاـخـهـ وـهـ دـهـ يـهـ ئـاـنـدـ .. بـيـدـهـ نـگـىـ سـهـ رـيـ جـمـ سـوـاـرـيـوـوـهـ کـانـىـ لـوـوـشـ دـاـ ..  
لاوه کـهـ بـهـ دـهـ نـگـيـكـىـ هـيـمـنـهـ وـهـ وـوتـىـ ..

(( شـاـنـاـ زـيـيـهـ کـهـ تـوـ دـايـكـىـ ئـەـوـيـتـ .. ))  
ئـوـتـۆـمـبـيـلـهـ کـهـ بـهـ رـهـ دـاـمـ لـوـوـتـىـ لـهـ بـهـ فـرـهـ کـهـ دـهـ ئـهـنـىـ .. نـاـ وـقـهـ دـىـ  
شاـخـهـ کـهـ بـرـىـ وـ بـهـ لـايـ رـاـسـتـ دـاـ کـشاـ ..

پـيـرـيـزـنـهـ کـهـ بـهـ رـهـ دـاـمـ دـهـ گـرـيـاـ وـ ژـنـهـ کـهـ شـهـ رـىـ بـهـ سـهـ رـيـ کـورـپـهـ کـهـ يـداـ  
شـوـرـ كـرـدـبـوـوـهـ کـهـ بـهـ تـامـهـ زـرـوـوـهـ گـوـيـ مـهـمـكـىـ دـهـ مـئـىـ .. ئـوـتـۆـمـبـيـلـهـ کـهـ شـهـ  
بـهـ رـهـ دـاـمـ رـيـگـاـيـ دـهـ بـرـىـ .. شـوـفـيـرـهـ کـهـ بـهـ دـهـ نـگـيـكـىـ گـېـرـ هـاـ وـارـىـ لـهـ  
ئـاـ سـكـوـلـ كـرـدـ وـوتـىـ ..

(( نـاـ تـوـانـمـ بـچـمـهـ نـاـ وـ دـىـ .. تـهـنـهاـ لـهـ رـوـخـيـ رـيـگـاـ دـهـ وـهـ سـتـ .. خـوتـانـ  
باـرهـ كـاـنـتـانـ لـهـ كـوـلـنـيـنـ .. ))

و رو و رهشی بدر قاپییه کهی ئه وین.. تنهها ئه و بیگه رده سوپاس بسو  
به خشنده بیت (۰۰) .

ژنه که که میک هاتدوه سه رخوی بدهم ژیرکردنده وه کورپه که وه  
ووتی..

(( برم خدبه ری بووه (۰۰) .

کورپه که چاوه گه شکا شی ده تروکاند و پهنجه خپینه کاشی له یه خمه  
کرا سه که می دایکی گیر کردبوو و لهوه ده چوو بررسی بیت بؤیه ئه ویش به  
دوو پهنجه ممکی راستی ده رهینا و ئاخنیه ده میه وه .. پیریزنه که  
سه رنجیکی دا و ووتی..

(( ئۆی چەند جوانه (۰۰) .

ژنه که خدم دایگرته وه و به هیمنیه وه ووتی..

(( ده چیته وه سر با وکی (۰۰) .

پیاوه که سه یریکی کردبوو به توره بیه وه ووتی..

(( جوان دایپوش با سدرمای نه بیت (۰۰) .

تیشكی خوره که تا دههات گه رم ده بwoo .. دامینی شاخه کاشی ده هینا يه  
وورشو برقه .. کومه لیک ریثوله گفه یا ن کردو له لاریکه نیشتنه وه.  
پاشان هه لفرینه وه و له چا و وون بون پیریزنه که توره که یه کی به  
شت ئاخنرا وی له بدر ده مدا بwoo پیاوه که شقاچی چه پی خستبووه سه ر  
کوله که می بدر ده می .. پیریزنه که ریوی ده می له لاوه که کرد و ووتی..  
(( رۆلە . ئۇغر بیت (۰۰؟) .

لاوه که وک ده میک بیت ئالوودهی ئه و پرسیاره بیت به تاسوفه وه ووتی.  
(( بۇ دیئى - و - ده چم (۰۰) .

(( بۇ دیده نی ده چیت و ا نیه (۰۰؟) .

(( بەلی برا کەم پیشە مرگە يه (۰۰) .

لاوه که ئەمەی ووت و بیدەنگ بwoo .. پیریزنه که پرسیاریکی ترى ئاراسته  
کىرد ..

(( سر ب ده ستھی شھید - نھبەزه - وا نیه (۰۰؟) .

(( بەلی (۰۰) . لاوه که ئەمەی ووت ..

(( دیاره شھید نھبەزت ده ناسی (۰۰؟) .

پیریزنه که ئەم پرسیاره ب سر بەرزیه وه تیسرە واند ..

پر له گریانده و له ژنه کهی روانی و له بدره خویه وه ووتی ..

((ئا وات .. کوری شه هید .. شمه شگه وره ترین سه ربه رزیه بـ لام گوقان .. بو ده بیت کور په کانمان به هه تیوی و دوور له سـ وزی با وکایه تی گه ورده بن .. ئه بیت تاوانی ئه وان چی بیت )) .

سـیریکی ئاسما نی شین و بـیگه ردی کرد و زور به رقه وه لـیوی خواره وهی کروشت وهک بـیه وـیت ئه و تاوانه بـخاته ئستـوی ئه و .. پـیریـژـنهـکـهـ بهـدـهـمـ لاـوانـدـنـهـ وـهـیـهـکـیـ دـلـ تـهـ زـینـهـ وـهـ کـهـ بـهـ بـهـدـ دـشـاـ دـهـ بـوـ بـهـ ئـاوـ وـوـتـیـ ..

(( کـچـ . سـوـپـاـ سـیـ یـهـ زـدـانـ بـوـ نـاـکـهـیـ .. جـواـنـهـ مـهـ رـگـ ئـاـ وـاـتـیـ بـهـ جـیـهـیـشـتـیـتـ .. بـ لـامـ رـوـلـهـکـهـ منـ هـرـ بـهـ لاـوىـ خـدـبـاتـیـ کـرـدـ وـهـ بـهـ لاـوىـ مـالـ ئـاـ وـاـیـ کـرـدـ )) .

له نـا~ک~ و ~گ~رم~م~د~ی~ه~ک~ لـهـ ئـوـتـوـمـبـیـلـهـکـهـ وـهـ هـلـساـ وـ بـهـ لـاـیـ چـهـپـداـ خـزـاـ ..

ژـنهـکـهـ بـهـ شـیـوهـیـهـکـ قـیـژـانـدـیـ جـگـهـ لـهـوـهـیـ کـوـرـپـهـکـهـ هـیـنـاـ یـهـ زـرـیـکـهـ سـرهـ جـهـ مـ سـوـاـ رـبـوـوـهـ کـانـیـ تـوـقـانـدـ .. پـیرـیـژـنـهـکـهـ کـهـ وـهـتـهـ دـوـوـعـاـ خـوـیـنـدـنـ .. ئـوـتـوـمـبـیـلـهـکـهـ وـهـسـتاـ و~ شـوـفـیـرـهـکـهـ دـهـ رـگـاـکـهـ کـرـدـهـ وـهـ .. تـدـواـ و~ شـلـهـژـاـ بـوـوـ .. رـهـنـگـیـ ئـا~س~ا~ی~ پـهـرـی~ بـوـو~ .. کـتو~ پـر~ لـهـ پـاـشـکـوـی~ ئـوـتـوـمـبـیـلـهـکـهـیـ کـهـیـ کـیـرـا~ و~ فـرـتـی~ فـرـتـی~ بـوـو~ .. کـتو~ پـر~ لـهـ پـاـش~ کـو~ خـوا~ ئـهـ مـجـارـهـشـ زـیـاـنـی~ پـیـدا~یـنـهـوـ ..

(( هـیـچـ نـهـ بـوـوـ .. خـوا~ یـا~ رـمـهـتـی~ دـاـیـنـ .. ئـهـگـیـنا~ لـمـ هـهـ لـدـیـرـه~ بـهـ دـهـ بـوـوـیـنـهـوـ .. سـوـپـا~س~ بـو~ خـوا~ ئـهـ مـجـارـهـشـ زـیـاـنـی~ پـیـدا~یـنـهـوـ ..

شوـفـیـرـهـکـهـ زـورـ بـهـ پـهـلـهـ ئـمـ وـوـتـانـهـیـ دـهـ وـوـتـ پـاـشـانـ وـوـتـیـ ..

(( هـا~ .. پـوـورـ رـهـ حـمـهـ .. بـاـجـی~ ئـاـسـکـوـل~ .. مـام~ بـاـیـز~ .. تو~ ئـهـی~ لـا~ .. خـو~ شـوـکـور~ زـیـاـنـتـانـ نـهـ بـو~ )) .

ئـوـتـوـمـبـیـلـهـکـهـ چـهـنـدـ مـهـ تـرـیـکـ رـوـوـهـ و~ هـهـزـارـ بـهـ هـهـزـارـهـکـهـ لـهـ رـاستـه~ رـیـگـا~کـه~ لـاـی~ دـا~ بـو~ .. کـوـرـپـهـکـهـ ماـ و~ هـیـهـکـ گـرـیـا~ .. ژـنهـکـهـ پـهـتـوـکـهـ لـهـ سـدرـ روـوـ لـا~ بـرـد~ .. کـوـرـپـهـیـهـکـی~ خـرـبـنـ و~ چـا~ و~ گـهـش~ و~ سـوـرـوـسـی~ .. لـاوـهـکـهـ تـدـوا~ و~ بـهـنـگـی~ پـهـرـی~ بـو~ .. روـوـی~ لـهـ شـوـفـیـرـهـکـهـ کـرـدـ وـوـتـیـ ..

(( شـوـکـور~ زـیـاـنـمـان~ نـیـه~ .. بـهـ رـدـهـوـ!~ م~ بـه~ .. لـیـخـورـ )) .

شوـفـیـرـهـکـهـ گـرمـهـیـ لـهـ دـهـ رـگـا~کـهـ و~ هـیـنـا~ و~ ئـوـتـوـمـبـیـلـهـکـهـ باـ ژـواـنـدـهـو~ .. پـیرـیـژـنـهـکـهـ دـیـار~ بـو~ هـیـشتـا~ نـهـهـا~تـبـوـوـه~ سـهـ رـخـوـی~ چـهـنـد~ جـارـیـکـهـ بـه~ خـوـی~ دـا~ کـیـشا~ و~ وـوـتـی~ ..

(( خـوا~ بـهـزـهـیـ بـه~ تـولـفـه~ دـا~ هـاـتـهـوـ .. ئـیـمـه~ هـمـو~ تـا~ وـاـنـبـیـار~

(اچهند مانگیک له مه و بدر له دیئی - ک (۰۰-۰) )  
ژنهکه ئەم وەلامەی لە گەل لىشى وېك فرمىسىكى گەشدا ھەلرەشتکە زوو  
بە روويىدا خزان و پاشان بۇ چەناغە خە كورتەكەي و ئىنجا كەوتىنە  
سەر پەتوكە ... پياوهكە بى ئەوهى هىچ بلىيەت سەيرىكى پىرىيەزەكەي كرد  
و سەرى خستەوە كۆشى ...

ژنهكە، بە تەمنىن گەنج بwoo. چاوه رەشكانى نوقمى فرمىسىك بـ وو  
بوون و كەزىيە رەشكانى لە ژىر سەر پۇشە رەشكەيدا سەرەتا تكىيىان  
دەكرد. كراسىكى رەشى سادەي لەبەر دا بwoo.. دەست و پەتجەومەچەكى  
ئەوهىان پىشان دەدا كە زۆر ئاشنای پاچ و بىل و داس بىت ..  
ژنهكە وەك بىيەويت ئازارى پەنگ خواردوو ناخى بكتە سەر باسى  
قسەي ئەو سەفەرە بى سى و دوو ووتى ..

(( جوانەمەرك رولە بwoo .. شەھيد بۈونى كۆستىك بwoo لە خىزان و  
خزم و ها ورپىيانى كەوت .. )) .

لاوهكە نوتقى لە خۆي برى بwoo. توند خۆي گىر كرد بwoo چونـكە  
ئۆتۆمبىلەكە بەردهوا مەلبەز و دابەزى پى دەكردن. چاوهكانى پـ  
بىبۇون لە بەزەيى ، زۆر بە ووردى لە ژنهكەي دەروانى .. پىرىيەزەكە  
سەرنجىكى لە زنجىرە شاخەكانى ئەو بدر دا كە تا دەھات دوور دەكە  
وتىنەوە ئىنجا ووتى ..

(( خەم مەخۇ .. منىشدا يكى شەھيدم .. ھەر تو ئەو كۆستەت لىـ  
نەكەوتىوو .. شاسوار بۇ خۆي شابوار بwoo .. )) .

زۆر بە توندى بە راـنى خۇيدا كىشا و ويستى زىاتر درىزەي پىبىدا  
بۇيە قورگى پـ بwoo. چەند جارىك هيـزى دايىخ خۆي ناـچار قولپى گريانى  
هاـتى و چاـوهـكـانـى بـوـونـه دـوـوـ گـوـمـ .. ژـنـهـكـەـشـ وـهـكـ ئـازـارـكـەـيـ زـىـاتـرـ  
تاـوىـ بـوـ بـەـھـىـنـىـتـ كـەـوـتـهـ لـاـوـانـدـنـهـوـ وـ بـ چـمـكـىـكـىـ كـراـسـكـەـيـ هـەـرـدوـوـ  
چـاـوىـ گـرـتـ وـ سـەـرـەـتـاـيـ پـرـسـەـيـكـىـ دـاـنـاـ ..

(( مەخابن .. رولەي شىرىنى بە چاـوىـ خـۆـيـ نـهـدىـ .. خـۆـزـگـەـ گـەـرـ بـوـ  
چـاـ وـ تـرـوـكـاـ نـدـنـىـكـىـشـ بـوـاـيـ بـىـدـىـسـاـ .. ئـاخـ .. بـۇـيـهـ منـىـشـ بـهـ (ئـاـوـاتـ)  
ناـ وزـهـ دـمـ كـرـدـ .. )) .

پىرىيەزەكە قولپى گريانى دايىھ .. هەناـوىـ زـىـاتـرـ دـەـكـ لـوـلـاـ ..  
مووچوركەيەكى ساردى كارەبا ئاسا لاوهكەي لە ناخەوە لەرزاند و بـ

لیوه ووشکه کانی ژاکان و پاشان همناسه یه کی بُو کرووزا وی هلکیشا و  
ووتی ..

(( دایکی بمیریت .. چاره نووسی ئه میش له جوانه مرگه که با وکی  
با شتر نابیت )) . . .

لاوه که کتو پر توری پرسیا ریکی ئاراسته ئه م ووتیه کرد . . .  
(( که واته بی باوکه . . . )) . . .

ژنه که به ده نگیک که گریان له گهروویدا خنکا بیو ووتی . . .  
(( بله کوری شه هیده .. بهلام ئمهوهی جیئی داخه جوانه مرگ، به چاوی  
خوی نهی دی و زوریش بیه ئا واته و بیو دهستی سوژی باوکایه تی بیه  
سهر دا بهینا یه .. بهلام ئه فسوس .. کاتیک ئه و شه هید بیو ئه م تنهها  
پارچه یه ک گوشت بیو . . . )) . . .

چاوه کانی ببوونه دووزنه و هون هون دانهی فرمیسکیان ده رزانند  
پیاوه که وه ک گریانه که ناخی برزاند بیت سه ری بُو به رده می شوپ کردو  
بیده نگ بیو .. پیریزنه که ش همناسه یه کی پر خه می هلکیشا و ووتی ..  
( بیو داما ویه به خیویان ده کهین و هر واش بیه ئاسانی له ده ستمان  
ده چسن . . . )) . . .

ئوتومبیله که به رده وام گرمی لیوه ده هات و ده لنه نگی هندیک جار  
له و ده چوو جاریکی تر بچه قیته و بؤیه شوفیره که به رکه وه پیی له  
به نزین توند ده کردو و خاوی ده کرده وه . تایه کانیش ما وه یه ک ده خولانه وه  
و قور و لیته یان زیاتر بُو پاشوه ده ها ویشت و دوای چند تدکانیک  
ده چووه و دوختی جارانی و شوفیره که ش که میک پیی لی شل ده کرد . . .  
پیریزنه که سه ری با سکه گرته وه و به پرسیا ریک سه رنجی ژنه که  
راکیشا . . .

(( جوانه مرگ پیشمه رگه بیو . . . )) . . . ئه ویش سه ریکی  
لاوه کهی کردو ووتی .. (( بیگومان . . . )) . . .

لاوه که زیاتر له ژنه که وورد بیو و زیاتریش تا مه زروی ناخی  
بیو بؤیه ته واو گوی قولاخ بیو .. گریانی به کولی ژنه که ش وه ک ده می  
گوییان همنا وی پاره پاره ده کرد ..

(( کهی شه هید بیو . . . )) . . . پیریزنه که ئه مهی به هیمنیه وه  
در کاند . . .

هیواشی دری ببه فره که ددهدا و پاشکوی بهم لاولا دا فری ددهدا و سواربووه  
 کانی ده هینا و ده برد.. سرجهم خا موشیدک بالی به سردا کيشابون  
 و له وورهی ئوتومبیله که زیاتر هیچی تر نهده بیسترا ...  
 لاوه که له سر په دانیشتبو. ده یروانیه قورولیتە که .. پیریژنە که  
 سه رنجیکی له لاوه که دا و پاشان چاوی گواسته و سر کورپە که .. لاوه کەش  
 تا مهزروی ئەو نهینیانه بwoo که له سیماي پیریژنە که دا بهدی ده کرد.  
 ئا واتی ده خواست که مشتیک له خدرواری خەمی ناخی بزانیت .. بە وەش  
 شاگەشكە دەب Woo که يەكىكىان سەردهقى بىدەنگىيە کە بشكىنیت و ملى  
 باسیک به كيش بکات .. بەلام ئەوهى لاي گران بwoo چۈن و به چ ھۆيمى  
 هەر له خۆيە وە پرسيا رېك وەك نا رنجوک به روویدا بتهقىنیتە وە لە  
 واندەيە بۆ ئەم وەك لاويىكى سەر رووتى شارى كارېكى نەنگ بىت . رېگا کە  
 زۇرى ما وە و ئوتومبیله کەش بهم پىيە بىراتوا زوو به مەنzel ناگات  
 ناچار سەرنجى گواسته وە بۆ شاخەكانى ئەوبەر کە سەرتاپا تىماراي  
 زىوبىنيان پوشى بwoo و له ژير تىشكى رۆزە زىپىنە کە دا وەك پلپلە و  
 گوارەي كچە كوردىك لە شايىھى كى رەش بەلەك دا دەدرە وشانە وە و سروشتى  
 دەوروپىشتى ئەوهندەي تر جوان دەکرد ... له ناكا و رەوه کە ويک بە  
 پا نتا يى ئاسمانى شين و بىھەور دا فريىن و به كىۋەكەي ئەوبەر  
 دا داكسان و له چاو وون بونو .. پیرىژنە کە به ووتەيەك جلەھە وى  
 خديالى لاوه کەي راگرت و بىدەنگىيە کەي شەق كردد ...

(( قاچى ئەو كورپە يە دەركە و تۈوه .. دايپۇش با سەرمائى نەبىت ))  
 لاوه کە و پياوه کە له يەك كاتدا بۆ كورپە كەيان روانى کە دايسكە -  
 كەي سەرى بە لاوه نابوو، كە روپىشكە خەموى دەکرد . ژنە كەكتو و پىر  
 راچەنلى و تەوا و پەتوكەي تىۋە پىچا و خەندهيە كى پە لە خەم و ئازار

(نه‌که ن دهست شل بکه ن ثه‌مجا رهش هیسمه تئیمکی تر...) ...  
 ئوتومبیله‌که‌ی هینایه و جوش و ثه‌مجاره زیاتر پی له به‌نزيں داگرت  
 پیا وه‌که‌ش‌تەوا و سور ببۇوه و لاوه‌که‌ش‌شەلالى ئارهق بۇو...  
 تا يه‌کانیش‌گفه‌یان لیچو ده‌هات و قورولیتەیان بۇ پاشوه ده‌ها ويشت.  
 ئوتومبیله‌که چەند تەکانیکی بۇ پیشوه دا و لە چالماكان دەرباز  
 بۇو... ئینجا وەک تیسکەی تفه‌نگ دەرچوو... پاشان وەستا.  
 شوفیره‌که‌هاری كرد... (درزگارمان بۇو تکا يه سەركەونه و خوا  
 بکات ئەمە دوا جار بیت...) ...  
 لاوه‌که لە شوینه‌کەی خۆي دانیشته و پیا وه‌که‌ش لە تەنیشت ژنەکە وە  
 که کۆرپەکەی لە شیرەی خەویکی هیمن دا بۇو پەتھەنیکی قا وەیی چىلکنى  
 تیچو پېچرا بۇو... پیریزنه‌کە لە لاي راسته و لە تەنیشت لاوه‌کە وە  
 دانیشتبۇو... كراسىکى رەشى گول ووردى سپى لەبەر دا بۇو سەرپۈشىكى  
 رەش كەلملاولاوه بىكە سپىھەكانى سەرەتا تکييان دەكىد و لە گەل چرچە  
 ووردەكانى دەموجا ويدا تەمنىنەکى پەنجا سالىيان بۇ دەنەخشانىد.  
 بەلام تا بلىي بە خۇ و توكمە بۇو... لەدە دەچوو ژيان بە ھەمەو  
 رک و ملۇزمىيە وە تەيتوانىبىت کارى خۆي لى بکات... ئافره تەكەش  
 ناو بە ناو لە پیرىزنه‌کەی دەرۋانى و ئینجا بە تىلەمى چا و لى  
 لاوه‌که وورد دەبۇو...  
 پیا وه‌که‌ش سەر و ملى دا پوشى بۇو پا لتویەکى خاکى پوا وى گىرفا ن  
 گەورەی لەبەر دا بۇو كە ئانىشىكەكانى بە قوماشى رەش پىينە كرا بۇو...  
 شەروالە كون كونەکەي ئەوه‌یان پىشان دەدا كە لە ژىزە وە دەرپىھەکى  
 خامى درىزى لە پیا بىت... سەرجم لە جوتىارىكى هەزارى يەكىن  
 لە گوندانە دەچوو كە ها كا پىيگە يىشتن... ئوتومبیله‌کە زۇر بىمە

شوئین جيگاي تا يهی تراكتور که پيش ئەمان ئە و رىگەيدى بە سەر  
كردبورو بە فرووقورى تىك هەلشيلابسوو رېرەوهى رېگاكە دەست نيشان  
دەكرد ...

شوفيرەکە بە دەم خورته و بولەوە دا به زىيە وە ... ئۆتۆمبىلە كەش  
وهى گيا نەوهە رېكى ما ندوو گەرم ببۇو و تا يەكانى دوا وە تەوا و روچوو  
بۇون .. شوفيرەکە بە پيا وە كەدە ووت ..  
(( كار وا بروات بو نيوه روش ناگەين )) ..  
ما وە يەك بىيەنگ بۇو پاشان ووتى ..

(( خۆ نا شكريت بىگە رېيىنه وە .. ) .. پيا وە كە هيشتا چا وى لە  
چالى تا يەكان چەقا ندبۇو بى شەوهى هيچ بلى سەرىكى رەزا مەندى بۇ  
لەقاند .. لاوهەكەش لە ژنەكە و پىريزىنەكە دەۋانى كە سەرتا پا رەش  
پوش بۇون ووتى ..

(( گەر خا كەنا زىك شك بەريت لە واندەيە كارەكە مەيسەر بىت .. ))  
شوفيرەکە لە لاوهەكە دەۋانى و هيچى نە ووت .. ژىر كوشەكە  
پىشە وەي ھەلدا يەوه خا كەنا زىكى دەسک كورتى دەرھىندا و ووتى ..  
(( فەرمۇو .. )) ..

لاوهەكە زۆر چالاكان بە فرى پيش تا يەكانى رامالى و چالەكانى  
پىرى كرده و بە پىلەقە دايگىرته وە ..  
تەوا و ئارەق گەردانە لە نا وچەوانە گەشەكەيدا كرد بۇو نا وبە  
نا ويش لە كۆرپە خەتووەكە دەۋانى و زياتر شان و بازوو دەكوتا.  
شوفيرەکە زۇو لە كارەكە گەيىشتە .. ئۆتۆمبىلە كە ڭازوواند ..  
ئەما نىش نەرەي شانيان لىيگىر كرده وە خۆيان بۇ شىن و مۇر كرده وە ..  
پيا وە كە لە گەل ئەوهەشدا بە سەر و سىما لَاواز بۇو دەسىت و  
مەچەكى لە گەل پالنەكە دا دەلەر زى .. ئۆتۆمبىلە كە وەك مەنالىكى  
بەستە زمان بە دەست با و كىكى دل رەقە وە دەيزىپاند و تا يەكانى يىش  
ساف و لۇوس بۇو بۇون و بىنيان دەخوارد لاوهەكە تا دەھات ھېزى  
دەدا يە و پا ژنەي قاچى راستى تەوا و لە زەويەكە گىر كردى بۇو ..  
لە گەل ھەمو تەكانىكدا ئەمان زياتر گۈرپانلى دەخوارد ..  
ئۆتۆمبىلە كە چەند تەكانىكى دا و كۈۋا يە وە ..  
شوفيرەکە وەك ھەستى بە شىك كردى بىتھا وارى كرد ..

# شاخ

حه مه ستوکهولم

ئۆتۆمبىلەكە وەك شىرىيکى زا مدار بە دەم نەرەو وورە وورە وە لۇوتى لە شەختەلانەكە گىر كىدبوو تايىھەكانى دواوهى تەواو لە بەفرەكە چەقى بىوون بە شىۋەيەك دەخولانەوە قۇورۇلىتەيان بۇ پاشوه فەرى دەدا و دووكەلىان لى بەرز دەبىووه لەوە دەچوو ئىستا نا ساتىكى تر كىلپە بىكەن . چەند جارىك بۇ دوواوه تەكانى دا و ئىنجا بۇ پېشەوە كەشىا .....

سواربۇوه كان كە لە بەشى دو اووهى پىكا به سەر بە چا درەكە دانىشتىبوون وەك منالى نا و لانك دەھاتن و دەچوون.. شوفىرەكە لە پەنچەرەكەوە سەرى دەرھىنا بىوو و لىيۇ خوارەوە دەگەست و بۇ تايىھ چەقىوەكان دەپەروانى و زىاتر بىنى لە بەنزىن دادەگىرت ..... ئۆتۆمبىلەكەش بەردەوا م دەيشىرا ندو دووكەلى سې. چى فەرى دەدا ..... چەند تەكانىكى ترى دا و كۈزايدو شوفىرەكە دەرگاكەي كەردى وە سەرنجىكى بىھۇودەي لە سواربۇوه كاندا ووتى (( پىا وەكان دابەزنو ياللىنىن )) .....

پىا وېكى لاوازى سەرو رېش ماش و بىرنجى لە تەنىشت ژنېكىسى قەلەوى سىنگ دا چەقاو دا نىشت بىوو، كىتو پى بازىدا و شەوېش كە ھېشتا لە ھەرەتى لاوى دا بۇو ئەوهندەي يەك و دوو بازىدا و نەرەي شانىان لەم لاو لاي ئۆتۆمبىلەكە گىر كرد.. شوفىرەكە ئۆتۆمبىلەكەي خىستەوە گەر.. تايىھەكان وەك لۇورەي رەشە بايەكى توندى شەۋىكى تۆف دەنگىيان لىيۇ دەھات و زۆر بە خىرا يى دەخولانەوە و ئەوهندەي تىر چالەكانىان قوول دەكرد.. چەند جارىك تەكانى دا و ئەمانىش ھەمۇو ھېزىيان كۆ كردى و زىاتر خۆيان لىيچىر كردى وە .

رېيگا كە وەك تۈولە مارىكى سېرىپو درىيەز سېبۈوه و پاشان بىنلىي چەپى شاخەكەدا دەشكایەوە و لە چا و وون دەبىوو.. دامىنى شاخەكەش بۇ خوارەوە ھەزار بە ھەزار بۇو و تا چا و بىر بىكەت سې دەچسووه .. زنجىرە شاخەكانى ئەوبەر كە بە دارگۇيىزى بىنلىك و پۆپ دا پۇشرا بۇون لە نا و بەفرەزېرىينەكەي بەر تىشكى خۆرە لاوازەكەي ئە و دەمىنە و بەيا نىيە لە دوورەوە وەك خالى سەر گۇنای كچە كوردىك دەبىنرا ان..... كىزە بايەكى ساردىش چەھى لە بناگۇئى و رۇومەتى سواربۇوه كان هەلدىھەساند ...

بەم جورە چىنەچەوا وسا وەكان پا رىزە زىكى زور بىر وردو خەيال تىۋىيان لە كىس دەچى و كە لە تەنگانەدا بەرگرى لى دە كەن .

بە بونە كوج كردىنى شاعيرە وە ( ئەممە دلزار ) ئى شاعيرە سەت و سوزى خوى دەرددە بىرى بە ناوى ( شىن بو دلدار ) وە دەلى :

ھەي رو كاك دلدارم رو  
شاپىرى گەنجو پىر شعورم رو  
محامى گەلى ھەزارانىم رو  
( دلدارى ) زاناو زورفەننام رو  
ھاوريى بە نىرخوبەها دارم رو  
ئەدىبى گەورە بى قسۇرم رو  
رى نىشاندەرى بى اراشم رو  
خاوهنى بىرى بە رزوجوانىم رو (۹)

---

٩- ئەممە دلزار شىن بو دلدار گۇوارى گەلاۋىز چاپخانەمى مەعا رىف  
زمارە ۱۲ بەغدا ۱۹۴۸ ل ۴۰

\* \* \*

ئەم حىزبە كەوتە چالاکى نواندن، هەرچەندە بە رەسمى رىيگەي ئىش كەردىنى پىنەدرا، لە چالاکىيەكانى ئەم حىزبە ھەلسان بە ئاھەنگى نەورۇزى سالى ۱۹۴۶ و ۱۹۴۷. لقى حىزب لە ھەموو پارىزگاكان پىيڭەت، گەللىي روشن بىرۇ پېشىكەوتى خواز چۈونە رىيى ئەم حىزبەوە لە ما نە (دلدار) ئاشىرىپەر بۇوه.

شا عىرى تىكۈشەرۇ پېشىكەوتىخواز ئەممە دلزار دەلى:

سالى ۱۹۴۶ دواى تەواو كەردىنى خزمەتى سەربا زى گەرا مەوه بۇ كۆيىه، چەندەنەدا ورپىتىك داوايانلىكى كەنەنەدا بۇ وەرگەرنى ئىجا زەي كار بە شىوه يېكى دا كار بىكمە، كە ھەولئەدرا بۇ وەرگەرنى ئىجا زەي كار بە شىوه يېكى ئاشكرا، لە ما نە شا عىرى پېشىكەوتتوو (يوونس رەئوف) بۇو، لە سەرەتا دا تۆزى گومانم كەرد، بەلام كە كەرىم ئەممەدم بىنى كە لە قوتا بخانەمى سەرەتا يى دا بە ما مۇستا دامەزرا بۇو، دەستم كەردى بە كار كەردى لە رېيى (حزب التحررالوطنى) لە لايەن حىزبەوە راسپىيردرام كە چاودىرىنى كىتابخانەي حىزب بىكمە، كە تەرخان كرا بۇو بۇ فرۇشتىنى نامىلىكەمى حىزب و روژنا مەو گۇقا رى پېشىكەوتتوو لە ما نە گۇقا رى رىيگەي لوپىنان

بۇو (۸)

گۇقا رى گەلاۋىژ (۱۹۳۹-۱۹۴۹) رۆلى كارگەرى بىنى لە بىلاو كەردىنەوەي بىرى پېشىكەوتىخوازو بەرە پېدانى ئەددەبى كوردى توانى كۆمەللىي شا عىرو رۇشنبىرى لاو لە دەورى خۆيدا كۆبكا تەوه، (دلدار) شا عىرو ئەدىب كە قوتا بى حقوقق بۇو لە بەغدا ئاشنا يى لە گەل دەپەيدا دەكا و پەتىا پەتىا ووتا رى كۆمەلايەتى و ئەددەبى تىدا بىلاو دەكانتەوه.

دواى تەواو كەردىنى خويىندى زانستىغا واتە سالى ۱۹۴۵ دەگەرېتەوە بۇ شارى ھەولىيىر و دەبىتىه پارىزەر بۇ ما وەى سى سال تا لە ئىپوارە ئى ۱۲ تىرىپىنى دووهمى سالى ۱۹۴۸ دا، زۇر بە ناوهخت دەلىمە گەورەكەمى لە لىدان دەكەوى و مال ئاوايى يەكجا رى ما نلى دەكەت و كەلىننېكى دىيار دەخاتە نا و ئەددەبى كرىكاكا روجوتىيا رانى كوردىستانەوە

سالی ۱۹۳۸ پارتی هیوا له به غدا دامزرا ، هیوا رولیکی باشی بینی له بلاؤ کرده وهی بیری نه ته وا یهتی و بنکه یه کی باشی له نا و زوری زوری چینه جیا وا زه کانی کۆمەلدا دامزراند ، " ئەم حیزبە بە گەورە ترو بە بەھیزتر تەناتەت حیزبە ئاشکراکانی عیراقیش داده نرا ، خویندەوارانی کورد ، شفشهان ، سەروکانی عەشاير ، کاربەدەستان لە نا و جغزی ئەم حیزبە دا بەشیان ھەبـوو ، مەركە زى حیزب لە بەغدا بـوو ، پەلی بـو ھەموو و ولاتانی کـورده وارى ها ويشت بـوو ، تەناتەت بـو (ئیران و سوریا) شـدە توانـری بوـتری ئـەم حیزبە تـا ئـەو تـەئـرـیـخـە لـە گـدـورـەـتـرـ حـیـزـبـیـکـیـ کـوـرـدـ بـوـوـهـ (۶)

لـە سـالـیـ ۱۹۴۰ دـا ، شـاعـیرـ بـوـ خـوـینـدـنـیـ کـۆـلـیـجـیـ حـوقـوـقـ بـوـ بـەـغـداـ چـوـوـهـ ، لـەـوـیدـاـ دـەـبـیـتـەـ ئـەـنـداـ مـیـ حـیـزـبـیـ ھـیـ وـاـ ، ھـەـرـ ئـەـوـ ئـەـنـداـ مـیـ یـەـشـ (دلدار) اـیـ لـەـ ماـ مـوـسـتـاـ رـەـفـیـقـ حـیـلـمـیـ نـزـیـکـ کـرـدـبـوـوـھـوـهـ ، چـونـکـەـ وـەـکـوـ ئـاشـکـراـ یـەـ ماـ مـوـسـتـاـ رـەـفـیـقـ حـیـلـمـیـ سـەـرـوـکـیـ حـیـزـبـیـ هـیـواـ بـوـوـ .

لـەـ چـلـەـ کـانـداـ دـاـ مـوـدـەـ زـگـائـیـ هـیـتـلـەـرـیـ فـاشـیـسـتـلـەـ بـەـرـدـەـمـ خـەـبـاتـیـ رـەـواـیـ گـەـلـانـ تـیـکـ شـکـیـنـراـ ، بـەـرـپـاـ بـوـوـنـیـ بـزوـوتـنـهـ وـهـیـ رـزـگـارـیـ خـواـزـیـ لـەـ زـۆـرـ شـوـیـنـیـ گـیـتـیـ دـاـ ، شـۆـرـشـیـ مـەـزـنـیـ گـەـلـیـ چـینـ دـەـرـواـزـیـکـیـ فـراـ وـاسـیـانـ لـەـ بـەـرـدـەـمـ گـەـلـانـ ئـاشـتـیـخـواـزـ ئـاـوـەـلـەـ کـرـدـوـ بـوـوـنـ بـەـ سـەـرـمـدـشـقـ وـ ھـەـوـیـنـ بـوـ گـەـلـانـ تـرـوـ . گـەـلـیـ عـیرـاقـیـشـ بـەـ عـارـەـبـ وـ کـورـدـ وـ کـەـمـنـەـتـهـ وـاـیـتـیـ یـەـکـانـیـهـ وـهـ کـەـمـوـتـنـهـ جـمـوجـولـیـ سـیـاسـیـ بـیـهـوـهـ ، کـۆـمـەـلـیـ رـیـکـخـراـوـ پـارـتـیـ پـیـشـکـەـ وـتـوـ هـاـتـنـهـ کـاـیـهـوـهـ بـوـ ھـیـنـاـنـهـ دـىـ دـیـمـوـکـرـاـسـیـ وـ سـەـرـبـەـسـتـیـ لـەـ سـەـرـاـ نـسـرـیـ عـیرـاقـ دـاـ .

" جـاـ پـارـتـیـ کـۆـمـؤـنـیـسـتـیـ عـیرـاقـیـ چـاـكـ دـەـبـیـزـانـیـ کـەـ مـیـرـیـ بـەـ ئـاشـکـراـ ئـیـجاـ زـهـیـ کـاـ رـکـرـدـنـیـ پـیـ نـاـ دـاـ ، بـوـیـهـ چـەـنـدـ ئـەـنـداـ مـیـکـیـ خـۆـبـانـ تـەـرـخـانـ کـرـدـ بـوـ دـاـ مـەـزـرـانـدـنـیـ (حزـبـ التـحرـرـ الـوطـنـیـ) ، دـاـ وـاـکـارـیـکـ لـەـ لـایـنـ حـوـسـیـنـ مـحـمـدـ دـاـ لـشـبـیـبـیـ ، مـحـمـدـ حـوـسـیـنـ ئـەـ بـولـعـیـسـیـ الـمـاحـمـیـ ، مـحـمـدـ مـدـسـالـحـ سـەـعـیدـ الـمـاحـمـیـ پـیـشـکـەـشـ وـهـ زـاـرـەـتـیـ نـاـ وـ خـوـ کـرـاـ " (۷)

عـ عـلاـ الـدـيـنـ سـجـاـ دـىـ ، شـورـشـکـانـیـ کـورـدـ وـ کـومـارـیـ غـيرـاـ ، چـاـپـخـانـهـ مـعـاـرـيفـ ، بـەـغـداـ ، ۱۹۰۹ ، لـ ۱۷۵ .

۷ـ سـعاـ دـخـیـزـیـ ، "مـنـ تـاـ رـیـخـ الـحـرـکـهـ الـثـوـرـیـهـ الـمـعـاـصـرـهـ فـیـ الـعـرـاقـ ، الـجـلـاـلـوـلـ مـطـبـعـهـ الـادـیـبـ الـبـغـدـادـیـهـ ، بـغـداـ صـ ۱۲۶ـ ۱۲۸ـ .

- لەگەل ئاسەف رەئۇوف كۆپى تى ئەكۆشاين زۇر نامەنە نەھىيىمان ئەنۇوپى بۇ متصرف و وەزىرەكان و داواى نۇوسىن و خۇيىندىن بە كوردى ئەكەرا (۳) .

جا كۆمەللى پېتىپا دەورى باشى ھەبۇو له وریا كردەنەوەي مروقى تىكۆشەر بە تايىپەتى ئاسەفرەئۇوف دەورىكى باشى ھەبۇو، له پەرەر دەكەردن و بەھىز كردەنى گىانى نىشتىما ن پەرەر لاي شاعير. لە سالى ۱۹۳۵ دا (دلىدار) روو دەكەتە ھەولىرى بۇ خۇيىندىنى قوتا بخانەنە نا وەندى، نىوهى يەكەمى سىيەكەن سەرەتاي چا لاڭى و بزۇتنەوەي كوردايدىتى كەوتە ناوا لاؤان و قوتا بىانى كوردىستا نەمە، (دلىدار) ئەمەرىش وەكۇ قوتا بىيەكى تىكۆشەر دەورى دىيار دەبىسنى لە رېزى قوتا بىانى كوردىستانى ھەولىرى، ئەم چا لاکىيەش بە رۇونى لە ياداشتەكەى شاعير دا دەبىنرى .

" شاعير لايەرەيىكى گەش لە خەبا تى قوتا بىان لە پېيىندا وى كوردايدىتى لە قوتا بخانەنە نا وەندى ھەولىرى لە سالانى ۱۹۳۶-۱۹۳۵ رۇون دەكتەھە " (۴)

دەرچۈونى گۆڤارى رۇوناكى لە سالى ۱۹۳۵ لە ھەمان شاردا، دەورى باشى بىنى لە پېشخىستى ئەددەب و فراوان كردەنى بىيىرى نەتەوايدىتى، (دلىدار) ئاشىرىش يەكەم شىعىرى لە گۆڤارى ناوبراو دا بلاؤ كردىتەوە. سالى ۱۹۳۸ بۇ تەواو كردەنى قوتا بخانەنە ئاما دەيىرى بۇو دەكەتە شارى كەركۈوك " لە شارى كەركۈوك دا شاعير دەبىتىتە ئەندامى ( كۆمەللى داركەر ) ئەم كۆمەللى يە لاسا يى كردەنەوەي كۆمەللى ئەرىيۇنا رى ئىتالىيا بۇوه، دەستە دامەز زەرىنەرانى يەكەمین كۆبۈونەوە - يان لە باغى (ام الربىعىن) لە كەركۈوك كردىووه، ئەوانەنە لە دە كۆبۈونەوە يە بەشدار بۇون زۇر بۇون لەمانە موڭەرەم تالەبانى شىخ حوسىئى بەرزنجى، شىخ ما رەفى بەرزنجى، يۈونس رەئۇوفى دلىدار " (۵) .

٣- ھەمان سەرچا وەي پېشىۋو ، ل ۲۸

- ٤- د. مارف خزندار ، " شاعيرى ما وەي تاقى كردەنەوە و گواستنەوە " ، كولىيجى ئەددەبىاتە چاپخانەنە دارالحاظ، زماړه ( ۲۰-۲۱ ) ۱۹۷۷ ل ۳۷
- ٥- ئەم زانىا رېم لە نامەنە تايىپەتى ما موتاى هىۋا و خوشەويىستىم پروفسور مارف خزندارەوە لە ۱۹۹/۹/۱۹۸۳ دا پى گەيىشت .

ههـ لـهـ تـهـ مـهـنـىـ مـنـالـيـهـوـهـ ئـهـمـ شـارـوـ ئـهـ وـ شـارـىـ پـىـ كـراـوـهـ،ـ هـيـشـتـاـ  
تهـ مـهـنـىـ يـهـكـ سـالـانـ بـوـوـهـ،ـ كـهـ باـ وـكـىـ هـيـشـاـ وـيـهـتـىـهـ هـوـلـيـرـ لـهـ بـهـرـ كـارـىـ  
مـيـرـىـ باـ وـكـىـ گـوـيـزـرـاـ وـهـتـهـوـهـ بـوـ رـانـيـهـ،ـ پـوـلـىـ يـهـكـ وـ دـوـوـيـ سـهـرـهـسـاـيـىـ  
لـهـ رـانـيـهـ خـوـيـنـدـوـهـ،ـ پـاـشـانـ لـهـ گـهـلـ بـاـ وـكـىـ پـيـكـهـوـهـ گـهـرـاـ وـهـتـهـوـهـ شـارـىـ  
كـوـيـهـ،ـ خـوـيـنـدـيـ سـهـرـهـتـايـىـلـ تـهـواـ وـ كـرـدـوـوـهـ،ـ هـهـرـ لـهـ تـهـ مـهـنـىـ لـاوـيـداـ  
خـولـيـاـيـ شـيـعـرـوـ ئـاـشـنـاـيـ شـاعـرـهـ كـلاـسيـكـيـهـ كـانـيـ كـورـدـ بـوـوـهـ،ـ لـسـمـ روـوـهـوـهـ  
خـوـيـ دـهـلـىـ:

هـيـشـتـاـ لـهـ قـوـتـاـ بـخـانـهـ سـهـرـهـتـايـىـ دـاـ بـوـومـ كـهـ دـيـوـانـىـ حاجـىـ قـسـاـدرـىـ  
كـوـيـيـمـ زـوـرـتـرـىـ لـهـ بـهـرـ كـرـدـبـوـوـ،ـ هـهـمـيـشـهـ بـهـ وـرـدـىـ سـهـرـنـجـمـ لـهـ هـهـلـبـهـسـتـهـ  
كـانـىـ عـهـونـىـ وـ رـاجـىـ وـ عـاـصـىـ وـ حـوـسـيـنـىـ وـ هـيـرـاـنـىـ دـهـدـاـ وـ لـهـبـهـرـيـشـمـ  
دهـكـرـدـنـ،ـ بـهـ وـاـنـهـشـ دـاـبـيـنـ نـهـبـوـومـ هـهـلـبـهـسـتـىـ هـهـرـكـهـسـيـكـمـ دـهـسـكـهـ وـتـبـاـيـهـ  
دهـمـنـوـوـسـيـهـوـهـ وـ لـهـبـهـرـيـشـمـ دـهـكـرـدـنـ،ـ بـهـ تـاـيـبـهـتـىـ هـهـلـبـهـسـتـىـ وـهـفـاـيـىـ،ـ  
كـورـدـىـ،ـ بـىـكـهـسـ زـيـوـهـ روـپـيـرـهـ مـيـرـدـمـ زـوـرـ لـهـ بـهـرـكـرـدـنـ وـ هـهـرـ لـهـ سـالـهـ دـاـ  
هـهـسـتـمـ بـهـوـهـ كـرـدـ كـهـ چـيـزـ لـهـ هـهـلـبـهـسـتـ وـهـرـگـرمـ وـ زـوـرـ گـيـرـوـدـهـ بـوـ بـوـومـ(1)  
ئـهـوـهـيـ شـاـيـانـيـ باـسـ (دـلـدـارـ)ـيـ شـاعـرـ رـوـزـ بـهـ رـوـزـ لـهـ گـرـوـرـانـ  
وـ پـيـشـكـهـ وـتنـ وـ پـهـرـهـسـهـنـدـنـاـ بـوـوـهـ،ـ گـهـلـ شـهـ وـ نـخـوـونـىـ وـ هـهـوـلـ وـ تـهـقـهـلـاـيـ  
بـىـ وـجـاـنـىـ دـاـوـهـ بـوـ پـهـرـوـهـرـدـهـ كـرـدـنـ وـ بـىـ گـهـيـانـدـنـىـ خـوـيـ وـ فـرـاـوـانـكـرـدـنـىـ  
ئـاـسـوـىـ بـيـرـىـ بـهـ خـوـيـنـدـنـهـ وـهـ كـتـيـبـىـ هـهـمـ چـهـشـنـهـ لـهـ بـاـرـهـيـ مـيـزـوـوـىـ  
كـورـدـ وـ شـوـرـشـهـ كـانـىـ جـيـهـاـنـ وـ ئـهـدـهـبـيـاتـىـ ئـهـوـرـوـيـيـهـوـهـ،ـ لـهـ كـوـتـاـيـىـ  
بـيـسـتـهـكـانـ لـهـ بـهـغـداـ بـرـيـارـ درـاـ كـهـ كـوـمـهـلـيـكـىـ سـيـاسـىـ وـ نـهـيـشـنـىـ  
دـاـبـمـهـزـرـيـتـ،ـ ئـهـمـ كـوـمـهـلـهـ لـهـ ١٩٢٧ـ ١٠ـ ٧ـ ٧ـ ١ـ ١ـ دـاـمـزـرـاـ بـهـ نـاـوـىـ (كـوـمـهـلـهـ  
پـشتـيـوانـ)،ـ لـقـىـ پـشـتـيـوانـ بـهـ هـهـمـوـ شـارـهـكـانـىـ كـورـدـسـتـاـنـداـ بـلـاـوـ بـوـوـهـ،ـ  
لـهـ ئـهـنـدـاـمـ وـرـيـاـ وـ كـارـامـهـكـانـىـ شـارـىـ هـهـلـيـرـ ئـاـسـهـ فـرـهـئـوـفـ بـوـوـ(2)ـ كـهـ  
بـرـاـ گـهـوـرـهـيـ (دـلـدـارـ)ـيـ شـاعـرـهـ .ـ ئـهـمـمـدـ خـواـجـهـ دـهـلـىـ:

1- گـيـوـيـ موـكـرـيـانـىـ " دـيـوـانـىـ لـدارـ" چـاـپـىـ دـوـوـهـمـ،ـ چـاـپـخـانـهـ كـوـرـدـسـتـانـ  
هـهـلـيـرـ ،ـ ١٩٧١ـ ،ـ لـ ٨ـ

2- ئـهـمـمـدـ خـواـجـهـ ،ـ " چـيمـ دـىـ" ،ـ بـهـرـگـىـ سـىـ يـهـمـ،ـ چـاـپـخـانـهـ رـاـپـهـرـيـنـ  
سـلـيـماـنـىـ ،ـ لـ ٣ـ٥ـ

# دلدار شاعیری شورشگیر و پیشکه و تنخواز

که مال مستهفا مه عروف

له گرمەی جەنگی جیهانی بیدەمدا ، لهو کاتەدا کە شەرپىکى تەماح  
كارى بە هۆى دا مودەزگا ئەمېریا لىستەكانەوە ھەموو گىتى گرتىبووه ،  
ئەو شەرپەي کە سودو قازانچى وولاتە ئەمېریا لىستەكانىي ئەوروپاي  
تىدا بۇو ، ئەويش بە مەبەستى دابەش كردى میرا تى دەولەتى عوسمانى بۇولە  
نىوان ئەو دەولەتانە دا ، ئا بەم جۇره جەنگ كۆتا يى هات و وولاتە  
سەرما يەدارەكان کەوتتە خۆ بۇ دابەش كردى دەولەتى عوسمانى بە  
گۈرپەي بەرژە وەندى يە ئا بۇوريەكانىان ، كوردستانى خۇشە ويستمان  
بە سەر چوار وولات دابەش كراو ، زۇردا ران کەوتتە فران فرانسى  
ھەر مەپرسە ج روزى بۇو ، له گەل ئەۋەش دا دەيەھا بانگەۋازى  
ديموکراتى و مافى گەلانى زىرددەست دەدرا بە گۈئى خەلکىدا بىرۇ  
ھەل خەلەتىندن و تەفرىيە دانيان تا وەكوبىغەنە مەرا مى خۆيان ئا  
لهو کاتە دا (دلدار) پىرى نايە جيھانەوە له ۲۰ شۇوباتى ۱۹۱۸ .  
کاتى کە فامى كرده و خۆى بىينى ھەستى كرد مەرۋى نەتەوە يېكە  
کە ناوى نەتەوەي كوردمە ئەو كوردهي کە له زۆر كۆنەوە خاۋەنى  
شا رستا نېتى بۇوە و جلەوى فەرمان رەوايى بە دەست خۆيەوە بۇوە ، له  
گەل ئەۋەي کە نەتەوە يېكە لهو نەتەوانى هېشتا چارەنۇوسى خۆيان  
نەكەوتتە دەست خۆيان ، (دلدار) شاعير له ناو نەتەوە يېكە وادا  
دەكەويتە شىعر ووتەن و خەيال كردىوە .

دلدار ، ناوى (إيوونس) ئە كورى مەلا رئوفى كورى مەلا  
مەحمۇمۇد ئەفەندى كورى مەلا سەعدى خاديمۇلسەججا دەيە .  
دا يكى ناوى (زەھوھا) يە ، كچى خورشيد ئەفەندى يە ، لە مەلا  
زادەكانى نا وچەي زەھاون .

"دلدار" له ناو بىنه مالەيېكى مووجەخۇرى بچووك پەروەرددە بۇوە ،

- ۱- شیرینو فه رهاد، داستانیکی عهشقه ، له کورده و اریداگه لی بلاوه و  
دهما و دهم ده گیرنه وه وه کره مزی خوش ویستی و قوربانی دان لشه  
زور دهقی ئەددەبی دا به کارهینرا وه ...
- ۲- " بیستون " ناوی ئەوکیویه که (فه رهاد) نەخشی، شیرینی له  
سەر ھەلکەندووھ .
- ۳- " گەرمەسیر شوینه و ئا وەدوانی زور گەرم و ووشک .
- ۴- " زوربا " ناوی يەکیگە له رومانه به ناوبانگە کانی شووسەری  
یونانی ( نیکوس کازانتزاکی ) . هەروەها ناوی پالەوانی رومانە کەشە ..
- ۵- ئىقان و وەزىنە موسىقى يەكتى ئەم شىعرە له کۈپلەيە كەوە بىو  
يەکیکى دىكە دەگۇررىن، كە بەم نىشانەيە ( ) لەيەك جىادە كېرىتە وە .

\* \* \* \*

ئەوا توش دەبىتىھ "شىرىن"

منىش دەبىتىھ

"فەرھاد" دە قەرەجەكەت ..

نا گىانەكەم

تو ناتوانى ، بەفروچىا بە جى بىلى.

تو لە "گەرمەسىر" دا دەمىرى

لە كەنارى دەرياكانا ،

لە شەپولەكان ، تى ناگەي .

دەروازەي ئەم عەشقە داخى

من وا روشتىم .. نايەمەوە .. نايەمەوە ..

توش ئەدى كچە خەماوى بىھكە

لە دوورەوە ..

نە بوم بگىرى

نە لە كەپەتىتەگۈزى خورى ئەۋين

بشارەوە ..

نە يادم كە

نە "پىكەنин" يىش بخەرە كاغەزەوە

من وا روشتىم .. نايەمەوە

نايەمەوە ..

گولانى ١٩٨٣

گولانى ١٩٨٣ يى ، وەرزىز

ي وەرزىز

### ببوره لیم

گهر ده ته وی برازاني کیم ؟  
 من شاعيریکی سره پروم ۰۰۰  
 قدره ج ئاسا سنور ده برم ۰۰  
 ولاتکه م سره استی یه  
 رپا هدر بیلای ئه ویش ئه گرم ۰۰

گهر ده ته وی بمیینیه و ۰۰  
 ده بی رووه و اوتکه بزری  
 "گیانی زوربا"

ده لبزنی ۰۰  
 ده بی به داوه پرچه کانی خور دا  
 شور بیته وه ۰۰  
 له روخی خه می پیروزی هزاریکا

### ده لبتوتی

ده بی له پوسته قدره جه کانا  
 نامه کانم بدوزی یه وه ۰۰  
 له دیوانی شاعیره بی ناوه کانا  
 شیعره کاظم بخوینی یه وه ۰۰

ئمه منم  
 ئه وهی تو پی ده لی ده ولدت  
 من تیایا نیم  
 ئه وهی تو پی ده لی سنور  
 من نای بینم

گهر ئاماذهی ؟  
 دهست گیرانی ئم قدره جه نامویه بی ،  
 ده بی چیاو  
 لو تکه بی فر  
 به جی بیلی ۰۰۰  
 کهی خور ئم زه وی بیدی ،

به جی هیشت ؟

# دوا نامه

ی - وہ رزیر

وات ده زانی: ئەم کۆچمە من ،  
پیشی "هات و نه هات" ی عەشقە و  
چارە نووسى "فەرھاد" یکى ئەم سەددە يە  
چاوه ریشمە ..

دەت و ویست : ببیتە "شیرین" ی  
دلە پېر لە ئاز اړە کەم ..  
دا وات ده کرد : پېیکە ریکى زۆر نازد ارت  
لە "بیستون" ی ،

شیعرە کانمدا بۇ بکەم  
نەت ده زانی: من فەرھاد نیم ؟  
من شاعیر نیم ؟  
من ریبواریکى کاروانی بى کوتایی ،  
ھەنگاو نام ..

چارە نووسى، وون بوویەکى ئەم سەددە يە ،  
چاوه ریشمە ..

ئەی کیژولە چیایی يە کە  
چۈن دە تواني: دەست گىر انى ،

وون بوویەکى ئەم وەرزە بى ؟  
چۈن دە تواني: دەست بەرد ارى ،

چیاو لوشكەی بە فر ببى ؟

ئەی کیژولە چیایی يە کە  
تى بگە لىم ..

من سامەوی چارە نووسى ،  
بە خۆمەوە گری بى دەم ..

من قەرە جم  
من پسولەی قەرە جى خۆم ، بە تۆ نادەم !

دیاره چین و گهلى چه وسا و  
زووتر له خه و هه لدینچا و

گوران ده زانی ئه و گه لهى سووربى له سه ر شورش كردن هه رده گاته ئا ما نجه -  
كانى وئه و روژه زورنزيك ده بىنى كه داگير كه ران و ئيمپريا ليزم و كونه -  
په رستي گلوله يا ن ده كه و يته ليزى وهىزى گومان و خوپه رستي و كونه په رستي .

بويه گوران دوا رۇزى ئهوانه و اده بىنى و پى يا ن ده لىت:

تهپها ... تريپتدى ولنگه و قووج  
بىوي ئه كه و يت ده عبای وەك حسوج

\* \* \*

بەلام گۇران با وەرى بە گۇرانە ولە وېرىۋا يە دايىھ كوردىش وەك  
گەلى كۆريا تە كانىكى مەزن دەدا بەرە وپىشەوە وشۇرش بەر پادەكتات  
شۇرش ھەر لە بەر دەوا مىدا يە تا چەواسانە وە ما بىتە بۇيە دەلىت :

راستە ئەمۇۋىيە كىما نۇستۇوين ،  
ئەوى ترمان زەدە و ما ندووين ،  
بەلام رۆز دى و ئەرداو، ما وە  
لە هيچ كامان نە گىراوە  
ئەمما نە خەو بىزار ئەبىنى  
ئەو توڭ لە پشتى ئەتكىنى ...  
ئەو سا دووبارە بەلاما  
ئامانە بۇ سەرسەتمەكار

گۇران ئاگا دارمان دەكتەوە كە ھەموو گەلمە ژىردىستە كا ن دەبى  
سوود لە تاقى كردىنە وە كۆريا بىيىن. گۇران ئاسۇيدىوا رۆز زۇر بە  
رووناڭ دەبىنى وە وېرىۋا يە دايىھ كە رىزگار بۇونشتىكى حەتمى يەنە  
بۇيە دەلى :

ئەى نە تە وە كوردى بىرسى  
عەرەب ، ھىيندى ، ھەركەس، ھەرچى  
ئە و قەوما وە كۆريا پەندە  
بۇ گشتگەلى دىيل و بە نە

تا چەواسانە وە زىيا تر بى ، تاقەفى زنجىرى دەست وپى ئەستور ترلىرى  
تا گەل بىرسى ترلىرى ، ئەۋەندە زووتر گەل ووريا دەبىتە وە ھەنگا و بە  
رە و ئاماجەكان دەنلى :

تا ئە و زىيا تر داگىر كراو  
بىداتە بە رکەلبەي سواو  
قەفى زنجىر ئەستور تر كا  
لەشكەر سەوقى پىق دوور تر كا

بیری ئینتەر ناسیونالیستى واى لە گۆران كردووه وەك كوردىك  
ها و دەنگى تەواوى گەلى كۆريا بكا ، لە ئازارو مەينەتىدا لە پۇزى -  
خوشى و سەر كەوتەن دا بۆيە دەلىت :

گەر نەمەوى سەر فرازىت  
بە هەستى خۆتا شانا زىت  
گەر دوژمنى ئازادى تو  
بە دوژمنى نە زانم بۆخۆ  
خوايى بەشم ھەر دىلى بىسى  
ھەر رەوو زەردى و زەللىي بىسى

دەردى كۆريا ، دەردى كوردىشە ، بۆيە دەرمانىشيان يەكىكە ، ئىمپريا -  
لىزمى ناو خۇو كۆنه پەرسىتى ناوخۇ ، ھەر دووكىان بەر بۇونەتكىانى  
مېللەت بە ھەموو رىگا يەك و بە ھەموو چەكى:

چۈنكە كۆريا ھەر دوولامان  
بۆيەك دەرد ئە خوازىن دەرمان  
كۆنه پەرسىتى ناو خۇومان  
بىۋتە شەملىكى شەر بىومان  
رايکىشىا وە دەستى يارى  
بۇ بىگانەمى ئىستىعمارى  
بە ھەر دەوو دوژمنى خوپىن مۇز ،  
بە گشت چەكى : لەش كۆۋەپېركۈز  
تىيەمان بەر بۇون ئەميا نەوي :  
ھەقىمان ھەرگىز چىڭ نەكەوى

گۆران ئاگايى لە وەھىيە كە گەلى كورد ھېشتا بە تەواوى هوشىار نە<sup>\*</sup>  
بوته وە و لە خەۋى نەزانى بىدار نە بىوتە وە ، "ع

ع - ئەم شىعرە لە سالى ۱۹۵۱ ووترا وە .

\* ئەم مەبەستىكە لە نۇسینىكى درېز لە بارهى ئىنستەر ناسیونالىست  
لە شىعرى كوردىدا .

بۇ ماك ئارسەرپى ئە كەننى  
شەرمىز زاربى ، چەن خا يەنى ! " ٥  
پاشان دەلىي :

گريما ن! نەك سەرەك ، تەوشاي....  
خيوى خوارو ۋۇرى كۆرۈياى....  
دۆلارىيڭ ، لىنى كىيسە پرى  
ھەرگىز ناتوانى پىنى بىرى  
يەك تك چى يە ، لە وگشت ئا وە  
كە لاي گەل لە روت تەكادا وە....

گەل لە پەيوەندى نىۋان ئىمپيريا لىزم و كۆنەپەرسىنى نا و خۇ دەگا و چاك  
دەزانى ئىمپيريا لىزم نۆگەرىنا و خۇ بۆبەدى هيىنا نى ئامانجەكانى بە كار-  
دىنى، بويە گەل روودەكا تەكۆنەپەرسىنى نا و خۇوپى ئى دەلى :

ئە توانى چۆن ئارەز و ووكا  
لە پۇوشى حورمەتت فووكا  
دەس با تە جىلەوي كارت  
چۆن بۇيى بلوي قورس كابارت

پاشان گۇران خە با تى گەلى كورد و گەلى كوريا بە يەكە وە دەبەستىتە وە و  
ئامانجى گەلى كوريا بە هي كورد دەزا نى و دوژمنىشى ھەربە دوژمنى كورد  
دەزا نى، بويە دەلى:

ئەي نەته وە كۆرۈيا ئە بىز ؟  
ئەي سى ملىون لە زەرد رەگەز  
تۇ ھەر رەنگ بى من ھەر رەنگ بىم  
گەر نەتىپەرە سەتم بە پەنگ بىم

---

٥- ماك ئارسەر : فەرمانىدەي گشتى ھىزە شەركەرە كانى ئە مرىكا و دەولەتە  
نوکەرە كانى بۇو لە كوريا كە خۇبان نا و نابۇو ھىزى نەته وە يەكگۈز توھ كان  
دىوانى گۇران لايپەرە - ٢٣٦

بُويه ئيمپيريا ليزم و نوکره کانى دهسته و ئەزىز دانانىش و به هه مۇو  
شىوه يەك دەيا نەوى هه مۇو دەنگىگى ئازادى خواز كې بکەن و لەناوى بېمەن  
بَوْيىھ :

ئە هەرەمەن ، ئە كوان له گە لا  
بَوْمباي ئەتتۆم له باخە لا  
سەر پەر لە سەوداى بەدکارى  
زۇربە سوورى و به لا سارى  
بَوْسەر كۆريا تاوى داوه  
ھەر كورىاي چى؟ كورىا داوه !

لە گەل ھەنە مۇو تاوانكارى و كوشتن و بېرىن و وىران كردن و برسىتى  
و چەوساندنه وە، كە ئيمپيريا ليزم بە خەلات بۇ گەلانى دىنى كەچى هەمېشە  
دەيا نەوى رۇوي رەشيان بشارنه وە و لاف و گەزا فیاتە و دەلىن :

خۇمم قەلائى دى موكرا سى  
بە خىوکەرى لات و برسى  
خۇمم لە دەست جە و روئازار  
رەزگار كەرى كۆريا ھەزار !

ئيمپيريا ليزم بۇ جى به جى كردى پىلانە گلاؤھە کانى پەنا دەباتە بەمەر  
دا رو دەستە خۆى لە ھەر وولاتىك كە كۆنەپە رستى نا خۆيە، ئەوانىش  
ئەلقلەلە گۆيى ئيمپيريا ليزمن بۇ پارىزگارى كردن لەبەر زەوهندىيە  
چىنا يەتى يە كانىيان و پارىزگارى كردن لە دەستەلات و زىا ترما نەوهەيان  
لە سەر حۆكم و زىاتر چەوساندنه وە گەلە ھەزارەكان ، به لام ھەزارو  
چەوسا وەكان ئەو بىگانە پەرستانە چاڭ دەناسن بُويه رۇوبە رۇويان دەبنە -  
وھ وېيىيان دەلىن :

"ئەي سينگما ن رى! ئەي سينگما ن رى" "٤  
پرسەي مەيتى كۆريا ناگىرى ،

---

٤ - سينگما ن رى : سەرۈكى ئەودەمەي كۆريا باشـوور .

گوران لەلاؤکى سوربۇ كۈرياي ئازا ئەوه ئاشكرا دەكا كە چۈنگەلى نەبەزى كۈريا دەيانەوى بە ئازادى بېزىن و خۆيان دوا رۆزىخۆيان دىا رى بکەن و ئەۋۇپانە ھەلبىزىرەن كە خۆيان دەيانەوى، بەلام ئىمپيريا لىزمىسى جىهانى بە يارمەتى كۈنەپەرسى نا و خۆئەلبىن: (( نە، ئىمە چۈنمان بۇوېت ئەبىءا وابېزىن )) " ٢ "

هرودهها ئەوه روون دەکاتەوه كە چۆن گەلانى رۆز ھەلات دووجارى ھەمان دەردن ولە دەردى گەلى كۆريا دەگەن و ھا ودەردن، پاشان دەلى (ئەگەر بە بوئەتى به سەرەتاىدا ما وي كۆريا وە فرمىسىكىي دىلسۇزا نەبەسەربىرىنى ھەر دوولاي ئەوانىش و خۇشما نابىرىزم، با وەپنا كەم كەس بتوانى زاتى پىلى كىرتىم بە دلا بەھىئىي )) " ٣ " .

له سره تای شیعره که دا ئاما نجه کانی گه لی کوریا یه ثیوه یه گئی  
زانستی ده کاته زنجیره یه ک و ده لئی<sup>۷</sup>:

گه لیک ئە بیویست ئا غای خـوـی بـی  
کـلـکـیـ گـشـتـ : ئـاـ ماـنـجـ وـ هـوـیـ بـی  
ئـهـ وـ چـینـیـ جـوـتـیـارـ وـ کـرـیـکـارـ بـهـ خـاـوـهـنـ هـهـ مـوـوشـتـیـکـ دـهـ زـانـیـ وـ پـیـشـکـهـ وـ تـنـیـ ئـهـ وـ انـ  
بـهـ هـوـیـ سـدـرـهـ کـیـ پـیـشـکـهـ وـ تـنـیـ گـهـلـ دـهـ زـاـضـیـ بـوـیـهـ بـهـ زـمـانـیـ گـهـلـهـوـهـ دـهـلـیـ:

دەرگای دەزگای پیشە و ھونەر  
بۇ رۆلەمە جوتىارو رەنجىنەر  
وا بخاتە سەر گازى پشتىت  
خۆزگەمە بىتە دى كۆممەل گشت

ما ف ده سه نری، نا دری، بویه تنهها شورش گهله ده گه یه نیته ئا ما نجه کانی ،

۱- دیوانی گوران ، لایه ره - ۲۳۵

۲- همان سه رچاوه.

۳- هه مان سه رچاوه :

## ئېنترناسيونالىزم لە شىعرى گوراندا

شا عیرى مولته زىم پەيوەندى يەكى پىتھوى بە مەسىلە بىنەرەتتى -  
يەكا نى گەلەكەيە وە هەيدە . بۆيە شىعرەكانى رەنگ دانەوەدى سارى سياسى  
و كۆمەلایدەتى و ئا بورى گەلەكەيەتى ، بىرۇكەدى شىعرەكانى لە واقىعى  
كۆممەلگا كەدى ھەل ھېنجا وە و پەرىشىعەر ئىلىها ملە ئاوات و بىر كەردنەوە و  
گىر و گرفتى كۆممەل وە رەددەگىرى .

شا عيري مولته زيم له خزمه تي ئا مانجه كانى گلهى دايىه، گورانى  
مهزون، يەكىكە لەو كەلە شاعيراندى كە مولته زيمىدە بە مەسەلەتى گەلە  
كەيدىوه، لەھە ما ن كاتيشدا مولته زيمىدە بېرۇپېروايدىكى پېشىكەوتىن خوازۇ  
مرۇقا يەتى وئينىتە رىنا سىۋۇنالىيستى.

خوشه ویستی کوردستان گورانی گهیا ندوته ئه وبروا بیدی که پشتگیری  
شورشی گله رزگاری خوازه کان بکات و له قولایی دلیه و خوشبا نی بوی، چونکه  
رزگار بروونی ئه وگه لانه به هنگاویک زاسیوه بؤ له تاوبردنی دهسته لاتسی  
ئیمپریا لیزمی جیها نی ئه ووهش ما نایزیک بروونه وهی گهلى کورده له رزگربونو  
له ژیئر دهستی داگیر که ران و بنه برکردنی هیزی کونه په رستی ناخو.  
گوران، هه روک له شیعری و هسف و دلداری و کومه لایه تی و خوشه ویستی نیشتمان  
به شیعری ته رو ناسک و پا را ودا ریکی به ردا ری گهشی روواندووه له با خچه  
شیعری کوردیدا، هه رئا واش له شیعری ئینتە رنا سیوونا لیستی و هاوده نکی له  
گه ل خباتی گله ئازادیخوازه کان و گری دانی خباتی رزگار بیخوازانه  
گهلى کورد و ئه و گه لانه زیا تر با خچه شیعری کوردی رازا ندوته وه

خوای ئازادى و سەربەستىتان دەسپىرىن و ئەوسا كە گەيشتن بەئامانج  
وا بزاڭم بۇمان ھەيە كە جاروبار يادمان بىكەنەوە و بە ناوى ئىمەوە  
چەپكىڭ گولى رىازاوهى بۇن خۆش بخەنە سەر پەيكەرى سەربەستىتى  
و ئازادى ولاتە خوشە ويستە كە مان .

---

به رهه مه کانی بخوینیته وه و چه پله هی بو لیده ن و خه لاتی بکه ن... زور ما ن  
له بهر پی پاره بی نه ده توانی کتیب بکریت ، کاغه ز نه بتو شتی تیا  
تومار بکا ، له بدر ئه وهی به زوری به رهه مه کان ده ما ودهم بلاو ده کرا یه -  
وهه و له بدر ده کرا یا جاروبار له په راویزی کتیبه کونه کاندا  
ده نوسرا یه وه ... ئه وسا له سر سره برشتی کاغه ز ده نوسرا و به که تی - ره  
پیکه وه ده نوسیتر او لورو ده کرا او ده بتو به تومار و له با خه  
و پشتینه کاندا ، یا له تاو بوخچه خام جاوه چلکن و شروله کانا شاربه  
شار و دی به دی له گه ل خوماندا ده مان گیرا ... به رهه می زور به نرخ  
له کیس چوه زور به رهه م که و تو ته ده ست دوژمن و سوتینرا وه یا که و تو ته  
ده ست پیاوی ناشی و کرد ویتی به ئاغزه جگه ره ... ئه و با به تهی لمه  
زه مانی ئیمه دا و تراوه و ئیسته ئیوه ره خنه لی ده گرن ، ئه گهر له وه  
زورتر له سری برویش تینایه دوور نه بتو با ووبابیرانی ئیوهی سرده می  
ئیمه له جیا تی چه پله بو لیدان هو وها یان لی ده کیشاين و راویان  
ده ناین و به ریزگا ویان ده ژمار دین ده ربده درو ئاواره یان ده کردی سن  
وه کو به سر هه ندیکمانا هات . ئه وسا ئه گهر ئیمه پاره شمان نه بوبیت  
جو انى (یوسف) بی پی بکرین به لام له گه ل ئه وه شدا هه ولمان داوه وه کو  
کلافه ده زووی پیریزنه کهی چیزکی یوسف به هه مو لایه کدا په ل بکوتین و  
په تک و هه دا کو کهینه وه و به ته شیی دلما ن بیریسین و بیکهین به  
کلافه ده زووی بو ئه وهی بچینه کو زی میدانه وه ... ئه وهی که بؤئیوه مان  
به جی هیشته تان و پوکهی لمه کلافه ده زوویه ...

خوش ویسته کانمان ، له کو تاییدا ده لیین ... ئیمه هیج کاتیک  
ئومیدبروا نه بوبین و نایین بیر تانه پیریکمان بیزی و تن حاریک له ناو  
به فرو سه هولبه ندانیکدا چقی بوم ، له دووره ئاگریکی به کلپه م دی ...  
به هیوا تین و ته وژمی ئه و ئاگره خوم گرت و خوم نه دایه ده ست مردن  
و رهق نه بوبو مه وه ... ئیمه شئه و ئاگره له زور شوینی ولا ته که ماندا  
به دی ده کهین ...

رۆزی سرکه و تن نزیکه و دوژمنی داگیرکه رو ره گه ز په رستی له  
ئهنجامدا هه ره شویریان بو ده مینیتھ وه ... هه تا ئه و رۆزهی ده ست  
ده کهنه ملی هیوا او ئالای سه ربھستی و ئازادی له زیر سایهی ئاشتی  
راستیدا به سر لووتکهی چیا کانه وه ده شه کیتھ وه ، هه تا ئه و کانه به

به کوّمه ل به زه وی و خاکی نیشتمانه پیرۆزه که مانه وه لکاوین و ههزاران  
هدول و ته قه لای دوزمنانی بُویان لیک جیا ناکریته وه ...  
خوش ویسته کانمان ... ئهوسای سه رده می ئیمە ده سه لات زور کەم بُو،  
خەلکی زور سا ولیکه بُون، میشکیان فەریک بُو، دەلەم بُو، هەر شتى  
رووکەشیان دەبىنى، وەکو مندالى شیرە خوارە وابون لە شیرى بەرمە مکانى  
دا يك بە ولاده هەرجىکى توبان دە خوارد بدرایه قىزىان لى دە بسوه و  
ھېلىنجىان ئەداو ئەرشانه وه ... ئهوسای ئیمە هەر لە مندالىھ و كۆنھ  
پەرسى سەركوپىرى كردى بُون مامانى ووشکە ئیمان بە ژەھرى كۆنھ پەرسى  
بنى مەلاشۇرى ھەل ئەدا ينھ وه ... تەنھا باوهۇمان بە ئەفسانە دیو و  
درنج و حورى و ئاگىرى جەھەنەم بُو ... دوازۇزى پەر لە مەتروسى و سامانك  
و سزاى گور و ئاگىرى جەھەنەم بُو ... ھەمو جۈرە بىر كردنە و ھەكى  
ژيرانه مان لى قەدەغە بُو ... كفر بُو ... سەربىچى بُو ... بە كورتى  
گا و گوتالى سا ولیکە يەتى و كورت بىنى و لىك ئەدانه وەي بىسا او  
با پیرانى سەدەھا سال بەر لە ساتى ئیمە ھەمووی بە سەر ئیمە داپڑا و  
ئیمە گرتە وه ....

ئهوسا ئیمە دەسته پاچە بُوين ... كەم دەست بُوين ... لە دەمى مال  
و مندالىمانيان دەگىر ايدە و دەيان نارد بُو غەزاي سولتان ... خوشمان  
وەکو دەلى مالىمان پەر بُو لە را زىانە كە چى بە سكى يەشە دە مردىن ...  
پېئۇسما بىرىتى بولە قامىش و مەرە كە بىمان لە دوو كەلى قوتىلەي سەر  
دیوارە كان و پەرو (لىفە) دروست دە كرد ... كتىپ و بەرگ و پىلاۋمان بە  
پارەي را تووی فەقى و دە قەفە فەقى و بە پوولە سوولە كۆ كراوهى ناو  
فەقىانە شزو چىكىنە كانمان دە كردا ... كاتى ئیمە هات و چۈھە مووی بە  
پى بُو زور جار لە شويىنې كە و بُو خويىندن بُو شويىنې كى تر بەپى خاوسى  
دەچوين بُو شويىنې كى تر ... ئەو تا يەكىكمان بە ئاشكرا بىرى هاوريە  
كى دە حستە وه :

لە بىرەت دى لە مانى چوينە بالەك بەپى خاوسى نەكە و شمان بۇ و شە كالەك  
ئهوسای ئیمە دە زگا يەك نە بُو دو دىرمان بُو چاپ بکا و بلاوى بکاتە وە،  
وەکو ئىستاي ئىيە دە زگا يەك نە بُو يارمەتى نووسەر باداو بەرھە مەكاني  
بُو لە چاپ بدا و بلاوى بکاتە وە و وىنە يەكى خۆشى لە بەرگە كەيدا بىشى  
بکىشى لە ناو مەلېنە كاندا كورى بُو ساز كا بُو ئەوهى بەرھە مەكاني

خوّش ویسته کانمان نه کمن به نیازی لاسایی کردنده وهی بیگانه له هست و هوستی ها و ولاتیانی خوتان دوور بکهونه وه و پلی ده ماره کانتان به لیدانی دلی بیگانه پل بدا ... زمانه که مان لواز نیه و کم ماؤه نیه، به پیچه وانه وه بهربلاو و فراوانه ... پره له که رهسی رهسه نی خومالی که هه ممو شتیکی تیادا دهست ده که ویت ... زه مینهی ولاشه که مان پره له به سرهات و کاره سات و لایه ره کانی میژوی به تایبه تی ئه وانهی شم سرده مهی دواایی پرن له و بابه شانهی ئه گهر هزاران کتیب و پرتووکی له سر بنوو سریت هیشتا که مه ... و ابزانم له بدر ئیمه وهی پیویست ناکا بازد بدنه بو به رهه مه کانی بیگانه و له هر هوز اوه یه ک دیریک و له هر دیریک ووشیه کی لی بخوازن ... ئه مانه ش بو ئه وهی نالیین که گوشه گیر و دووره په ریز بوه ستن و نالیین هر چی بیگانه دهیکا و ده ینووئی نیوه لی دوور بکه ونده وه چونکه ئه مه شیان کونه په رستیه کی سامنا کی کوشنده و ره گهر په رستیه کی ترسنا که، ئه مرؤ باری ژیان و گوزه ران و هملکرد واي له هه ممو مزو قی جیهان کردوه که له زور ره فtar و هملکرد و بیرکردنده وه و خدبات و تیکوشاندا له یه ک بچن ... بهلی یا چه کی تیکوشان و خدبات و به رهه مه له بیک بچت .... به لام و ابزانین به رهه مه رهیه که شهقل و شیوه تایبه تی خوی پیوه هه یه، ئه مرؤ هیچ شتیک به قدد ئده دلی دوژمانان خوش ناکات که ل هه لکرد و شیوه و رابواردن و نوسین و گورانی و به رهه مه و نه ریتی نا و کومه لگای ولاته کهی خو مان دوور بکه وینه وه ... ئه وهی هه تا ئیسته ئیمهی پاراستوه و له گه رووی نه هنگ رزگاری کردوین ئه وهی که له هه سست و هوستی جه ماوه ری خاوه ن مافی ولاته که مان دوور نه که و توینه ته وه ... که زانیم دوژمن پی ناخوشه جله نیشتمانیه که م بپاریزیم و له کو روئا هنگه کاندا بلیم له رقا له جیاتی نویژکردنیش هر گورانی ده لیم ... که زانیم دوژمن پی ناخوشه جله نیشتمانیه که م بپاریزیم و له کو روئا هنگه کاندا له بدری بکم له رقی ئه و به شه ویش پیوهی ده نووم ... و ابزانم هه رئه و رقه پیروزه شه که دوژمنی که لله بی کردوه و شیت و هار بوه و نازانی چیمان لی بکات که له سر ری راست لاما ندات ... هر ئه ور قه پیروزه یه که له گه ل بعوئی ههندی ناکوکی و ناریکی نیوان خوماندا هیشتا جا شه کانیشمان نه گه بیشتو نه ئه و راده یه که له خوش ویستی نیشتمان و سه ربہ رزی دوور بکه ویته وه ... بویه له گه ل ئه و تاریکی اند شد اه مومان

نا چاری ههندی ریبازی بیگانه بگرینه به رو نه مان توانيی به کامی  
دلی ئیسته ئیوه و به پی رو و بارو دوخی ژیانی ئیسته و بـه  
شیوه یه کی روونتر و باشترا باسی ژیانی ئه سه رده مهی خوماتتان بوبکهین  
گله بـی ئیوه له ئیمه ئه وهیه که لاسایی بیگانه مان ده کرده وه و پیره ویمان  
ده کردن له کیش و ووشدار شتنداده بـلی ئه وهیان راسته، به لامسه یـر  
ئه وهیه که ئیسته شزور کـس به جوـریکـی تو لاسایی بـیگانه ده کـاتـه وـه  
هر بـوـئـهـوـهـیـ بـهـ خـاـوـهـنـهـکـهـیـ بـلـیـنـ خـاـوـهـنـیـ بـهـ رـهـهـمـیـ رـیـبـازـیـ تـازـهـیـهـ  
خـوـیـ نـاـ بـهـ سـتـیـتـ بـهـ کـیـشـ وـ قـافـیـهـوـهـ ،ـ ئـیـتوـ هـرـجـیـ وـوـشـهـیـ ئـالـوـزـوـ تـهـ مـاوـیـ  
وـ هـلـهـقـ مـهـلـهـقـیـ نـوـسـرـاـوـهـکـانـیـ بـیـگـانـهـ هـهـیـهـ ...ـ هـهـرـجـیـ وـرـیـنـهـیـ بـیـ سـهـ روـ  
پـیـ یـانـ هـهـیـهـ هـهـمـوـیـ کـرـاـوـهـ بـهـ وـیـرـدـیـ سـهـرـدـهـمـ وـ تـیـ هـلـکـیـشـیـ چـهـنـدـوـشـهـیـهـکـیـ  
زمـانـهـکـهـیـ خـوـمـانـ کـرـاـوـهـ .

ئـهـ گـهـ رـیـ سـیـهـ رـیـ هـهـ نـاسـهـیـ بـلـیـلـ وـ چـورـاـوـگـهـیـ خـوـیـنـیـ دـهـ مـگـوـیـزـانـیـ نـاـ و~ دـلـی~  
پـهـ پـوـولـهـ وـرـهـ شـهـ بـاـیـ هـهـ نـاسـهـیـ سـیـنـرـیـفـوـزـهـ رـدـهـ وـوـسـمـهـیـ سـهـ رـلـیـوـیـ کـامـوـ ئـهـ مـانـهـ  
بـهـ پـوـختـهـیـ بـهـ رـهـهـمـ دـانـرـیـ بـهـ رـهـهـمـیـ ئـهـ وـبـیـرـهـ دـارـاـنـهـیـ دـیـرـیـنـ بـهـ قـرـچـوـکـ وـرـیـزـوـ  
بـژـمـیـرـدـرـیـتـ ،ـ دـهـ بـیـ وـوـرـیـنـهـ کـانـیـ (ـئـهـ حـهـیـ سـهـ رـاـیـلـیـ)ـ هـهـ مـوـوـیـ بـهـ ئـالـلـتـونـ بـنـوـ  
سـرـیـتـهـوـهـ ...ـ دـوـ هـهـ زـارـبـهـ زـمـیـ وـایـ هـهـ بـوـ کـهـ دـهـیـ وـوتـ :ـ لـیـوـهـ لـهـ رـهـیـ لـهـ شـکـوـیـ  
مـیـرـوـلـهـیـ سـهـرـ دـهـ رـیـاـیـ شـهـ وـنـمـ وـایـ لـهـ مـهـلـهـ وـانـهـ کـانـ کـرـدـ بـوـ هـهـ مـوـوـیـانـ بـیـوـ  
بـوـنـ بـهـ سـیـسـیـ مـهـ غـزـیـ مـیـوـهـ ...

بـیـ گـومـاـنـ بـهـ رـگـ وـ پـوـشـتـهـنـیـ خـواـسـتـیـ بـیـگـانـهـ وـ بـهـ زـورـ تـیـ هـلـکـیـشـانـیـ بـهـ  
بـهـ رـیـ بـهـ رـهـهـ مـداـوـهـکـوـ بـوـوـکـهـ سـهـ ماـکـهـ رـهـیـ (ـکـرـنـقـالـ)ـ دـیـتـ بـهـ رـچـاـوـ ...  
کـاتـیـ ئـیـمـهـ نـهـیـانـ دـهـ هـیـشـ لـهـ ئـهـ لـفـ وـ بـیـ ئـیـ ژـیـانـ بـهـ وـلـاـوـهـ هـیـچـیـ تـوـ فـیـرـ  
بـبـیـنـ ...ـ هـهـ مـوـوـ شـتـیـکـمـانـ لـیـ قـهـدـهـ غـهـ بـوـوـ ...ـ هـهـ رـبـانـگـ وـ نـوـیـژـوـوـسـخـانـهـیـ  
نـاـ وـ مـزـگـهـ وـ تـمـانـ لـیـ قـهـدـهـ غـهـ نـهـکـرـاـبـوـ لـهـ گـدـلـ ئـهـ وـهـشـدـاـهـ مـانـ بـوـ بـیـ  
روـالـهـتـ زـورـ شـتـیـ ئـهـ خـسـتـهـ رـوـوـ ...ـ ئـهـ وـهـ بـوـیـهـ کـیـکـمـانـ دـهـیـ وـوتـ :ـ  
لـهـ بـیـرـحـیـزـهـ تـحـوـیـ وـنـاـتـهـ بـاـیـ لـهـ زـیـرـخـیـرـیـ حـیـزـاـنـاـ بـوـیـنـ بـهـ دـوـشـهـکـ  
هـ تـاـوـهـ کـ ئـاـگـرـیـ بـنـ کـاـیـنـ لـهـ گـهـلـ بـهـ کـ

ئـهـ گـهـ رـطـوـفـانـ بـیـ لـهـ شـکـرـتـانـ بـهـ پـوـشـهـکـ  
وـاـ بـزـانـمـ ئـهـ وـهـیـ کـهـ ئـیـسـتـهـشـ ئـیـوهـ لـهـوـ بـارـهـوـ بـوـیـ بـچـنـ لـهـوـ ئـاـشـکـرـاـتـوـ  
رـوـوـنـتـرـ نـاـتـوـیـ ...ـ لـهـ بـهـرـ ئـهـ وـهـ بـارـهـوـ وـاـ بـزـانـمـ زـورـ نـاـرـهـوـ وـاـیـهـ ئـهـ گـهـرـ حـسـابـ  
بـوـ کـاتـ وـ بـارـ وـ دـوـخـیـ ئـهـ وـهـ خـتـهـ سـهـ کـرـیـتـ کـهـ وـشـعـرـهـیـ بـهـ بـیـ رـوـالـهـتـ تـیـاـ  
وـوـتـرـاـوـهـ ...ـ

کردوه و به دلیان او بون به چقلی ناو چاویان .  
 خوش ویسته کانمان ، یادی ئه و رۆژه تال و سختانه ئیمە تان له  
 بیز نه جىڭ که توانيومانه به چنگەکرى ئەم بەرھەمانەی لە بەردەستان -  
 دایه ھەموی ئامادە بکەین و به هەزار كويىرە وەرى و پەت پەتلىپەن  
 پاراستومانه و گەياندومانەتە ئەم رۆژه . نالىيىن بىرەوى ھەمسەروى  
 بکەن ، چونكە ھەموشيان ھەر راست و تەواو نىن بەلام جاروب اريش يادى  
 كۆن بى سوود نىيە ... راستە ئەمروق و دوارۇز قۇناغەكەي زۇر گرنگە  
 و دەبى ھەموو و وزە دەسەلاتىكتان له پېنىاوي گەشە كردن و سەركەوتى  
 ئە كرده و سەرگەوتىتنان پى نيشان دەدات و دەتاخاتە سەر رېتىگە  
 ژيانى سەركەوتىتنان پى نيشان دەدات و دەتاخاتە سەر رېتىگە  
 بەختىاري و شادمانى ھەموو مەۋەقىك لە جىهاندا ... دەبى بەرھەمە كانغان  
 له پېنىاوي پاراستن و سەرگەتنى ئەدە كرده و سەرگەوتى دابى ...  
 بەلام وا بىزائىن بەرھەمى سەرددە مى ئىمەش دەورى خۆي بىنیو و ھەتا  
 رادەيدىكى باش توانيويىتى گەشە بە زمانەكەمان بىداو ھەندىك بەسەرهات  
 و روودا و نەرىپىتى كۆنتان بو بپارىزى ... ئەدە بەرھەمانه يادى بىأو  
 باپېرانتانه ... ھەمو نەتەوەيدىك شانازى بە كەلەپۈورى راپىردوی و  
 ئەدەب و سامانى نەتەوەايەتى كۆنلى خۆيە و دەكاو نايختاتە پشتگۈي و  
 بە كەم و پەست و نزمى ناژىمېرىت ... ئەدە ئەندىكەمانەتە دەست  
 ئىپە ، ھەمو يادى ئەدە رۆژه تال و سەختا و دىۋارانەيدى كە نەخويىنده -  
 وارى و كۆنەپەرسى و ووشكە رۆپى و مېرىدەزەمى دوزمنى داگىرگە رو  
 ووشكە ئاين وەكۈ موتە كە سوارى سەرمان بوبۇن ... ھىشتا له حەوتە و  
 چىلە دادە بوبۇن ، ھىشتا له ناو بىشكە و جولانە دادە بوبۇن ، بەدەم راژە -  
 ندىنى دواى ھەنسك ھەللىكىشان و گرىيانە وەشە و دايىكى هالى كۆنەپەرسى  
 و زۆزداران بىيى بەزەيى دەپان گوشىن و چىكىان دەنايى بىن و قور تەمل  
 بۇ ئەدە ئەر لە ناو لانكە و بىشكەدا بىمان خنکىنن ، يَا ھىچ نەيى لە  
 حەوتە و چىلە و سەرسنۇك و سەركوپۇر توسا و سەزشورمان بکەن كە  
 گەورە بوبۇن فزەمان لىيۇھ نەيە و نەويىرىن دەم بکەيىنە و خوشى -  
 ویستە کانمان نابى لىيما بگەن ئەگەر ئەدە ساي ئىمە ، لە روانگەنى  
 ئەدە كورە ويرانە ئەنماندا كە ھەموي تارىكتان و تەم و مۇ بۇ ،  
 نەخويىنده وارى بالى رەشى كىشا بۇ به سەر ھەمو ولاتەكەمانا ،

سه وزی... زه ردبووی... و هریوی ئیمە کە وائیستە لە بەر دەستاتندا یە  
پەرى رەنج و تىکۈشان و ماندو بىھ تى سالانى ھەزارى و ئاوارەبى و ۵۵ر-  
بەددەرى و برسىتى و كويىرە و هريمان بىھ ؟

ئەوا خۆستان گەورە بون و دىنياتان تاقى كردى و زۆر شستان  
بە باشى بۇ روون بوه و، بۇتان دەركەوت كە ئەۋەي ئیمە كردو ماشە  
ھەر وَا شىتكى ئاسان و خۆرایى نەبوبە... بەلكو ئەركى ويستو، خۆگرتى  
ويستو، بىن برکى و مل ملانىي ويسىتو بەرامبەر بە ئان پەيدا كرد ن  
و بەرامبەر شالاوى كۆنەپەرەستى و دەرەبەگ و دوزمنانى داگىر كەرى  
ولاتى ئە و سەرەدە مەي ئیمە... ئەمانە ھەموو لە ژىر پەرەدەي ئايىن و  
بە ناوى ئايىنە و لە گەلمانا دەكرا و ھەزار ئايىن و ئۆيىيان لەگەللا  
دەكردىن... سەير ئەۋەي ئە و ساش ئیمە بە ھەندى كەسمان دە ووت كۆنە  
پەرەست و پىاپا ھەلّدە خشائىن و تو انجمان تى دەگرتەن... وَا ئېيّوھش  
وەكۆ نەزانىنى سەرەدە مى ئە و ساي ئیمە، ئىستە بە ئیمە دەلىيىن  
كۆنەپەرەست و ھەرچىكمان ھەبوب ئەگەر بەدەستتان بوايىھە موتان  
دەسووتان و لە ناوتان دەبرد... زۆر دەترسم رۆزىكىش وەچى دوا رۆزى  
دوای ئیمە، بە ئىۋەش بلى كۆنەپەرەست و ھەول بەن ھەمىم و  
بەرەدە مەكانتان كۆ بکەنە و لە ناوى بېھن... .

نەخىر خۆشە ويستە كانمان دووبارەي دەكەينە و كە زۆر دلىيىا بن  
ھىچ زوپىر و دلگىر نەبوبىن ليتەن... بە پىچەوانە و، ئە و بەرەدە مەي  
لە گەرووی نەھەنگى كۆنەپەرەستى سەرەدە مى ئیمە رىزگاريان بىوھ و  
گەيشتۇتە دەست ئىۋە خۆتان سەرپىشك بىن ئەۋى بە باشىي دەزانى سوودى  
لى وەربىرن... بە جىما وەكانى ئیمە وەكۆ رىستى تەزبىح وايىھ، ھىچ  
نەبى ئانە دانە دانە و اى تىايىھ كە خالدار و جوان بى، دەتوانى ئە و دانانە  
ھەلبىزىرن و تى ھەللىكىشى رىستى تەزبىحى بەرەدە مەكانى خۆتانى بکەن...  
ئیمە ئومىدى زۆر گەۋەمان بە ئىۋە ھەپىه... بە تايىبە تى  
ئەوانە تان كە هەتا ئىستە لە راواھ رېيى دوژمندا نەبەزىيون و كۆلتان  
نەداوه و بەرگەي گەرما و سەرمائى ھاۋىن و زستانى تاوانىباران تان  
گرتۇھ و بەرگەي كەلېي چىنگى گەلمە گورگى ناۋ تەم و مۇئى ولاتتان  
گرتۇھ و بەپەرى شانازىيە و بەرامبەر دوچاوازى زەقى دوژمن وەكۆ شىپۇر  
و نېرۇھ سىتاون و پىاپا ئا ھەلّدە شاخىن و كۆلتادەن و ھەميشە داختان

له پر گهلايىكى تر كه وته خواره وه، كه خويينديانه وه لىنى نوسرا بولۇغى  
 ئەوا رۈومىكىدە توڭى دايىكى موشيق بىست و پىنج سالە  
 لە غوربەتدا، بە يادى تو ئەزىم خواشاھىدى حالە  
 (ترەين) جوولايىه وه، واكە وته رې باوهەر بەخۆم ناکەم  
 خەوە يَا خۇدختەيال، يَا راستئەم حالى فەرەھناتىم  
 كە با بونى گولىكى كانى با بىنى، لەلام وايد  
 تەلائى كەيىخرەوى وەك گەنچى بىداوهەر، ھەمووى بايىه  
 كە دىبىي ئە دىبىي گەلاكەيان خويىندە وە لىنى نوسرا بولۇغى  
 قەسەم بە و عەزمى كوردىدى شانى رىچاردى بە شىر رووشان  
 كلاوى كورد ئەبى قووج بى هەتاڭو ماوهەلە جىهان  
 يەكىكى لە نەمامەكان ووتى: ئاي كورە ئەو گەلايى ئە دەپىرەدارەگالۆك  
 بە دەستتەيە كە خۆى پىنەگىراو دوو جىڭر گۆشەئى خۆى لە ولاتىنى  
 رۇمىان بە جىنەتەيە كە خۆى پىنەگىراو دوو جىڭر گۆشەئى خۆى لە  
 ھەرەۋەزى دانانى بەردى بناغانى كۆشكى خويىندەوارى و زانستى و روشنى  
 بىرىيەن و لاتە كلۇلەكەيدا بەشدارى بىكەت... ئە دەپىرەدارەيە كە بىمە  
 پىرەيە وەكە لاوىكى خويىن گەرم وابۇ لە جوش و كولى خۆشە ويستىسى  
 نىشتىماندا و لە دواسالەكانى ڦياندا مارسلىزى ئەم رۆزى ساللىنى  
 تازەيەي بۇ لاران هويندە و...

لەم گفت و گۆيە دابۇن، گەلايىكى زۆر زىلەتە خوارە وە، كە  
 تماشايانكىرد مۇرى چەند پىرەدارىكى بېيە و لىنى نوسرا وە:  
 خۆشە ويستەكانما... جىڭر سۆزەكانما... دلىنىابىن، ئىيمە لە  
 ئىيە زىز نەبوين و نابىن... چونكە ئىيە زۆرتان پاڭ و دلىسافن،  
 ھەر چەند لە سەرەتا وە بەھەلە سىماى تىھەلچۇون و بە نەئارە و  
 پەلامارى خوراپىيتان بۇ سەر ئىيمە ھىتا، گوايا ئىيمە ھىچ نەبوين و  
 كەم تەرخەم بوبىن... لە بىرەناندى كە پىيمان دەوتىن رۆزىك دى لەم  
 ھەلۇيىستە تان پەشىمان و پاشگەز دەبنەوە؟... وائە دەپىرە هات و بىمە  
 چا وى خۆتەن دېيتان كە زۆر شت كە بۇي چوبۇن وَا نەبۇو... ئىيە واتان  
 دەزانى ئىيمە تاوانبارىن... واتان دەزانى ھەمووشتىك لەبەر پىيماننا  
 تەخت و نەرمان بوبۇ... واتان دەزانى ئىيمە دەمان توانى ھەمووشتىك  
 بکەين و بە ئاسانى بى ھىننەن بەرھەم... نەتان دەزانى كە گەملەيى

گوتم ئیستاش لە سەر كەريتى ما وي چاڭ بۇو مىستم نەدالەنیيى چا وي

دىيار بۇو دلۋىپىك فرمىيکىش رېزا بۇو بە سەر دىرىه كانىا لمخەفەتى  
ئەوهى كە بىي عەقلى ئەو سەردەمە گەيشتە رادەيەك كە نۇوسىن بىه  
كۈردى بە چاۋىكى سووك تماشاي دەكرا ... كە نەمامەكان ئەمەيان  
خويىنده وە خۆيان پى نەگىر او هاوارىان كىردى : ئاي ئەوه چىمان بىه  
خۆمان كىرد ؟ خۆ ئەوه ئەو گەلائىانەيە كە ئىيمە دەمانە ويستە مۇيەن  
بسووتىنن ، گەلائى ئەو دارەيە كە دەمان ووت دەبىھە مۇو لقەكانى  
داپاچرى و بکرىن بە دارە را و گورگەي گۆيىسى وانەي ئا و دەستخانەكانى  
مۇزگەوت ... باشە كەواتە جىاوازى ئىيمە و ئەۋانە چىيە كە ئەوسا ئەم  
جۆرە كەسىيان را و دەنا و ئاوارە دەر بەدەرىان دەكىردىن ... ؟

باشە چى بکەين بۇ ئەوهى دلى ئەو دارانە بىننىنە وە جىلى خۆي ... ؟  
لە پى گەلائىكى ترەتە خوارە وە كە خويىنديانە وەللىي نوسرا بۇ

قوربانى تۆزى رىگە تم ئەمى با دى خۆش مرور  
ئەمى پەيكى شارەزابەھە موشارىشا رەزور

كە دىيوهكەي ترىيان خويىنده وە لىي نوسرا بۇ :

ئايا مەقامى روخسەتە لەم بەينە بىيىمە وە

يا مەسىلە حەت لە وە قوفە تايومىنىھە فەصىر

ئىنجا هەمۇو بە كۆمەل وەتىان : ئاي كۈرە خۆئەمەش گەلائى ئەۋپىرە  
دارەيە كە ئەوسا بە ناكامى و سەر چلىقى و بە گالىتەپى كەرنە وە دەمان  
ووت ... دەبىھە كە ناوهكەي كە (تال) بکرىن بەتال و بەسەر دەرگا و  
دەردا زەدا لە جىاتى تالى وولاغ ھەللاو اسرين ... ئەوه بەراست چىمان بە  
خۆمان كىرد ؟ خۆ ئەوه بەرھەمى ئەو ئاوارەيە كە خاکى خاڭ و خولىان  
پى رەوانىدە بىنى و دەربەدەر و ئاوارە بۇو ...

نەخىر قوربان گىيان ... تۆ بەبىي وەرە وە ... پەيمان بى ئەگەر  
بىيىتە وە ، لە ناو بىلىبىيە چاوه كانما تا ھەلت دەگرىن ... لەندا و  
دەلما دەت پارىزىن ... ھەرچىند دوزمنى تاوانبارى ئەم سەردەمە  
ئىيمەش لە دوزمنى ئەوساي ئىيۇھ خويىن رېزىتىز و درىنە ترە ، بەلام لە گەل  
ئەوهشدا بەللىيىت دەدەيىن كە دەسەلاتى ئەوه مان ھەيە بىتەيىنە نَاو  
پەرەي دەلما نەوە نەيدەللىن گەردەتلى بىنىشى ... ئەگەر دوزمنە خويىنە  
خويىكانمان توانا و دەسەلاتى ئەوه يان ھەبى جارو بار زالى بىن بە  
سەر لەشمانتا ، بەلام بىروات بى قەت تواناي ئەوه يان نىيە دەلما  
داگىر بىكەن ...

با بزانین ئەم گەلایانه چى تىايىه وا ئەو پىرەدارانه ئەۋەندىدە  
پىيانەوە دەنازن و شاناز يان پىيۇھ دەكەن ؟

كە خويىندىانەوە روانيان ئەو گەلایانه گەلای ئاساينى نىن...  
بەلكو تىايىا يەبۇ بەردى بىناغى ئەو كۆشكانه دەشى كە ئەوان  
ما وەيەكە ئاواتى بۇ دەخوازن، لەم گفت و گۆيىھى ناو خۆيانا بىوون  
گەلایكە دەتكە خوارەوە و هاتە بىر دەستىان، كە خويىندىانەوە لىقى  
نوسرا بۇ :

بەلى شىخ قوتىبە ئەما قوتىبى ئاشە  
بەچاوى كىداروبەرىشى پانى  
بە من چىنە قىشىنى، مانۇنە مى  
نەخىر سەيريان كرد ئەۋەي بۇيى چو بون زۆرى ھەلە بۇو...  
رېزگاوى بۇو... ئەوان بە تەما بون ھەموو ئەو گەلایانه قەلاچۇ بىكەن  
و لە ئاوايان بىبەن.. كە چى ھەر يەكەيان بىريتىيە لە توّمارى مىزۇي  
ژيان و بەسىر ھەتكانى باوو باپيريانان... ئەو توّمارانه ھەمسۈمى  
بە دۈوكەللى ھەناسى دەرۇنى ئاوازەي دەرىدەرزو دوور لە ولاتكەان  
نوسرا وەتەۋە، ئەوانەي لە كاتى خۆيدا لە داخى كۆنەپەرسىتى و دوا -  
كە وتنى ئاوخۇ سەرى خۆيان ھەلگىرتبوو ولات و كەس و كاريان بە جى  
ھېشتىبوو... بەلى ئەم ھەموو خەلکە تاھقىان نەبۇو كە دەش بىردارى  
ئەو گەلایانه نەدەبۇون و بۇ ھەركۈي دەجۇوپ باس ھەر بأسىي ئەوان  
بۇو... گەلایكى تر كە دەتكە خوارەوە ، كە خويىندىانەوە لىقى نوسرا بۇ:

جۆشىك بىدەن وەكۆ ھەنگ  
ئەسبابى شەپ پەيدا كەن  
پارانەوە و تەوهكىول  
تىرە دوعايىي جەوشەن

تەدبىر بىكەن بە بى دەنگ  
تۆپ و تەنگ و ھاوا  
لە مەعصرە پارە ناكا  
پەيكانە حرسىي مەيدان

كە دىيوي ئەو دىيوي گەلەكەيان خويىندەوە تماشايان كرد لىقى نوسرا بۇ:  
چاڭھئىستا دە كالەبۇ كوردان تەرجمەي شەرع و ئايەتى قۇرئان  
واقعا خزمەتىي لەبۇ خودا يە جى دەبۇو گەر بە كوردى نەبوايە  
ھەر كەوايى ووتە وەها موڭەدەر بىوم وام زانى كەوا لە دىن دەرچۈرم

له میزه مرخیان له داگیر کردنی ههواری ههمو خیله کانی ئەم دهور و  
بەرهی دارستانانه خوشکردوه ...

بەکیکیان له پالدوه ووتی: به راستی زۆر فەریک و خام بويىن  
و بە نەشارە زايى و كورت بىينىدە و بىھۆ كەوتىنە ويزەئە و  
پىرە دارانە و بە خۇرىايى و نارەوا شالاومان بىردى سەريان و وامان  
دەزانى كە پېشىكەوتىن و دەركەوتى ئىمە لە كىز بۇون و نەمانى ئە و  
پىرە دارانەدا يە . . . .

كە جاروبار تەرمە باى شەمال ھەلى دەكىد و سروھى ئە و شەمالە  
گەلا و لقى دارە کانى دەلە رانەوە تازە نەمامەكان ئە وەندەي تىر  
لەشيان فينىك دەبۈوه و گەشەيان پى دەكىد . . . .

ورده ورده نەمامەكان لەگەل پىرە دارە کانبا راھاتن و بۇن بىه  
دۆست و ئاشنا وايان لىھات بىھەوان ھەلىان نەددەكىرىد . . . .  
دارە کانىش كە بۆيان دەركەوت و نەمامەكان رام بۇون و ئە و گۈوكەھى  
جاراشيان پى نەماوه ، بۆيان دەركەوت كە ئە و نەمامانە پىيەمان  
ناوه تە تەمنى لاويكى پىگە يىشتۇرى شارە زاوه . . . ئەوانىش لە سەر خۇ  
دەرگای ئە و صندوقە كۆنانەي كە پى بۇ لە پەرتۈوكى دەس نىووس  
و تۆمارى لۇولكر اوى كۆن ھەمۈيان خستە سەر پشت و گرىي بوخچە  
چىكىنە نەكراوه کانىان بۆ كردەن و بىيان وتن فەرمۇن ھا ئە و  
بە ئارە زوى خۇتان ھەرچىكتان دەۋى لىيان ھەلبىزىرن . . . ئەمانى لە  
بىكەين لە چىنگى چەپۈكى گەردونى نادەمۇارى سەرددە مى خۇمان . . . ھەر  
ئە وەندەمان بۆ دەرباز كرا . . . زۆر بۇن . . . بەلام بە داخەوە دوزەمنان  
ھەرجارە لە كارە ساتىكدا كۆمەللىكىان لۇول دەداو دەيان سوتاندو لە  
تاوابيان دەبرىدىن . . . ھېشىتا ھەشمانە شخراونە تاوا صندوق و بوخچە و  
ھەر بە لقى دارە کانەوە ماون . . . لە گەل ئە وەشدا . . . ئەوانە كە  
تۆمار كراون و لە تاوا بوخچە و صندوقە کاندان، نمۇونەيان بە سەر  
لق و پۆپى دارە کانەوە ماوه و چاوه روان بىكەن ورده ورده سروھى شەمال  
ئە و گەلایانەتان بۆ دەخاتە خوارەوە و بە دىيارى پېشىكە شتاتى دەكات .  
نەمامەكان شەرم گرتى رەنگىكىان ھېشا و رەنگىكىان بىرىد . . . .  
خۇ خەرىكە قىسى پىرە دارە کانى جاران ورده ورده دېتە دى . . . و تىسان

کردوه و خستويانه ته ناو گولڈانيکي خوماليه وه، ئيتو هه مهو شنتىك  
به و چېپکه گولانه تدواو ده بى و ولاس سه روخوارى هه مهوبي به بونى  
خوشى ئه و گولانه تىرو مهست ده بى ... به لام رۇزىك هور دى كه بەم  
برياره ياندا دەچنەوه و لىرى پەشيمان دەبنەوه . با ئەوانىش گەورە  
بىن و بگەنە تەمهنى ئىمە و تالى و ترشى و سوئرى بەسەر ھاتكەن  
بچىزىن و خۆيان ببىينتەوه له ۋىر تەوروتەوراسى ئەو داركەرە  
تاوانبارانى كە بى بەزەيى بەردە سوونە ويىمان، ئەوسا بە تەواوى  
بويان روون دەبىتەوه كە بارى ئىمە مانان لە ژيانا چەنان چەنگى مۆتەككىمى  
و لار بوه و چەند ئەشكىجە و برسىتى و نەبۈونى و كويىرە وەرىمىمان  
چىشتە و نچۇن توانىيۇمانە خۆمان دەرباز كەين لە چەنگى مۆتەككىمى  
مەرك و دوژمنانى ئەو سەردەممەمان ... و ازيانلى بىن چۈنگە زۇرىبى  
ناچى به شانا زىيەوه رۇو ئەتكەنە مەلېنەدەكانى ئىمە بۇ ئەنە وهى  
ئاكادارى ئەو كەرسە رەسەنانە بىنەوه كە نىنۇكىان بۇ كرابو بە  
بىلەكان و له ناو وەردى دىمىرە قەنى بى بارانى ئەو سەردەمانەدا  
روپىنراون و به فرمىسىكى چاوى ئاوارە دەربەدەرە كان پەرەرەدە بۇون  
و گوشكراون و هاتونىتە بەرەم ...

روزگار ھەتا سەر رۇزەكانى هەر بەھار نابىي، بەلكو وردى ورده  
خويىن جىمان كۆتاىي دى و ھاوبىن بە خۆي و گەرمائى تەپ و تۆزىمەوه،  
بە زويان و گەرە و رەشەبایوه چۆكى دائىدە دەنەنە زەنەنە  
دەنىشىتە سەر تەوقى سەرى پېرەدارو تازە نەمام ... كە وەختى گەرمائى  
زەيف لە تازە نەمامەكان دەسىنى، هىچ چاريان نامىنى رۇو ئەتكەنە  
سېبەرى دارستانى لايالى چىاكمى بەرامبەريان كە هەر دارىكى لە پەنا  
تاشىكى زىلدا رېگى داکوتاوه، لەو تاشە بەردە زلانەي كە وەكى گۆران  
و وتنەنی كە هيشتى گەردون تلى پى نەداون ... كە گەيشتنە بەر سېبەر  
و ئاراميان گرت و پشۇويان داو حەسانەوه ... ئەوسا و تىيان: ئۆخەي ...  
ئەوه ئىمەين خومان دەرباز كرد لەو گەرمائى ملۇزمە خەرىك بىسوو  
ھەموومان ھەلىپۇوكىيەت؟ نەمان دەزانى كە گەرمائى هيىنە كارىگەرە  
و ساماناكە ... ئافەريين بۇ ئەو دارانى كە ھەتا ئىيىستە بەرگەي ئەم  
ھەموو گەرمائى گەرە و تەپ و تۆزەيان گرتۇو و توانىيۇمان لەم شوپىنە  
سەختە دا خۆيان بچەسپىنن و بىن بە چىلى چاوى ئەو چاو چەنۈكەنەي

ساوابون لاوازبون ودهستیانته ورو تهور استی پی نهدهگیرا بویهنه یان-  
توانی داره کاند اپاچن و رهگه کانیان بقرتیشن، ئه وهی که پی یان کرا  
بریتی بwoo له داوه راندی چهند گهلایه کی زه ردو هه ممویان کوکرنە وە و  
ئاخنیان ناو جه و الله کانیانه وە و برديان هەلیان رشته ناوشیشی  
لای گورستانه کەی تەنیشت رو انگه یان... ئیتر بwoo به ئاھنگ و شایى  
لوغان و چەپلە ریزان و مژده رپاونان و شکاندی بەرەمە می کۆن و سەر-  
کە وتنی نتۆی بەهه مولایە کداجا ردر او بلاؤ کرايە وە ، بە خەبال بەرەمە می  
کۆن نەما و وون بwoo له چا و ... هه مموی بە جاریک بwoo بەبلقى سەرئا و  
بەلام دارستان هەربەخوشى نەزارى ... پیرە داره کان له رو انگەی-  
خۆپانە وە سەبرى ئەمگالىتە جاره یان دەکردو جاروبار بەدەم قاقای بېیکە-  
نینه وە دەیان ووت . قەی تاکا ... با نەختىك دەماخى خۆیان تەختىكەن،  
ھیشتا خۆینیان ، گەرمە و تىنۇوى ھەلىيە و بەلاماردا نو خۆنىشاندا ن  
وەکو لاویک چۆن سوارى ئەسپى سەركىش دەبى ، ئەوانىش وەکو ئە و سوارە  
دەبى ئاوى خۆیان بەدن و غارغارىنى خۆیان بکەن ھەتا تەواو شەكتە و  
ماندوو دەبن ... ئىمەش ھەندىكما ن لە تەممەن ئىستەئەوانا ھەرواسەر  
گەرم و بزىوبوبىن، ھەندىكما ن ھەلەش بۈوپىن و زوو ھەلدەچۈپىن ...  
وا مان دەزانى ئەگەر بىلە کانىكما ن دەسکە ويت ، ئىپتەر ھەرچى ھەلەکوک  
و پىشۇكى ئە و جىايانە يە هه مموى لەبىن دەردىنەن و دەيکەن بەرسى  
پىشۇك و ھەلەکوک وەکو پرچى زىرىنى خا توزىن هه مموى دەھونىنە وە جارى  
ھىشتە لە ئىمە نەگە يېشتون چوشکە لە دەورى دانە روكەدان ، ھىشتا ئە و  
کەرەسە زەسەنە خۆ ولاتىيەيان نىيە کە بتوانن خشلىكى كوردەوارى لى  
بەھۇنە وە بى را زىننە و بىكەنە گەردىنى بۈوكى ولاتەکە یان... بەلام  
تىستان نەبى هەر وا خام تابن، زۆرى پى ناچىت زۆر شت فىر دەبن  
وەکو ئىمە یان لى دى و باشتىش ... گەللى كەرەسەر رەسەنی کۆن ھەيە  
کە دە توانن دەنك وەکو مروارى ھەللى بىزىرن و بى ھۆننە وە و لە  
گەل ئەوانە خۆياندا موتوربە بکەن و بەرېكى خۆش و بۆندارى لى  
بەھىنە بەرەم ...

لى یا ن گەرپىن با گەشتى خۆیان بکەن با وەکو ئىمە دلشكە او  
رى لى گىراوو سەركوپىر بى بەش نەبن ... هەر چەند ئىبستا ھېر روا  
دەزانى کە بە و چەپكە گولانە کە لە باخچە بىگانە دا گول بىزىريان

ورده نه مام سه ریان له م دیمهنه سوویر مابوو...

خدهه تیان خواردو رقیان هه لساو و تیان : ئەی ئیمە ؟ ئیمە بوجىسى  
وا لاوازىن ، بوجى وا بى سىبەربىن ؟ نه هنگىك و نه پەپاولەيمەك  
لىمان ناپرسىتەوە . . . . نه سىبەرىكمان هەدە كەس لە سايەمانابحەسىتەوە  
ھەموو بە جارىك دەنگىيان بەرز كرده وە و تیان . . نەخىر ، ئەمە نەكراوه  
و ناكرى . . ئەبى ھەموو شتىك بگۇرزىتە ، ئیمەتازە نەمامى وەچەى  
ئەم رۇزە ئەبى بىي يە كایەوە و ھەرخۆمان ھەمووشتىك بىن . . . لە مەدە  
دوا ئەبى رۇزە رۇزى ئیمە بى ، ئەم پىرە دارانە چىن ؟ بەكەلکى  
ھىچ نايەن و باويان بەسەر چوھە و تامىيان تىا نە ماوە . . . باسکەرنىان  
ھەر وەكۆ كاۋۇز كردن و اىيە . . ئەبى گەلڭانىان ھەمووى ھەللوه رېتىرىت  
رەگەكائىان لە بىدا بقۇتىنرىت ، گول و بەريان ھەمووى دارپىرى و بخېتە  
زىر پى لەقەوه بۇ ئەوهى بە ئىچگارى ، نەتوو و نە ناونىشانىان لە  
ناوانەمىنیت . . . ئەبى چىل و لقەكائىان ھەمووى دالپاچرى و سکرىن بە  
سوونەمىنى تاۋەنۇور و ئاگىردانو تۇونى حەمامەكان ، قەفىدارەكان  
سېكىن بە دارە را و گوبىسى وانە ئاودەستخانەكانى مىزگەوت . . . بو ئەدە  
شتانە نە بىـ بۇ ھىچ شتىكى تر دەس نادەن . . .  
مقوّمقو لە ھەموو لايەكەوە دەستى پى كردو تاقمىك كەوتىنخۆيان و بېرىزـ  
يان دا روانكەكەي خۆيان بىكەن بە مەلېتەندىكى تايىھەتى و ناويان لىـ  
نا كۆمەلگەن نوئى دىزى كۈن . . . ھەموويان بەجاري ھەستانە سەرپـ  
و ھەرىيەكەيان بە ( ۱۰ ) پەنجەمۇريان كرد و بېرىار دەرچوو كە تـا  
دوا ھەناسەيان ھەول بىدەن تۆۋى ھىچ شتىكى كۈن نە ھىلەن (ھەر وەكـو  
شۇرۇشە كەلچەرىكەي چىن ) . . . دەبى ھەمووشتىك لە ئەلەف و بىي تازە وەدەست  
پى سکرى و ژەنگى گوئى ئەوانەي كە بە ئاوازى بەرھەمى كۈن راھا تـىـوـون  
و فىـر بـوـون ھەـموـوى رـاـمـالـرـى و مـىـشـكـيـانـ مـشـتـ وـمـالـ سـكـرىـ وـخـاـوـيـنـ سـكـرىـتـوـھـ  
بـهـ وـ جـوـرـھـ سـوـيـنـدىـ رـوـانـگـهـ خـورـاـوـ بـرـپـارـىـ گـرـنـگـىـ كـۆـمـەـلـگـەـنـ نـوـئـىـ دـىـزـىـ بـهـ رـھـ مـىـ  
كـۈـنـ دـەـرـچـوـوـ ، ھـەـمـوـوـ وـەـكـوـ باـزـىـ بـەـنـگـ كـرـدىـانـ قـۆـلـىـانـهـوـ . . ئـەـنـجاـ بـهـ جـىـ  
ھـىـنـاـنـىـ پـرـقـوـزـەـ نـەـخـشـھـىـ بـوـ كـىـشـرـاـوـ ھـەـرـكـەـسـ پـىـوـيـسـتـىـ خـۆـىـ بـىـ سـېـرـرـاـوـ لـهـ  
ھـەـمـوـوـلـايـهـ كـەـ وـھـىـرـشـ دـەـسـتـىـپـىـ كـرـدـ . . . . بـهـ دـارـلاـسـتـىـكـ وـ بـهـ پـلـارـوـ بـىـ بـهـ دـەـرـدـوـ  
قـۆـچـقـانـىـ بـهـ رـبـوـنـهـ وـىـزـھـىـ دـارـ وـ پـىـرـەـدـارـ . . . . بـهـ لـامـ بـهـ دـاخـھـوـھـ ھـىـشـتـىـ

# نامه يهك . . . بو روانگه يهك

هاوار

سالیکیان و هر زی به هاره کهی هه تابلی ته رو تووشي بwoo، باران و -  
ته رزهی سی ووچان بwoo، هدوره گرمم و هدوره تریشنه له تامیان ده رکرد  
بwoo، سال سالی فارچک و بنچک و سوز بسوونی ورده نه مام بwoo . . . .

زه مین ئا ووس بو ژان گرتبوی و ورده نه مام له هه مولایه که و هه رووه کو  
فارچک له (پوانگه) کانه و سه ریان ده رهینابو، به تمه اوی ته نگیان  
به گز و گیا کان هه لچنی بو، هه موکه سیک ئه م دیمه نهی پی خوشبوو که  
ئه و ورده نه ماما نه له و روانگه يه و سه ریان ده رهینابوو به ئومیندی  
ئه وهی ئه وانیش له دوا رپردا ده بنه داری به ردارو سیبه ردار و دارستا  
نه کانمان له جاران چر تووپرتر و به سوود تو ده بن .

که نه ماما کان چاویان پشکوت و چاویان گیز ا به ده ورو پشتیانا و سه بیوی  
خویان کرد، بیویان ده رکه و که چند باریکی و هکو موو له شیانی گه لاور و وته  
بی په رو باله و که زه رنه قووته، له بدر ئه وه زور خفه تیان خواردو پهله یان  
بwoo زوو گهوره ببن و پی بگه ن . . . هر توزیک خویان گرت و که وتنه  
داره داره و پی گرت ن، سه بیری رو انگه کانی ئه و بردی خویان کرد که  
دارستا نیکی چر و سه وزه و پره له پیره داری به سالجوو، داره کان  
هه ندیکیان قه ئه ستوره و هه ندیکیان خلفه نه ماما و خه ریکن په ل و پو  
ده هاون، هه ندیکیان گولی گرت و داری به ردارن و هه ندیکیان به دیمه ن  
جوان و سیبه دارن و موله مهرو ریبواری ماندوو ده تو ان له ژیز سایه -  
یانا مول بخون و ماندویه تیان ده ربکهن و له ژیزیا بجه وینشه وه و عمره قی  
نا و چه وانیا ن بیرون . . . .

هه ندیکیان په پوله دی ره نگاوره نگ هه لفره لفریانه به ده وری گول و چلند  
کانیانا، هه ندیکیان هه نگ ریزه یان به ستوه بو هه ل مژینی شیله و ئا وارهی -  
گوله کانیا ن . . . .

## \* هەلېھەست

55	رزا چۆلپان	- بىرنابىن
75	نەزىر گىدۇ	- ئاپلۇو
59	تۆسنى رەشيد	- سەتوانىا پىشىمەرگان * پىرتۇوكىيْن نىسو
69	پىشە و كەرىمئە حەممە	- لى سەر پىرتۇوكا مەنتى شاشویلى

## دوملىنى

75	ئە حەممە دى خاسى	- مەولۇودى نەبى
98	ئۇسمان ئەفەندى	- بىيىشى پىيغەمبەرى (مەولۇودا نەبى)
111	مال مىسانىز	- شىخ سەعىد حامى پىرا
115	دەمیر ئۆوزلۇو	- مەركى خالد بەگى جىرى
121	فرات	- فۇلکلۇرى دەرسى را
127	مال مىسانىز	- بىلەيۈگۈرافىيا دولى (ازازا)

## بەشى كرمانجى خواروو

٦	هـاوار	- نامەيەك بـو روانگەيەك
٢١	كـامـهـرـان	- ئـينـترـنـاسـيوـنـالـيزـمـ لـهـ شـيـعـرـىـ گـورـانـ دـاـ
٢٨	ـ وـهـرـزـيرـ	- دـوـانـاـمـهـ
٣٢	ـ كـهـمـلـهـ مـسـتـهـ فـاـمـهـ عـرـوـفـ	- دـلـدـارـشـاعـيرـىـ شـورـشـگـىـرـ وـپـىـشـكـهـ وـتـنـخـواـزـ
٣٨	ـ حـمـمـهـ	- چـيـرـوـكـىـ شـاخـ
٤٩	ـ فـهـرـهـادـ شـاكـهـلىـ	- بـنـچـيـنـهـ كـانـىـ بـيـرىـ كـورـدـاـيـهـتـىـ لـهـ مـهـ مـوزـيـنـىـ خـانـىـ دـاـ

## بەشى كرمانجى ژۇرۇوو

٧	جوـيـسـ بـلـوـ	- مـيرـىـنـاـ حـمـسـهـنـىـ قـزـلـجـىـ
١١	جوـيـسـ بـلـوـ	- بـيـرـانـىـنـاـ تـوـماـسـ بـلـوـ
15		* بـەـلـگـەـ
		- بـيـرـانـىـنـىـنـ ئـيـحـسانـ سـوـورـىـ پـاشـاـ (٣)
		* زـمـانـ وـ ئـەـدـبـيـاتـ
٢٧	ـ فـهـرـاتـ جـهـ وـهـ رـىـ	- قـاـچـخـ كـريـسـياـ بـوـبـىـ
٣٧	ـ روـژـكـىـ بـهـ ئـيلـمـدارـ كـيـنـياـزـ ئـيـبرـاـهـيمـ رـهـ	- چـهـرـكـەـزـىـ رـەـشـ
٤١	ـ حـمـسـهـنـ مـيـتـهـ	- پـەـنـجـارـ
٤٤	ـ موـسـىـ گـاـوـالـ	- كـچـاـ گـاـوانـ ئـوـ كـورـىـ مـيـرـ

کرمانج د دهولهتا دنیدا  
ئایا بچ وەجهی مانە مەحرۇوم ؟  
بىلچىملە ئېبوچ بۇونە مەحكۇوم ؟

ئەحمدى خانى  
(سەددەى حەققەيىم)

ئەم كۆفارە سالى دوو جار  
ئەنسىيەتىوو كورد دەرى دەكى

# چوا

کوئلریکی رووناکییری کشتے



ڈومنارہ ۴ / ٹھیلوولی ۱۹۸۵

# ENSTİUYA KURDÎ

Enstituya Kurdî malbendeke çan-diya serbixwe ye. Di Sebata 1983 bi destê ronakbîrine kurd ên ji her aliyêñ Kurdistanê, hatiye danîn. Amanca wê besdarbûna şerê ji bo parastin û pêşvebirina çanda gelê kurd e.

Civandina gencineyêñ çanda kurdî, çekirina ferheng û rezimanên kurdî, légerînêñ li ser edebiyat, pî-şe û dîroka kurdî, çapkirina kovar û kitêbên kurdî, pêkanîna kaset, sêlik û filmên kurdî şaxêñ bingehi-yêñ xebata wê ne. Karekî wê yî serekeyê din jî nasandina çanda kurdî bi gelên cihanê ye.

Enstitu dixwaze bibe cîgehekî xebatê ji bo hemû zimanzan, nivîskar, dîrokñas, hinermend, pî-şekar û ronakbîrêñ kurd û dostêñ gelê me.

Ew ji bo jiyan û pêşveçûna xwe, hewcê alîkarî û tevkariya her Kurdê welatparêz e.

Hîmdarêñ Enstituya Kurdî :  
CEGERXWÎN, Ordîxanê CELÎL:  
Heciyê CINDÎ, Yilmaz GÜNEY,  
HEJAR, KENDAL, Qanatê KURDO,  
REMZÎ, Osman SEBRÎ, Ismet Şerîf  
VANLÎ, Tewfiq WEHBÎ, Nûredîn  
ZAZA.

## ئەنسىتىتووی كورد

ئەنسىتىتووی كورد مەلېبەندىكى كولتۇورىي سەربەخۆيە . لە مانگى فيقىريي 1983 بە كۆششى چەندان رووناكبيرى كوردى ھەموو بەشكانى كوردستان دەمەزرا . ئامانجى بەشدا ربوونە لە خەبات بۇ پاراستن و پەرەپىدانى كولتۇورى گەللى كوردە .

كۆكىرنە وەى گەنجىنە كولتۇورى كورد، نۇوسىنى فەرەنگ و رېزمانى كوردى، لېكۆللىنە وە دەربارە، ئەدەب و ھونەر و مېزۇوى كورد، چاپكىرنى گۆفار و كتىبى كوردى، قا ما دەكىرنى كاسىت و قىسوان و فلمى كوردى، ئەمانە بىنچىنە چالاكييەكانى ئەنسىتىتوون .

ئەنسىتىتوو دەيە وى بىپى بە جىڭىاي كاركىرن بۇ ھەموو زمانناس، نۇوسەر، مېزۇوناس، ھونەرمەند و رووناكبيرىكى كورد و دۆستى كورد . بۇ ما نە وەى ئەنسىتىتوو و پەرە سەندىنى، پېۋىستى بە ھاوكارى و بەشدا ربوونى ھەموو كوردىكى نىشتمان پەروەر ھەيە .

# حبو

کوفلنگ کی رووناکیوں کشناہ



ژومنارہ ۴ / ٹھیلوولی ۱۹۸۵